

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası KurdiName Dergisi
International Journal of KurdiName

CONTENT - NAVEROK

Research Articles / Gotaren Lêkolini

- ✱ **XEBATEK BÎBLİYOGRAFÎK JI BONA ROMANÊN KURMANCÎ**
A BIBLIOGRAPHIC STUDY FOR KURMANJÎ NOVEL
Mehmet Emin PURÇAK.....1-28
- ✱ **HÎZAN WEK NAVENDEKE PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDIYA KLASÎK**
HIZAN AS ONE OF THE FORMATION CENTERS OF CLASSICAL KURDISH
LITERATURE
Nevzat EMİNOĞLU29-42
- ✱ **KURD DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA AYETA ŞAZDEMÎN A SUREYÊ FETHÊ**
KURDS IN THE CONTEXT OF THE INTERPRETATION OF THE SIXTEENTH
VERSE OF SURAH AL-FATH
Mustafa ÖNCÜ.....43-51
- ✱ **,BIKARANÎNA ÎZAFEYÊ DI DEVOKÊN KURDÎYA KURMANCÎ DE**
(DEVOKÊN BAKUR, BAŞÛRÊ ROJILAT Û BAŞÛRÊ ROJAVA)
EZAFE CONSTRUCTION IN KURMANJI KURDISH
(NORTHERN, SOUTH-WESTERN AND SOUTH-EASTERN DIALECTS)
Mehmet YONAT.....52-75
- ✱ **ŞÊX QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: JIYAN, BERHEM Û KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ**
SHEIKH QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: HIS LIFE, WORKS AND LITERARY
PERSONALITY
Numan YURT76-98
- ✱ **ZAZAKÎ DE RAWEYA FERMANÎ**
IMPERATIVE MODE IN ZAZAKI
Ahmet KIRKAN.....99-108
- ✱ **رەنگی سوور له شیعری کلاسیکی کوردیدا**
RED COLOUR IN KURDISH CLASSICAL POETRY
Koser Omar AHMAD...109-126

Book Review / Nirxandina Pirtûkan

- ✱ **LÎRÎKAY ŞA'IRÊ GEWREYÊ KURD MEWLEWÎ (1806-1882)**
Hemin Omar AHMAD...127-132
- ✱ **MELAYÊ CİZİRÎ SEVGİ VE GÜZELLİĞİN ŞAİRİ**
Nevzat EMİNOĞLU...133-137
- ✱ **RÊBERA RASTNÎVÎSÎNÊ KOMXEBATA KURMANCÎYÊ**
Tahirhan AYDIN...138-142

Kovara Kurdiname'yê ya Bi Hakem û Navnetewî
International Peer-Reviewed Journal of Kurdiname
Uluslararası Hakemli Kurdiname Dergisi
(e-Journal)

Chief Editor And Owner

Asst.Prof. Osman ASLANOĞLU –Dicle University
email: aslanogluosman@gmail.com

Editorial Board // Licneya Edîtorîyê

Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL (Dicle University) email: hkhayreddin@gmail.com
Asst.Prof. Hacı ÖNEN (Dicle University) email: hacionen@gmail.com
Asst.Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University email: ahmetkirkkan@gmail.com

Associate Editors // Alîkarên Edîtor

R. A. Resul GEYİK // Mardin Artuklu University - resulteacher@gmail.com
R.A. Betül ÇOBAN // Mardin Artuklu University - cbnbetul@gmail.com
R.A. Dr. Mehmet YONAT // Mardin Artuklu University - mehmetyonat49@gmail.com

Advisory Board // Licneya Şêwirmendîyê

Prof. Dr. Hasan TANRIVERDÎ / Dicle University: tanriverdi21@hotmail.com
Prof. Dr. Abdurrahman ACAR - abduajar@gmail.com
Prof. Dr. M. Edip ÇAĞMAR / Dicle University: mecagmar@hotmail.com
Prof. Dr. M. Mesut ERGİN / Dicle University: emesutergin@gmail.com
Prof. Dr. Nesim DORU / Mardin Artuklu University: nesimdoru@artuklu.edu.tr
Prof. Dr. Abdurrahman ADAK / Mardin Artuklu University: abdurrahmanadak@gmail.com
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Mardin Artuklu University: tahirhan@hotmail.com
Assoc. Prof. Hayreddin KIZIL / Dicle University: hkhayreddin@gmail.com
Assoc. Prof. Zahir ERTEKİN / Bingöl University: zahirertekin@hotmail.com
Assoc. Prof. Hayrullah ACAR / Mardin Artuklu University : hayrullahacar@hotmail.com
Assoc. Prof. Ayhan TEK /Muş Alparslan University: ayhan_tek@hotmail.com
Assoc. Prof. Nesim SÖNMEZ /Van Yüzüncü Yıl University: nesimsonmez@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖZTÜRK / Mardin Artuklu University: mustafaozturk47@gmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖNCÜ / Mersin University: mistefaoncu63@hotmail.com
Assoc. Prof. Canser KARDAŞ /Muş Alparslan University: kardascanser@gmail.com
Assoc. Prof. İlyas AKMAN / Mardin Artuklu University: ilyas.akman21@gmail.com
Assoc. Prof. Ahmet GEMİ / Mardin Artuklu University : ahmetgemi04@gmail.com
Assoc. Prof. Necat KESKİN / Mardin Artuklu University: necatkeskin@gmail.com
Assoc. Prof. Hassan Sarbaz. Kurdistan University: Sanandaj- Iran h.sarbaz@uok.ac.ir
Asst.Prof. Mustafa ASLAN / Mardin Artuklu University: mustafaaslan@artuklu.edu.tr
Asst.Prof. Nurettin BELTEKİN / Mardin Artuklu University: nbeltekin@yahoo.com
Asst.Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University: hacionen@gmail.com
Asst.Prof. Hemin Omar Ahmad AHMAD / Soran University: Irak: hemin.ahmad@soran.edu.iq
Asst.Prof. Mehmet Emin PURÇAK /Muş Alparslan University: epurcak@hotmail.com
Asst.Prof. Osman ASLANOĞLU / Dicle University: aslanogluosman@gmail.com
Asst.Prof. Yusuf BALUKEN /Yozgat Bozok University: yusufbaluken@gmail.com
Asst.Prof. İlyas SUVAĞCI / Hakkari University: ilyascembeli@gmail.com
Asst.Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University: ahmetkirkkan@gmail.com

Asst.Prof. Bakhtiyar Sajjadi / Kurdistan University: Sanandaj /İran: bakhtiar_sajjadi@yahoo.com
Asst.Prof. Yadullah Peşadadi / Kurdistan University: Sanandaj /İran y.pashabadiuok.ac.ir
Asst.Prof. Arkhwan MOHAMMED OBAID - Karkuk University: arkhwanmohammed83@uokirkuk.edu.iq
Dr. Lect.Zülküf Ergün / Mardin Artuklu University: zxweshevi@gmail.com
Dr. Hewa Salam Khalid/ Koya University: hewasalam@gmail.com
Dr. Mehmet YONAT / Mardin Artuklu University: mehmetyonat49@gmail.com
Dr. M. Şirin FİLİZ / Mardin Artuklu University: mehmetirinfiliz@gmail.com
Dr. Yakub AYKAÇ / Mardin Artuklu University: aykacyakup@gmail.com
Dr. Kenan SUBAŞI / Mardin Artuklu University: kenanenado@gmail.com
Dr. Mikail BÜLBÜL - : mikailbilbil@hotmail.com

Referee Board / Licneya Hakeman

Journal of Kurdiname uses double-blind review fulfilled by at least two reviewers.

Referee names are kept confidential.

(Kovara Kurdinameyê nirxandîna herî kêr "du hakemên kor" bikar tîne.
Navên hakeman tîn veşartin)

INDEX

SIS, ASOS, BASE, TEI, ASI, ESJI, DRJI, Citefactor, Asian Research Index, EuroPub, Jatstech, İdealonline, Google scholar, Rootingindex, Journalsdirectory, ISSN PORTAL, Advanced Science Index, IJIFACTOR, Openaire, infobase, sjifactor, Academia.


CONTACT/TÊKILÎ

Chief-Editor: aslanogluosman@gmail.com
Journal : kurdiname1@gmail.com
Website: https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname

ABOUT JOURNAL



Kurdiname is a Refereed International Journal Published in Electronic
Publish period is biannual (Twice for a year)
This journal uses double-blind review
Publishing article is free for authors
The journal articles are open access for readers
Articles being controlled for plagiarism before review
All articles are licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0)
The Responsibility of the articles published in the journals belongs to the author/authors.



CONTENT / NAVEROK

Research Articles / Gotarên Lêkolînê

1	XEBATEK BÎBLİYOGRAFÎK JI BONA ROMANÊN KURMANCÎ A BIBLIOGRAPHIC STUDY FOR KURMANJÎ NOVEL Mehmet Emin PURÇAK- Muş Alparslan University-Turkey	1-28
2	HÎZAN WEK NAVENDEKE PEYDABÛNA EDEBIYATA KURDIYA KLASÎK HIZAN AS ONE OF THE FORMATION CENTERS OF CLASSICAL KURDISH LITERATURE Nevzat EMİNOĞLU - Muş Alparslan University-Turkey	29-42
3	KURD DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA AYETA ŞAZDEMÎN A SUREYÊ FETHÊ KURDS IN THE CONTEXT OF THE INTERPRETATION OF THE SIXTEENTH VERSE OF SURAH AL-FATH Mustafa ÖNCÜ - Mersin University-Turkey	43-51
4	BIKARANÎNA ÎZAFİYÊ DI DEVOKÊN KURDÎYA KURMANCÎ DE (DEVOKÊN BAKUR, BAŞÛRÊ ROJHILAT Û BAŞÛRÊ ROJAVA) EZAFE CONSTRUCTION IN KURMANJI KURDISH (NORTHERN, SOUTH-WESTERN AND SOUTH-EASTERN DIALECTS) Mehmet YONAT- Mardin Artuklu University-Turkey	52-75
5	ŞÊX QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: JIYAN, BERHEM Û KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ SHEIKH QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: HIS LIFE, WORKS AND LITERARY PERSONALITY Numan YURT - Turkey	76-98
6	ZAZAKÎ DE RAWEYA FERMANÎ IMPERATIVE MODE IN ZAZAKI Ahmet KIRKAN - Mardin Artuklu University-Turkey	99-108
7	رهنگی سوور له شیعرى کلاسیکی کوردیدا RED COLOUR IN KURDISH CLASSICAL POETRY Koser Omar AHMAD - Iraq	109-126

Book Review / Nirxandina Pirtûkan

1	LÎRİKAY ŞA'IRÊ GEWREYÊ KURD MEWLEWÎ (1806-1882) Enwer Qadir Mihemed, 2007, Silêmanî, Weşana Serdem, Çapa sêyem, 285 rupel. Hemin Omar AHMAD – Soran University-Iraq	127-132
2	MELAYÊ CİZİRÎ SEVGİ VE GÜZELLİĞİN ŞAIRİ Halid Cemil Muhammed, Wergera ji Erebi bo Tirkî: Ümit Demirhan, 2008, İstanbul: Weşanên Hivda, Çapa yekem. 273 rûpel, Isbn: 3990000086542 Nevzat EMİNOĞLU - Muş Alparslan University-Turkey	133-137
3	RÊBERA RASTNIVÎSÎNÊ KOMXEBATA KURMANCÎYÊ Kom, 2019, Stenbol: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, Çapa duyem, 229 rûpel, Isbn: 9786058097506 Tahirhan AYDIN - Mardin Artuklu University-Turkey	138-142

XEBATEKE BÎBLİYOGRAFÎK JI BONA ROMANÊN KURMANCÎ A BIBLIOGRAPHIC STUDY FOR KURMANJÎ NOVEL

Mehmet Emin PURÇAK*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 21/07/2020

Accepted // Pejirandin: 26/09/2020

Published // Weşandin: November, 2020

Pages // Rûpel: 1-28

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Purçak, Mehmet Emin, (2020). Xebateke Bîbliyografîk ji bona Romanên Kurmancî, *Kurdiname*, no. 3, p. 1-28

Plagiarism/Înfihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Romana Kurdî ya yekem *Şivanê Kurmanca* di 1935an de çap bûye û îro romana Kurdî ketiye heştê û pênc saliya xwe. Lê ji ber sedemên cuda, xebatên li ser roman û romannûsiya Kurdî kêr û qels in. Kesên ku bixwazin li ser romana kurdî bixebitin, ihtimalek mezin dê di temînkirina romanên de pirsgerêkan bijîn. Lewre ne saziyeke ku bi rêkûpêk berhemên Kurdî arşiv dike heye ne jî bîbliyografyayên ku van berhemên dihewînin. Ji bona qismekî vê kêmasiyê jî holê rakin, me xebateke bîbliyografîk ji bona romanên kurmancî çêkir.

Bêjeyên sereke: Kurmancî, roman, weşanxane, nivîskar.

Abstract

The first novel in Kurdish is *Şivanê Kurmanca*, published in 1935, and today the Kurdish novel has turned eighty-five years old. However, due to different reasons, studies on Kurdish novel and novelism are few and incomplete. Scholars who want to work on the Kurdish novels, most likely have problems in providing the novels. Because there is neither an institution that archives Kurdish works properly nor a bibliography that includes published works. We have prepared a bibliography of Kurmanji novels to eliminate this shortcoming, in part.

Key words: Kurmanji, novel, publisher, author.

Destpêk

Arşivkirin, nîşaneya hişmendiyekê ye. Lewre arşiv, hafiza ye. Yê ku qîmeta hafizayê dizanin, em dikarin bibêjin, qîmeta rabirdûya xwe jî dizanin. Lewre hafiza, ango bîr, dîroka mirovan, dîroka miletan dihewîne. Qasî belgêyên fermî, berhemên fiktîf, zanyarî, çapemeniyê jî bîra mirovan û mirovahiyê ihtiva dikin. Ew jî divê bîr parastin. Li welatên pêşketî, em dikarin bibêjin girîngiya arşivan baş tê zanîn. Ji ber vê jî bi sedan, bi hezaran muzeyên şexsî û fermî, herî kêr qasî wan jî pirtûkxane û belgexaneyên fermî hene. Lê ji ber sedemên cuda,

* Dr. Öğr. Üyesi, Zanîngeha Muş Alparslanê, Fakulteya Fen Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, epurcak@hotmail.com, Orcid: <http://orcid.org/0000-0003-1875-5842>

heta îro saziyeke ku em bikaribin herin û hemû berhemên kurdî yê çap bûne, bibînîn û li ser bixebitin tune. Lewre sedemên polîtîk û sedemên bêkêriyê derdikevin pêşya me. Di nava kurdên bakur û yê metropolên Tirkiyê de problema tirsê ji dewletê heye. Mirov, ji ber ku bi metnên, berhemên kurdî neyên girtin yan xwe sedî sed ji berhemên kurdî îzole dikin yan jî dixwînin lê kom nakin. Ji xwe dûr dixin. Saziyên wekî komele, partî, sendîka û hwd. jî di lêgerînan de, di serdegirtinan de ji ber berhemên kurdî hatine hişyarkirin, darizandin, girtin. Bi pir hêsanî ne tenê pirtûk, hemû amûrên wan hatine desteserkirin û ji wan hatine standin û windakirin. Ev jî wana dike nava tirseke. Xêncî sedemên polîtîk û polîsiye, sedemekî dinê jî aborî ye. Lewre ji bo hemû berhemên kurdî bî şopandin, pere lazim e ku cîhek bê vekirin û ji weşanên kurdî herî kêr çend numûne bî standin û arşivkirin. Ji ber van sedeman, yan jî yê wekî van sedeman, li Tirkiyê saziyek ku berhemên kurdî bi rêk û pêk kom dike yan jî bike, qasî ku dizanim, tune. Dîsa li Başûr jî, ji ber sedemên cuda, saziyeke ku berhemên li hemû beşên Kurdistanê yan jî hemû weşanên kurdî bişopîne û vana di pirtûkxaneyekê, di arşivekê de bîne cem hev û bide xizmeta xwendevan û lêkolîneran tune. Helbet ev problemek mezin e. Divê saziyên bi hişmendiyê zanyarî û profesyonel tevdigerin bî avakirin û li ser çand, ziman û dîroka kurdan xebatên hatine çêkirin berhev bikin û wekî “navenda lêkolînan kurdolojiyê” xizmetê bidin xwendevan û lêkolîneran¹.

Her çiqas di aliyê rojname, kovar, biroşur, pirtûk û hwd. her metnên çapkirî/belavkirî berhevkin girîng be jî, ji bo van karan xebatên bîbliyografîk jî girîng in. Ji ber vê, ez dixwazim di nava vê giloka problem û kêmasiyên mezin de li ser beşekê bisekinim. Armanca me ji bo romannûsiya Kurdî (Kurmancî) amadekirina bîbliyografyayekê ye. Bi vî awayî, lêkolîner û zanyarên ku dixwazin li ser romanên kurmancî bixebitin, dê di destê wan de listeyekê van berhemên hebe. Bi vî awayî em hêvî dikin ku xebatên di vî aliyê de hêsantir bimeşin. Beriya ku encama xebata xwe parve kin, em dixwazin li ser çavkaniyên xwe hinek agahiyan parve kin û hinek xeletiyên sererast bikin.

Rexneyek Li Ser Çavkaniyên Listeyên Romanên Kurmancî

Bi gelemperî ji bo edebiyata kurdî, bi taybet jî ji bo romana kurdî, qasî ez dizanim, bîbliyografyayek bi rêk û pêk tune. Lê çend xebatên di mahiyeta ceribandî de hene. Lê hem di ser (piraniya) van xebatan re qasî deh sal dem derbas bûye, hem jî hinek xeletiyên van hene.

Listeya yekem ya ku em dê li ser bisekinin, nivîsa panoramîk ya Nacî Kutlay e. Kutlay sala 1998an de di kovara *Warê* de nivîseke bi sernavê “Romana Kurdî” belav dike (hejmar: 5-6: r. 125-134). Kutlay, di vê nivîsê de bi agahiyên kurt, romanên kurdî dinirxîne, behsa romanên û romannûsan û dabeşkirina romanên li ser welatê kurdan dike. Wekî Kurdên Sûriye, Iraq, Îran û Tirkiyê û yê Sovyetan. Romannûsên ku ew behsa wan dike, Erebe Şemo, Seîde Îbo, Egîdê Xudo; Eliyê Evdirrehman; Azad Bavê Şehîn, Bavê Nazê, Xemgîn Temo; Rehîmê Qazî; Îbrahîm Ehmed, Huseyîn Arîf, Mihemed Mukrî; Mehmed Uzun, Şahîne Soreklî, Mehmûd Baksî, Hesênê Metê, Medenî Ferho, Nacî Kutlay (Nûrî Şemdin) in. Berhemên ku Nacî Kutlay behs dike, di listeyên din de jî hene. “Murtule Beg” ya Eliyê

¹ Haşîm Ahmedzade jî di xebata xwe de li ser vê rewşê disekine û dibêje, ne tenê saziyên ji ber zext û zora desthilatdarên çar parçeyê Kurdistanê, heman demê saziyên li diasporayê jî di rewşekê xirab de ne û di ziyaretê xwe ya ji bo Enstîtuya Parîsê û Pirtûkxaneya Kurdan ya Stockholmê jî aliyê kêmbûna çavkaniyan de çawan hêviya wî şêkênastine vedibêje (Ahmedzade, 2004, 153).

Evdilrehman ku em îro jî nizanin gelo ev roman çap bûye yan nebûye. Di pirtûka Eskerê Boyik de jî, di behsa Eliyê Evdilrehman Mamêdov (1920-1994) de navê vê pirtûkê derbas nabe (Boyik, 2012: 269-280). Lê di *Antolojiya Edebiyata Kurdî* ya Mehmed Uzun amade kiriye de, Tîmurê Xelîl, behsa hevpeyvîna xwe bi Eliyê Evdilrehman dike û vê hevoka wî neql dike: “[E]z niha dîsa li ser romana ‘Murtule Beg’ê dixebitim, çawa tê zanîn ew xweşmêrê navçeya Muksê bû” (Xelîl, 1995: 386). Di çapa romana *Şer Li Çiya-Şêx Zayîr* ya Weşanên Pêriyê de, di berga dawiyê de behsa berhema Eliyê Evdilrehman ya bi navê *Hesreta Min* hatiye kirin û di nava kevanê de jî cureya wê wekî roman hatiye nivîsîn, lê di hevpeyvîna ku Tîmurê Xelîl neql dike de Eliyê Evdilrehman ji bo vê pirtûkê jî dibêje, “Berî çend mehan berevoka min ku têda gelek helbest cih girtiye bi navê ‘Hesreta Min’ der çû. Di wê de gelek helbest hene ku min avîtiye li ser kurd û Kurdistanê” (Xelîl, 1995: 387). Bi vî awayî, em dibînin ku weşanxaneyên me pir bi hêsanî xeletiyên derbarê cureya berheman de dikin.

Lîsteya duyem ya Îbrahîm Seydo Aydogan ya bi sernavê “75 Sal û 200 Romanên Kurdî (Kurmancî)” ye. Îbrahîm Seydo Aydogan, di xebata xwe de agahiyên romanên kurmancî yên di navbera 1935 û 2010an de hatiye çapkirin dide. Lê beriya ku lîsteya xwe bide jî hûrgiliyên wan romanên yên îstatîstîkî parve dike û şîroveyên xwe yên derbarê romannûs, cîhê ku romanên kurmancî lê derçûne, jimara romanên romannûsan, mijarên romanên û kalîteya wan de dinivîse. Ji lîsteya Îbrahîm Seydo Aydogan rasterast naxûyê ku gelo wî ev berhem hemû dîtine, bi dest xistine yan na. Lewre di lîsteyê de hinek berhem bi kunyeyeke tam ve cîh digirin lê hinek xwedîyê agahî kêma û qels in. Mînak: Dema behsa romanên Medenî Ferho dike, ji bo romana *Marê Di Tûr De* agahiyên weşanxane, sala çapê û hejmara rûpelan dide, lê cîhê çapê (bajêr, welat) nade. Ji bo romanên heman nivîskarî yên bi navê *Xewnên Pînekirî* û *Çiroka Me* jî tenê navê weşanxaneyê, sala çapê daye, agahiyên din tunin û ji bo *Berxwedan Jiyan e* jî tenê sala çapê (1994) hatiye dayîn. Ji bo romana Mêvan (Betel Betê) ya bi navê *Bêbextî* jî agahiyên kunyeyê yên wekî weşanxane, cîhê çapê, sala çapê, hejmara rûpelan nedaye. Xêncî vê, ji sernavê lîsteyê jî diyar e ku dê lîste ji romanên kurmancî pêk bê. Li hember vê agahiyê, romana Îlhamî Sertkaya ya bi navê *Kılama Şilane*² jî di vê lîsteyê de cîh digire û ev xeletiyek e. Lewre ev roman, kirmanckî/dimilkî ye. Navê romana Enwer Karahan bi xeletî wekî “Şapînoza” hatiye nivîsîn, bi eslê xwe *Şapînoz* e. Navê nivîskarê pirtûka *Evîna Bêtuxûb* jî wekî Seydayê Exlatî nivîsiye, lê li ser berga pirtûkê navê nivîskar wekî Mele Seîdê Exlatî dinivîse; di rûpela ewil ya pirtûkê de jî navê nivîskar bi vî awayî cîh digire û binê vî navî, di nava kevanê de (Seydayê Xelatî) hatiye nivîsîn.

Xalekî din jî di cureya pirtûkan de derdikeve ber me. Pirtûka Omer Dewran ya bi navê *Û Çiya Ji Dinalin* û pirtûka Amed Çeko Jiyan ya bi navê *Varjabed*, di çapên wan de cureya wan wekî “kurteçîrok” cîh digire, Aydogan wekî roman di lîsteyê de cîh daye van pirtûkan jî. Bijîşko û Helîm Yûsiv jî cureya *Û Çiya Ji Dinalin* wekî roman dane. Ji ber îfadeya li ser bergên van pirtûkan, me di lîsteya xwe de cîh neda van du pirtûkan.

Lîsteyekê din ku em dê behs bikin, li ser malpereke înternetê hatiye belavkirin. Em dê jêre bibêjin “lîsteya bijîşko”. Di vê lîsteyê de jî 233 romanên kurdî cîh digirin. Ev lîste jî ji aliyê hejmara romanên ve ji lîsteya me kurtir e. Di lîsteyê de ji 1935an heta 2014an xêncî romanên kurmancî, yên kirmanckî (Îlhamî Sertkaya: *Kılama Şilane*, *Sasine û Gulîzare*; Hesên

² Di çapa pirtûkê de alfabe ya Celadet Alî Bedirxan bi kar neaniye. Me jî wekî orîjînalê wê cîh daye.

Dilawer Dersim: *Deyndar*; Jêhatî Zengelan: *Zifqêra Berî*; Munzur Çem: *Gula Çemê Pêre*; Deniz Gunduz: *Kalaşnîkof, Soro*) cîh digirin. Di heman demê de ev romanên ku ji soranî wergerandine kurmancî jî di lîsteyê de ne: Şerzad Hesên: *Jinek Xînanî, Xewna Pîrepîndan*; Bextiyar Elî: *Êvara Perwaneyê, Qesra Balindeyên Xemgîn*; Eta Nehaî: *Balindeyên Li Ber Bê*; Ferhat Pîrbal: *Santiago de Compestela*. Romana Sırrı Ayhan ya bi navê *Dansa Berber* (2014) jî di vê lîsteyê de ye; lê ji ber ku ji tirkî werger e, bi ya me divê di nava vê lîsteyê de cîh negire. Lîsteyê de pirtûk li gor sala çapê rêz kirine. Agahiyên wekî weşanxane, cîhê çapê û hejmarê rûpelên pirtûkan jî nehatine dayîn. Romanên ku ji çend bergan pêk tên jî wekî bi sere xwe romanên cuda ne, hatine dayîn. Di lîsteya Îbrahîm Seydo Aydoğan de jî hinek romanên pir-berg bi vî awayî cîh digirin. Em dikarin ji berhemên Mezher Bozan, *Av Zelal Bûyê* mînak bidin. Lewre ev roman ji şeş cildan pêk tê û di lîsteya Bijîşko de heta cilda V. (ya Aydoğan de heta cilda IV.) heye. Her yek wekî romanekî xwerû di lîsteyê de cîh digire. Ev berhem di lîsteya me de bi şeş cildên xwe û wekî romanekî cîh digire. Romanên ku ji çend cildan pêk tê û bi heman navî hatine çapkirin, wekî yek berhemekî me cîh daye û agahiyên hemû cildan jî nivîsiye. *Soryaz* ya Diyar Bohtî û *Hêvî Herdem Heye* (2 berg) ya Hesên Huseyîn Deniz jî du cild in û her yek bi hejmarekî cuda cîh digirin. Di lîsteya Bijîşko de agahiyek bi vî awayî heye: “Siyamend Serbilind, Ebdullah Şêxo, 2013” Lê qasî me tesbît kir, pirtûkeke bi vî navî ya Siyamend Serbilind tune. Xalekî din jî di vê lîsteyê de nivîskarekî bi navê wî Reşat e, heye. Hem di lîsteya Îbrahîm Seydo Aydoğan hem di ya Bijîşko de, hem jî di pirtûka Helîm Yûsiv de sê romanên wî dixuyên. Lê paşnavê wî di lîsteya Aydoğan de “Akaş”, di ya Bijîşko de “Akgün”, di pirtûka Helîm Yûsiv (2011: 39) de jî wekî “Akgül” hatiye nivîsîn. Lê her çiqas me xwe negîhandibe û pirtûk bi dest nexistibin jî me xwe gîhand nivîskar û ji bo agahiyên em jê sîd bigirin, di malpera wîkîpediya kurdî maddeya Rêşad Sorgul ji aliyê nivîskar ve bi me re hat parvekirin. Di vê malperê de her sê berhemên di vira de behsa wan derbas dibe, hene. Lê ji vana ev agahî hene: “*Veger* (Tîrmeh 2001 - Weşanên Rewşen li Elmanyayê)-ceribandî” û “*Evdalkovî* (Sibat 2004 - Weşanxaneyê Mezopotamyayê li Elmanyayê)-bîranîn”. Ji ber vê jî di lîsteya xwe de em cîh nadin van berhemên.

Pirtûka Bêwar Diyardîna ya *Ferhenga Bêwar* (2014) jî roman nîn e, ferheng e. Di vê lîsteyê de tenê me ev temîn nekir: Rizaliyê Reşîd, *Biharê Bihar Nedît* (Boyik, 2012: 372-376). Lê ev berhem di pirtûka Helîm Yûsiv (2011: 43) de bi vê kunyeyê cîh digire: Rizaliyê Reşîd, *Biharê Bihar Nedît*, Weşanên Han, Berlin-2008.

Lîsteyek din jî bi sernavê “Lîsteya Romanên Bi Kurdî” di malpera pirtukweje.wordpress.com hatiye parvekirin. Lê eva_lîsteyek bi rêk û pêk nîn e. Berhem di dawiyê de hatine dubarekirin. Liste bi navê nivîskaran û berhemên wan ve hatiye rêzkirin. Ku em berhemên dubare hatine nivîsîn derxin, 67 roman tê de dimînin û ew hemû jî di lîsteyên din yên me behs kirin de hene. Lîsteyek jî li ser malpera wîkîpediyayê heye. Li wir jî em 113 roman dibînin, lê ev roman jî di lîsteya Îbrahîm Seydo Aydoğan û lîsteya Bijîşko de hebûn. Cudatiya van her du lîsteyan, cîh didin romaneke bi navê *Murtule Beg* ya Eliyê Evdîrehman. Aydoğan cîh nade vê romanê lê di beşa analîzê de dibêje em nizanin gelo çap bûya yan nebûye.³ Lê van her sêyan jî tene nav dane, em îro nizanin gelo ev roman qediya yan

³ Îbrahîm Seydo Aydoğan ji bo vê agahiyê ve çavkaniyê dide: Naci Kutlay, Kovar *War*, hejmar: 8. Lê hejmarê kovarê xelet e. Lewre ev nivîs di hejmarê 5-6. de cîh digire û behsa vê romanê jî di rûpela 129an de derbas dibe.

neqediya, çap bû yan nebû. Pariltî-Galip jî diyar dikin ku agahiyên çapê bi dest nexistine. Ji ber vê em jî cîh nadin vê.

Di malpera amidakurd.netê de bi sernavê “75 sal û 197 romanên kurdî kurmancî” listeyek heye. Lê ev liste jî xwe dispêre listeya Îbrahîm Seydo Aydoğan.

Listeya dawî ku em dê li ser bisekinin, ji aliye Cemîl Oguz ve di malpera diyarname.comê de hatiye parvekirin. Oguz ji sala 2005an vir ve, di dawiya wê salê de listeyek berhemên wê salê yê bi kurdî hatine çapkirin belav dike û dinirxîne. Me jî ji van listeyan sûd girt. Me ji van listeyan xwe negîhand listeya 2012an. Xêncî vê, di listeyên di navbera 2005 û 2019an qasî ku me tespît kir, 298 romanên kurmancî yê telîf hene. Xêncî vana, çendek romanên ku cara duyem, sêyem di salên cuda de hatine çapkirin û listeyên Cemîl Oguz de cîh digirin jî, me çapên din nekirin nava vê hejmarê. Di van listeyan de hinek xeletî jî hebûn. Wekî mînak em dikarin van xala nişan bidin: Di listeya 2019an de pirtûka Resul Baltacı ya bi navê *Rodeng* ku cureya wê çîrok e, lê di kategoriya romanên de cîh dane di vê listeyê de. Dîsa romana Newaf Mîro ya bi navê *Lehengê Tazî* (W. Lîs), berê di nava Weşanên Pêriyê de bi navê *Lehengê Tazî Keleşê Reş* (2009) derçûbû. Di listeya 2018an de pirtûka *Kobanê* ya Alî Oruç bi tirkî ye û *Qurbanîyên Gunehkariyê* ya Heysem Hisên jî ji erebî hatiye wergerandin, lê herdu jî bi xeletî, wekî romanên kurmancî hatine nişandan. Di listeya 2016an de berhema Ganî Turk ya bi navê *Sermest e Dema Evînî* (W. Ava) kitêba helbestê ye, lê wekî roman hatiye kategorîzekirin. Di listeya 2010an de *Û Çiya Jî Dinalin* ya Omer Dewran (W. Lîs) û *Varjabad* ya Amed Çeko Jijan (W. Lîs) di vê listeyê de wekî roman hatine diyarkirin; lê di bergên herdu pirtûkan de jî cûreya berhemên wekî “kurteçîrok” hatine pênasandin. Di listeya 2007an de *Ez û Delal* ya Sidqî Hîrorî wekî helbest hatiye kategorîkirin, lê roman e. Di listeya 2014an de *Dansa Berber* ya Sirri Ayhan (W. Na) wergera ji tirkî ye, lê nehateye diyarkirin, wekî telîf ya bi kurmancî hatiye dayîn. *Ferhenga Bêwar* ya Bêwar Dîyadînî wekî roman di listeyê de cîh digire, lê ferheng e.

Xêncî van listeyan, çend xebatên din jî hene ku rasterast mijara wan romana kurdî ye. Lê em dê di vana de li ser romanên kurmancî bisekinin. Ji van berhemên ya yekem berhema bi navê *Kürt Romanî-Okuma Kılavuzu* (2010) (Romana Kurda-Rehberek ya Xwendinê) ya ku ji aliye Abidin Pariltî û Özlem Galip ve bi tirkî hatiye amadekirin. Di pirtûkê de ji Erebe Şemo heta Lokman Ayebe, behsa bîst romannûsên kurdî kirin û romanên wan ji aliye mijar û uslûbê ve tên nirxandin. Ev navên ku li vê derê tên nirxandin, piraniya wan di listeya me de hene. Di dawiya wê pirtûkê de jî bi sernavê “Bugüne Kadar Yayınlanmış Kürtçe Romanlar” (Romanên Kurdî Yê Heta Îro Hatine Weşandin) cîh dane listeya romanên kurdî yê bi sê zarevayan (Sorani-kurmancî-zazakî) ji 242 romanên pêk tê. Ji vana nêzikî sed heb soranî û dimilkî ne. Me cîh neda van berhemên ku em rind nizanin ka gelo soranî ne yan kurmancî ne. Di listeyê de hinek agahiyên wekî rûpel, cîhê çapê û weşanxane kêma in yan jî nehatina dayîn. Mînak, pirtûka Xurşîd Mîrzenî ya bi navê *Bircên Evînê* ku di listeyê de cîh digire; lê agahiyên weşanxane, cîh û sala çapê û hejmarê rûpelên pirtûkê tune. *Çiyayên Bi Xwînê Avdayî* (Komele, Îsveç, 1989) ya Bavê Nazê wekî romana Brîndar hatiye nişandin. Romana Eskerê Boyik ya bi navê “Xezebî” hatiye nivîsîn, di çapa me bi dest xist de *Xezeb* e.

Pirtûka Helîm Yûsiv ya bi navê *Romana Kurdî* (2011) jî berhemek din e ku ji bo bîbliyografyaya romana kurdî agahiyên fireh tê de hene. Di vê xebatê de hem li ser romannûsan û mijarên hinek romanên, hem jî nirxandina romannûsiya kurdî hatiye kirin. Romanên kurmacî û dimilkî di vê xebatê cîh digirin. Berhemên çapkirî bi serdem û erdnigariyê ve girêdayî hatine dabeşkirin. Di binê sernavê “Romanên Kurdên Sovyetan” navê 18 romanên tê dayîn. Di welatên din de, di navbera salên 1990-2000an de 59, di navbera 2000-2010an de 80, ji bo kurmacî yê behdînanî 36 û ji bo kurdên rojhilat jî romanek hatiye dayîn. Bi vî avayî navê 194 romanên kurmacî dide. Romanên ku di vê lîsteyê de cîh digirin, bi taybet yê li Avrûpa, Tirkiye û Sovyetan hatine çapkirin, kem-zêde di lîsteyên din de jî cîh digirin û me jî piraniya wan temîn kirin. Lê romanên di bin kategoriya romanên bi Bedinanî hatine nivîsîn de, me piraniya wan nekarî em temîn bikin. Pirtûka navboriya ya Omer Dewran di vê lîsteyê de jî wekî roman derbas dibe. Romana *Kılama Şilane* ya Îlhamî Sertkaya ku bi dimilkî ye jî di nava lîsteya romanên kurmacî de hatiye dayîn (Y’usiv, 2011: 42).

Sê berhemên di derheqê romana kurdî de ji aliyê Lokman Polat ve hatiye nivîsin. Lokman Polat her çiqas rasterast lîsteyek belav nekiribe jî di sê pirtûkên xwe de behsa çend romanên kurdî kiriye. Di van berhemên bi navê *Bîst Romanên Kurdî* (2004), *Pênci Romanên Kurdî* (2014) û *Çil Romanên Kurdî* (2019) de sed û deh romanên Kurdî dinirxîne. Bi vî avayî ew jî jimarekî diyar dike. Lê di vir de jî hinek berhemên ku di kategoriya çîrokan de çap bûne, wekî roman li vir cîh digirin. Mînak, *Xadim* a Selahattin Bulut, di çapê de wekî “çîroka dirêj” hatiye pênasekirin, lê li vir di kategoriya romanê de cîh dayê. Di *Bîst Romanên Kurdî* de cîh dide berhema Berjîn Hakî ya bi navê *Awaza Bilûrê*, lê berhem Tirkî werger e. Lewre di nivîsê de diyar dibe ku berhem berê bi Tirkî hatiye nivîsîn. Berhemên ku wî di van sê pirtûkan de cîh daye wan jî bi lîsteyên din re hevpar bûn. Ji ber vê em naxwazin xwe dubare bikin, em hewce nabînin navê van romanên jî bidin.

Bi Kurtasî Çend Agahiyên Îstatîstîkî Derheqê Romanên Kurmacî De

Di edebiyata kurdî de roman, cureyê nû, ciwan e. Wekî tê zanîn, di dîroka kurdan de romana yekem di sala 1935an de hatiye nivîsîn û bi îsal ve romannûsiya kurdî gihîşt heştê û pênc saliya xwe. Di nava van heştê û pênc salan de rewşa romana kurmacî çi ye? Romana kurmacî xwe gîhandiye kîjan astê, di nava edebiyata kurdî ya nûjen de cîhê roman û romannûsiya kurmacî di kîjan astê de ye, heta niha çend romanên kurmacî çap bûne? Romannûsiya kurmacî di kîjan salan de pêş ketiye, çi wext paş de çûye, herî zêde kîjan weşanxaneyê romanên kurmacî çap kirine, weşanxaneyên ku kurdî pirtûka çap dikin li kîjan bajêran in; kîjan romannûsan çiqas roman nivîsîne; di nava romannûsan de ku em li zayenda romannûsan binihêrin, em di aliyê romannûsên mêr û jin de tabloyeke çawa dibînin? Em dixwazin li ser van pirsan hinekî bisekinin û qasî ku agahiyên me bi dest xistine, van pirsan bibersivînin.

Di lîsteya me de bi giştî 533 romanên kurmacî hene. Ji vana piranî ji aliyê mêran ve hatine nivîsîn. Jinên ku bi kurmacî roman nivîsîne û hejmara romanên wan bi vî avayî ne:

Aynûr Aras, Eqîde Tok, Gulîstan Çoban, Suzan Samancı, Linda Elî, Xezal Îkeyê, Zarîfe Demîr romanek; Yıldız Çakar du roman; Gulgeş Deryaspî, Çidem Baran, Mizgîn Ronak sê roman gîhandine xwendevanên xwe. Ji nava li gor malpera www.niviskar.org di nava Kurdên Rojava (Kurdîstana Sûriyeyê) de jî Hind Ebdelo, Vejîna Kurd, Mîdya Berekat, Zozan Mihemed, Nêrgiz Ismaîl, bi romanekî cîhê xwe di dîroka romanûsiya kurmacî de digirên. 23

romanên kurmancî ji aliyê romannûsên jin ve hatine nivîsîn. Yanî di nava 533 romanên de hejmara berhemên mêran nêzîkî bîst û sê qatî berhemên jinan e. Ev jî nîşan dide ku di nava civaka kurdên kurmanc de jîn hê jî ji îmkânên romannûsiyê dûr in, dûr tîn hîştin.

Di nava romannûsên mêr de yên ku bi kurmancî dinivîsin de yên ku herî zêde roman nivîsine, bi deh romanên Medenî Ferho û Lokman Polat in. Fêrgîn Melîk Aykoç 9; Ronî War, Abdusamet Yiğit û Cihan Roj 8 heb; Mehmed Uzun, Yakup Meşe, Omer Dilsoz, Newaf Mîro, Mezher Bozan jî bi heft heban; Jan Dost, Menaf Osman, Hesênê Îbrahîm, Helîm Yûsiv, Erebe Şemo, Zeynel Abidîn (Han) 6 heb; Bavê Nazê, Arîn Zîn, Ciwanmerd Kulek, Fawaz Husên, Atilla Barîşer, Abbas Abbas, Merwan Berekat, Zeynel Abîdîn, Yaqop Tilermenî, Tehsîn Navişkî, Silêman Demir, Hesênê Metê, Kovan Sindî, Laleş Qaso, Firat Cewerî, Silêman Feqiyânî jî bi 5 heb; Şener Ozmen, Dîlawer Zeraq, Xurşîd Mîrzengî, Serkan Brûsk, Mîr Qasimlo, Kamran Simo Hedilî, Eskerê Boyik, Veysi Ulgen, jî bi 4 romanên xwe, di romannûsiya kurmancî de xwedî cîhekî ne.

Bi gelemperî ku em li van nivîskaran dinihêrin, em dibînin ku piraniya wan ji salên 1990an bî vir de kurdî dinivîsin û beşekê wan jî bi helbestê yan jî bi çîrokê dest bi nivîsê kirine û berhemên xwe yên ewil ji wan qadan de dane, paşê derbasî romanê bûne. Ev jî firsenda vê şîroveyê dide me ku roman, di edebiyata kurdî de xwedî cazîbeyekê ye û nivîskarên ku di qadên din, cureyên din xwe dikemilînin yan jî dipijin, derbasî qada romanê dibin. Xêncî vê, hinek romannûsên (wekî Jan Dost) ji rojavayê Kurdistanê hem bi Kurdî hem jî bi Erebi; ji bakûrê Kurdistanê (wekî Suzan Samancı, Zeynel Abidîn û Îlhamî Sîdar) hinek hem bi Kurdî hem jî bi Tirkî berheman dane/didin.

Li gor berhemên me xwe gîhandinê weşanxaneyên herî zêde romanên kurmancî çapkirina Lîs (61 heb), J-J (52 heb), Avesta (35 heb), Do (30 heb), Aram (22 heb) û Pêrî (19 heb) in. Xêncî vana qasî tê zanîn weşanxaneyên wekî Sîtav (18 heb), Ar (15 heb), Ava (16 heb), Peywend (13 heb), Doz (12 heb), Belkî (10 heb), Na (10 heb), Nûbihar (13 heb) roman çap kirine û weşanxaneyên wekî Apec, Dara, Name, Aryen, Tevn, Elma, Sî û hwd jî roman çap kirine. Li ser van xebatan jî em dikarin bibêjin weşanxaneyên ku herî zêde romanên kurmancî çap kirine, li bajarên Wan û Amedê ne. Li Başûr jî Duhok û Hewlêr derdikevin pêş. Dîsa em dikarin bibêjin ku îmkân bî dayîn, navenda çapemenî û weşangeriya kurdan berê xwe dide bajarên kurdan. Bi taybet jî Amed, di nava rewşa îro de ji weşanxaneyên wekî J-J, Lîs, Belkî, Dara, Name, Apec û Aramê re navendiyê dike. Sîtav jî li Wanê weşangeriya xwe didomîne. Lê navenda wan li Amedê be jî, ev weşanxane pirtûkên xwe li rojhilatê Tirkiyê, bi taybet jî li Stenbol û Enqerê çap dikin. Lewre matbaayên wan yên serbixwe tunin.

Ji aliyê salan ve ku em li hêjmara romanên binihêrin, em dê bibînin ku ji 2000an vir ve bi taybet di nava Kurdên Tirkiyê de (hem li Bakûr hem jî li metropên Tirkiyê - bi taybet Stenbol, Enqere û Îzmîrê) rewşenbîrên kurd gelek roman nivîsine. Îbrahîm Seydo Aydoğan, heta 2010an hejmara romanên kurmancî nêzîkî dusedî dide (xêncî romanên pir-cild ku em wekî pirtûkekî qebûl bikin, nêzîkî 190 roman). Lê qasî deh sal şûnda lîsteya ku me amade kiriye de hejmara romanên kurmancî bûye 533. Ango di heystê û pêncsalîya romana kurmancî de 75 sal li alîkî, ev deh salên dawî (Qesta me ji 2010an heta Çîriya paşîn ya 2020an e. Lewre romanên heta wê demê gihîştine ber destê me, me daxilî lîsteya xwe kirine.) li alîkî. Li hember vê pêşketinê jî, rewşa kurdî ya di jiyana rojane de, li gor lêkolînan roj bi roj ber bi xirabiyê ve diçe û ev jî wekî paradoksekê derdikeve pêşiya me, lê ev mijara xebatekî din e.

Encam

Ji ber ku di qada xebatên kurdolojiyê de wekî kêmasiyekê dixûya, me xebateke bibliyografîk pêk anî. Em bi vê xebatê di îddîaya ku me xebatekî bêqûsûr çêkiriye de nîn in. Lê heta ji me hat û îmkânên me têrê kirin, me bi armanca lîsteyeke baş pêk bînin, lêkolînên xwe kirin. Ji bona vê jî, heta ji me hat û me xwe gîhandê, me lîsteya xwe de pirtûkên ku çap bûne kirin, temîn kirin. Bi vî avayî agahiyên xwe me piştrast kirin, hinek agahiyên kêr, qels yan jî xelet yên di xebatên din de ku li ber çavên me ketin jî me sererast kirin. Bi vî avayî me bi giştî lîsteyeke ku ji 533 romanên Kurmancî pêk tê bi dest xist. Di vê lîsteyê de 441 romanên kurmancî ku aîdî 207 romannûsên cuda ne, me temîn kirin û niha di destê me de ne; 92 roman jî, di lîste û xebatên din de hebûn, lê bi destê me neketin.

Di qada akademiya de hê jî di destê me de ji bo dîroka romana Kurmancî berhemeke bi rêkûpêk tune, em hêvî dikin ku ev xebat ji bo xebateke bi vî avayî jî bibe alîkar.

Amadekariyên ji bo vê xebatê de me carekî din jî dît ku li Kurdistana bakûr û li metropolên Tirkîyê hebûna Kurdan û nîşaneyên Kurdî xeternak tînin. Lewre hetanî piraniya pirtûkfiroşên Bakûr jî, xêncî çend berhemên populer, berhemên Kurdî nafiroşin yan jî di vîtrînan de cîh nadin wana. Xwe gîhandina pirtûkên nû-çapkirî de jî mirov zehmetiyan dikişîne. Ev rewş ewqas xirab e ku weşanxaneyên navendên wan li bajarên wekî Wan, Amed û Batmanê ne, pirtûkên ku çap dikin, di nava van bajêran de jî temînkirina pirtûkên wan de zehmetî hene. Ev tenê pirsgerêkên van weşanxaneyan nîn e, di gelekên din de jî heman problem hene. Ji ber vê, divê weşangerên Kurd jî li xwe veşêrin û kêmasiyên xwe bi çavên profesyonelî rexne bikin û sererast bikin.

Divê sazî û tevgerên kurdewar ji bo lêkolînên kurdolojiyê girîngiyê bidin pirtûkxaneyên kurdî û berhemên derheqê Kurdan de bi rêkûpêk bi dest xînin û arşîv bikin.

Dema em li romannûsên Kurdî dinihêrin, em dibînin ku îro hê jî gelek nivîskarên ku bi Kurdî (Kurmancî) dinivîsin yan di girtîgehan de ne, yan demekî di girtîgehê de mane yan jî mişextî ne û sedem jî polîtîk in. Ji ber vê em dikarin bibêjin di romana Kurmancî de şaxeke polîtîk ya bi hêz hê jî xwedî roleke girîng e û mijar û temayên berhemên jî li gor vê polîtîzebûnê tê xemilandin. Lê bi taybet di deh salên dawî de (ji 2008an vir ve) berhemên ku giraniyê didin ser derûniya lehengan, pirsgerêkên kesayetê jî zêde dibin û lê ev jî bi rewşa polîtîk ve girêdayî ye. Xêncî vê, di van salên dawî de hêjmara romanên dîrokî, fantastîk, mîtolojîk jî zêde dibin. Ev jî xalekî ji bo analîz û şîrovên kûr mihtacê xebatên nû ye.

Me di vê xebatê de cîh da hêjmara romanên Kurmancî, lê ji bo hemû diyalektên Kurdî xebatên bi vî avayî divê bînin kirin ku dewlemendiya edebiyata Kurdî bêhtir bê dîtin.

Çavkanî

Pirtûk

- Polat, Lokman (2004). *Bîst Romanên Kurdî*. Stockholm: Helwest.
- Polat, Lokman (2019). *Çil Romanên Kurdî (Danasîn/Nirxandin/Şîrovekirin)*. Wan: Sîtav.
- Polat, Lokman (2014). *Pêncî Romanên Kurdî*. Stenbol: Ar.
- Yûsiv, Helîm (2011). *Romana Kurdî*. Amed: Ronahî.
- Pariltî, Abidin û Galip, Özlem (2010). *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*. İstanbul: Sel.
- Kutlay, Nacî (1998). “Romana Kurdî”, Stenbol: *War Kovara Lêkolîn û Lêgerînê*, H. 5-6, Havîn –Payîz 1998, , r. 125-134.
- Boyik, Eskerê (2012). *Çanda Kurdên Sovêtê*. Amed: Deng.
- Ahmedzade, Haşim (2004). *Ulus ve Roman*. (Wergêr: Azad Zana Gündoğan). İstanbul: Pêrî.
- Ahmedzade, Haşim (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. (Wergêr: Fahriye Adsay) Stenbol: Avesta.
- Ferho, Medenî (2011). *Rewşa Romana Kurdî*. İstanbul: Do.
- Xelîl, Tîmurê (1995). “Eliyê Evdilrehman”. *Antolojiya Edebiyata Kurdî Cilt 1*. (Amadekar: Mehmed Uzun). İstanbul: Tüzmamanlar. r.386.
- Ayhan, Sirri (2014). *Dansa Berber*. (Wegera ji tîrkî: Yaqop Tilermenî). İzmir: Na.

Çavkaniyên Înternetê

- Ji bo berhemên Reşad Sorgul:
https://ku.wikipedia.org/wiki/R%C3%AA%C5%9Fad_Sorgul
(Dîroka jêgirtinê: 20.02.20)
- Dîyadinî, Bêwar, *Ferhenga Bêwar*:
<https://www.pirtukakurdi.com/ferhenga-bewar-418-tr> Dîroka jêgirtinê: 29.01.20)
- Lîsteya wikipediayê ji bo romana Kurdî:
https://ku.wikipedia.org/wiki/L%C3%AEsteya_roman%C3%AA_n_kurd%C3%AE
[AE](#) (28.01.20)
- Aydogan, Îbrahîm Seydo. “75 Sal û 200 Romanên Kurdî (Kurmancî):
<http://www.kurdigeh.com/authors.aspx?an=43&aid=31> (Dîroka jêgirtinê: 20.06.17)
- Lîsteya Malpera Amîdakurd:
http://www.amidakurd.net/nuce/75_sal_û_197_romanên_kurdî_kurmancî (20.01.20)
- Nûçeya Malpera çandanaeyê ji bo romana Mehmed Dehsiwar:
Dehsiwar, Mehmed, *Çepera Giran*: <http://candname.com/romaneke-nu-ya-mehmed-dehsiwar-cepera-giran-sere-merdan-u-nemerdan/> (Dîroka Jêgirtinê: 15.02.20)
- Roj, Cîhan, *Mahrûm* : <https://www.pirtukakurdi.com/mahrum-103339-tr> (Dîroka Jêgirtinê: 01.02.20)
- Yiğit, Abdusamet, *Çîroka Keçelok 1*,

[https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9roka_ke%C3%A7elok_1_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9roka_ke%C3%A7elok_1_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Çîroka Keçelok 2* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9rok%C3%AAn_ke%C3%A7elok_2_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9rok%C3%AAn_ke%C3%A7elok_2_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Çîroka Keçelok 3* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9rok%C3%AAn_ke%C3%A7elok_3_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%87%C3%A9rok%C3%AAn_ke%C3%A7elok_3_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Destana Dewrêşê Evdê* :

https://ku.wikipedia.org/wiki/Destana_Dewr%C3%AA%C5%9F%C3%AA_Ewd%C3%AE (Dîroka jêgirtinê: 29.01.2020)

Yiğit, Abdusamet, *Destana Heme Destana Hemê Zerê* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Destana_Hem%C3%AA_Zer%C3%AA_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Destana_Hem%C3%AA_Zer%C3%AA_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 29.01.20)

Yiğit, Abdusamet: *Destana Kawayê Hesinger* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Destana_Kaway%C3%AA_Hesinger_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Destana_Kaway%C3%AA_Hesinger_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Elî Herîrî* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%8A1%C3%AE_Her%C3%AEr%C3%AE_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/%C3%8A1%C3%AE_Her%C3%AEr%C3%AE_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 29.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Feqiyê Teyran-1* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Feqiyê Teyran -2* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_2_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_2_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Feqiyê Teyran-3* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_3_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_3_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Feqiyê Teyra- 4* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_4_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_4_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka Jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Feqiyê Teyran-5* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_5_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Feqiy%C3%AA_Teyran_5_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka Jêgirtinê: 29.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Şahmaran* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/%C5%9Eahmaran_\(pirt%C3%BBk,_2011\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/%C5%9Eahmaran_(pirt%C3%BBk,_2011)) (Dîroka jêgirtinê: 28.01.20)

Yiğit, Abdusamet, *Ya Ku Li Mirov Zor Dihat ku Bijî* :

[https://ku.wikipedia.org/wiki/Ya_ku_li_mirov_zor_dihat_ku_bij%C3%AE_\(pirt%C3%BBk\)](https://ku.wikipedia.org/wiki/Ya_ku_li_mirov_zor_dihat_ku_bij%C3%AE_(pirt%C3%BBk)) (Dîroka jêgirtinê: 29.01.20)

Lîsteya romanên Kurdên Rojava:

- <https://niviskar.org/rojawa-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)
- Berekat, Mîdya, *Berxwedanistan*: <http://shermola.net/ku/berhem/pirtuken-derketi/berxwedanistan-midiya-berekat/> (Dîroka jêgirtinê: 21.01.20)
- <http://shermola.net/ku/berhem/pirtuken-derketi/efrin-name-zozan-mihemed/> (Dîroka jêgirtinê: 21.01.20)
- Yûsif, Luqman, *Hêviyên Bi Rê Da*:
<https://www.yekitiyanks.com/2018/12/luqman-yusif-romana-heviyen-bi-re-de.html> (21.01.20)
- Kurd, Vejîna, Hawarîne Efrînî: <https://www.yekitiyanks.com/2018/12/vejina-kurd-romana-hawarine-efrini.html> (Dîroka jêgirtinê: 18.11.2020)
- Rustem, Pîr, *Zarotiya neynikekê û tiştin din*:
<https://www.emrro.com/pdf/zarotiya.doc> (Dîroka jêgirtinê: 19.01.20)
- Reşîd, Tosinê. *Evîna Te Ez Parstim*: <https://rojvakurd.com/tosine-resid-evina-te-ez-parastim/> (Dîroka jêgirtinê: 06.10.19)
- Miftefî, Omîtê, *Hêvî û Tekoşîn*:
<https://zanistvan.wordpress.com/2018/07/07/hevi-u-tekosin/> (Dîroka Jêgirtinê: 15.02.20)
- Hessaf, D. Isma'îl, *Derdê Gel*:
https://doc0c94docs.googleusercontent.com/docs/securesc/ha0ro937gcuc717deffksulhg5h7mbp1/pd7en6j6eqb0h9e3jqqhpd8e52nefk3/1579442400000/09972567841075610586/*0B4fCdsgQUeAySWdIOHJoenv5Tnc?e=download (Dîroka daxistinê: 19.01.20)
- Berekat, Merwan, *Nameyên Jineke Kurd*:
<https://www.yekitiyanks.com/2019/02/efrin-destane-u-birin-roman-merwan.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)
- Birîndar, *Soro*:
http://www.arsivakurd.org/images/arsiva_kurd/pirtuk/pirtuken_kurdi/birindar/so-ro.pdf (Dîroka daxistinê: 11.12.2019)
- Birîndar, *Keça Kurd Xanê*:
<http://www.arsivakurd.org/index.php/legerin/87-pirtuk/4182-keca-kurd-xane> (Dîroka daxistinê: 11.12.2019)
- Listeya pirtûkên li Rojava hatine çapkirin: <https://niviskar.org/rojawa-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (19.01.20)
- Lîsteya romanên 67 roman bi Kurmancî:
<https://pirtukweje.wordpress.com/2017/07/01/listeya-romanen-bi-kurdi/> (Dîroka jêgirtinê: 12.01.18)
- Lîsteya berhemên Kurdî yê 2005an ya malpera diyarname.comê:
<https://diyarname.com/news.php?Idx=301> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)
- Lîsteya berhemên Kurdî yê 2006an ya malpera diyarname.comê:
<https://diyarname.com/news.php?Idx=302> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)
- Lîsteya berhemên Kurdî yê 2007an ya malpera diyarname.comê:
<https://diyarname.com/news.php?Idx=178> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2008an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=1675> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2009an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=3015> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2010an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=4197> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2011an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=5500> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2013an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=7971> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2014an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=12073> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2015an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=19083> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2016an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=25215> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2017an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=27467> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2018an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=33986> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya berhemên Kurdî yên 2019an ya malpera diyarname.comê: <https://diyarname.com/news.php?Idx=39384> (Dîroka jêgirtinê: 22.09.2020)

Lîsteya Bijîsko: http://bijisko.blogspot.com/2015/03/listeya-romanen-kurdi-1935-2014_26.html (Dîroka jêgirtinê: 12.10.19)

Berekat, Merwan, *Awirên Royê*: https://doc-04-a8-docs.googleusercontent.com/docs/securesc/ha0ro937gcuc717defkksulhg5h7mbp1/sgq7ht7tu91m4me7sv2dfplui4lnu730/1579420800000/07983084505411770094/*1b8Ywn02IZCx11u9FUW5dp0smZ76zHKtz?e=download (Dîroka jêgirtinê: 19.01.2020)

Berekat, Merwan, *Pakrewanekî Kurd*: <https://niviskar.org/rojawa-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20). Di vê malperê de jî navê romanê wekî *Romana Pakrewanekî Kurd* cîh digire: <https://www.yekitiyanks.com/2019/02/efrin-destane-u-birin-roman-merwan.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)

Berekat, Merwan, *Penage*: <https://www.yekitiyanks.com/2019/02/efrin-destane-u-birin-roman-merwan.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)

Berekat, Merwan, *Efrîn Destane û Birîn*: <https://www.yekitiyanks.com/2019/02/efrin-destane-u-birin-roman-merwan.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)

İsmail, Nêrgiz, *Çirik*: <https://niviskar.org/rojawa-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)

Mihemed, Zozan, *Efrîname*: <http://shermola.net/ku/berhem/pirtuken-derketi/efrin-name-zozan-mihemed/> (Dîroka jêgirtinê: 21.01.20). Di lîsteya vê malperê de jî ev agahî hene: <https://niviskar.org/rojawa-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)



Nerexî, Hezar, *Xeyalên koçber*: <https://niviskar.org/rojava-listeya-pirtuken-kurdi-yen-2019an-qamislo-c9ccc.html> (Dîroka jêgirtinê: 16.02.20)

BÎBLİYOGRAFYAYA ROMANÊN KURMANCÎ

Di vê lîsteyê de du beşên sereke hene. Ji vana ya yekem ji romanên ku min temîn kirine û bi dest xistine pêk tê. Ya duyem jî ji berhemên ku me bidest nexistine, lê di çavkaniyên cuda de derheqê wan de agahî bidestxine hene. Em jî lîsteya xwe li gor vana di nava du beşan de tasnîf dikin.

1. Romanên Me Temîn Kirine

1. Abbas, Abbas, *Dengbêjê Piçûk*, Weşanên Pêrî, Çilleya paşîn 2005, Stenbol, 95 r.; *Helbestvan*, Weşanên Pêrî, Îlon 2005, Stenbol, 95 r.; *Neviya Çiyayekî*, Weşanên Pêrî, Çiriya Pêşîn, 2006, Stenbol, 112 r.; *Şivanê Berxan*, Weşanên Pêrî, Çiriya pêşîn 2004, Stenbol, 111 r.; *Xewnên Şiyarî*, Weşanên Pêrî, Adar, 2004, Stenbol, 111 r.
Berhemên Edebiyata Kurdî ya nivîskî digihêjin serdema berî Îslamê (Meranî, 2012: 57). Lê ji van berheman yên ku gihîştine heta roja me ya îroyîn, yên piştî serdema Îslamê ne. Bi belavbûna bawerî û çanda Îslamê ya di nav Kurdan de, derdoreke zanyarî peyda bû û zanyar gihîştin. Paşê jî li ser vê bingehê edebiyateke Kurdî ya bajarî û nivîskî derket holê (Ergun, 2015: 45).

Di serdema destpêka Îslamê de, di dewra desthilatdariya Ebbasiyan de wek hukümetên xanedanên Faris û xanedanên Tirkan, hin hikümetên xanedanên Kurdan jî çêbûn. Ev hikümetên Kurd ên wek Şeddadî, Merwanî, Hesenweyhî, Eyyûbî û hwd û herêmên wan, bûne warê çêbûna medreseyan û derketina alimên Kurd. Dû vê serdemê re di serdema mîrekiyên Kurd de jî nimûneyên edebiyata Kurdî, xasma edebiyata Kurdî ya Kurmancî çêbûn (Adak, 2015: 53).

Di serê serdema Îslamî de pêşî bi zaravayên Kurdî yên Lorî û Goranî berhemên edebî hatine nivîsîn. Ev berhemên wek *Dubeytî* yên Baba TahirêUryan (XI.), *Deftera Dewdanî*” ya Baba Sehengê Dewdanî(sedsala XIan) û hwd. destpêka edebiyata Kurdî yên nivîskî ne (Izady, 2009: 315).Piştî van nimûneyên pêşîn ên edebiyata Kurdî, berhemên bi zaravayê Kurmancî jî destpê dikin. Ev berhemên bi Kurdiya Kurmancî bêhtir li herêmên mîrektî û hikümetên Kurd ên mîna Cizîr, Bidlîs, Hîzan, Hekkarî, Bazîd, Miks, Amediye û Meyafarqîn û hwd. derketin holê (Kurdo, 1983:39).

Di serdema klasîk de çendîn herêm û navendên giring ên peydabûn û geşedana edebiyata Kurdi ya nivîskî derdikevin pêş. Yek ji van navendan û bajarên ku bûne paytext jî Hîzan e. Di vê mijarê de heta niha lêkolîneke berfireh li ser herêma Hîzanê nehatiye kirin. Armanca vê xebata me ew e ku em paşxaneya çandî, dîrokî û edebî ya vê herêmê derxînin holê û edebiyatnasên vê herêmê yên klasîk ên Kurdînas bidine nasîn.

2. Edebiyata Kurdî di Serdema Mîrekiyan de

Piştî zeîfbûn û paşketina dewleta Ebbasiyan, hin xanedanên Kurd hikümetên serbixwe ava kirin. Wek mînak hikümetên Hesenweyhî, Merwanî, Eyyûbî û hwd. Çand û zimanê birêveberên van dewletan her çiqas Kurdî bûn, Lê zimanê fermî Erebi bû. Zimanê nivîs û resmîyete yên dewletên ku Tirkan ava kiribûn jî yên di vê serdemê de Farisî yan jî Erebi bûn. Lêbelê bi hikumraniya van xanedanên Kurd ên dema van hikümetên Kurd de, çand û nasnameya Kurdî xurt bû û pêş ket. Herwisa, bû bingeh û zemînekî geşedanê ji bo peydabûna berhemên bi zimanê Kurdî. Ev zemîne munbît jî serdema Mîrekiyên Kurd bû ku piştî van hikümetan ava bûn. Yanî meriv dikare bêje ku ger ev pêşketin û belavbûna çand û nasnameya Kurd a di serdema van hukümetan de nebûya, belkî ew şaheserên edebiyata Kurdî ya di dema Mîrekiyan de peyda nedibûn(Adak, 2013:149).

Di sedsala XIIIan de piştî êrişên Moxolan li ser cîhana Îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasiyan, dawî li dewleta Ebbasiyan hat û bi vî awayî di cîhana Îslamê de serdemeke nû destpê kir. Di vê navberê de hikumetên Kurd ên ku di nivê serdema Ebbasiyan de ava bûbûn jî temenê xwe tîjî kiribûn. Ev serdema nû ji bo Kurdan serdema Mîrektiyên e. Mîrektiyên herî giring ên Kurdan û bi taybetî yê Kurmancan piştî êrişên Moxolan hatin avakirin û heta bi nivê sedsala XIXan li ser pîyan man. Ev serdem ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî serdemeke zêrîn e. Lewra em dikarin bêjin hemû berhemên klasîk ên Kurdiya Kurmancî yê di destê me de ne, di vê serdemê de hatine dayîn. Di destpêka vê serdemê de cara pêşî li cihên wekî Hekarî, Cizîr, Amêdiye û Erdelanê û piştî wan jî li cihên wekî Bidlîsê, Bazîdê, Hîzanê, Miksê, Şêrwanê û hin cihên din mîrektiyên Kurdan ava bûn (Adak, 2015: 162).

Di sedsala 16an de dewleta Osmaniyan, bi alîkariya mîrên Kurd di şerê Çaldiranê de Sefewî tîk birin. Bi vê îtifaqa Kurd û Tirkan a piştî îtifaqa pêşîn ku Sultanê Selçûkî Alparslan di sedsala 11an de bi Kurdên Merwanî re kiribû, ji bo Kurdan serdemek nû destpê kir û mîrektiyên Kurdan desthilatdariya xwe bihêztir kirin (Özer, 2010:132). Herwiha saziyên wan ên sîyasî, dînî û perwerdehî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan perwerde bûn û di encamê de helbestên Kurdî derketin holê. Di vê serdemê de helbestvan li dora qesr û qonaxên mîran kom dibûn. Em dibînin gelek helbestvanên vê serdemê yê wekî Melayê Cizîrî(w.1640), Elî Herîrî(XVI.), Feqiyê Teyran(w.1632), Ehmedê Xanî(w.1709), Wedaî(XVIII.), Selîmiyê Hîzanî(XVIII.), Mela Xelîlê Sêrtî(w.1750), Harîsê Bidlîsî(XVIII.) û hwd. li dora mîran rabûne û bûne helbestvanên wan. Bi vî awayî sîstema patronajiyê/hîmayekariyê jî derketiye meydanê di edebiyata Kurdî de.

Ji bo geşbûna edebiyata Kurdî faktora herî giring hebûna medreseyan bû. Di her bajarekî mîrektiyeke mîrekî Kurdan de gelek medrese jî hebûn. Piraniya van medreseyan di sedsalên XV-XVIan de hatine avakirin. Ev medrese bi mîmariya xwe û bi sîstema xwe ya perwerdeyê, ne medreseyên ji rêzê bûn. Hinek ji van medreseyan wekî Medreseya Qubehanê ya mîrektiya Amêdiyeyê û Medreseya Sor a li mîrektiya Cizîra Botan, di asta medreseyên paytextên cîhana Îslamê yê wan deman bûn. Di van medreseyan de zimanê perwerdeyê zimanê Kurdî bû. Vê yekê jî rê li ber derketina helbestên Kurdî vekir. Gelek helbestvan ji van medreseyan rabûn. Piraniya helbestvanên vê serdemê di van medreseyan de xwendibûn. Wihareng çand û edebiyata Kurdî ya di serdema mîrektiyên de jî li ser bingeha van medreseyan hêşîn bû û teşe girt. Edebiyata Kurdî li medreseyên girêdayî mizgeftên li gund û bajaran derketiye holê û li dîwan û dîwanxaneyên arîstokrat û xanedanan eleqe û hîmaye dîtiye (Hasanpur, 1994:52).

3. Hîzan û Mîrektiya Hîzanê

Navend û paytexta vê herêmê bajarê Hîzanê ye. Navê Hîzanê yê pêşîn Arart e. Ev nav muhtemelen ji Ûrartûyan hatiye (Çiçek, 2008: 663). Paşê navê vî bajarî dibe Hîzan. Navê Hîzanê di çavkaniyên dîrokî de wek "Hîzan" yan jî "Seherxîzan" derbas dibe. Gelê herêmê jî bi piranî wek "Hîza" yan jî "Hîzan" bi lêv dike. Çavkaniyên dîrokî yê ku qala dîroka Hîzanê dikin pir hindik in. Çavkaniya sereke ya di vê derbarê de bêguman pirtûka dîroka Kurdan a bi navê *Şerefname* ye ku ji hêla Mîr Şerfxanê Bidlîsî(w.1603) ve hatiye nivîsîn. Li gorî vî dîrokzanî Hîzan ji navê "Seherxîzan" hatiye kurtkirin. "Seherxîzan" yanî "ew kesên ku di seher û berbangaya sibê de hişyar dibin û radibin" (Bidlîsî, 2011:161).

Îro Hîzana ku jê re "Nefsê Hîzan" yanî "Hîzan bi xwe" tê gotin û di dîrokê de wek bajarê serbajar/paytext xizmet kiriye ji mîrektiya Hîzanê re nêzî Xeydayê ye û êdî qasî gundekî ye. Li

vî bajarê kewn ê ku aniha xerabe ye sûreke dîrokî heye ku li ser qadeke mezin ava ye. Lewma ji vir re “Nava Sûrê”jî tê gotin. Hîzan ji salên 2000an ên berî Mîladê ve bûye war û wargeh ji însanan re. Lewra di van tarîxan de ketiye bin desthilatdariya Hitîtan. Li Hîzanê kelefeyên ji bermayeyên dîrokî yên ji salên 1400ê bz. ku ji Asûriyan mane, hene. Ji kelefeyên sûr, xan û hemameke li gundê bi navê Sûra Hîzanê/Nefsê Hîzan ku bi Tirkî navê Kayalar lê kirine (ev gund vê dawiyê li ser bermayeya serbajarê Hîzana kevn ava bûye) tê fêmkirin ku Hîzan navendeke Asûriyan a giring e. Hîzan piştî salên 1000î yên b. z. dikeve bin desthilatdariya Êrtartûyan û paşê jî dikeve bin hikumdariya Medan. Piştî Medan ev herêm digel derdora xwe ya fireh ket bin desthilatdariya Persan (Demir, 2008: 138). Niştecihbûna vê herêmê ya ku ji b.z. bi Hitîtan destpê dike, bi desthilatdariya Med, Pers, Roma, Bîzans berdewam dike. Di serdema Îslamê de jî bi wasiteya Xelifeyên Îslamê, Emewî, Ebbasî, Merwanî, Selçûkî, Eyyûbî û Osmanîyan kete bin desthilatdariya Ereb, Kurd û Tirkan(Çiçek, 2008: 664).

Di dawîya sedsala 10an de Hîzan, Bidlîs û der û dora wê dikeve bin desthilatdariya Merwanîyên Kurd ên musulman ku navenda wan Amîd û Meyafarqîn e (Erzak, 1990:38). Wuhareng Hîzan jî dikeve nav erdnîgariya dewleta Merwanîyan. Ji xwe avakarê vê dewletê, xanedana Baz Bîn Dostik ji Hîzanê ne(Erzak, 2016:448). Ev xanedan ji aliyê Hîzanê ve tîn û pêşiyê herêma Ercîs û der û dora wê hildidin bin hukumraniya xwe. Di sala 983an de herêma Dîyarbekirê hildide bin hukmê xwe û paşê jî Mûsulê dixin nav tixûbê dewleta xwe ya bi navê Merwanî. Di serdema Merwanîyan de gelek qebîle û şaxên eşîreta Humeydî /Xuytî yên Kurd li vê herêmê hatine bi cihkirin ji hêla Merwanîyan ve (Yinanç, 1995: 662) Piştî şerê Melazgirê Hîzan û herêma Hîzanê ji desthilatdariya Merwanîyên Kurd derdikeve û dikeve destê Selçûkiyên Tirk. Piştî demeke kin, hemû herêmên mîrekiyên Kurd digel herêma Hîzanê dikeve bin hukumraniya Dewleta Eyyûbiyên Kurd(Hîzan.meb.gov.tr.20.05.2015).

Di serê sedsala XVI. de tîkiliya Osmanîyan a bi mîrekiyên Kurd û her wiha bi mîrekiya Hîzanê re li ser naskirina hukumraniya mîrên Kurd bû û di çarçoveya îttifaqa peymanî Amasyayê ya 1514î de bû. Lê her çiqas piştî sedsal û nîvekê û du sed sal ev sîyaseta Osmanî hatibe guherîn jî, dîsa jî mîrekiyên Kurdan digel mîrekiya Hîzanê, karibûn bibine serfiraz û sekeftiyê berdewmîya hukumdarî û hukumeta xwe heta nîvê sedslala XIX(Epözdemir, 2005: 110).

Piştî sîyaseta Sultan Mehmûdê II. ya hukmê merkezi ya di nîvê sedsala 19an de, dewleta Osmanî ew îttifaqa sala 1514an a bi peymanî Amasyayê pêkhatibû bi awayeyî yekalî xerab kir. Di heman demê de bi leşkerên giran êrîş bir ser mîrekiyên Kurd û şerên dîr û dirêj di navbera Dewleta Osmanî û mîrekiyên Kurdan de qewimîn. Lewra îdareya Osmanî di vê tarîxê de li gor îcaba sîyaseta nû dixwest ku rêvebiriyên mîrekiyên Kurdan ên ku statuya hukumetan de bûn, ji holê rake. Lewma artêşa Osmanî ya giran berê xwe da mîrekiyên Kurd ên wek Baban, Soran, Behdînan, Mehmûdiyan, Bradost, Mukriyan, Erdelan, Rojkan, Hekkarî, Hîzan, Miks, Zîrkan, Palo, Êgil, Siwêdî û Çemîşkezekê(Epözdemir, 2005: 114).

Bi vê sîyaseta hukmê zatî yanî merkeziyetparêziyê ya Osmanî, ew aştî û aramî çawa li hemû herêmên mîrekiyên Kurd rabû, li Hîzanê jî ji holê rabû. Di encama êrîşên artêşa Osmanî, herêmên mîrekiyên Kurd û xasma serbajarên wan ên bi dehan medrese, xan û qesr û kaşxaneyan mamûr û bi sed hezaran nifûs ve şên û şad, talan û wêran bûn.

Hîzan di sala 1913an de marûzê îşxala Rûs dibe û di sala 1914an de Rûs ji Hîzanê vedikişin û derdikevin. Di sala 1919an de mintîqeya Hîzana nû ku jê re dibêjin Karasu, dikin navenda navçeyê, navê Hîzanê lê dikin û bi Bidlîsê ve girê didin. Hîzana dêrîn jî wek “Nefsê

Hîzan” yanî “Hîzan bi xwe” yan jî “Hîzana eslî”, hin caran jî wek “Sûra Hîzanê” tê binavkirin; aniha “mezra/gom” ye, navê wê bi Tirkî kirine “Kayalar” û mezreya gundê “Xeydayê/Gayda” ye. Di serdema komarê de di sala 1929an de Hîzanê ji navçetiye dadixin bûcaktiyê. Di sala 1936an de jî Hîzanê ji Bidlîsê vediqetînin û bi Mûşê ve girê didin. Paşê jî li gor qanûna bi hejmara 2881ê dîsa dikin navçe û bi Bidlîsê ve girê didin. Aniha qasî 180 gundên Hîzanê hene û piraniya navên wan ên eslî bi Kurdî û Ermenkî ne. Navê gundekî tenê bi Tirkî ye. Piştî avabûna komarê, navên gund û beldeyên Hîzanê yên orjînal, wek hemû navên gund û beldeyên herêmên din, vegerandine zimanê Tirkî (<http://www.Hizan.gov.tr>, 24.07.2016).

4. Rewşa Çand û Edebiyatê li Mîrekiya Hîzanê

Mîrên Hîzanê digel wê sîyaset û desthilatdariya xwe ya aştiyane, dam û dezgehên xwendinê ava kirine. Her wisa xwedîtî û hîmayekariya zanyar û edîban kirine. Vê yekê jî zemînekî munbît amade kiriye ji bo gihîştin û derketina zanyar û edîban û her wisa jî ji hatin û bi cihbûna wan a bi bal Hîzanê ve (Bidlisi, 2011:297).

Li mîrekiya Hîzanê li ser van hêmanan ekoleke çandî ya xwendin û perwerdeyê derkete holê. Wihareng Hîzan jî bû navendek ji wan navendan ku atmosfereke zanyarî û çandê nivîskî lê çêbûye û geş bûye. Wek wan mîrekiyên Kurdan ên xwedî ekol, wek Cizîr, Hekkarî, Miks, Amêdiye, Bazîd û hwd. vê ekola zanyarî û edebî ya li mîrekiya Hîzanê ji sê hêlan ve şax veda. Yek, çêbûn û belavbûna şop û toreyeke perwedeyêke dînî û derketina aliman di bin unwanên wek seyda, mela, feqî û taliban de. Van, dane dû allameyên Kurd ên di dereceya alema Îslamê û dinyayê de ku mîsyona tecdîdê pêk tînin yên wek Ebû Henîfe Dînewerî (w.896), Îbnî Teymiye (w.1328) û hwd. ku bi Bedûzzeman Seîdê Nûrsî ye Kurdî (w.1960) ve dawî lê hatiye. Ya duduyan, gerîna Hîzanê ya wek navend û herêmeke ilmê tesewwuf û irfanê. Bi qasî ku tîzanin bi Şêxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq destpê dike û bi Şex Ebdurrehmanê Taxî berde wam kiriye û belav bûye. Ya sisêyan jî, peydabûn û geşbûna edebiyateke Kurdî ya Kurmançî ya nivîskî ye li Hîzanê. Ev tradîsyon jî bi Mela Selîmê Hîzanî, Mela Xelîlû yên wek wan ên Kurdînivîs derketiye holê.

Vê ekola çandî, dînî û edebî ya li vê mîrekiyê, Hîzan gerande navendeke ilm û edebiyatê. Vê ekolê çawa ku gelek zana û edîbên ku ne ji Hîzanê bûn, kaşî Hîzanê kir; herwisa jî gelek edebiyatnas, zanyar û alimên ehlê ekola Hîzanê ji bo îrşad û dersê yan jî bi sedemne dî, sewqî dervayî herêma Hîzanê kir. Ew li hemû erdnîgariyên Kurdnişîn û alema Îslamê belav bûn. Em ê di vê çarçoveyê de li ser zanyar û edîbên serdema klasîk ên herêma Hîzanê bisekinin.

5. Rewşa Edebiyata Kurdî li Mîrekiya Hîzanê

Gava meriv li serdema klasîk û herêmên ku lê edebiyata Kurdî derketiye holê û geş bûye dinêre, hin taybetiyên wan ên hevpar derdikevin pêş. Ev taybetî, wek hebûna îstiqrareke sîyasî, çêkirin û xwedîlêderketina mîr û hikumdarên a li dezgehên xwendinê û hwd. xwe nîşan didin. Meriv van hemû bingeh û paşxaneyên dîrokî yên giring li mîrekiya Hîzanê dibîne. Li ser van binaxeyan digel zanyariyêke dînî ya xurt, edebiyateke Kurdî ya nivîskî jî şax vedaye.

Li mîrekiya Hîzanê wuhareng ekoleke çanda nivîskî û edebî çêbû. Ev edebiyatnasên herêma mîrekiya Hîzanê wek berdewamiya tradîsyoneke şair û edebiyatnasên Kurdînivîs in ku rêça Eliyê Herîrî, Melayê Cizerî û Ehmedê Xanî û hwd. dişopînin. Bi qasî ku tê xuyanê ev ananeya li Hîzanê ya di edebiyata Kurdî de ji *Yûsuf û Zuleyxaya* Selîmiyê Hîzanî destpê dike,

bi *Nehcul Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, helbestên Axaokê Bêdarî, bi dîwana Mela Abdurrehmanê Hîzanî û bi yê mayî dewam dike.

Em ê aniha li ser edebiyatnasên klasîk yê Hîzanî û yê bi Hîzanê re peywendîdar bisekinin û di derbarê wan û xebatên wan de agahî bidin. Paşê jî em ê wek nixandî û encamê, di derbarê edebiyata Kurdî ya mîrektiya Hîzanê de çend xalên giring destnîşan bikin.

6.1. Edebiyatnasên Hîzanî yê Kurdînivîs

Li herêma Hîzanê û xasma li bajarê Hîzanê yê dîrokî û paytext, gelek şair û edîb derketin. Lewra ji hêla mîr û hukumdarên vê mîrektiyê ve gelek medrese, dam û dezgehên perwerdehiyê hatibûn damezrandin. Ev binaxeya çandî û bajarî, bû jêderka edîb û zanyaran û her wisa bû kana edebiyateke nivîskî ji bo Kurdî. Em dê li edebiyatnasên Hîzanî yê sereke û berhemên wan bisekinin.

6.1.1. Selîmiyê Hîzanî

Selîmiyê Hîzanî di nîveka duyem a sedsala 18an de hatiye dinyayê. Yek ji giringtirîn edîb û helbestvanekî serdema mîrektiya Hîzanê ye. Tê gotin ku gelek behrem nivîsîne. Heta qala dîwaneke wî ya tîkûz jî tê kirin. Lê vê gavê xêncî mesnewiya wî ya giring a bi navê “Yûsuf û Zuleyxa” yê tu berhemên wî bi dest me neketine (Sağnıç, 2002: 449).

Çavkaniya sereke û herî giring a di derbarê jiyana Selîmiyê Hîzanî de berhema wî ya bi navê “Yûsuf û Zuleyxa” ye. Navê “Selîm” di mesnewiya wî de çar caran derbas dibe. Helbestvan navê xwe di beşên tewhîd, munacat û xitameyê de wek “Selîm/Selîmî” derc kiriye. Di beşa “tewhîd û tehmîd”ê de awha dinivîse:

Ya Reb bi cemala Zatê sermed

Azad bikî Selîmiyê bed

Di behsa “Ne’tê Resûlullah” de navê wî û dîroka nivîsîna “Yûsuf û Zuleyxa” yê bi “hesabê ebcedê” derbas dibe.

Lewra bi hikayetê seniye

Tarîx ji îsmê “Heq xenî ye” (Hîzanî, 2013: 42)

Navê Selîmiyê Hîzanî di nav gel de jî wek “Selîm” tê zanîn. Digel vê yekê nivîskarê dîroka edebiyata Kurdî Qanatê Kurdo jî vî edîbî re dibêje “Selîm Suleyman”. Lewra di arşîva Moskovayê de bi vî navî hatiye qeydkirin (Kurdo, 1983: 103). Anegorî vî hesabî tarîxa jî peyva “Heq xenîye” derdikeve, sala 1173yê Hicrî / 1759ê Mîladî ye. Ev tarîx dîroka nivîsîna vê berhemêye (Mizûrî, 1994: 93). Hemû lêkolînerên ku heta niha li ser mesnewiya “Yûsuf û Zuleyxa” yê xebitîne dibêjin ku ew mîrê Hîzanê ku Selîmiyê Hîzanî di mesnewiya xwe de medha wî kiriye û berhema xwe pêşkêş kiriye, navê wî nayê zanîn (Sağnıç, 2002: 203).

Ew mîrê ku Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe pêşkêş kiriye û di berhema xwe de pesnê wî daye, Mîr Suleyman e. Lewra mîrê Hîzanê yê ku serdema hikumdariya wî rastî nivîsîna mesnewiya Yûsuf û Zuleyxayê tê, Mîr Suleyman e. Em vê yekê jî agahiyên li ser kêlika Mîr Ebdî fêm dikin. Li gor nivîsa li ser kêlikê mezêlê Mîr Ebdî yê mîrê Hîzanê, ev mîr bi xwe di sala 1825ê Mîladî de wefat kiriye û kurê Mîr Suleymanê mîrê Hîzanê ye. Merzelê Mîr Ebdî li gundê Taxê ku bi medreseya xwe navdar e, li kêleka medreseya Taxê ya dîrokî ye. Li hêla rojavayê medreseyê merzelê Mîr Ebdî ku avakarê medreseyê ye û yê jin û zarên wî hene. Mîrê wê serdemê Mîr Ebdî, jinên wî Mîranete Xatûn û Pakîze Xatûn li vir hatine defînkirin. Qesra Mîr Ebdî di nav keleya Taxê de ye. Kele hema li hemberî medreseyê ye. Li ser kêlikê Mîr Ebdî

wek dîroka wefatê, Hicrî: 1241 (zayînî: 1825) dinivîse. Dîroka wefata jina wî ya Mîranete Xatûnê, Hicrî: 1237 (z: 1821) û ya Pakîze Xatûnê ku keça Mîr Esad e, Hicrî: 1256 (1840) ye. Li ser kêlikê Mîr Ebdî dinivîse ku Mîr Ebdî kurê Mîr Suleyman e (Çiçek, 2008: 665)

Mîr Ebdî yê 1825an de wefat kiriye temenekî wasatî yê şêst-heftê salî derbas kiribe, jidayîkbûna wî teqrîben tê salên 1755-1765an. Bavê Mîr Ebdî Mîr Suleyman jî muhtemelen di navbera salên 1745-1775an de mîrtiya Hîzanê kiriye. Ew dîroka ku Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe ya *Yûsuf û Zuleyxa* nivîsiye û îthaf û pêşkêşî mîrê hîzanî kiriye, 1759 e. Ev dîrok jî dikeve navbera salên hikumdariya Mîr Suleyman. Lewma bi qenaeta me ew mîrê ku Selîmiyê Hîzanî di mesnewiya xwe de qala wî dike, Mîr Suleyman e. Hewisa ew malika

Selîm dil men Sulêman im

Esîrê mîrê Xîzan im

ku wek destnîşanekê di dawîya mesnewiya *Yûsuf û Zuleyxayê* de ye, di hêlekê de wek bi gotineke girtî ya bi *hunerê tewriyeyê* ku ji du maneyên gotinê, qesta maneya dûr dike. Yanî bi maneya nêz û zahir Hz. Suleyman Pêxeberê ku bi hikumdariya xwe navdar e tîne bîra meriv û di hêla din de jî rasterast qesta mîrê Hîzanê yê bi vî navî dike. Herwisa dibe ku di çarçoveya *huner tezatê* de bi gotina “Selîm dil men Suleyman im” dewlemendiya dilê xwe, bêminnetî û îstixnaya xwe tîne ziman. Digel vê yekê, bi gotina “Esîrê mîrê Xîzan im” jî bi dîlbûn û esîrbûna xwe ya ji mîrê Hîzanê re îftixar dike. Ev malika ku wek îmzayekê li dawîya mesnewiyê, qenaeta me ya di vê hêlê de zêdetir dike.

6.1.1.1. Peywendiya Selîmiyê Hîzanî Digel Mîrê Hîzanê

Ji beşa methiyeyê ya mesnewiya *Yûsuf û Zuleyxayê* ya Selîmiyê Hîzanî tê fêmkirin ku Hîzanî şairekî serayê ye û helbestvanê qesra mîr e. Selîmiyê Hîzanî weka gelek helbestvanên Kurd ên serdema mîrektiyên berhema xwe, helbestên xwe pêşkêşî mîr û hikumdarekî Kurd kiriye. Ji teswîr û danasînên Selîmiyê Hîzanî yên derbarê wesf û taybendmendiyên Mîrê Hîzanê derdikeve holê ku mîrê Hîzanê di hêla hikumdarî, desthilatdarî û birêvebiriya hikumeta xwe de kêmtirê ji şah, padişah û melîkên Fars, Tirk û Ereben cînar, nîne. Lewma berhema xwe pêşkêşî mîrê mîrektiya herêma xwe, mîrê Hîzanê kiriye:

Ger medhê bikin ji bo Emîr e

Alem ku hemû bi wî xebîr e

Ya Rebbî bi heqqê mahê Kenan

Mehfûz bikî Emîrê Hîzan (Hîzanî, 2013: 63)

6.1.2. Mela Xelîlê Sêrtî/Gupîkî

Nîsbeta Mela Xelîlê Sêrtî her çiqas bi bal Sêrtê ve tê kirin jî ew di eslê xwe de xelkê devera Hîzanê ye (Adak, 2016: 40). Herwisa li Hîzanê hatiye dinê, qismekî giring ê jiyana xwe, tehsîl û seydatiya xwe li wir derbas kiriye. Lewma li gor krîtera nîsbeta herêmî, ew edebiyatnasekî Hîzanî ye. Mela Xelîl di sala 1750 yan jî 1751ê mîladî de hatiye dinê (Gözetin, 2015: 54). Li ser kêla mezêlê wî jî dîroka ji dayîkbûna wî wek 1750 nivîsandiye.

Ji bo Mele Xelîl gelek leqeb hatine bikaranîn. Ji ber cihê ji dayîkbûna wî leqebê wek “Hîzanî”, “Gulpîkî” û “Kulatî”, ji ber cihê lê maye û jiyaye leqebê wek “Sêrtî”, ji ber neseba wî wek “Kurdî” ji ber nîsbeta mezhebê wî wek “Şaffî” hatiye telqîbkirin. Leqebekî wî jî “Omerî” ye. Ji ber ku li gor hin rîwayetan nesla wî bi saya Siltan Şexmûsê Zûlî digihêje Hz.

Omer. Lewma jê re ev leqeb hatiye gotin. Nivîskar di hinek helbestên xwe de “*Li kâtibihi Xelîl Şewqî*” gotiye û mexlesa “Şewqî” bikaraniye (Öncü, 2013: 23).

Ji zarokên wî Mela Mistefa li Cizîra Botanê di serdema mîrektiyan de û di dema Mîr Bedîrxanê Mîrê Cizîrê de hetanî seraya wî bilind bûye. Û di medreseya wî de muderîstî kiriye û herwisa bûye Şeyxul Îslamê hikumeta mîrektiya Cizîrê. B. Seîdê Kurdî yê Nûrsî jî di berhemên xwe de beytên Mela Xelîl neqil dike û wî wek merciyeke payebilnd destnîşan dike û dibêje “Zatekî muheqqîqê pir meşhûrê ku gotinên wî huccet e li ba me.” (Nursi, 2013: 75) Mela xeynî van wêfên xwe yê ilmî, zanyar û edîbekî gelek welûd e ji hêla nivîskarî û berhemdariyê de. Gelek eserên nivîskî li dû xwe hîştine. Liser mijarên pir cihêreng nivîsiye: baweri, fiqh/huqûq, hedîs, tefsîr, usûl/metodoloji, Qiraet, Gramer, Mantiq, Edebiyat, Biyografya û hwd. Piraniya wan bi Erebî ne. Lê çend heb berhemên wî yê giring ên bi Kurdî jî hene:

6.1.2.1. Berhemên wî yê bi Kurdî ev in:

1-Diwançeya şîrên wî yê bi Kurdî ku di şeweyê qesîdeyan de ye.

2- Berhema bi *navê Rîsâle fî ilmî‘‘t-Tecwîd* a di şiklê manzûmeyê de ku li ser tecwîdê, yanî di derheq rê û rêbazên xweşxwendina Quuranê de nivîsiye.

3- *Nehcul Enam* ku di şeweyê mesnewiyê de û di derbarê eqîde û baweriyê û adabê muaşeretê de ye.

6.1.2.2. Berhemên Wî yê bi Erebî:

1. Besîretu‘‘l-qulûb fî kelâmî ‚allâmî‘‘l-guyûb
2. el-Kâfiyetu‘‘l-kubrâ fî‘‘n-nahv
3. el-Qamûsu‘‘s-sânî fî‘‘s-sarfî we n-nahwî‘‘ we‘‘l-me,‘‘ânî
4. el-Manzumetu‘‘z-zumrudîyye nazmu Telhîsi‘‘l-Miftâh
5. Rîsâle fî‘‘l-mecâz ve‘‘l-îstî,‘‘âre
6. Besîretu‘‘l-qulûb fî kelâmî ‚allâmî‘‘l-guyûb
7. Kitabun fî usulî‘‘l-hedîs
8. . Zubdetu mâ fî Fetâva‘‘l-hedîs
9. Tabaqatu‘‘r-rîcâl
10. Mînhâcu‘‘l-wusûl îlâ ilmî‘‘l-usûl
11. Rîsâle saxîre fî‘‘l-ma,‘‘fuvvât
12. Te‘‘sîsu qewâidî‘‘l-eqâid ‚âlâ mâ senehe mîn ehlî‘‘z-zâhir we‘‘l-bâtin mîne‘‘l-qevâid
13. Nehcu‘‘l-enâm fî‘‘l-eqâid
14. Muhtasaru Çerhî‘‘s-sudûr fî Çerhî‘‘l-mewtî ve ehwâlî‘‘l-qubûr

15. Mulahhasu“l-qevâti,, we“z-zevâcîr fî mâ tekellemû „ala“s-sexâîr we“lkebâîr
16. Mînhâcu“s-sunnetî“s-seniyye fî âdâbi sulûkî“s-sûfiyye
17. Nebzetu mewâhibî“l-ledunniyye fî“Ĝ-Ĝatahâti we“l wahdetî“zzâtiyye
18. Rîsâle fî menâkîbî gêx Ahmed
19. Diyâu“l- qelbî“l-arûfî fî“t-tecwîd we“r-resmî ve ferĜî“l-xurûf
20. ĝerhu manzûmetî“Ĝ-ĝâtîbî fî“t-tecwîd
21. ĝerhu Qasîdetî“l-hemziyye
22. Kîtabu ezhârî“l-xusûn mîn maqûlât-î erbâbî“l-funûn we mâ lî“ttâlîbîne fîhî qerru“l-„uyûn
23. Mahsûlu“l-mewâhibî“l-ehadiyye fî“l-hesâisî we“Ĝ-Ĝemâîlî“lAhmediyye
24. Manzûme fî mewlîdî“n-nebi
25. Rîsâle fî îlmî“l-mantik
26. Rîsâle fî“l-wad
27. el-Habiyye fî îlmî âdâbî“l-behsî we“l-munâzara (Gözeten, 2015: 21).
 - a) gelek kitêbên wî yên bi Erebi jî hene. Li ser wefata tarîxa Mela Xelîl îxtîlaf heye. Lê di piraniya çavkaniyan de tarîxa wefata wî wek sala 1843 derbas dibe. Cihê wefata wî wek Siêrt e (Şemrexî, 2012: 5).

6.1.2.3. Cihê Mela Xelîlê Gulpîkî di Edebiyata Kurdî de

Mela Xelîl, di gelek şaxên ilmê dînî de û herwisa di ilmê edebiyatê de pispor e. Di gelek waran de berhem nivîsine. Hejmara berhemên wî zêdetirê ji bîst û pêncan e. Piraniya berhemên xwe bi Erebi nivîsine. Çend berhemên xwe jî bi Kurdî telîf kirine. Yên bi Kurdî nivîsîne, berhema wî ya navdar *Nehcul Enam, Risaleya Tecwîdî* û çar qesîdeyên wî ne. Herwisa berhemên wî hin menzûm û hin jî pexşan in (Gözeten, 2015: 31).

Navê berhema wî ya bi Kudî ya navdar di çavkaniyan de wek “Nehcul Enâm fil Eqâid” derbas dibe. *Nehcul Enam* berhemeke giring a edebiyata dînî ye; ji hêla teşeyê ve mesnewî ye û ji hêla naverokê ve eqîdename ye. Mela Xelîl di van her du hêlan de jî şopînerê Ehmedê Xanî ye. Ev pirtûk ji hêla temaya edebî ve jî berhemeke dîdaktîk a exlaqî ye. Di medreseyên Kurdan de wek pirtûka dersê hatiye bikaranîn. Di asta perwerdeya seretayî û navîn de tête xwendin. Ev berhema menzûm ku ji bo perwerdeya xwendekarên medreseyan hatiye amadekirin bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin. *Nehcul Enam* tê maneya “rêya gel/xelqê.” Ev behrem li ser weznê erûzê hatiye nivîsîn. Li ser behra muteqarib a meqsûr (feûlun, feûlun, feûlun, feûl) hatiye hûnandin. Mirov dikare naveroka *Nehcul Enamê* di du beşên sereke û bîst û du binbeşan de dabeş bike. Serbeşa yekem di derheqê eqîdeyê de ye û ya duduyan di derheqê exlaqê de ye. Herwisa du sed û heftê sê beytan pêk tê (Adak, 2016: 329).

Berhemên Mela Xelîl, xasma jî yên bi Kurdî, him ji bo pratîzekirina zimanê Kurdî wek zimanekî perwerdeyê, him jî ji bo standardîzeya Kurdî, xizmetên giring pêk anîne (Aslanoğlu, 2019: 55).. Herwisa ji bo pêşketin û qalîteya edebiyata Kurdî rolên mezin bi cih anîne (Doskî, 2019: 675).

6.1.3.Axaokê Bêdarî

Helbestvanekî din ê serdema Mîrektiya Hîzanê Axaokê Bêdarî ye. Bêdar gundekî Spayirtê ye. Spayirt jî nehyayeke Hîzanê ye. Ev gund dikeve navbera Hîzan û Miksê (Adak, 2015: 163). Axaokê Bêdarî wek berhem dîwan û nesîhetnameyê hêja li dû xwe hiştiye. Lêbelê ev her du berhemên wî wînda ne û heta niha nehatine dîtin. Helbestên wî bi awayekî perekende û bi destxet li nav seyda û feqiyên medreseyan têne zanîn. Neh-deh helbestên wî gihîştine roja me ya îroyîn. Celadet Elî Bedirxan jî di derheqê Axaokê Bêdarî de agahiyên giring dide (Azizan, 1998: 813).

Ji mersiyeya wî ya ku di sala 1727an de li ser koça dawiyê ya du kurên xwe nivîsiye derdikeve holê ku du lawên wî di eynî salê de wefat kirine. Serdem û salên ku Axaokê Bêdarî tê de jiyaye, ji vê dîroka derckirî ya di risteyeke beyta mersiyeyê wî de, eşkere dibe:

“Her di weqtê ev musîbet Heq li ser min aniye

Sal hezar û sed û çil bûrîn ji Hicra ummî ye”(Adak, 2015: 164).

Bêdarî di helbestên xwe de mexlesa “elîf” û “xeyn”ê bi kar aniye. Wihareng bi vêya îşaretî bi bal navê xwe kiriye. Ev her du herf jî ji her du herfên pêşî yên navê wî pêk hatine.

6.1.3.1. Cihê Axaokê Bêdarî di Edebiyata Kurdî de

Axaokê Bêdarîhelbestên xwe bi Kurmanciyê rewan û rihet nivîsîne. Di zimanê wî de hêzdarî û herikbariyê de dereceya hunerê *sehlê mumteni* de li ber çavan dikeve. Bi qasî ku em dizanin Axaokê Bêdarî di edebiyata Kurdî de edebiyatnasê pêşîn e ku mersiye li ser ewladê xwe nivîsiye û di helbestên xwe de hicwa civakî kiriye.

Xem li ser piştta me hazir bûne barê uştir im

Min du şahî çûne vêkra mubtelayê wan kirim

Sed mixabin vê cewabê ez ji dil talan kirim

Taqet û quwwet nema min belkê ez sincan kirim(Hirîfî, 2005: 25)

6.1.4.Mela Ebdurrehmanê Gulpîkî

Mela Ebdurrehman di sala 1791êde li gundê Hîzanê yê bi navê Gulpîkê hatiye dunyayê. Li medreseyên herêma xwe yên navdar ders girtiye. Paşê buye muderrîsê /dersdarê medreseya tarîxî ya meşhûr a Melekendê ku girêdayî qezaya Kopê/Bulanîka li ser wilayeta Mûşê ye. Lewma di hinek çavkaniyan de mela wek Ebdurrehmanê Melekendî jî tê nasîn. Di sala 1872yan de li Melekendê wefat kiriye.Gelek eserên Mela hene. Lê yên gihîştine heta roja îroyîn sê heb in: Dîwaneke şîrên Kurdî, Farisî û Erebî. Şerheke li ser kitêba Mela Yûnusê Erkatîni ya bi navê *Zurûfa* bi Kurdî. Ya sisêyan jî Xutbeyên wî ne (Yüca, 2018: 243).

6.1.5.Mela Îbrahîmê Çoxreşî

Îbrahîmê Çoxreşî kurê Mela Ebdurrehmanê Gulpîkî ye. Ew jî piştî wefata bavê xwe muderrîsiya medreseya Melekendê dike. Paşê wek xelîfeyê Xewsê Hîzanê Seyyîd Sibxetullahê Arwasî û Seydayê Mela Ebdurrehmanê Taxê, ji bo îrşadê diçe gundê bi navê Çoxreşî ku li ser

qezaya Qereçobana Erzurumê ye, bi cih dibe. Dîwançeyê helbestên bi Kurdî li dû xwe hîştîye (Yüca, 2018: 246).

6.1.6. Mela Îmadeddînê Reşpojî

Mela Îmadeddînê Reşpojî di sala 1944an de li gundê Hirwisê ku di navbera Hîzan û Bidlîsê de ye, hatiye dinyayê. Li gelek medreseyan herêmê tehsîla xwe girtiye. Paşê wek mufî li gelek bajarên wezîfe kiriye. Şeş heb dîwanên wî yên helbestên Kurdî hene. Lê hê wek destxet in û nehatine çapkirin (Ertekin, 2019: 22).

6.1.7. Edebiyatnasekî bi Hîzanê re Peywendîdar: Feqiyê Teyran

Feqiyê Teyran edebiyatnasekî bi serdema mîrekiya Hîzanê re peywendîdar e ku ji derveyê Hîzanê hatiye, li Hîzanê perwerde dîtiye û li wir, gundê Şandîsê medfûn e. Belê Feqiyê Teyran edebiyatnasekî Kurdî e serdema mîrekiyan e. Ew yek ji wan hozanvanên kevntirîn e ku bi zimanê Kurdî helbest nivîsîne (Sadî, 2009: 11).

Feqî esas edebiyatnasekî ji mîrekiya Miksê ye. Li gundê Miksê yê bi navê Werezûzê hatiye dinyayê. Ji ekola serdema zêrîn a dîroka edebiyata Kurdî ye. Ehmedê Xanî jî ew digel Cizîrî û Herîrî wek pêşeng û stêkên zimanê edebiyata Kurdî zikir dike di serê mesnewiya xwe ya bi navê *Mem û Zînê* de. Feqî qismekî tehsîl û muderistîya xwe li Hîzanê li medreseyan Hîzanê derbas kiriye. Eşqa wî ya bi Sînema keça mîrê Hîzanê re û hwd. hemû têkiliya wî ya bi Hîzanê re nîşan didin. (Sadî, 2009: 13).

Xwedîderketina mîrê Hîzanê li Feqî û çêkirina gora Feqî û tayînkirina ratibê bo xizmetên di wê derbarê de, sîstema patronajê ya li mîrekiyan Kurdî û xasma ya li Hîzanê nîşan dide. Feqî di sala 1632an de li gundê Şandîsê ku girêdayî Hîzanê ye, çûye ser dilovaniya xwe. Mîrê Hîzanê Mîr Huseyîn qebreke mezbût jê re çêdike. Weqfê jî ava dike ji bo parastina vê merqedê (Adak, 2015: 235).

Li herêma Hîzanê û li der û dora wê û heta Bitlîsê, Tetwanê, Miksê, Hekkariyê, Cizîrê, Sêrtê û hwd. roja 31ê meha Adarê wek roja wefata Feqiyê Teyrantê zanîn. Di vê rojê de xelq û xasma seyda, mela û feqiyên medreseyan behsa heyata Feqî dikin, helbestên wî dixwînin û wek qesîde ji hevûdu re dibêjin. Roja 31ê Adarê telebeyên medreseyan li malan digerin û hêk top dikin. Ehlî jî ji bo pîroziya vê rojê pir hêk didin wan. Ew jî van hêkan dipijînin û li hevûdu belavdikin û dibêjin:

*Ne Adar e, Ne Nîsan e
Rojê Feqiyê Teyran e.*

Lewra 31ê Adarê li gor hesabê (teqwîma) Kurdî ne ji Adarê ye û ne jî ji Nîsanê ye (Nizamettin Yakışık, Hevdîtin: 13.06.2017)

7. Encam

Hêmanên wek îstiqrara sîyasî, bajarvanî, bazirganî, dezgehên perwerdeyê, hîmayeya desthilatdaran û hwd. di peydabûna nîrx û cewheran wek berhemên edebî û çanda nivîskî de diyarker in. Mîrekiya Hîzanê bi awayekî gelemperî karîbiye otorîteya xwe berdewam bike û îstiqrareke nîspeten dirêj a bi qasî hezar salî bidest bixe. Di bînesaziya vê rewşê de qasî avantaja erdnîgariya vê herêmê, têkilî û dîplomasiya mîr û rêvebirên mîrekiya Hîzanê jî xwedî bandor

e. Herwisa jî mîr û hikumdarên vê hikumetê bi meşandina rêya lihevkerin û camêriyê ya bi mîrekiyên cînar û dewletên hêzdar re, navdar in. Mîrê Hîzanê Mîr Dawud di sala 1514an de digel bîst û pênc mîrên mîrekiyên Kurd li Amasyayê peyman îtifaqa Kurd û Osmanî destnîşan kiriye. Bi vî hawî ew îstiqrara sîyasî di vê serdemê de jî berdewam kiriye.

Mîrekiya Hîzanê û xasma serbajarê wê Hîzan her çi qas xwedî gelek nimûneyên bajarên antîk e jî lê taybentmendiya çanda serdema navîn a Îslamî bêhtir lê hene. Ev çand jî bi gelemperî bi rêya saziyên sereke yê serdema Îslamê yê wek medrese hatiye holê û teşe girtiye û seranserê mîrekiyê belav bûye. Wihareng Hîzanê wek bajarekî serdema Îslamê malxwedîtiyabi dehan medreseyên mezin kiriye. Evdezhêhên xwendin û perwerdehiyê, bûn çavkaniya çandê nivîskî, gihîştina alim û edîbên Hîzanê yê navdar.

Rêvebirên mîrekiya Hîzanê hem dam û dezgehên perwerdeyê ava kirin û derûdoreke xwendinê saz kirin; hem jî xwedî li alim û edebiyatnasan derketin û ew teşwîq kirin. Wihareng sîstema hîmayeya mîr û hikumdarên a edîb û zanyaran a di serdema navîn de ku sedemekî giring û diyarde ye ji bo çêbûn û pêşketina zanist û edebiyatê, li bajarê Hîzanê jî pêk hat. Bi vî hawî li Hîzanê ekoleke çandê ya nivîskî çêbû û ev herêm gerî navendeke ilm û îrfanê. Her wisa jî edebiyateke bi Kurdî ya Kurmancî derkete holê. Li hêlekî alim û zanyarên wek Şêx Hesên Hîzanî, Şeyxulîslam Mewlana Ebdulxaliq, Mewlana Xizir Bîbî, Şêx Musterfayê Gulpîkî, Şêx Sibxetullah Arwasî, Şêx Ebdurrehmanê Taxî û Bedîuzzeman Seîdê Kurdî yê Nûrsî û hwd. gihîştin, li hêla din jî edebiyatnas û helbestvanên wek Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Axaokê Bêdarî, Mela Emerê Gulpîkî, Mela Abdurrehmanê Gulpîkî, Mela Îbrahîmê Çoxreşî, Mela Îmadeddînê Reşpojî û hwd. rabûn û bi berhemên xwe yê bi Kurdî Hîzan gerandin navendeke edebiyata Kurdî ya klasîk.

Mîrekiya Hîzanê gelek alim û edebiyatnas cezb kir û anîn Hîzanê. Herwisa jî gelek zanyar û helbestvanên Hîzanî ekola çandî û edebiyata Hîzanê ya Kurdî, birin û li derveyî Hîzanê jî belav kirin. Di edebiyata Kurdî ya li mîrekiya Hîzanê de nimûneyên sîstema patronajê jî derketine holê. Edebiyatnasê navdar Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe ya *Yûsuf û Zuleyxa* pêşkêşî mîrê Hîzanê kiriye. Di vê xebata me de derket holê ku Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe pêşkêşî Mîr Suleyman kiriye.

Di serê sedsala 19an de dewleta Osmanî sîyaseta xwe ya ademê merkeziyetê guherand û ew peymanî îtifaqê ya bi mîrên Kurdan re kiribû, xerab kir. Sîyaseta hukmê merkezi meşand û piştî gelek şer û qîtalên dûr û dirêj di nîveka sedsala 19an de mîrekiyên Kurd ji holê rabûn. Wihareng dawî li Mîrekiya Hîzanê jî hat. Bi dawî lê hatina mîrekiyan, ew çand û edebiyata ku li mîrekiyan geş bibû, derbeke mezin xwar û temirî. Lewra ew dezgehên xwendin û perwerdeyê û ew zanyar û helbestvan bêfînansor û bêhîmaye man. Wihareng ew asta çandî û edebî ya li Hîzanê dakete jêr.

Çavkanî:

- 1- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- 2- Adak, A. (2015). "Tarîxa Perwerdeya Bi Kurdî Di Medreseyên Kurdan De" *Kovara Deng*, h:99, Ist., r.53.
- 3- Adak, A. (2016). "Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê", *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn, r. 34.

- 4- Aslanoğlu, O. (2019). "Di Nehc'ul-Enamê de Cureyên Hevokan", *Molla Halil es-Si'irdî Hayatı Eserleri ve İlmîKişiliği*, İstanbul: Beyan Yayınları,
- 5- Azîzan, H. (1998). "Klasikên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin" *Hawar* II, Stokholm, r.813.
- 6- Bidlisî, Ş. (2011). *Şerefname Kürt Tarihi*, İstanbul: Deng Yayınları,
- 7- Çiçek, H. (2008). "Hîzan'ın Kültürel Zenginliğinin Arka Planı", *I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İst., r. 663
- 8- Demir, A. (2008). *İslam'ın Anadolu'ya Gelişi*, İstanbul: Kent Yayınları
- 9- Doskî, İ. T. (2019). "Keşkola Mela Xelîlê Sêrtî û Giringiya Wê Bo Dîroka Edebiyata Kurdî", *Molla Halil es-Si'irdî Hayatı Eserleri ve İlmîKişiliği*, İstanbul: Beyan Yayınları.
- 10- Epözdemir, Ş. (2005). *Osmanlı - Kürt İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Stenbol: Weşanên Pêrî.
- 11- Ergü Z. (2015). *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê,
- 12- Ertekin, M.Z. (2019). "Mela İmadeddînê Reşpojan: Gencîneye Ke Veşartî", Kovara Nûbihar, Hejmar: 147, r.22
- 13- Ezrak, İ. (1990). *Mervani Kürtleri Tarihi*, Wergêr: M. E. Bozarlan, İst.
- 14- Ezrak, İ. (2015). *Tarîxû Meyafarqîn*, Weşanên Nûbiharê, İst.
- 15- Gözetin, İ. (2015). *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcul Enam*, Teza Mastirê, Sosyal Bilimler Enstitüsü ya Muş Alparslan Üniversitesi.
- 16- Hassanpour, A. (1990) *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985*, Sanfrancisco.
- 17- Hîzanî, S. (2013). *Yûsuf û Zuleyxa* Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- 18- Hirîtî, M.R. (2005). "Axaukê Bêdarî", *Nûbihar*, Hejmar: 110, r. 25.
- 19- Meranî, M. R. (2011). "Bilinen En Eskî Kürt Alfabetesi", *Kürt Tarihi Dergisi*, Sayı: 5. r.57.
- 20- Izady, M. (2009). *Kürtler*, İstanbul: Doz Yayıncılık.
- 21- Mizûrî. E. (1994) "Hozanvanê Kurd Selîmê Hîzanî û Berhemê Wî Yûsûf û Zuleyxa", *Karwan*, H:93.
- 22- Nursî, B. S. (2013). *Mektubat*, Stenbol: Weşanên Zehra.
- 23- Kurdo, Q. (1983) *Tarîxa Edebyeta Kurdî-I*, Stokholm: Weşanên Roja Nû.
- 24- Özer, A. (2010). *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, İstanbul: Hemen Kitap Yayınları.
- 25- Öncü, M. (2013). *Basîretu'l-Kulûb fî Kelâmi 'Allâmi'l-Ğuyûb Adlı Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi (teza doktorayê)*, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Dicle Üniversitesi
- 26- Sadînî, M. X. (2009). *Feqiyê Teyran*, İstanbul: Nûbihar.
- 27- Sağniç, H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, İst: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê
- 28- Şemrexî, H. (2012). *Nehc-ul Enam*, Stenbol: Weşanên Nûbiharê.
- 29- Yinanç, M. (1992). Maddeya "Bitlis", *İslam Ansiklopedisi*, C. II, r. 662
- 30- Yüce, S. İ. (2018). *Mollakent: Anadolu'da Kadim Bir Kültür ve Medrese Merkezi*, Ankara: Gece Yayınları.

KURD DI ÇARÇOVEYA TEFSÎRA AYETA ŞAZDEMÎN A SUREYÊ FETHÊ

KURDS IN THE CONTEXT OF THE INTERPRETATION OF THE SIXTEENTH VERSE OF SURAH AL-FATH

Mustafa ÖNCÜ*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 22/09/2020

Accepted // Pejirandin: 13/10/2020

Published // Weşandin: 30.11.2020

Pages // Rûpel: 43-51

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Öncü, Mustafa, (2020). Kurd di Çarçoveya Tefsîra Ayeta Şazdemîn a Sureyê Fethê, *Kurdiname*, no. 3, p. 43-51

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Di derbarê Kurdan de çavkanîyên Erebi gelek girîng in. Ev çavkanî, bi xêra dîne Îslamê berfirehtir bûne. Dema ku mirov bixwaze li ser dîroka Kurdan lêkolînan bike, divê bi zimanê Erebi baş bizanibe da ku bigêhêje van çavkanîyan. Di çavkanîyên Erebi yê wek çavkanîyên dîrokê, erdnîgarîyê, tefsîrê, hedîsê, fiqhê, eqîdê, kelimê, felsefê, helbest û edebiyatê de gelek agahî li ser Kurdan hene. Çavkanîyên sereke bêguman Qur'ana Kerîm û tefsîrên wê ne. Di Qur'ana Kerîm de navên gelan pir cih nagre. Qur'an, bi piranî li ser prensîban radiweste. Hinek "mebadîê 'umûmî" ango zagonên giştî datîne. Yek caran behsa gelan jî dike. Wekî Rum, Erebi, Benî Îsrâil hwd. Nêrîna Qur'anê nêrîneke îmanî ye. Navê gelên wekî Kurd, Erebi, Tirk, Îngîlîz, Fars û hwd. di Qur'anê de cih negirtine. Lê belê piştî Hz. Pêxember (s.x.l) hinek tefsîr li ser Qur'anê hatin nivîsandin. Di van tefsîran de hîn di dema sehabî û tabînan de hatiye gotin ku filan ayet îşareta filan miletî dike. Di filan ayetê de behsa filan qewmî û miletî tê kirin. Ji wê demê û heya îro di gelek tefsîran de navê Kurdan cih girtiye. Hinek mufessîran gotine ku "di filan ayetê de qala Kurdan tê kirin.", "Filan ayet behsa Kurdan dike.", "Ev ayeta Kurdan nîşan dide." û hwd. Ev jî nîşanî me dide ku bêjeyên wek Kurd, Kurdî, Ekrad bi 1400-1500 salî berî niha jî bi heman formê dihatin zanîn. Wek mînak ayeta şazdemîn a sûreya Fethê. Di hinek tefsîran de di çarçoveya vê ayete de qala Kurdan hatiye kirin û hatiye gotin ku di vê ayetê de behsa qewmekî tê kirin û ew qewm jî Kurd in. Ev gotar li ser vê mijarê rawestîya ye.

Peyvên Sereke: Qur'ana Kerîm, Tefsîr, Kurd, Kurdî, Erebi, Çavkanîyên Erebi

Abstract

Arabic sources are important. These resources are further developed through Islam. If you need to do research about Kurds, you need to know a good Arabic for it. There are a lot of information about Kurds in Arabic sources such as history, geography, fiqh, tafsir hadith, kalam, philosophy, poetry and literature. Its main sources are the Qur'an and Qur'anic books/commentary of Qur'an. Qur'an does not include many names of nations and races. Qur'an sets general principles. Based on these principles, sometimes Arab, Greek, Christian, etc. names are included. It is possible to come across Kurdish subspecies in Qur'an and Qur'anic commentaries. This shows us that the words like Kurd, Kurdish, Akrad, were used 1400-1500 years ago. It can be inferred that

* Doç. Dr., Mamosteyê Fakulteya Zanistên îslamî Ya Zanîngeha Mersînê, mistefaoncu63@hotmail.com, Orcid: <http://orcid.org/0000-0002-2661-1147>

the Kurds were known by the Arabs at that time. In some tafsir books there is information about the Kurds. Some of the verses contain information about the Kurds in their exegesis. Here are some of these verses. For example, the sixteenth verse of Surah Fatah. In some commentaries, the Kurds are mentioned in the context of this verse and it is said that in this verse a nation is mentioned and that nation are also Kurds. This article focuses on this topic.

Keywords: Holy Qur'an, Interpretation, Kurds, Kurdish, Arabic, Arabic Sources

Destpêk

Xwedayê Teala însan afirand. Peywira însên, îbadet û exlaq e. Da ku însan ji Xweda Teala re îbadetê bike. Bi vî rengî însan digihêje bextewarîya vê dinyayê û axîretê. Ji bo vê yekê ji însanan re gelek pêxember şandine. Vehy ji wan re şand û gelek pirtûkên pîroz dane wan. Yek ji van pêxemberan û kîtaban, pêxemberê me Hz. Muhammed (s.x.l) û pirtûka me ya pîroz Qur'ana Kerîm e. Wek tê zanîn, zimanê Qur'anê Erebi ye. Piştî ku Qur'an hate berhevkirin û li ser ruyê dinyayê hate belavkirin, ji bo ku baş bê fêmkirin gelek tefsîr li ser hatin çêkirin. Van şîroveyan wateya Qur'anê vegotin. Dîsa xwestin ku mirov, mebesta Xweda Teala bi alîkarîya van ayetan fêm bikin. Ev karê giran ji dema Hz. Pêxember (s.x.l) û sahabîyan û tabînan dest pê kirîye û heta îro jî hatîye domandin. Ji bo ku wehya Xwedê Teala baş bê fêmkirin di gel van tefsîran hinek ilmên dîn jî hatin holê û ev xebat bûne çavkanî ji bo me ku em hîn baştir li Qur'anê fêm bikin.

Ji ber vê yekê derbarê Kurdan de çavkanîyên Erebi gelek girîng in. Ev çavkanî, bi xêra dîne Îslamê berfirehtir bûne. Dema ku mirov bixwaze li ser dîroka Kurdan lêkolînan bike, divê bi zimanê Erebi baş bizanibe da ku bigihêje van çavkanîyan. Di çavkanîyên Erebi yên wek çavkanîyên dîrokê, erdnîgarîyê, tefsîrê, hedîsê, fiqhê, eqîdê, kalamê, felsefê, helbest û edebiyatê de gelek agahî li ser Kurdan hene. Mirov ji van çavkanîyan li kîjanan binihêre dê mirov di nav rûpelan de bibîne ku behsa Kurdan hatîye kirin. Di vî warî de tefsîrên Qur'ana Kerîm gelek girîngin. Gelek ji wan tefsîran heya îro hatine û gihîştine destê me. Di hinek tefsîran de hatîye gotin ku filan ayet a Qur'anê behsa Kurdan dike.

Li gorî tesbîtên me, ev ayetên Qur'ana Kerîm ku hinek mufessîran gotine ku mijara wan Kurd in, çar-pênc heb in û weha ne:

- 1- Ayeta çil û çaremîn ya sûreyê Hûd (Hûd 11/44).
- 2- Ayeta bist û duyemîn ya sûreyê Kehfê (Kehf 18/22).
- 3- Ayeta şêst û heştêmîn ya sûreyê Enbîya (Enbîya 21/68).
- 4- Ayeta şazdemîn ya sûreyê Fethê (Feth 48/16).

Ji bilî van ayetana di hinek ayetên din de jî gelek mufessîran bi hinek munasebetan behsa Kurdan kirine. Beşek ji van nêrînên mufessîran li lehê Kurdan e, qismek jî li dijî Kurdan e. Emê di vê gotarêde li ser ayeta şazdemîn ya sûreyê Fethê rawestin. Ka di tefsîrên Qur'ana Kerîm de mufessîran bi çi hawayî behsa Kurdan kirine emê derxînen holê.

Di hedîsên Pêxemberê me Muhammed (s.x.l) de jî behsa Kurdan hatîye kirin. Wek mînak, di pirtûkên hedîsan de tê gotin ku Hz. Pêxember qemîs/qotikê xwe daye sehabîyekî û ji dêvla wî ve jî qotikekî “Kurdî/enbîcanî” ji wî sehabeyî girtîye. (Ahmed b. Hanbel, 1421/2001: XXXX/223.) Ji xeynî van agahîyan wekî ku tê zanîn, Caban el-Kurdî (r.x.l) û kurê wî Meymûn el-Kurdî bi nav û deng in. Lewra Caban sehabîye û Meymûn jî ji tabîinan buye. Meymûn di ilmê hedîsê de xwedî cîhekê girîng e. Mirov di van rîwayetan de rewşa Kurdan ya aborî jî dikare bibîne. Lewra, hîn wê demê -berî niha bi 1400-1500 salî- celebek pirtî bi navê “Pirtîyê Kurdan” hebûne. (Îbn Hacer, el-Esqelanî, 1379 : I/87-299-485, VI/609).

Di çavkanîyên Erebi de di pirtûkên tesewwufê de jî behsa Kurdan tê kirin. (el-Esbehanî, Ebu Nuaym, 1409: VIII/228). Tiştêkî din î balkêş jî ev e ku di hinek çavkanîyên Erebi de behsa Kurdên Îsfahanê tê kirin. (el-Esbehanî, Ebu Nuaym, 1409: VIII/228). Di hinek çavkanîyan de jî dema ku behsa elametên roja qiyametê tê kirin, di wê derê de qala Kurdan dikin. Di vê derê de hatîye ragihandin ku Hz. Muhammed (s.x.l) gotîye “heta ku hûn bi hinek qewman re şer nekin qiyamet ranabe. Ew qewm ewên ku sol û pêlavên wan ji mû ne an jî ji pirçê ne”. Hatîye ragihandin ku ew qewm Kurdin. (el-Merwezî, t.t: II/ 683).

Di pirtûkên fiqhê de jî behsa Kurdan hatîye kirin. Di behsa kirîn û frotinê de qala taylasan/şasîk/xav a Kurdî tê kirin. (es-Serahsî, 1414/1993: XIII/28). Di mijara mehr û telaqê de jî behsa Kurdan tê kirin (Îbn Teymîyye, 1978: I/556). Di behsa mehrkirina carîyeyan de, (Îbn Teymîyye, 2004: I/138), di behsa cihadê de (Îbn Teymîyye, 1422: V/301), jî herweha.

Di çavkanîyên Erebi de mirov dikare hinek mezhebên olî ku Kurdan pê întîsap kirine jî bibîne. Di hin deveran de tê gotin ku Kurd li ser mezhebê Îmamê Şafiî ne. Kalamullah mexluqe an ne? Qedîm e an ne? Di vê mijarê de jî Îbn Teymîyye (w.728/1328) gotîye ku hinek Kurd ew qas di vî warî de pêşve çûne û dibêjin ku hetta hibra di mushefê de jî qedîm e. (Îbn Teymîyye, 1995: XII/238). Lê ew vê nêrînê qebûl nake û rexne dike.

Di pirtûkên dîrokê de jî pir caran behsa Kurdan hatîye kirin. (el-Himyerî, Suleyman, 1420: II/599). Gava ku mirov li kitêbên tarîxê dinêre mirov dibîne ku di dema Moxolan de beşek ji erdê Yemenê di bin destê Kurdan de bûye (el-Maqrizî, t.t: XII/316). Dîsa di nav 130 pirtûkên dîrokê ên Erebi de nêzî hezar carî bêjeya “Ekrad” derbas dibe. Bi sed caran bêjeya “Kurdî” û “Kurd” cîh girtiye. (ed-Dînewerî, Ebu Hanîfe, 1960: 5).

Di pirtûkên edebiyata Erebi de jî behsa Kurdan hatîye kirin. Wekî nimûne el-Cahiz (w. 255/869) behsa Kurdan dike. (el-Cahiz, 1384/1964: I/510). Bedîuzzeman Hemedanî (w. 398/1008) nivîskarê ku bi *Meqamatê* xwe meşhûr e ew jî behsa Kurdan dike. (Hemedanî, Bedîuzzeman, 1923: 295). Pirtûkên ziman û ferhengên Erebi jî behsa Kurdan dikin. Îbn Sîde (w. 458/1066) dibêje ku Kurd qewmekî bi nav û deng û naskirî ne. (Îbn Sîde, 2000: VI/748). Xwedîyê *Tacu'l-erûs* ê ez- Zebîdî der heqê Kurdan de gelek melumatan dide. Paşê dibêje ku div ê mijarê de tiştê ku eşkere tê fêmkirin û rast ev e ku Kurd jî wek Farisan ji nesla Sam'in. (ez- Zebîdî, Murteda, IX/104; Çağmar, 2017:786-861). Di ilmê kalam û eqîdeyê de jî qala Kurdan tê kirin. (el-Ba'li, Muhammed, 1422: 67).

Mîna ku me got çawa ku di çavkanîyên Erebi ên kevn û klasik de behsa Kurdan hatîye kirin herweha di çavkanîyên nûjen ên Erebi de jî behsa Kurdan tê kirin. Gelek caran jî di

mijara qehremanîyê, nîjadperestiyê û bindestiyê de behsa wan hatîye kirin. (el-Cel'ud, 1407/1987: I/163; el-Husayn, Ahmed, 1420/1999: 359).

1. Ayeta Şazdemîn A Sureyê Fethê û Wateya wê

Di Qur'ana Kerîm de navê gel û miletan pir derbas nabe. Qur'an bi piranî li ser prensîban sekinîye; hinek zagonên giştî danîye. Digel vê yekê jî yek caran behsa ol û nîjadan jî dike. Wekî Rum, Cihû, Benî Îsraîl, File û Ereb. Gava ku mirov li van dinihêre, mirov dizane ku nêrîna Qur'anê nêrîneke îmanî ye; ne nêrîneke qewmî û nijadî ye. Heta di Qur'anê de -tevî ku Qur'an bi Erebî daketiye jî- peyva "Ereb" cîh negirtîye. Lê yazdeh duwazdeh caran bi telaffuza "Erebî" cîh girtiye. Ev jî nîşan dide ku Qur'an li prensîban tene dinihêre, ne li tiştêkî din. Weke ku me got vê pirtûka pîroz de behsa hinek taybetiyên qewm û gelên berê tê kirin. Bi mebesta girtina ders û ibretan. Da ku ev qewmana û buyerên ku hatîye serê wan ji mirovahiyê re bibe ders û îbret. Di Qur'ana Kerîm de navê Kurdan rast e rast derbas nabe. Lê belê di tefsîrên Qur'anê de di çend cîhan de navê Kurdan derbas dibe. Di hinek ayetên Qur'anê de mufessîr dibêjin ku ew ayetên hanê behsa Kurdan dikin. Mesnedê nêrînan van mufessîran hinek gotegot in, hinek jî şîrove ne. (Anqarawî, 5.497).

Weke ku me got navê qewm û gelên wekî Kurd, Tirk, Îngîlîz, Fars û hwd. di nav rûpelên Qur'anê bixwe de cîh negirtine. Lê belê di pirtûkên tefsîrê/şîroveyê yên ku piştî wefata Hz. Pêxember (s.x.l) bi demeke kin hatine amadekirin de, Kurd dibin mijara hin gotin û şîroveyan. Hinek mufessîran, hîn di dema sehabî û tabînan de gotine ku filan ayet filan gelî nîşan dide; di filan ayetê de behsa filan qewmî û miletî tê kirin. Ji wê serdemê heya îro di gelek tefsîran de navê Kurdan cîh girtiye. Yek ji van ayetan jî ayet a şazdemîn ya sûreyê Fethê ye.

قُلْ لِلْمُخَلَّفِينَ مِنَ الْأَعْرَابِ سُدْعُونَ إِلَى قَوْمِ آوِي بَأْسٍ شَدِيدٍ ثَقَاتُلُوهُمْ أَوْ يُسْلِمُونَ فَإِنْ تُطِيعُوا يُؤْتِكُمُ اللَّهُ أَجْرًا حَسَنًا وَإِنْ تَتَوَلَّوْا كَمَا تَوَلَّيْتُمْ مِنْ قَبْلُ يُعَذِّبْكُمْ عَذَابًا أَلِيمًا

Ji bedewiyên ku li paş mane re bibêje: Hûn ê werin gazîkirin ji bo şer û cengekê bi qewmekî re ku (ew qewm) xwediyê hêzeke dijwar e. Hûnê bi wan re şer bikin an jî ewê (bê şer) bibin misilman. Eger hûn itaat bikin, dê Xweda Teala ecreke xweş bide we. Heger çawa ku we berê (ji şer) rû bada bû vê carê jî hûn rû babidin, dê (Xweda Teala) bi ezabekî bi êş we bide cezakirin. (Sureyê Feth, 48/16).

2. Şîroveya Ayetê

Qur'ana Kerîm kelimê Xwedê Teala ye. Di Qur'ana de bi hezaran ayet hene. Ji wan ayetan yek jî ev ayeta hanê ye ku me him metna wê him jî meala wê nivîsî. Li gor mijara me tiştê ku di vê ayetêde bala mirov dikişîne qismê *Hûn ê werin* سُدْعُونَ إِلَى قَوْمِ آوِي بَأْسٍ شَدِيدٍ

gazikirin ji bo şer û cengekê bi qewmekî re ku (ew qewm) xwediyê hêzeke dijwar e. Lewra di vê ayetêde Xwedê Teala behsa qewmekî dike. Dibêjîye ku ev qewm qewmekî xwedî hêzek e dijwar e. Derbarê vê ayetê de pir şîrove hatine kirin. Hin ji mufessîran gotine ku ew qewmê ku di ayetê de, derbarê wan de wekî “qewmekî ku xwediyê hêzeke dijwar in” hatîye gotin, Kurd in. Di hin rîwayetan de tê gotin ku ew qewm Rom in. Li gorî hin rîwayetên din jî ew qewm Faris in hwd. Ji dawîya vê ayetê mirov kare fêhm bike ku vî qewmê hanê bi îxtîyar û îrada xwe bê ceng û lec dîne Îslamê qebl kirîye û ketîye nav civaka Îslamê.

Di tefsîra Îbn Ebî Hatim er-Razî (w. 327/938) de derbas dibe ku ew qewm yan Farisin yan jî Kurdin. Tiştê girîng ev e ku ji bo Kurdan te’bîra Beariz hatîye bikaranîn. Heta Îbn Ebî Hatim pêşîye gotîye Beariz paşê gotîye ku Beariz Kurdin. (er-Razî, 1419: X/3300). Eş-Şewkânî (w. 1250/1834) jî dibêje ku Îbn Ebî Hatim ji Ebû Hureyre (r.x.l) hedîsek texrîc kirîye ku Ebû Hureyre gotîye ew qewm Kurd in. (eş-Şewkanî, 1414: V/61).

Di van çavkanîyan de tiştê din î balkêş jî ev e ku Îbn Kesîr (w.774/1373) gotîye ku ewna “Barizûn” in, lê Îbn Ebî Hatim ev nav weke navê “Beariz” qeyd kirîye. Gelo têkilîya vî navî û navê “Berzan” bi hev re heye an tune ye mirov nikare sedî sed tiştê bibêje. Lê dengên van peyvyan dişibihin hev. Fonetika herdu bêjeyan nêzî hev in. Ev tişt nakeve nav hududê vê xebatê. Ev tişt mijar a xebateke serbixwe ye. (er-Razî, 1419: X/3300; Îbn Kesîr, 1420-1999: 7/314).

Weke ku niha me got rîwayet bi vî awayî ne, ango di hinek rîwayetan de hatîye gotin ku ev qewm Kurd in, di hinekên din de jî hatîye gotin ku ev qewm Tirk in an jî Faris in an Rom in an hinek eşîrên mayîn ên Erebb in. Wek Hewazîn, Seqîf, Benû Henîfe hwd. Hinek mufessîran jî gotine ku ev qewm hîn nehatîye û dê paşê bê. (Îbn Kesîr, 1420-1999: 7/314). Ev nêrîn nêrineke rasttir e. Lewra lefza قَوْم/qewm di ayetê de hêm bi hawakî umûmî hêm jî wek bêjeyeke nekra/nedîyar cîh girtîye. Ew jî nişan dide ku mirov nikare bêje ku île filan qewm e.

Rîwayeta ku dibêje ew qewm Kurd in, ji Ebû Hureyre (r.x.l) (w.58/678) hatîye ragihandin. Ji wî hatîye pirsîn bê ka ev qewm kî ne. Wî jî gotîye ku “Ew Barizûn in yanî Kurd in. (Îbn Kesîr, 1420-1999: 7/314). Ebû Hureyre (r.x.l) di vê hedîsêde dibêje ku “ew qewmekî wisa ye ku sol û pêlavên wan ji mû ne an jî ji pirçê ne”. Çawa ku tefsîra ayete de hatîye gotin dîsa ji Ebû Hureyre (r.x.l) hatîye pirsîrin ku ka gelo ev qewm kîne? Wî di şerha vê hedîsê de jî, wekî ku di şerha ayetê de gotibû, heman bersîv daye û gotîye ew qewm Kurd in. Ji tabînan, tabînê mezin û bi nav û deng Mucahîd (w.103/721) jî dîsa bi vî rengî hatîye rîwayetkirin. Tiştê ku di vê rîwayetêde bala mirov dikşîne ev e ku Kurd û Faris bi hev re hatine zikirkirin.

es-Suyûtî (w. 911/1505) di tefsîra vê ayetêde der heqê Kurdan de du rîwayetan peşkeş dike. Yek: dibêje ku Îbn Ebî Hatim ji Ebû Hureyre ragihandîye ku wî gotîye ew qewm Beariz in yanî Kurd in. Riwayetan duduyan jî ev e ku dibêje Îbn Munzur û et-Teberanî ji tabînan Mucahîd ragihandine ku wî gotîye ew qewm Kurd in. Wî evya bi tebîra “Kurdên ku Ecem in an jî Kurdên Eceman e” anîye zimên. es-Suyûtî jî vayê bi tabîra أكراد العجم Kurdên Eceman an jî Kurdên ku Ecem in bilêv dike. (es-Suyûtî, [t.y.]: VII/519; eş-Şewkanî, 1414: V/61).

Eş-Şewkânî dibêje ku Îbn Ebî Hatim texrîc kirîye û gotîye ew qewm Kurd in. Sadîq Hesên Xan (w.1307) dibêje ku ji Ebû Hureyre hatîye rîwayetkirin ku va qewma Kurd in. (eş-Şewkânî, 1414: V/61). Va rîwayetana pirê wan hinek îdia ne ku piştî Hz. Pêxember (s.x.l) hatine îdiakirin. Ji xwe Kurd bi qehremanî û dijwarîya xwe bi nav û deng in. Weke ku tê zanîn Ereba însana dîkin du beş. Gorî wan însan yan Ereba in yan jî ne Ereba in. Ereba ji mîletê ku ne Ereba in re dibêjin Ecem. Yanê ji xeynî Ereban dixwezî bila Kurd be Tirk be an jî bila Faris be ji hemîyan re dibêjin Ecem. Lê di vê noqteyê de mufessîrê meşhûr el-Alûsî (w. 1270/1854) dema ku vê ayetê tefsîr dike ew jî behsa van rîwayetan dike. Lê tiştê herî balkêş ev e ku el-Alûsî dibêje “em zanin ku Kurd mîletekî serbixweye, yanê Kurd musteqîlen mîletekî ji mîletan e. Îcaba ku bal bi Ereban an jî Eceman/Farisan bê nîspetkirin nake”. (el-Alûsî, 1415: XIII/257).

Di nav van tefsîran de tefsîra herî kevin tefsîra Îbn Ebî Hatim er-Razî ye. Wisa xuya ye ku tefsîrên piştî wî ev malumat ji Îbn Ebî Hatim girtine. Îbn Ebî Hatim dibêje ku Ebû Hureyre gotîye ku ew qewm Beariz/Bariz yanê Kurd in. Di vir de Kurd bi tena serê xwe hatine zikirkirin. Ne bi Faris ne bi Ereba ne bi Ecem ne jî bi ‘Erebtîyê. Ev jî tiştê girîng e ku bala mirov dikşîne. Lewra mumkune ku çavkanîyên piştî wî li gor şert û mercên dema xwe hinek tişt lê zêdekiribin an jî kêmkiribin.

Ev rîwayetên ku li jorê hatine behskirin, rîwayetên nêzîkî 1200-1400 sal berî niha ne. Rastbûn û nerastbûna van rîwayetan mijara xebatek din e. Lewra teshîhkirina van rîwayetan ne di nav sînorên vê xebatê de ye. Mirov dikare bi rehetî bibêje ku herî kêr 1200-1400 sal berî niha Kurd bi vî navî dihatine naskirin. Hîn ji wan deman de peyva “Kurd” û “Ekrad” dihatine bikaranîn. Ji vir tê fêmkirin ku wê demê mirovên zana û bi nav û deng bi çavekî mezin li Kurdan dinihêrin. Îro jî ji ber Selaheddînê Eyyûbî, Ereba nemaze di mijara rizgarkirina Qudsa şerîf de bi hêviyekê li Kurdan dinihêrin. Hemî Misilmanên cîhanê dixwazin û hêvîdarin ku Xwedê Teala qehremanekî wek Siltan Selaheddîn bişîne.

Di vê mijarê de tiştêkî din î balkêş heye. Ev jî nîşanî me dide ku wê demê di nav Ereban de Kurd dihatin naskirin. Lewra sehabiyekî Hz. Muhammed (s.x.l) hebûye û navê wî Caban (r.x.l) bûye. Nîsba Caban (r.x.l) “el-Kurdî” bûye. Mirov fêm dike ku wê demê haya Kurdan û Ereban ji hev hebûye. Tiştêkî din î balkêş jî ev e ku di fonetika peyva Kurd de li wê demê û heta îro tu guherîn çênebuye. Ev jî tiştêkî gelekî girîng e.

Gotina dawî li ser vê ayetê mirov dikare weha bibêje: Ayet ‘amm e yanê giştî ye ango Xwedê Teala gotîye ku “Qewmekî ku xwediyê hêzek e dijwar e”. Ev tê vê wateyê ku ji wê demê û heya roja qiyametê gelek qewmên din dikarin bikevin bin me‘na (sîvana) vê ayetê. Ji ber vê yekê mirov bi awayekî qet‘î (misoger) nikare bibêje ku ew qewmê ku Xwedê behs kiriye île (teqez) Kurd in, Tirk in, Faris in an jî qewmekî din e. Îro mirov bala xwe didê ku Xwedê Teala dîne xwe bi pir qewmên mayî parastîye û kirîye xwedî hêz. Ji xwe Xwedê Teala di Qur’ana pîroz de ev heqîqet beyan kirîye.

Encam

Dema ku mirov li çavkanîyên Erebi dinihêre, di derbarê Kurdan de gelek tiştan dibîne. Hinek ji van agahiyan erênî ne, hinek jî neyînî ne. Di gelek çavkanîyên Erebi de pêşiyê Kurd û Faris bi hev re hatine zikirkirin. Paşê li gel Kurd û Farisan navê Tirkan jî di çavkanîyên Erebi de cîh girtîye. Ango cîhê ku tê de behsa Kurdan hatîye kirin behsa Tirkan an jî Farisan hatîye kirin. Ev jî tiştêkî asayîye. Lewra dema ku Îslamîyet belav bû û derkete dervayî nivgirava Erebiştanê Erebi berî miletên din rastî Kurd û Faris û Tirkan hatin. Paşê ku ev miletê hanê misilman bûne tev bi hev re medenîyeta Îslamê ava kirin. Heta mirov kare bêje ku dema ku tê gotin çavkanîyên Erebi mebest ne tenha tiştên ku Ereban hanîne holê ye. Lewra çî tiştên ku li ser navê medenîyeta Îslamê hatîye holê digel Ereban keda Kurd, Faris û Tirkan hwd. jî ti de heye.

Ji van çavkanîyan yek jî tefsîrên Qur'ana Pîrozîn. Ji van pirtûkên tefsîran tê fêmkirin ku peyva “Kurd”, “Ekrad” û ew miletê ku bi Kurdî xeber dide 1400-1500 sal berî niha jî bi heman navê hebûne. Ev milet û zimanê wan wê demê jî di nav Ereban de dihate naskirin. Tiştêkî din ê balkêş jî ev e ku di alî fonetîkî de di vî navê de tu guhertin ne hatîye meydanê. Di çavkanîyên Erebi de Kurd carna bi serê xwe, carna jî bi Erebi û Tirk û Farisan re hatine zikirkirin. Pir caran Kurd, Tirk û Faris bi hev re hatine zikirkirin. Di vê derê de tiştêkî dinî balkêş heye ku ev jî biwêja أعراب العجم /Bedewîyên ku Ecem in an jî Bedewîyên Eceman e. Ev biwêj tebîrek e kevin e. Ku wateya wê “gundî, ehlê çolê, koçerê Eceman e”. Weke ku ji gundî û bedewî û koçerên Ereban re tê gotin أعراب /E'rab/Bedewî. Di çavkanîyên Erebi de hinek vê biwêjê ji bo Kurdan bikar tînin hinek jî ji bo Tirkan. Mesela el-Cahiz (w. 255/869) dema ku behsa Tirkan dike dibêje ku ewna xwedî ajal û konan in û أعراب العجم /Tirkên ku Ecem in an jî Tirkên Eceman e (el-Cahiz, I/510). Mesela el-Îsfehanî (w. Çaryek e pêşin a sedsal V./XI.) jî ji bo Tirkan biwêja أكراد النبط /Ereb Kurd in ku Nebatin an jî Kurd in Nebatîyan bikartîne. (el-Îsfehanî, 1420, I. 194). Ev hemî biwêjana ji encama nihêrîna Ereban e ku gelan wekî “Ecem” û “Ereb” dabeş dikin derketine holê. Tiştêkî din î balkêş jî ev e ku, ji bo Kurdan hinek navên din jî hatine bikaranîn. Weke “Beariz”. (el-Alûsî, 1415: XIII/257). Gelo tu tîkiliya vê peyvê û navê malbat/herêma “Berzanîyan” bi hev re heye an tune? Ev jî tiştêkî balkêş e û divêt xebat li ser bîna çêkirin.

Çavkanîyên Erebi di derbarê Kurdan de wekî deryayên bê binî ne. Heger li ser van çavkanîyan xebatên baş werin çêkirin dê gelek aliyên dîrok, çand, edebiyat û şaristanîya Kurdan baştir bêne fêmkirin.

Çavkanî

Ahmed b. Hanbel (1421/2001). *el-Musned*. thq. Şuayb Arnawud, Muessetu'r-rîsale.

el-Alûsî, Ebu's-Senâ Şihâbuddîn Mahmûd b. Abdullâh b. Mahmûd (1415). *Ruhu'l-meani fi tefsîri'l-Qur'ân 'i'l-azîm ve's-seb 'i'l-mesanî*. thq. Alî Abdalbârî Atîyye, Beyrut: Daru Îhyaî't-Turasî'l-Erebî.

el-Cahiz, (1384/1964). *Resaîl*. thq. Abdusselam Muhammed Harun, Mektebetu'l-xancî.

- el-Ba'li, Muhammed (1422). *el-Menhecu'l-qewîm*, thq. Muhammed K. Îmrân, Mekke: Daru alem.
- el-Cel'ud, (1407/1987). *el-Muvalat*. Daru'l-yeqîn.
- Çağmar, M. Edip (2017). *Tâcu'l-'Arûs'ta Kürtler*. e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, IX. cilt, 18. sayı, 786-801. sayfa
- Derweze, İzzet (1383). *et-Tefsîru'l-hadîs*. Daru îhyai'l-kutubî'l-Erebîye.
- ed-Dînewerî, Ebu Henîfe (1960). *el-Exbaru't-tîwâl*. Qahîre: Daru îhyai'l-kutubî'l-Erebî.
- ed-Dîyarbekrî, Huseyin *Tarîxu'l-xemîs*. Beyrut: Daru sadir.
- el-Endelusî, Ebu Hayyan (1420). *el-Bahru'l-muhît*. Beyrut: Daru'l-fikr.
- el-Hanbelî, İbn Adil (1419/1998). *el-Lubab fî 'ulûmî'l-kîtab*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-îlmiyye.
- el-Hicâzî, Muhammed (1413). *et-Tefsîru'l-wadih*. Beyrut: Darul-cîl el-cedîd.
- el-Himyerî, Suleyman (1420) *el-İktîfa*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-îlmîyye.
- el-Husayn, Ahmed (1420/1999). *Dawetu'l-îmam*. Fehrestu mektebetî'l-melîk.
- el-Îmâdî, Ebussuud Efendî. *Îrşâdu 'aqlî's-selîm*. Beyrut: Daru îhyâi't-turasî'l-Erebî.
- el-Îsfehanî, er-Rağib (1420). *Muhadaratu'l-udeba*. Şîrketu darî'l-erqâm.
- el-Maqrizî, Taqîyuddîn (1420/1999). *Îmta'u'l-esma'*. Daru'l-kutubî'l-îlmîyye.
- en-Nuweyrî, Şîhabuddîn (1423). *Nihayetu'l-ereb*. Qahîre: Daru'l-kutub we'l-wesâiqî'l-qewmîyye.
- er-Razî, Fexruddîn (1420) *Mefâtîhu'l-xayb*. Beyrut: Daru îhyâi't-turasî'l-Erebî.
- er-Razî, Ebû Muhammed Abdurrahman b. Muhammed b. İdrîs İbn Ebî Hatim (1419) *Tefsîru'l-Qur'anî'l-azîm musneden an Resulîllah s.a.v. ve's-sahabe ve't-tabiîn*. tahqîq, Esad Muhammed et- Tîb, Mekke: Mektebetu Nizar Mustafa el-Baz.
- el-Esbehanî, Ebu Nuaym (1409). *Hilyetu'l-ewliya*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-îlmîyye.
- el-Esqelanî, İbn Hacer (1379). *Fethu'l-barî*. Beyrut: Daru'l-marîfe.
- es-Serahsî, Şemsu'l-eimme (1414/1993). *el-Mebsut*. Beyrut: Daru'l-marîfe.
- es-Suyutî, *ed-Durru'l-mensûr*. Beyrût: Daru'l-fikr.
- eş-Şewkanî, Muhammed (1414). *Fethu'l-qadîr*. Dimaşq-Beyrût: Daru'l-keîmî't-tayyîb.
- et-Taberî, İbn Cerîr (1422/2001). *Camîu'l-beyan fî tewîlî'l-Qur'an*. Daru hicr.
- el-Qureşî, İbn Kesîr (1420-1999). *Tefsîru'l-Qur'anî'l-azîm*. thq, Samî b. Muhammed Selame, Daru taybe.
- el-Qurtûbî, Şemsuddîn (1384/1964). *el-Câmî' lî ahkamî'l-Qurân*. Mısır: Daru'l-kîtabî'l-Misrîyye.
- el-Xuwarizmî, Ebu Bekr (1424). *el-Emsal el-muwellede*. Ebu Zaby: el-Mecmu's-seqafi.
- el-Wahidî, Ebu'l-Hasan (1415/1994). *et-Tefsîru'l-wesît*, Beyrut: Daru'l-kutubî'l-îlmîyye.

ez-Zebîdî, Murteda *Tacu'l-'arûs*. Daru'l-hîdaye.

ez- Zuhaylî, Wehbe (1418). *et-Tefsîru'l-munîr*. Dimaşq: Daru'l-fîkr el-mausir.

Hemedanî, Bediuzzaman *Maqama*. thq, Muhamamed Muhyîddîn Abdulhamîd, el-Mektebetu'l-ezherîyye..

Îbn 'Aşûr, Muhammed (1984). *et-Tahrîr ve't-Tenwîr*. Tunus: Daru't-Tunusîyye.

Îbn Sîde, Ebu'l-Hasan (2000). *el-Muhkem ve'l-muhîtu'l-azam*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-ilmîyye.

Îbn Teymîyye, *el-Îxtîyaratu'l-fîqhîyye*, (di nav el-Fetawa el-Kubra), Beyrut: Daru'l-marîfe.

Îbn Teymîyye, *el-Mesail ve'l-ecwîbe*, el-Faruq el-hadîse.

Îbn Teymîyye, *Camîu'l-mesail*, Daru alemu'l-fewaîd.

Îbn Teymîyye, *Mecmûu'l-fetawa*, Medîne: Mecmeu el-Melik el- Fahd.

Mawerdî, Ebu Hasan. *Tefsîru'l-Mawerdî*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-ilmîyye.

Merwezî, *Kîtabu'l-fîten*.

Mucahîd, (1410/1989). *Tefsîru Mucahîd*. thq, Muhammed Abdusselam Ebu'n-nîl, Misir: Daru'l-fîkr el-Îslamî el-hadîs.

Nisaburî, Nizamuddîn (1416). *Xeraîbu'l-Qur'an*. Beyrut: Daru'l-kutubî'l-ilmîyye,.

Reşîd Riza, (1990) *Tefsîru'l-menâr*. Misir: el-Hey'etu'l-Misrîyye.

Qadî, Beydawî (1418). *Tefsîru'l-Beydâwî*. Beyrut: Daru îhyaî't-turasî'l-Erebî.

http://www.theholyQur'an.org/?x=s_main&y=s_middle&kid=14&sid=48

BIKARANÎNA ÎZAFEYÊ DI DEVOKÊN KURDÎYA KURMANCÎ DE (DEVOKÊN BAKUR, BAŞÛRÊ ROJHILAT Û BAŞÛRÊ ROJAVA)

EZAFE CONSTRUCTION IN KURMANJI KURDISH (NORTHERN, SOUTH-WESTERN AND SOUTH-EASTERN DIALECTS)

KURMANCÎ KÛRTÇESÎ AĞIZLARINDA ÎZAFENİN KULLANIMI (KUZEY, GÜNEY-BATI VE GÜNEY-DOĞU AĞIZLARI)

Mehmet YONAT*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolîni
Received // Hatîn: 23/10/2020
Accepted // Pejirandin: 17/11/2020
Published // Weşandin: 30.11.2020
Pages // Rûpel: 52-75

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).

<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Yonat, Mehmet, (2020). Bikananîna Îzafeyê di Devokên Kurdîya Kurmancî de (Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojava), *Kurdiname*, no. 3, p. 52-75

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website
//Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nixxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.

Kurte

Axiverên devokên kurdîya kurmancî wexta bi hev re diaxivin eger aşînayê devokên hevdu nebin pirî caran di hevîmîkirinê de rastî pirsîrêkan tên. Sebebê vê jî hin cudahîyên qadên leksîkî û rêzimanî yê wan devokan e. Yek qada bikaranîna cuda ya rêzimanî bikaranîna partîkela îzafeyê ye. Armanca vê xebatê nişandana bikaranînên cuda yên partîkela îzafeyê yên di sê devokên kurdîya kurmancî de ye. Bidestxistina varyasyonên dîyalektîkî yên partîkela îzafeyê wê hem bikaranînên cuda yên partîkela îzafeyê derxe meydana hem jî alîkarê hevîmîkirina axiverên devokên curbicur be.

Ev xebat li ser devokên bakur, başûrê rojhilat û başûrê rojavayê hate kirin. Ji van devokan şeş axiver hatine hilbijartin ku ev axiver li gor temen; ciwan, navsere û kal û li gor zayend; jin û mêr hatine dabeşkirin. Amûreke pîvanê ya ku ji pêncî û pênc pirsan pêkhatî ji van axiveran bi tirkî hatiye pirsîn û bersivên wan bi kurdîya kurmancî hatiye standin. Dikare bê gotin ku zayenda partîkela îzafeyê di nav axiverên nişên nû de hêdî hêdî hesasiyeta xwe winda dike û ber bi notrûnekê ve diçe. Axiverên jin jî li gor axiverên mêr di navdêrên cotzayend de rêkheftina mê jî rêkheftina nêr zêdetir bi kar tînin.

Peyvên Kildî: Kurdîya kurmancî, îzafe, devok, diyar, nediyar, nişander

* Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, E-mail: mehmetyonat49@mail.com, Orcid: <http://orcid.org/0000-0001-8576-7486>

Özet

Kurmanci Kürtçesi ağızlarının konuşucuları karşılıklı konuşuklarında birbirlerinin ağızlarına aşina değillerse anlaşmada bazı problemlerle karşılaşmaktadırlar. Bunun sebebi ağızların bazı leksikal ve gramatik farklılıklara sahip olmasıdır. İzafe partikeli gramatik farklılıkların görüldüğü yerlerden bir tanesidir. Çalışmamızın amacı Kurmanci Kürtçesinin üç ağızında izafe partikelinin farklı kullanımlarını ortaya çıkarmaktır. İzafe partikelinin dialektel varyasyonlarının ortaya çıkarılması hem farklı kullanımların keşfi sonucunu doğuracak hem de farklı ağızların birbirlerini anlamasına yardımcı olacaktır.

Çalışmamız kuzey, güney-doğu ve güney-batı ağızları üzerine yapılmıştır. Genç, ortayaş ve yaşlı olmak üzere üç yaş grubu ve erkek ve kadın iki cinsiyet grubu şeklinde bir ayrımına tabi tutulan ve toplamda her ağız bölgesinde altı kişi olacak şekilde konuşucular çalışmamız için seçilmiştir. Elli beş sorudan oluşan ölçüm aracımız seçilen konuşuculara Türkçe sorulmuş ve cevapları Kurmanci Kürtçesiyle alınmıştır. İzafe partikelinin cinsiyete karşı hasasiyetinin genç nesiller arasında oratadan kalkmaya başladığı görülmektedir. Son olarak kadın konuşucuların erkek konuşuculara oranla çift cinsiyetli isimleri dişil olarak işaretleme eğiliminde olduğunu görmekteyiz.

Anahtar Kelimeler: Kurmanci Kürtçesi, izafe, ağız, belirli, belirsiz, işaretleyici

Abstract

If the different accent speakers of Kurmanji Kurdish do not familiar with each other's accents, they generally run into difficulties to understand each other. The reason for the lack of mutual intelligibility is the lexical and grammatical variation among dialects. This article aims to show the variations of ezafe particles in three different Kurdish Kurmanji dialects. Revealing the dialectical variation of ezafe particle both demonstrates the different usage of the particle and helps the Kurdish Kurmanji accent speakers to understand each other.

This study conducted on the northern, south-eastern, and south-western dialects. From each dialect six interviewers have been selected according to their age; young, middle age and old, and their sex; male and female. A measurement tool has been developed which consists of fifty-five questions. The questions have been asked to interviewers in Turkish and the responses taken in Kurdish. It could be said that step by step nouns lose gender agreement among young generations. Last but not least, the data which is obtained from the measurement tool shows us that the female speakers prefer female agreement in the double-gender nouns more than male speakers.

Key Words: Kurdish Kurmanji, ezafe, accent, definite, indefinite, demonstratives

Destpek

Avanîya îzafeyê taybetîyek e ji taybetîyên bingehîn yên kurdîya kurmancî. Di avanîya îzafeyê de navdêra eslî yanê raveber ravekerên curbicur distîne. Bi gelenperî cureyên ravekeran li pey navdêra eslî tîn û qismeke wan jî berîya navdêra eslî tîn. Raveker bi partîkela îzafeyê ve bi navdêra eslî ve tîn girêdan. Partîkela îzafeyê li hember zayend û hejmarê hasas e. Yanê, li gor zayenda navdêrê allamorfên cuda bi kar tînin. Loma jî mijara zayend û îzafeyê bi hev re di nav tîkilîyeke zexm de ne. Loma ji bo fêmkirina mijara îzafeyê ferz e ku behsa zayendê bê kirin.

Peyva “zayend”ê (gender) ji “gennus”a (cure, beş) latînî tê. Li gor Hockett, zayenda zimanan di encama senifandina maneyî, morfolojîk an jî fonolojîk ya navdêran de dertê meydanê. Zimanek dikare xwedîyê du an jî zêdetir senifên zayendan be. Hin navdêrên di nav grubeke zayendê de cih

girtine, dibin ku ji hêla bîyolojîk ve jî xwedî heman zayendê bin. Hin caran jî zayenda bîyolojîk li ser senifandina navdêran ne bibandor e (Corbett, 1991: 1). Loma jî di hin zimanên dunyayê de senifandina navdêran wek “zayend” a wan tê terîfkirin, lê di hin zimanên xwedîzayend de ji bo vê senifandinê terma “beşên navdêran” tê bikaranîn. Hin zimanên dunyayê tenê xwedî zayenda leksîkî ne û hinên din jî hem xwedî zayenda leksîkî hem jî ya rêzimanî ne. Mesela, tirkî xwedî zayenda leksîkî ye. Lewra navdêr ji hêla rêzimanî ve tu carî nasinifin. Lê hin navdêr hene ku di tirkî de ji maneya leksîkî ya wan navdêran zayenda wan ya bîyolojîk tê fêmkirin; wek, “inek” (çêlek), mê “boğa” (conege) nêr (Aksan, 2015: 87).

Wextê wek kategorîyeke navdêrî behsa zayendê tê kirin, tiştê qestkirin ne zayenda leksîkî lê zayenda rêzimanî ye. Di zayenda rêzimanî de, zayenda navdêran ne tenê ji maneya wan navdêran lê ji forma wan ya rêzimanî jî tê fêmkirin. Mesela, di Almanî de wextê navdêrekê di nav kategorîya navdêrên nêr de be partîkela “der”, wextê di nav kategorîya navdêrên mê de be partîkela “die” û wextê di nav kategorîya navdêrên notr de be partîkela “das” digire. Dîsa, li gor Corbett û gelek nivîskarên din wek (Ortmann, 1988: 62) tiştê ku zimanên xwedî zayenda rêzimanî diyar dikin rêkkeftina (agreement) navdêran ya bi hêmanên din yê hevok an frazan re ye (Haig, 2000: 2). Yanê, rêkkeftin taybetmenîya nîşaneyê herî giring ya zayenda rêzimanî ya di zimanan de ye.

Hebûna zayendê di zimanekî de ji bo axiverên wî zimanî hêsanîyan çê dike. Mesela, zayend wê îmkane dide ziman ku navdêrên wek hev tî nivîsîn lê maneyên wan cuda ne, ji hev cuda bibin (Akin, 2005: 2). Mesela di kurmançî de peyva “mal”ê eger di maneya “cihê ku meriv lê dijî” de bê bikaranîn wek mê tê nîşankirin (mala min), lê eger di maneya “xwedîbûna tiştêkî” de bê bikaranîn wê demê jî nêr tê îşaretkirin (malê dunyayê).

Di kurdîya kurmançî de zayenda rêzimanî heye. Xebatên li ser zayenda di kurmançî de hatî kirin heta Jardîn diçe (Akin, 2005: 3). Xebateke din a bingehîn ya li ser zayenda di kurmançî de hatîye kirin xebata Bedîr Han û Lescot (2005) e. Piştî van xebatan di pirtûkên rêzimana kurmançî de tenê ji hêla rêkkeftinê ve li ser zayenda kurmançî nivîskar sekinîne. Di ferhengên kurmançî de jî gelek giringî ji bo mijara zayendê nehatîye dayîn û di gelek ferhengên kurmançî de zayenda navdêran li ber wan nehatîye nivîsîn; wek Ferhenga Îzolî (1991) û ya Torî (1999) (Akin, 2005: 3). Heta destpêka sedsala bîstan û yekî xebatên rêkûpêk, qasî em dizanin, li ser zayenda kurmançî nehatine kirin. Di destpêka sedsala bîst û yekan de Haig û Opengîn li ser vê mijarê bi awayekî zanistî kûr bûne.

Di kurdîya kurmançî de navdêr di bin du zayendan de tî senifandin; yê nêr û yê mê. Eger navdêr di rewşa tewandî yan jî rewşa bangkirinê de; yan jî di nav îzafeyê de wek yekjimar neyêne bikaranîn, di derbarê zayenda navdêrên kurdîya kurmançî de tu agahî bi dest nakeve (Haig, 2000: 4). Yanê navdêr di wan rewşan de yan nêr yekjimar yan mê yekjimar yan jî pirjimar tîne îşaretkirin. Navdêr bi serê xwe û di rewşa rasterast de tu agahî di derbarê zayenda xwe de nadin. Eger em bikaranîna paşgirên zayendê û pirjimarîyê yê kurmançî di nav tabloyekê de bidin wê wiha be (Tan, 2015; Bedîr Han û Lescot, 2004; Taş, 2013; Ekîncî, 2007; Adak, Aydın û yê din, 2016; Samûr, 2012; Komxebata Kurmançiyê, 2019);

Tablo 1: Di Kurdîya Kurmançî de Paşgirên Zayend û Hejmarê

	Rewşa Tewandî		Rewşa Bangkirinê	Avaniya Îzafeyê		Nîşander	
	Dîyar	Nedîyar		Dîyar	Nedîyar	Nêz	Dûr
Nêr	-î	-ekî	-o	-ê	-ek-î / -ek-ê ¹	vî	wî
Mê	-ê	-ekê	-ê	-a	-ek-e / -ek-a ²	vê	Wê
Pirjimar	-an	-inan / hin ...an	-ino	-ên	-in-e / in-ên ³ / hin ...ên		

Her wekî tê zanîn kurdîya kurmancî xwedî gelek devokan e û bikaranîna paşgirên zayend û hejmarê li gor devokan diguherin. Loma jî di vê xebatê de, em ê li ser paşgirên îzafeyê di devokên bakur, başûrê rojhilat û başûrê rojavayê de bisekinin.⁴ Ev devokên hatîye hilbijartin di nav xwe de jî xwedîyê bikaranîneke homojen nînin. Eger her devok bi hemû varyasyonên xwe ve di nav vê xebatê de cih bigirtina wê xebat gelek berfireh bûya. Loma jî hem hemû devok nehatine hilbijartin hem jî ji devokên hilbijartî tenê cihek û hin kes ji wê mintiqê hatine neqandin. Divê di serî de behsa girseya axiverên ji bo vê analîzê hatîye hilbijartinin bê kirin. Paşê jî divê di derbarê amûra pîvana îzafeyê de agahî bê dayîn ku ev amûr ji hêla nivîskarê ve gotarê ve hatîye pêşxistin.

Ev xebat wextê tetbîqî qadê bû, hin pirsgerêk hatin meydanê. Lewra kurmancî di nav gurehîneke gelek lez de (asîmîlasyon) ye û hemû nîfşên axiverên vî zimanî wek hev naaxivin. Di vê guherînê de duzimanîtî jî xwedî bandoreke gelek mezin e. Her wekî Öpengin dibêje “mirov dikare dîyar bike ku cimaeta zimanî ya kurdîyê xwedanê qerekerê duzimanîya civakî ye, bi kurdî û bi tirkî” (Öpengin, 2011: 37). Bi taybetî wextê mijar mijareke hesas wek rêkkestina zayendî û hejmarî be, wê demê gelek bikaranînen cuda di navbera nîfşan de derdikevin holê. Loma jî, wextê ev pirsên amûra pîvanê ji axiveran hate pirsîn ji sê jenerasyonan pirs hatin kirin; yên ciwan, yên navsere û yên kal. Dîsa mijara zayendê li hember zayenda bîyolojîk ya axiveran hesas e û di kurmancî de jî kesê ku refere lê tê kirin ji bo mijara zayendê giring e, axiver ne tenê ji hêla emr ve lê ji hêla zayenda bîyolojîk ve jî wek jin û mêr hatin senifandin. Di encamê de li her heremê ji şeş kesan ev pirs hatin kirin; ciwan-mêr, ciwan-jin, navsere-mêr, navsere-jin, kal-mêr û kal-jin.

Di bikaranîna paşgira îzafeyê de navdêr pêşîyê ji hêla fonksîyonên xwe yên rêzimanî ve hatine dabeşkirin. Ev kişandin di bin sê beşan de ne; dîyar, nedîyar û nîşander. Paşê navdêr li gor

¹ Herçî her du awayên (ek-ê, ek-î) Komxebata Kurmancîyê ji bo nivîsînê rast bibîne jî, lê ji ber sedema têrbelavbûna awayê duyem (-ek-î) Komxebat bi piranî vî awayî tercîh dike (Komxebata Kurmancîyê, 2019: 134).

² Komxebata Kurmancîyê her du awayan jî ji bo nivîsînê rast dibîne. Lê Komxebata Kurmancîyê ji ber sedema li jorê dîyarkirî, bi piranî awayê yekem (-ek-a) tercîh dike (Komxebata Kurmancîyê, 2019: 135)

³ Lê herçî tercîha vê Rêberê (Rêvera Rastnivîsînê) ye, awayê pêşîn e, ango awayê ku di nivîsîna kurmancîyê da, “n”ya nişana pirhejmarîyê li derveyî nahêle û îzafeya navdêrên her du zayendan yên pirhejmar ê nenasyar bi awayê “-(y)ên”ê dinivîse (Komxebata Kurmancîyê, 2019: 137)

⁴ Ev senifandin li gor senifandina devokên kurdîya kurmancî ya Haig û Öpengin (2014) hatîye kirin ku ev xebat bi nave “Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects” (Di kurmancî de Varyasyona Heremî: Senifandineke Destpêkî ya Devokan) hatîye çapkirin.

zayend û hejmara xwe di bin sê beşan de hatine dabeşkirin; nêr, mê û pirjimar. Li pey vê dabeşkirinê navdêrên nêr û mê ji hêla maneya xwe ve jî hatine dabeşkirin; yên însan, yên neînsan, yên mervantîyê, yên necandar, yên qerzkirî (ev du beş in; yên ku peyveke kurmancî ji bo wê heye (wek “yağ”a (rûn) tirkî) û yên ku peyveke kurmancî ji bo wê tune ye (wek, “hemşire”ya Farisî). Li pey vê, navdêrên pirjimar wek yên tên hejmartin û yên nayên hejmartin hatine dabeşkirin. Di dawîyê de navdêrên cot-zayend li lîsteyê hatine zêdekirin. Di encama vê senifandinê de amûreke pîvanê ya ji pêncî û pênc pirsan pêkhatî derket meydanê.⁵ Ev pirs bi tirkî ji axiveran hatîye pirsîn û bi kurdî cewabên wan hatine hildan.

Di vê xebatê de, em di serî de li ser paşgirên zayend û hejmarê yên îzafeyê û fonksiyonên van paşgiran sekinîn. Paşê em li ser bikaranîna îzafeyê di devokên hîlbijartî de sekinîn. Di encamê de jî bi gelenperî behsa destketîyan hatîye kirin.

1. Îzafe Di Kurdîya Kurmancî de

Îzafe termek e ku di zimannasîya Îranî de ji bo avaniya ravekê tê bikaranîn. Partîkela îzafeyê ku ji bo girêdana hêmanên raveker ji bo navdêra eslî ya avaniya îzafeyê tê bikaranîn. Ev partîkel di Kurdîya Kurmancî de li hember zayend û hejmarê hesas e. Ji bilî fonksiyona girêdanê ev partîkel di fonksiyona anaforîk de jî tê bikaranîn. Ev her du fonksiyon ew fonksiyon in ku heta niha tên zanîn. Haig (2007; 2008; 2011) behsa fonksiyoneke din ya partîkela îzafeyê dike. Ev fonksiyona nû ya partîkela îzafeyê, bikaranîna îzafeyê ji çarçova morfolojîk ber bi çarçoveyeke sentaktîk berfireh dike. Di vê fonksiyonê de partîkela îzafeyê di hevokên navdêrî û yên lêkerî de îşaretî bikerê (hin caran bireserê) dike. Di hevokên lêkerî de bi piranî maneya berdewamiyê û maneya perfektîyê dide. Ev fonksiyon di lîteratûrê de wek îzafeya berfirehbûyî (extended ezafe) hatîye îfadekirin. Em ê di vê xebatê de li ser îzafeya berfirehbûyî nekinin. Tiştê ku di vê xebatê de em ê li ser bisekinin fonksiyonên partîkela îzafeyê yên girêdanê û anaforîk in.

1.1. Di Kurdîya Kurmancî de Avaniya Îzafeyê

Partîkela Îzafeyê ji bo têkilîya di navbera navdêreke dîyar an jî yeke nedîyar û hemû raveker û her cure pêbestên wê navdêrê teqîrî tê bikaranîn. Ev partîkel tê dawîya navdêra dîyar an jî ya nedîyar û bi wê re yekûnekê çê dike. Li gor zayend û hejmara navdêrê ev partîkel diguhere (Bedîrhan û Lescot, 2005: 73; Tan: 2015: 56; Taş, 2013: 34; Samûr, 2012: 30). Yanê partîkela îzafeyê ji bo çêkirina ravekan tê bikaranîn. Di ravekan de navdêra eslî raveber e û partîkelên îzafeyê distîne. Wek,⁶

Mal-a	Sînem-ê
Raveber (N.E.) – partîkela Îzafeyê	Raveker (Navdêr)-tew.m.

⁵ Ev tablo wek pêvek di dawîya gotarê de hatîye dayîn.

⁶ Kurtenîşanên di vê gotarê de hatî bikaranîn wek pêvek di dawîya gotarê de hatîye dayîn.

Bi navdêra eslî qest ew bêje ye ku wexta ravek tê çêkirin, ji wê gruba bêjeyan bêjeya ku tê qestkirin e. Di mînaka me de wexta “mala Sînemê” tê gotin, tiştê tê qest kirin “Sînem” nîne lê “mal” e.

Her wekî li jor jî hate behskirin partîkela îzafeyê li gor zayend û hejmara navdêra eslî dibe ku di hin formên cuda de derkeve pêşberî me. Dîsa çawa navdêra eslî rewşa dîyar de dikare bê bikaranîn herwekî wê dikare di rewşa nedîyar de jî bê bikaranîn. Eger em partîkela îzafeyê li gor zayend, hejmar, dîyarî û nedîyarîyê di nav tabloyekê de bidin wê wiha be (Tan, 2015; Bedîr Han û Lescot, 2004; Taş, 2013; Ekîncî, 2007; Adak, Aydın û yên din, 2016; Samûr, 2012; Komxebata Kurmancîyê, 2019):

Tablo 2: Partîkelên Îzafeyê di Kurdiya Kurmancî de

Zayend û Hejmar	Dîyar	Nedîyar
Nêr	{-ê}	{-ek-î / -ek-ê}
Mê	{-a}	{-ek-e/ek-a}
Pirjimar	{-ên}	{-in-e / -in-ên}

Eger em ji bo her partîkelê mînakekê bidin wê mînakên me wiha bin;

(1)

keç- a	min
NE-îz.m.yekhejm..	1y.tew.

(2)

derî- yê	mal-ê
NE-îz.n.yekhejm.	Nvd.-tew.m.

(3)

keç- ên	min
NE-îz.pirhejm..	1y.tew.

(4)

keç-ek- e/a	min
NE-nedîy.yekhejm.-îz.m.	1y.tew.

(5)

deri-(y)ek- î/ê	mal-ê
NE-Nedîy.yekhejm.-îz.n.	navd.-tew.m.

(6)

keç-in-e/ên	Min
NE-Nedîy.pirhejm-îz.pirhejm.	ly.tew.

Di mînaka (1)î de paşgira dîyar ya mêt{-a}; di (2)yan de paşgira dîyar ya nêr {-ê}; di (3)yan de paşgira dîyar ya pirjimar {-ên}; di (4)an de paşgira nedîyar ya mêt {-e/a}; di (5)an de paşgira ne dîyar ya nêr {-î-ê} û di (6)an de paşgira nedîyar ya pirjimar {-e/ên} hatîye bikaranîn.

Di avaniya îzafeyê de, yanê di ravekê de hin hêman berîya navdêra eslî û hin jî pey navdêra eslî tên. Eger ev rêz bi formulasyonekê bê dayîn wê wiha be;

Dîyarker (Determiner) (D) Çendîker (Quantifier) (Ç) Rengdêrên Unvanan (R.U) **Navdêra Esî (N.E.)** Çendîker (Quantifier) (Ç) Dîyarker (Determiner) (D) Fraza Daçekî (Prepositional Phrase) (F.D) Fraza Lêkerî (Verb Phrase), Temamker (Complement) (T) Rengdêr (adjective) (R) (Bûlbûl, 2017: 96-104).

Her wekî li jorê jî xuya dibe hêmanên berîya navdêra eslî tên; dîyarker, çendîker û rengdêrên unvanê ne û yê pey navdêra eslî tên jî çendîker, dîyarker, frazên daçekî, frazên lêkerî, tamamkar û rengdêr in (Bûlbûl, 2017: 96-104).

1.2. Di Kurdiya Kurmancî de Fonksiyonên Partîkela Îzafeyê

Di Kurdiya Kurmancî de sê fonksiyonên partîkela îzafeyê hene. Ev fonksiyon fonksiyona girêdanê (adnominal linking), fonksiyona anaforîk (demonstrative/anaphoric) û fonksiyona zemanî (Tense Îzafe / Extended Îzafe) (Haig, 2011: 368-369).

1.2.1. Fonksiyona Girêdanê ya Partîkela Îzafeyê

Di vê fonksiyonê de partîkela îzafeyê hêmana ku pey navdêra eslî tê bi navdêra eslî ve girê dide. Wexta hêmana raveker bi navdêra eslî ve tê girêdan, partîkela îzafeyê ji hêla zayend û hejmara navdêra eslî ve allomorfên cuda hildide. Her wekî li jorê jî hatîye behskirin, îzafeya girêdanê çendîkeran, tamamkeran, rengdêran, frazên daçekî û lêkerî bi navdêra eslî ve girê dide. Wek;

yar -a	min	a	esmer	a	ji	Mûş-ê	a	ku duh hat
NE-îzf.m.	cîn.	îz.m	rengd.	îz.m.	daç.	navd.-tew.m.	îz.m.	Frazo Lêkerî

Her wekî ji mînakê jî tê dîtin navdêra eslî "yar" cînavk, rengdêr, fraza daçekî û fraza lêkerî standîye û hemû jî bi partîkela îzafeyê ve hatine girêdan.

1.2.2. Fonksiyona Anaforîk

Di kurdiya kurmancî de bê ku navdêra eslî di nav ravekê de hebe, partîkela îzafeyê dikare di nav wê ravekê de bê bikaranîn. Di vê rewşê de partîkela îzafeyê peywira nîşandayînê hildigire. Yanê di fonksiyona anaforîk de partîkela îzafeyê di derveyê raveka ku aîdê wê ye, tê bikaranîn. Wek (Bedir Khan & Lescot 1986: 199);

Tu	kijan	hesp-î	di-bin-î?
2y.rast.	Bêjeya Pirsê	navd-tew.n.	Pêş.DN-ditin:KDN.-2y

Yê	Soro	/yê	min	...
anaf.îz.n.	navd.	/anaf.îz.n.	1y.tew.	...

Di vê mînakê de “yê”ya berîya “Soro” hatiye û “yê”ya berîya “min” hatiye mînak in ji bo fonksiyona anaforîk ya îzafeyê. Lewra ev partîkel bê navdêra eslî hatine bikaranîn û navdêra eslî nîşan didin.

Fonksiyona girêdanê ya partîkela îzafeyê û fonksiyona anaforîk ya partîkela îzafeyê gelek nêzîkê hevdu ne û hin caran dibe ku tevlihev bibin. Cudahîya di navbera wan de hin caran bi navberên kurt ve dikare derkeve meydanê. Mesela (Haig, 2011: 368-69);

(1)

Bira-yê	min	ê	mezin	e.
N.E.-îzf.Nêr	1YJ.TEW	îzf.Nêr	Rng.	Kopula.3YJ.

(2)

Bira-yê	min	(I)	ê	mezin	e.
NE – îzf.n.	1y.tew.	Navbera kurt	îz.anaf.n.	reng.	Kopula. 3y.

Di mînaka yekem de “birayê min ê mezin e” pêveber e û maneya “Birayê min mezin e” dide. Di mînaka duyem de pêveber “ê mezin e” ye. Biker “birayê min” e. Yanê maneya “Yê mezin birayê min e” di hevokê de heye. Ev mane bi navbera kurt a pey “min” û berîya “ê”yê ve hatiye dayîn.

1.2.3. Fonksiyona Îzafeya Berfirehbûyî (Nîşankera Demî) ya Partîkela Îzafeyê

Di beşa jorîn de behsa nêzîkbûna fonksiyona girêdanê û ya anaforîk hate kirin. Ev nêzîkbûn ji hêla Haig (2011) ve wek çavkanîya îzafeya berfirehbûyî tê nîşandan. Di vê fonksiyona partîkela îzafeyê de partîkela îzafeyê ji sînoren morfolojîyê derketîye û ber bi sînoren sentaksê berfireh bûye. Îzafeya berfirehbûyî di hin devokên Kurmancî de wek perçeyê pêveberê tê bikaranîn. Pêveber dikare bibe pêvebereke navdêrî yan jî bibe pêvebereke lêkerî. Wek (Haig, 2011):

(1)

xuşk-a	min	ya	çû-î	sîk-ê
NE-îz.m.	1y.tew.	îzf.berf.m.	Çûn:KDB.-partîsîp	navd.-m.tew.

(2)

hal-ê	wî	ê	keftî	-ye
NE-îz.n.	3y.tew.n	îz.berf.	ketî-	-kopula. 3y.

Di hevoka (1)î de îzafeya berfirehbûyî refereyî bêjeya mê ya “xuşk”ê dike loma di forma “mê” de hatîye bikaranîn. Dîsa ev hevok ji bo îzafeya berfirehbûyî di pêveberên lêkerî de mînak e. Dîsa di mînaka ewil de maneya perfektîyê heye. Yanê “xwîşka min” berîya niha “çûye” “sîkê” û hêj jî li wir e. Di hevoka (2)yan de jî îzafeya berfirehbûyî refereyî bêjeya nêr ya “hal”î dike loma jî forma “nêr” hatîye bikaranîn. Ev hevok jî ji bo îzafeya berfirehbûyî di pêveberên navdêrî (di vir de pêvebera rengdêrî ye) de mînak e. Lewra hevok hevokeke navdêrî ye.

2. Bikaranîna Îzafeyê di Devokên Kurdîya Kurmancî de (Devokên Bakur, Başûrê Rojhilatê û Başûrê Rojavayê)

Di vê beşê de em ê li ser bikaranîna partîkela îzafeyê di devokên başûrê rojhilat başûrê rojava û bakur bisekinîn.

2.1. Devoka Başûrê Rojhilatê

Ji bo devoka başûrê rojhilatê bajarê Şirnexê bajaroka *Beytuşşebabê* gundê *Çemanê* hatîye hilbijartin. Pirsên hatine amadekirin ji bo axiverên vê mintiqê hate pirsîn. Di vê beşê de em ê li ser partîkela îzafeyê ya dîyar û nedîyar û nîşanderên vê devokê bisekinin.

2.1.1. Partîkela Îzafeyê ya Dîyar

Di vê devokê de partîkela îzafeyê ya dîyar bi cudahîyeke gelek kêr ve wek kurdîya kurmancî ya standart hatîye bikaranîn. Yanê navdêrên mê partîkela {-a}yê yên nêr partîkela {-ê}yê standine. Tenê navdêr wexta pirjimar hatine kişandin hin caran dengdara /n/yê ji partîkela pirjimarîyê ya {-ên}ê dikeve û ev partîkel yan wek {-ê} yan jî wek {-êd/êt}ê tê bikaranîn. Eger navdêra eslî yanê raveber ji ravekerê zêdetir raveker standibe û axiver partîkela îzafeyê bo van bi kar anîbe, dîsa wek kurmancîya standart partîkela îzafeyê li hember zayend û hejmarê hesasiyeta xwe diparêze. Mînak:

1. (Ş.K.Mêr)⁷

Ew	jînik-a	can	berxik-ên	me	yên	sipî	maç	di-ket-in
Cînv.Nîş.rast.	NE-îz.m.	Reng.	NE-îz.pirhejm.	1y.tew.	îz.pirhejm.	Reng.	Navd.	Pêş.DN-kirin:KDN-3y.

2. (Ş.NS.Mêr)

Em	ê	beran-ê	wî	di-kir-in
cînv.1p.rast.	îz.berf.	NE-îz.n.	cînv.3y.tew.	Pêş.DN-kirin:KDN-1p.

3. (Ş.NS.Mêr)

Şivan-ê	gênc	wê	çêl	û	ga-(y)êt	wî	çêrîn-îtin
NE-îz.n.	reng.	cîn.m.tew.	NE	gih.	NE-îz.pirhejm.	cîn.3y.tew.	çêrîn:KDN-3y.

⁷ Kurteyên ji bo herem, emir bi vî awayî ne: Ş.: Şirnex, M:Mûş, S: Semsûr, C: Ciwan, N.S.: Navsere, K: hal.

Di (1)î de partîkela {-a}yê ya pey “jinik”ê hatî partîkela îzafeyê ya mê; {-ên}a pey “berxik”ê hatî partîkela îzafeyê ya pirjimar û {-yên}a rengdêra “sipî” bi navdêra eslî ya “berxik”ê ve girê dide jî ji bo rêkkestina hejmarî ya partîkela îzafeyê bi navdêra eslî re mînak e. Di (2)yan de {-ê} ya li pey “beran”î tê jî partîkela îzafeyê ya nêr re mînak e. Di (3)yan de jî partîkela {-(y)êt}ê wek partîkela pirjimar ya îzafeyê hatîye bikaranîn.

Navdêrên cotzayend ji hêla hemû axiveran ve wek nêr hatine bikaranîn. Lê cînavkên refereyê du zayendan dikin jî ji hêla axivera ciwan ya jin ve wek mê hatîye bikaranîn.

Mînak: (Ş.C.Jin)

Ez	ew-a	nisax	di-bînît-im
Cnv.1YJ.RST.	Rng.Niş.-îzf.Mê	Rng.	Pêş.d.n.-dîtin:k.d.n.-1YJ

Her wekî ji vê mînakê jî dîyar e rengdêra nîşanî ya “ew” herçiqas refereyê du zayenda jî bike ji hêla vê axiverê ve wek mê hatîye kişandin.

2.1.2. Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar

Di vê devokê de partîkela îzafeyê ya nedîyar kêr zêde wek kurmancîya standart e. Lê hin axiver hin caran ji hêla rêkkestina zayendê ve navdêrên mê jî wek nêr kişandine. Dîsa wexta navdêr nedîyar û pirjimar tê kişandin paşgira pirjimarîyê hin caran di şûna ku bibe {-ên} yan dibe {-ê} yan jî dibe {-êd}. Eger em bi mînakan vê rewşê bidin wê wiha be:

1. (Ş.NS.J)

Ez	bûk-ek-e	xwe	y	delal	i	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	NE-nedîy.-îz.nedîy.m.	cîn.	îz. Notr	reng.	îz.berf.	pêş.DN-dîtinKDN-1y.

2. (Ş.NS.M)

Em	beran-ek-î	wî	di-kir-in
cîn.1p.rast.	NE.nedîy.-îz.n.	cîn.3y.n.tew.	pêş.DN-kirîn:KDN-3p.

3. (Ş.NS.J)

Ew	ê	l	meyteb-ê	arqadaş-ek-î	me	di-bîn-ît
cîn.3y.rast.	îz.berf.	pêş.daç.	navd.-tew.m.	NE.-Nedîy.-îz.n.	cîn.1p.tew.	pêş.DN-dîtin-KDN-3y.

4. (Ş.C.M.)

Ez	bûk-ek-î	xwe	ya	delal	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	NE.-nedîy.-îz.n.	cîn.	îz.m.	reng.	pêş.DN-dîtin-KDN-1y.

5. (Ş.NS.M)

Zilam	dê	hinde	deyn-êd	xwe	det-in
navd.rast.	PDB	reng.nedîy.	NE.-îz.p.	cîn.	dayîn:KDN-3j.

6. (Ş.C.J)

Ez	bûk-ak-a	xwe	ya	delal	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	NE.-nedîy-îzf.m.	cîn.	îz.m.	reng.	Pêş.DN-dîtin:KDN-1y

Di mînaka yekem de navdêra mê “bûk” paşgira nedîyarîyê {-ek-} û paşê jî paşgira nedîyar ya mê {-e}yê standîye. Di mînaka (2)yan de navdêra nêr “beran” paşgira nedîyarîyê {-ek-}ê û paşê jî paşgira nedîyar ya nêr {-î}î standîye. Di mînaka (5)an de jî navdêra “deyn” paşgira pirjimariyê {-êd}ê standîye û ji bo wateya nedîyarîyê jî bêjeya “hinde”yê hatîye berîya navdêra eslî. Ji bilî guherîna paşgira pijimariyê ji {-ên}ê bo {-êd}ê, ev her sê mînak wek kurmancîya standart e. Mînaka (3)yan ji bo navdêrên cotzayend mînak e. Navdêra “arqadaş” ku di kurmancî de “heval” e, navdêreke cotzayend e û wek nêr hatîye kişandin. Tiştê balkêş di vê derê de ew e ku ev bikaranîna nêr ji hêla axiverê jin ve hatîye bikaranîn. Ev jî nîşan dide ku nêrtîya gelenper di vê devokê de wek gelek devokên kurmancî gelek berbelav e.

Di mînaka (4)an de axiverê ciwan yê mêr navdêra mê “bûk”ê wek nêr kişandîye (-ekî nedîyar nêr e) lê wexta ravekera duyem (delal) li ravekê zêde kirîye dîsa vegerîye rêkkeftina mê (ya). Dikare bê gotin îzafeya nedîyar li gor îzafeya dîyar li hember rêkkeftinê qelstir e. Lewra guherîn di partîkela îzafeyê ya dîyar de na ya nedîyar de pêk hat.

Wek dawî ji bo bikaranîna cuda ya mînaka (5)an ev dikare bê gotin ku ev axivera ciwan ya jin di şûna ku ji bo pagira nedîyar ya mê {-e}yê bi kar bîne {-a}yê bi kar anîye. Sebebê vê jî ew e ku dîya vê axiverê ji Cizîrê ye û Cizîrî vê formê bi kar tînin.

2.1.3. Nîşander

Di vê devokê de rengdêra nîşander bi navdêra eslî ya ravekê re di nav rêkkeftina zayendî û hejmarî de ye. Navdêrên mê bi rengdêrên nîşander yê “vê / wê” ve, yê mê bi nîşanderên “vî / wî” yan jî “vi / wi” ve û yê pirjimar jî bi “wa” ve tê nîşandan. Mînak;

1. (Ş.K.M)

Tu	vê	mih-a	mi	doş-î
cîn.2j.rast.	cîn.nîş.m.Nêz.tew.	NE.-îz.m.	cîn.1y.tew.	dotin:KDN-2y.

2. (Ş.K.M)

Ez	ewi	zava-yê	Mîstefa	di-bînît-im
cnv.1y.rast.	cîn.nîşn.n.Dûr.tew.	NE.îz.n.	navd.	Pêş.DN-dîtin:KDN-1y.

3. (Ş.K.M)

Şivan-ê	cihêl	wa	çêl	û	paz-a	i	çêrîn-it
NE.îz.n.	regd.	cîn.nîş.pirhejm.tew.	NE	gih.	NE.-îz.p	îzf.berf.	Çêrîn:KDN-3y.

4. (Ş.C.M)

Ez	wî	bûk-a	xwe	ya	nû	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	cîn.nîş.Dûr.m.tew.	NE.-îz.m.	cîn.	îz.m.	reng.	Pêş.DN-dîtin:KDN-1y.

5. (Ş.C.M)

Hun	çîya-yê	he	yê	bilind	i	di-bîn-in?
cîn.2p.rast.	NE.-îz.n.	bêj.nîş.	îz.n.	reng.	îz.berf.	Pêş.DN-dîtin:KDN-p.

Di mînaka (1)î de nîşandera mê “vê”yê bi navdêra mê “mih”ê re ketiye nava rêkkeftinê. Di mînaka (2)yan de nîşandera “ewî”yê bi navdêra nêr ya “zava”yî re ketiye nava rêkkeftina zayendî. Di mînaka (3)yan de nîşandera pirjimar ya “wa” yê hatiye bikaranîn û bi navdêrên “çêl û paz”an re rêkkeftina pirjimarî çê kirîye. Axiverê ciwan yê kur di mînaka (4)an de dijî rêkkeftinê tevgerîyaye û rengdêra nîşander ya “wî”yê ji bo navdêra mê “bûk”ê bi kar anîye, lê ev axiver nadêre xwe wek mê kêşandîye. Ev jî nîşan dide ku eger jiholêrabûneke rêkkeftina zayendî pêk bê nîşander berîya partîkela îzafeyê wê ji holê rabe. Wek dawî di mînaka pêncan de xuya dibe ku hin caran cihê ku rengdêrên nîşander yên me behskirî ji bo nîşandanê werine bikaranîn di şûna wan de bêjeya “he” dikare bê bikaranîn.

Eger em partîkela îzafeyê ya dîyar û nedîyar dîsa nîşanderên bi ravekan re tîn bikaranîn ji bo vê devokê di nav tabloyekê de bidin wê wiha be:

Tablo 3: Di Devoka Başûrê Rojhilatê de Bikaranîna Partîkela Îzafeyê û Nîşanderan

	Partîkela Îzafeyê ya Dîyar	Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar	Nîşander
Nêr	{-ê}	(ek) {-î}	vi / vî {-ê}
Mê	{-a}	(ek) {-e}	vê {-a}
Pirjimar	{-ê(n)} / {-ê(d)}	hin/hinde ... {-ê(n)}/{-ê(d)}	va(n) {-ê(n)}/{-ê(d)}

3.2. Devoka Bakur

Ji bo vê devokê Bajarê Mûşê, gundê *Zîyaretê* hate hilbijartin. Pirsên avanîya îzafeyê dipîvin li axiveran hate tetbîqkirin. Niha wê partîkela îzafeyê ya dîyar û nedîyar û nîşanderên avanîya îzafeyê nîşan didin bi rêzê ji bo vê devokê bê dayîn.

3.2.1. Partîkela Îzafeyê ya Dîyar

Partîkela îzafeyê di vê devokê de herî aşîkar di rewşa dîyar de rêkkeftina zayendî pêk tîne. Rêkkeftina zayendî wek kurdîya standart e lê di rêkkeftina hejmarî de pirî caran paşgira {-ên}ê

dengê xwe yê dawîyê /n/yê winda dike û dibe {-ê(n)}. Dîsa wexta raveber ji ravekerekê zêdetir raveker bigire hin caran partîkela îzafeyê ya ravekerên duyem nîşan didin hesasîyeta xwe ya zayendê winda dikin û dibine “y”. Mînak;

1. (Hemû axiver)

Ez	bûk-a	xwe	y	teze	di-bîn-im
cîn. 1y.rast.	NE.-îz.m.	cîn.	îz.Notr	reng.	Pêş.DN-dîtin:KDN-1y.

2. (M.K.M)

Şivan-ê	ciwan	çêlek	û	conege-yê	jinik-ê	di-çêrîn-e
NE.îzf.n.	reng.	NE	gih.	NE-îz.pirhejm.	navd.-tew.m.	pêş.DN-çêrandin:KDN-3y.

3. (M.C.J)

Ew-a	ku	nexweş	e	di-bîn-im
cîn.nîş.-îz.m.	Temaker	reng.	Kopula.yekhejm.	Pêş.DN-dîtin:KDN-1y.

Di mînaka (1)î de partîkela îzafeyê {-a}yê navdêra mê “bûk”ê nîşan daye û ravekera duyem bi partîkela notrbûyî “y”yê ve nîşan daye. Di (2)yan de partîkela îzafeyê ya nêr {-ê} ji bo navdêra nêr “şivan” hatîye bikaranîn. Dîsa navdêra pirjimar ya “conege”yê partîkela îzafeyê ya {-ê(n)}ê standîye. Di vê devokê de piranî dengê /n/yê ji partîkela pirjimarîyê dikeve. Di (3)yan de axivera ciwan ji bo cînavka ku refereyî du zayenda dike partîkela mê {-a}yê bi kar anîye ku ev jî nîşan dide zayenda axiveran li ser rêkkeftina zayenda rêzimanî bandora xwe heye.

3.2.2. Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar

Di vê devokê de partîkela îzafeyê ya nedîyar ji bilî axiverê kal yê mêr ji hêla hemû axiveran ve rekkeftina zayendî winda kirîye. Navdêr wexta di nav avaniya îzafeyê de wek nedîyar tene kişandin, di vê devokê de axiver, yan partîkela nêr ya {-î}yê ji bo her du zayendan bi kar anîne yan jî tenê paşgira nedîyarîyê {-ek-}ê bi kar anîne. Navdêr wexta nedîyar pijimar hatine kişandin navdêra eslî paşgira {-ê(n)}ê hildaye û berîya ravekê jî bêjeya “hinek” hatîye bikaranîn. Mînak:

1. (M.K.M)

Ez	bûk-ek-e	xwe	ya	rind	di-bîn-im
cîn. 1y..rast.	NE.-nedîy.-îz.m.	cîn.	îz.m.	reng.	Pêş.DN-dîtin:KDN.-1y.

2. Hemû Axiver

Ew	zav-ek-î	ap-ê	te	di-bîn-e
cîn.3y.rast.	NE.-nedîy.-îz.n.	NE.-îz.n.	cîn.2y.tew.	Pêş.DN-dîtin:KDN-3y.

3. (M.K.J)

Jinik	telefon-ek	xirabe	di-kir-e
navd.rast.	NE.-nedîy.	reng.	PDN-kirîn:KDN-3y.

4. (M.NS.J), (M.C.M), (M.C.J)

Jinik	telefon-ek-î	xirabe	di-kir-e
navd.rast.	NE.-nedîy.-îz.n.	reng.	PDN-kirîn:KDN-3y.

5. Hemû Axiver

Jinik	hinek	berx-ê	me	y	qerqaş	maç	dike
navd.rast.	BêjNedîy.	NE.-îz.Pirhejm.	cîn.1p.tew.	îz.Notr	reng.	Navd.(Lêk.)	PDN-kirin:KDN-3y.

6. (M.G.K.)

Ew	heval-ek-î	we	y	li	oqil-ê	da	di-bîn-e
cîn.3y.rast.	NE.-nedîy.-îz.n.	cîn.2p.tew.	îz.Notr	Pêşdaç.	navd.-tew.m	Paşdaç.	PDN-dîtin:KDN-3y.

Di mînaka (1)î de navdêra mê “bûk” pêşîyê paşgira nedîyarîyê {-ek-}ê sitandîye paşê jî paşgira nedîyarîyê ya mê {-e}yê standîye ku ev wek kurdîya standart e. Ev bikaranîn ji hêla axiverê kal ve hatîye bikaranîn. Ji bilî wî tu kes vê formê bi kar neanîye. Di (2)yan de navdêra nêr “zava” partîkela nedîyarîyê {-î}yê satandîye ku ev jî wek kurdîya standart e. Yanê di navdêrên nêr de rêkkeftina zayendî di partîkela îzafeyê ya nedîyar de heye. Di (3) û (4)an de navdêra mê “telefon” bi partîkela nedîyarîyê ya mê ve nehatîye kişandin. Bileqş ya bêyî partîkela nedîyarîyê tenê bi paşgira nedîyarîyê {-ek-}ê ve hatîye kişandin (3); yan jî bi partîkela nêr ya nedîyar {-î}yê ve hatîye kişandin. Ev jî nîşan dide ku partîkela îzafeyê ya nedîyar notralîze bûye. Mînaka (5)an ji bo nedîyarîya pijimar mînak e. Di wê derê de navdêra raveber paşgira {-ê(n)}ê standîye û berîya ravekê bêjeya nedîyarîyê “hinek” hatîye bikaranîn. Wek dawî di (6)an de navdêra cotzayend “heval” ji hêla axivera ciwan ve jî wek nêr hatîye bikaranîn ku ev jî nîşan dide di kêşana nedîyarîyê de notralîzasyonê berfireh çêbûye.

3.2.3. Nîşander

Di vê devokê de wek partîkela îzafeyê ya nedîyar di nîşanderan de jî hesesîyeta zayendê ji holê rabûye. Tenê axiverê kal li hember zayendê hasas tevgerîyaye. Nîşander di nîşandera nêr “wî/vî” de standardîze bûye. Navdêrên cotzayend jî her wekî hemû navdêran nîşandera nêr ve hatine nîşandan. Mînak:

1. Hemû Axiver

Em	wî	beran-ê	wî	di-kir-in
cîn.1p.rast.	cîn.nîş.3y.Dûr.tew.n.	NE-îz.n.	cîn.3y.tew.n.	PDN.-kirîn:KDN-pirhejm.

2. (M.K.M)

Tu	vê	mi-ya	min	di-doş-î
cîn.2y.rast.	cîn.nîş.3y.Nêz.tew.m.	NE.îz.m.	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.

3. Ji bilî (M.K.M) Hemû axiver

Tu	vî	mi-ya	mi	di-doş-î
----	----	-------	----	----------

cîn.2y.rast.	cîn.nîş.3y.Nêz.tew.n	NE.-îz.m	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.
--------------	----------------------	----------	-------------	-------------------

4. Ji bilî (M.N.J) hemû axiver

Ez	wî	nexweş-ê	halsiz	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	cîn.nîş.3y.Dûr.tew.n.	NE.-îz.n.	reng.	PDN-dîtin:KDN-2y.

Di mînaka (1)î de navdêra nêr “beran” nîşandera nêr “wî”yê standîye. Di (2)yan de mînaka axiverê kal heye ku navdêra mê “mî” bi nîşandera mê ve hatîye nîşanan. Di (3)yan de ji bilî axiverê kal hemû axiverên din ji bo navdêra mê “mî”yê nîşandera nêr “vî”yê bi kar anîne. di çaran de jî rengdêra “nexweş” ku di fonksiyona navdêrê de hatîye bikaranîn bi nîşandera nêr “wî” ve hatîye nîşandan.

Di devoka bakur de partîkelên îzafeyê yên dîyar û nedîyar û nîşander bi vî awayî ne.

Tablo 4: Di Devoka Bakur de Bikaranîna Partîkela Îzafeyê û Nîşanderan

	Partîkela Îzafeyê ya Dîyar	Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar	Nîşander
Nêr	{-ê}	{-ekî}	vî{-ê}
Mê	{-a}	{-ekî}	vî ...{-a}
Pirjimar	{-ê(n)}	hinek ...{-a(n)}	van{-ê(n)}

3.3. Devoka Başûrê Rojavayê

Ji bo vê devokê ji navenda bajarê Semsûrê axiver hatin hilbijartin. Ji axiveran re pirsên berê hatî amadekirin hate pirsîn ku li jorê behs lê hatibû kirin.

3.3.1. Partîkela Îzafeyê ya Dîyar

Di vê devokê de ji bo partîkela îzafeyê ya dîyar sistemeke cuda heye ku heta niha di lîteraturê de behsa wê nehatîye kirin. Her wekî di teza doktorayê ya Yonat (2019) de jî cara ewil behsa wê hatîye kirin di devokeke kurdîya kurmançî de ku li Qafqasyayê tê xebirdan, navdêrên pirjimar jî ji hêla senifa xwe ya zayendî ve li gor însanbûn û neînsanbûnê kategorîze dibin. Yanê bi gelennperî navdêrên însanan û yên neînsanan wexta di nav ravekê de bi awayekî pirjimar têne kişandin paşgîrên cuda distînin. Rewşeke wek vê di vê devokê de di partîkela îzafeyê ya yekjimar de heye. Di vê devokê de navdêr wexta partîkela îzafeyê ya dîyar distînin di navdêrên însanan de marûzê cudahîyekê nabin lê wexta navdêra raveberê neînsan be wê gavê li hember zayendê hesas dibin. Navdêrên însanan yên nêr û yên mê partîkela îzafeyê ya dîyar {-ê}yê distînin. Ji bo navdêrên ne însanan eger navdêr nêr be paşgira {-î}yê û eger navdêr mê be paşgira {-ê}yê distînin. Navdêrên pirjimar jî partîkela îzafeyê ya dîyar {-ê(n)}ê distînin lê pîrî caran dengê /n/yê ya dawî dikeve. Bi vî awayî em dikarin mînakên pêşkeş bikin:

1. Ji bilî (A.C.J) hemû Axiver.

Ez	bûk-ê	xwe	y	nû	di-bîn-im
cîn.1y.rast.	NE.-îz.Notr	cîn.	îzfû.Notr	reng.	PDN-dîtin:KDN-1y.

2. Hemû Axiver

Ew	î	zava-yê	mi	di-wn-e
cîn.3y.rast.	îz.berf.	NE.-îz.Notr	cîn.1y.tew.	PDN-dîtin:KDN-3y.

3. Hemû Axiver

Jink-ê	rindik	berxik-ê	me	y	gewr	paç	di-k-e
NE.-îz.Notr	reng.	NE.-îz.Notr	cîn.1y.tew.	îz.Notr	reng.	navd.(Lêk.)	PDN-kirin:KDN-3y

4. Hemû Axiver

Em	beran-î	wî	hil-di-gr-ine
cîn.1p.rast.	NE.-îz.n.(Neînsan)	cîn.3y.n.tew.	Pêşgir-PDN-girtin:KDN-pirhejm.

5. Hemû Axiver

Ez	çîya-yî	bilind	di-wn-ime
cîn.1y.rast.	NE.-îz.n.(Neînsan)	reng.	PDN-dîtin:KDN-1y.

6. Hemû Axiver

Tî	mîy-ê	mi	di-doş-î
cîn.2y.rast..îz.berf.	NE.-îz.Notr	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.

Di (1)î de navdêra mê “bûk” di (2)yan de navdêra nêr “zava” partîkela îzafeyê ya dîyar {-ê}yê standine ku ji bo navdêrên însanan tê bikaranîn. Di (3)yan de navdêra “berxik” wek pirjimar hatîye kişandin û paşgira pirjimarîyê ya {-ê(n)}ê hildaye ku dengê /n/yê ya dawîya vê paşgirê de ketîye. Di (4)an de navdêra nêr ya neînsan “beran” û di (5)an de jî ya “çîya” partîkela îzafeyê ya {-î}yê standîye ku ev di vê devokê de taybetîya herî balkêş e. Her wekî di şeşan de jî xuya dibe navdêra mê ya neînsan “mî” paşgira {-ê}yê standîye ku ev ji yê navdêrên neînsan yê nêr {-î}yê cudatir e.

3.3.2. Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar

Partîkela îzafeyê ya nedîyar di vê devokê de {-î} ye û berîya vê partîlê jî paşgira {-(i/ê)k-} ya nedîyarîyê tê bikaranîn. Di navbera navdêrên nêr û mê de ferq tune. Wexta navdêr pirjimar tê kişandin jî paşgira nedîyarîyê ya {-in}ê tê bikaranîn. Bi vî awayî:

1. Hemû Axiver

Ew	zava-k-î	ap-ê	te	di-wn-e
cîn.3y.rast.	NE.-nedîy.-îz.Notr	NE.-îz.Notr	cîn.2y.tew.	PDN-dîtin:KDN-3y.

2. Hemû axiver

Wun	çîya-k-î	bilind	di-wn-ine	mi?
-----	----------	--------	-----------	-----

cîn.2p.rast.	NE.-nedîy.-îz.Notr	reng.	PDN-dîtin:KDN-pirhejm.	Bêja pirsê ya ji Tirkî hatî standin
--------------	--------------------	-------	------------------------	-------------------------------------

3. Ji bilî (A.K.J) Hemû Axiver

Tî	y	mi-k-î	min	di-doş-e
cîn.2y.rast.	îz.berf.	NE.-nedîy.-îz.Notr	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.

4. Ji bilî (A.K.J) Hemû Axiver

Tu	mi-k	min	di-doş-e
cîn.2y.rast.	NE.-nedîy.	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.

5. Hemû Axiver

Jinik	berxik-in	me	yê	gewr	paç	di-k-e
navd.rast.	NE.-nedîy.pirhejm.	cîn.1p.tew.	îzf.pir hej.	reng.	navd.(lêk.)	PDN-kirin:KDN-3p.

Di (1) û (2)yan de navdêrên “zava” û “çîya” pêşiyê paşgira nedîyarîyê {-k-}yê standine û paşê jî parîtkela nedîyarîyê {-î}yê ve hatine kişandin. Sebeba ku çima du mînakên nêr hatî dayîn ew e ku ji van navdêran yek navdêrên însanan e û ya din navdêrên neînsanan e. Her wekî me li jor jî behs kir parîtkela îzafeyê ya dîyar li hember navdêrên nêr yêr însan û nensanan hesas e. Lê parîtkela îzafeyê ya nedîyar xwedîyê vê hesasîyetê nîne. Di (3) û (4)an de navdêra mê “mî” di ya ewil de hem paşgira nedîyarîyê hem jî parîtkela îzafeyê ya nedîyar standîye. Lê di ya (4)an de tenê paşgira nedîyarîyê {-k} hatîye bikaranîn. Di (5)an de navdêra “berxik” bi awayeke pirjimar hatîye kişandin û tenê paşgira nedîyarîyê {-in}ê standîye. Di kurmancîya standart de parîtkela îzafeyê ya nedîyarîyê {-e} jî li vê derê zêde dibe. Lê di vê devokê de ev tune.

3.3.3. Nîşander

Di nîşanderan de di vê devokê de bikaranîneke weka kurdîya standart heye. Ravekên navdêra wan ya eslî nêr e nîşanderên “vî/wî” yêr mê nîşanderên “vê/wê” û yêr pirjimar jî nîşanderên “va(n)/wa(n)” bi kar tînin. Mînak:

1. Ji bilî (A.NS.M) Hemû Axiver

Ez	vê	bûk-ê	xwe	y	nî	hez	na-k-ime
cîn.1y.rast.	cîn.nîş.Nêz.m.	NE-îz.Notr.	cîn.	îz.Notr	reng.	navd.(lêk.)	PDNN.-kirin:KDN-1y.

2. Hemû Axiver

Tî	y	vê	mih-ê	min	di-doş-î
cîn.2y.rast.	îz.berf.	cîn.nîş.Nêz.m.	NE.-îz.Notr	cîn.1y.tew.	PDN-dotin:KDN-2y.

3. Hemû Axiver

Em	î	wî	beran-î	te	hil-di-gir-ine
cîn.1p.RST	îzf.berf.	cîn.nîş.Dûr.n.	NE.-îz.n.(Neîsnan)	cîn.2y.tew.	Pêşgir.-PDN-giritin:KDN-pirhejm.

4. (A.K.J), (A.K.M)

Ew	jin-a	wa	berxik-ê	me	paç	di-k-e
cîn.nîş.rast.	navd.-Clîtika Niş.	cîn.nîş.Dûr.pirhej	NE.-îz.pirhejm.	cîn.lp.tew.	navd.(lêk.)	PDN.-kirin:KDN-3y.

Di (1) û (2)yan de navdêrên mê yê “bûk” û “mî” bi nîşandera mê “vê”yê ve hatine nîşandan. Di (3)yan de navdêra nêr ya “beran” bi nîşandera nêr ya “wî”yê ve hatîye nîşandan. Ev navdêra nêr her çiqas navdêreke neînsanan be jî tu guherîn di nîşanderê de çênebûye. Di çaran de jî navdêra “berxik” ya pirjimar hatî kişandin jî bi nîşandera pirjimar ya “wa” ve hatîye nîşandan.

Eger partîkela îzafeyê ya dîyar û ya nedîyar dîsa nîşanderên vê devokê di nava tabloyekê de bê dayîn wê wiha be:

Tablo 5: Di Devoka Bakur de Partîkela Îzafeyê ya Dîyar û Nedîyar û Nîşander

	Partîkela Îzafeyê ya Dîyar		Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar	Nîşander	
	Navdêrên Însanan	Ne navdêrên Însanan		Navdêrên Însanan	Ne Navdêrên Însanan
Nêr	{-ê}	{-î}	{-(î/ê)k-}{-î}	vî ... {-ê}	vî ... {-î}
Mê	{-ê}	{-ê}	{-(î/ê)k-}{-î}	vê ... {-ê}	vê ... {-ê}
Pirjimar	{-ê(n)}		{-in}	va(n) ... {-ê(n)}	

NIRXANDIN Î ENCAM

Îzafe taybetîyeke bingehîn ya rêzimana kurdîya kurmancî ye ku li hember zayend û hejmarê hesas e. Kurdîya kurmancî wek hemû zimanan xwedîyê gelek devokan e. Bikaranîna îzafeyê li gor devokan pirî caran diguhere. Di vê xebatê de em li ser sê devokên kurdîya kurmancî sekinîn ku di van devokan de îzafe hem ji hêla fonolojîk ve hem jî ji hêla fonksiyonên xwe ve cudahîyan nîşan da. Ji hêla fonolojîk ve bi piranî paşgira îzafeyê ya pirjimar {-ên} dengê xwe yê dawî /n/yê pirî caran hunda kirîye. Di devoka başûrê rojhilat de ev deng bi dengê /t/ yan jî /d/yê ve guherîye. Ji hêla fonksiyonî ve jî di devoka başûrê rojavayê de em rastê bikaranîneke cuda tên ku heta niha kes behsa vê bikaranîne nekiribû. Ev bikaranîn bi vî awayî ye ku artîkela îzafeyê ya dîyar ne li gor nêrtî û mêtîyê lê li gor însanbûn û neînsanbûnê pêşî dikeve nava du beşan û navdêran însanan li hember zayendê hesas nînin lê navdêrên ne însan li gor nêrtî û mêtîyê diguherin.

Em dikarin bibêjin ku jîholêrabûna hesasîyeta zayendê di avaniya îzafeyê de jî di nav encamên vê xebatê de ye. Di devoka bakur de partîkela îzafeyê ya nedîyar û nîşanderên berîya îzafeyê tên di nêrtîyê de notr bûne. Dîsa, di devoka başûrê rojavayê de partîkela îzafeyê ya nedîyar hesasîyeta xwe ya li hember zayendê winda kirîye.

Wek dawî em dikarin behsa guherîna bikaranîna partîkela îzafeyê ya di navbera nîşan de bikin. Nîşên nû lewra kurdîya kurmancî zêde bi kar nayînin û ji ber ku pirî endamên nîşên nû

duzimanî ne, loma jî li hember cudahîya zayendê hesasîyeta xwe roj bi roj winda dikin. Di her sê devokan de jî nifşên ciwan li gor nifşên mezin li hember zayenda navdêran kêmtir hesasîyet nîşan dane. Aşîkar e ku eger ev rewş bi vê awayî dewam bike wê bibe sebebê notralîzebûna zayendê, yanê jîholêrabûna hesasîyeta zayenda rêzimanî ya di zimanê kurdî de.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. Aydın. T. Ergün. Z. û Bülbül. M. (2016). *Fêrkera Kurdî (Asta Destpêkê)*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- Akin, S. (2005). Têkçûna Zayendê di Zaravayê Kurmancî de. Di nav *Gotarên Konferansa li ser Zimanê Kurdî*. İstanbul: Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- Aksan, D. (2015). *Her Yöniyle Dil (Ana çizgileriyle Dilbilim) II Cilt*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Bedir Han, C. & Lescot, R. (2004). *Kürtçe Gramer*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Bülbül. M. (2017). Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê). *The Journal of Mesopotamian Studies*, Cilt:2/1, 89-177.
- Corbett, G. (1991). *Gender*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Ekici. D. (2007). *Kurmanji Kurdish Reader*. Hyattsville, USA: Dunwoody Press.
- Ghomeshi, G. (1997). Non-projecting Nouns and the Izafe Construction in Persian. *Natural Language and Linguistic Theory içinde* (729-788).
- Haig, G. (2000). The Gender System in the Kurdish Language: Structural and Sociolinguistic Aspects. Li ser *Kurdish Gender Studies* li Katzow û ji muswedda di navbera dîroka 23-25.09.2000 de hatî kirin. Em makale bi Almanî bi vî awayî derketîye; Haig, G. (2004). Das Genusssystem in der kurdischen Sprache: strukturelle und soziolinguistische Aspekte. Hajo, S. Borck, C., Savelsberg, E. & D. Şukriye (Ed.). Di nav *Gender in Kurdistan und der Diaspora* (33-58). Münster: Lit.
- Haig, G. (2007). The Emergence of the Tense Ezafe in Bahdînî Kurdish. *Second International Conference on Iranian Linguistic (2019. Ağustos 17)*. University of Hamburg.
- Haig, G. (2008). Alignment Change in Iranian Languages. A Construction Grammar Approach. *Empirical Approaches to Language Typology ; 37*. Berlin: Mouton
- Haig, G. (2011). Linker, Relativizer, Nominalizer, Tense-Particle. Yap, F. H. Grunow-Hârsta, K. & J. Wrona (Ed.), *Nominalization in Asian Languages: Diachronic and Typological Perspectives. Volume 1: Sino-Tibetan and Iranian Languages İçinde* (363-390), Amsterdam: John Benjamins.
- Haig, G. & Öpengin, E. (2014a). Gender in Kurdish: Structural and Socio-cultural Dimentions. Hellinger, M. & H. Motschenbacher (Ed.). Di av *Gender Across Languages Sayı. IV*, (247-276). John Benjamins.
- Haig, G. & Öpengin, E. (2014b). Regional Variation in Kurmanji: A Preliminary Classification of Dialects. *The Journal of Kurdish Studies S. 2, No. 2*, (143-176).

- Haig, G. & Öpengin, E. (2015). Kurmanji Kurdish in Turkey: Structure, Varieties, and Status. B. Christiane (Ed.). *Linguistic Minorities in Turkey and Turkic speaking minorities of the peripheries İçinde* (1-72). Wiesbaden: Harrassowitz. Erişim Tarihi: 01.02.2019, https://www.academia.edu/17650650/Kurmanji_in_Turkey_structure_varieties_and_statuses
- Komxebata Kurmancîyê. (2019). *Rêbera Rastnivîsînê*. Stenbol: Weqfa Mezopotamyayê.
- MacKenzie, D.N. (1954). Gender in Kurdish. *Bulletin of the School of Oriental and African Studies 16/3 içinde* (528-541) . London: University of London.
- MacKenzie, D.N. (1954). Gender in Kurdish. Di nav *Bulletin of the School of Oriental and African Studies 16/3* (528-541). London: University of London.
- Öpengin, E. (2011). *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Sahin, R. (2018). *Extended Ezafe Particles in Tor Kurdish*. Master's Thesis in Iranian Languages. Sweden: Uppsala Universitet.
- Samur, A. (2012). *Kurdîya Kurmancî*. İstanbul: Nûbihar.
- Strunk, J. (2003). The Structure of Kurdish Noun Phrase. Erişim Tarihi: 02.02.2019, https://www.researchgate.net/publication/251783008_The_structure_of_the_Kurdish_noun_phrase
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. (3.Baskı). İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Taş, Ç. (2013). *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*. İstanbul: Weşanên Dîwanê.
- Yonat, M. "Notên Dersa Destpêka Morfolojîya Kurdî".
- Zinar, Z. (2009). *Di Çanda Kurdi de 37 Şaxên Zanistê*. Stockholm: Weşanên Pêncinarê.

PEVEK**Pêvek 1: Kurtenîşanên Gotarê**

1p.: Şexsê Yekem yê Pirjimar	daç.: Daçek	nav.: Navdêr
1y.: Şexsê Yekem yê Yekjimar	gih: Gîhanek	pêş.DN: Pêşgira Dema Niha
2p.: Şexsê Duyem yê Pirjimar	îz.: Îzafê	Pêş.daç.: Pêşdaçek
2y.: Şexsê Duyem yê Yekjimar	îzf.berf.: Îzafeya Berfirehbûyî	pirhejm.: Pirjimar
3p.: Şexsê Sêyem yê Pirjimar	KDB: Koka Dema Borî	partîkel.DB: Partîkela Dema Bê
3y.: Şexsê Sêyem yê Yekjimar	KDN: Koka Dema Niha	reng.: Rengdêr
îz.anaf.: Îzafeya Anaforîk	NE: Navdêra Eslî	rast.: Rasterast
bej.nîş.: Bêjeya Nîşander	Nedîy.: Paşgira Nedîyariyê	tew.: Tewandî
cîn.: Cînavk	nîş.: Nîşander	yekhejm.: Yekjimar

Pêvek 2: Amûra Pîvanê ya Avaniya Îzafeyê**1. Partîkela Îzafeyê ya Dîyar**

Însan, Eqreba, Mê	Ez bûka xwe ya nû dibînim	Ben yeni gelinimi görüyorum.
Jîndarê Neînsan, Mê	Tu miha min didoşî	Sen benim koyunumu sağyorsun.
Însan, Eqreba, Nêr	Ew zavayê apê te dibîne	O senin amcanın damadını görüyor.
Jîndarê Neînsan, Nêr	Em beranê wî dikirin	Biz onun koçunu satın alıyoruz.
Nejîndar, Nêr	Hun çiyayê bilind dibînin?	Siz yüksek dağı görüyor musunuz?
Nejîndar, Mê	Ew dara me ya di baxçê de dişkênin	Onlar bizim bahçedeki ağacı kırıyorlar.
Însan, Mê, Qerzkirî	Mêrikê kal hemşîreya pordirêj a bejindirêj tîne.	Yaşlı adam uzun saçlı uzun boylu hemşireyi getiriyor.
Însan, Nêr, Qerzkirî	Gundîyên Mûşê cendirmeyê birçî têr dikin	Muş'un köylüleri aç jandarmayı doyuruyorlar.
Qerzkirî, Îcadbûyî	Jinik telefona xirabe dikire	Kadın bozuk telefonu satın alıyor.
Qerzkirî yê di Kurdî de Maneya wê heyî.	Mêrik ayaqabîyê teze yê biha dikire	Adam yeni pahalı ayakkabıyı satın alıyor
Pirjimar, Jimarbar	Jinika rind berxên me yên qerqas maç dike	Guzel kadın bizim beyaz kuzularımızı öpüyor
Pirjimar, Nejimarbar	Qehwecî çayên reş yên qaçax tijî dike	Kahveci demli kaçak çayları dolduruyor
Pirjimar+Pirjimar	Şivanê ciwan çêlek û conegeyên wê diçêrîne.	Genç çoban onun inek ve boğalarını otlatıyor
Cotzayend	Ew hevalê/a we dibîne	O sizin arkadaşınızı görüyor
Îzafeya Anaforîk	Ez yê nexweş dibînim	Hasta olanı görüyorum

2. Partîkela Îzafeyê ya Nedîyar

Însan, Eqreba, Mê	Ez bûkeke xwe ya rind dibînim	Ben güzel bir gelinimi görüyorum.
Jîndarê Neînsan, Mê	Tu miheke min didoşî	Sen benim bir koyunumu sağlıyorsun.
Însan, Eqreba, Nêr	Ew zavayekî apê te dibîne	O senin amcanın bir damadını görüyor.
Jîndarê Neînsan, Nêr	Em beranekî wî dikirin	Biz onun bir koçunu satın alıyoruz.
Nejîndar, Nêr	Hun çiyayekî bilind dibînîn?	Siz yüksek bir dağ görüyor musunuz?
Nejîndar, Mê	Ew dareke me dişkênin	Onlar bizim bir ağacımızı kırıyorlar.
Însan, Mê, Qerzkirî	Mêrikê kal hemşireyê pordirêj a bejindirêj tîne.	Yaşlı adam uzun saçlı, uzun boylu bir hemşire getiriyor.
Însan, Nêr, Qerzkirî	Gundîyên Mûşê cendirmeyekî birçî têr dikin	Muş'un köylüleri aç bir jandarmayı doyuruyorlar.
Qerzkirî, Îcadbûyî	Jinik telefoneke xirabe dikire	Kadın bozuk bir telefon satın alıyor.
Qerzkirî yê di Kurdî de Maneya wê heyî.	Mêrik ayaqabîyekî xweşik dikire	Adam güzel bir ayakkabı satın alıyor
Pirjimar, Jimarbar	Jinika rind hin berxên me yên qerqaş maç dike	Guzel kadın bizim bazı beyaz kuzularımızı öpüyor
Pirjimar, Nejimarbar	Mêrik ê hin deynên xwe bide	Adam borçlarının bir kısmını verecek
Pirjimar+Pirjimar	Şivanê ciwan hin çêlek û conegeyên wê dişêrîne.	Genç çoban onun bazı inek ve boğalarını otlatıyor.
Cotzayend	Ew hevalekî/e we yê ji dibistanê dibîne	O sizin okuldan bir arkadaşınızı görüyor
Cotzayend	Ez nexweşekî/ê ji Mûşê dibînim	Ben Muşlu bir hasta görüyorum

3. Nîşander

Însan, Eqreba, Mê	Ez wê bûka xwe ya nû hez dikim	Ben şu yeni gelinimi seviyorum.
Jîndarê Neînsan, Mê	Tu wê miha min didoşî	Sen benim bu koyunumu sağlıyorsun.
Însan, Eqreba, Nêr	Ez wî zavayê birayê Mistefa dibînim	Ben Mustafa'nın kardeşinin o damadını görüyorum.
Jîndarê Neînsan, Nêr	Em wî beranê wî dikirin	Biz onun o koçunu satın alıyoruz.
Nejîndar, Nêr	Hun vî çiyayê bilind dibînîn?	Siz bu yüksek dağı görüyor musunuz?
Nejîndar, Mê	Ew wê dara me dişkênin	Onlar bizim o ağacı kırıyorlar.
Însan, Mê, Qerzkirî	Mêrikê kal wê hemşireya pordirêj a bejindirêj tîne.	Yaşlı adam o uzun saçlı, uzun boylu hemşireyi getiriyor.

Însan, Nêr, Qerzkirî	Gundîyên Mûşê wê cendirmeyê birçî têr dikin	Muş'un köylüleri o aç jandarmayı doyuruyorlar.
Qerzkirî, Îcadbûyî	Jinik wê telefona xirabe dikire	Kadın o bozuk telefonu satın alıyor.
Qerzkirî yê yê di Kurdî de Maneya wê heyî.	Mêrik vî yaxê motorê dixê erebê	Adam arabaya bu motor yağını koyuyor
Pirjimar, Jimarbar	Jinika rind wan berxên me yên qerqaş maç dike	Guzel kadın bizim o beyaz kuzularımızı öpüyor
Pirjimar, Nejimarbar	Mêrik ê wan deynên xwe yên ji par mayî bide	Adam geçen yıldan kalan o borçlarını ödeyecek
Pirjimar+Pirjimar	Şivanê ciwan wan çêlek û conegeyên xurt diçêrine.	Genç çoban o tavlı inek ve boğalarını otlatıyor
Cotzayend	Ew wî/ê hevalê/a we yê/a ji dervayê welêt dibine	O sizin o yurtdışından olan arkadaşınızı görüyor
Cotzayend	Ez ewê/î nexweşê/a bêdurum dibînim	Ben o durumsuz hasta olanı görüyorum

ŞÊX QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: JIYAN, BERHEM Û KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ* SHEIKH QUTBEDDÎNÊ KORİKÎ: HIS LIFE, WORKS AND LITERARY PERSONALITY

Numan YURT*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatîn: 06/06/2020
Accepted // Pejirandin: 13/08/2020
Published // Weşandin: 30.11.2020
Pages // Rûpel: 76-98

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Yurt, Numan, Şêx Qutbeddînê Korikî: Jîyan, Berhem û Kesayetiya Wî ya Edebî, *Kurdiname*, no. 3, p.76-98

Plagiarism/Înfîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website
//Ev gotar herî kêrî ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.

Kurte

Şêx Qutbeddînê Korikî (k.d. 1979) yek ji helbestvanê klasik e ku mexlesa “Xakî” bi kar aniyê. Korikî di dergahê Şêx Seydayê Cizîrî yê girêdayî şaxa Basretê de perwerde bûye û hem îcazeyê xwe ya ilmî hem jî ya xelîfetiye jî Şêx Seyda wergirtiye. Her çend di perwerdehiya takekesî ya Korikî de para malbata wî çêbûbe jî di geşedana wî ya ilmî, tesewifî û edebî de Şêx Seyda û dergahê wî bandoreke xurt lê kiriye. Korikî digel xebatên xwe yê ilmî û tesewifî kesayetekî ku aliyê wî yê edebî jî heye û xwedî berhem e. Li gorî agahiyên li ber dest Xakî, bi Kurdiya Kurmançî ‘eqîdenameyê menzûm, mewlûdeke nîvco, xezelek û du muxemmesan nivîsiye. Korikî bi ‘eqîdenameya xwe bûye şopînerê Ehmedê Xanî. Di ‘eqîdenameya wî de jî hela şeweyê ve bandora Melayê Bateyî û Mela Xelîlê Sêrtî jî eşkere ye. Korikî bi mewlûdenameya xwe jî Melayê Bateyî şopandiyê. Xakî di xezela xwe ya musemmet de Melayê Cizîrî teklîd kiriye. Di muxemmeseka wî ya ku li ser Şêx Seydayê Cizîrî nivîsiye de jî aliyê şeweyê ve bandora Melayê Cizîrî, di ya din de jî bandora Şêx Ebdurehmanê Aqtepi tê dîtin. Ev xebat li ser jîyan, berhem û kesayetiya edebî ya Şêx Qutbeddînê Korikî hatiye kirin.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî ya klasik, Şêx Qutbeddînê Korikî, ‘eqîdename, mewlûd, helbest

Özet

Şeyh Qutbeddînê Korikî (v.1979) “Xakî” mahlasını kullanan klasik şairlerinden biridir. Korikî Basret’e bağlı Şeyh Seydayê Cizîrî dergâhında eğitim görmüş, hem ilmî hem de halifelik icazetini Şeyh Seyda’dan almıştır. Şahsî eğitiminde her ne kadar ailesinin hissesi olmuşsa da ilmî, tasavvufî ve edebî gelişiminde Şeyh Seyda ve dergâhının güçlü bir etkisi olmuştur. Korikî, ilmî ve tasavvufî çalışmalarının yanısıra edebî yönü de olan eser sahibi bir kişiliktir. Xakî, eldeki verilere göre Kürtçe’nin Kurmançî diyalektiği ile manzum bir akidename, tamamlanmamış bir mevlid, bir gazel ve iki muhammes kaleme almıştır. Korikî akidenamesi ile Ehmedê Xanî’nin takipçisi olmuştur. Akidenamesinde üslûp açısından Melayê Bateyî û Mela Xelîlê Sêrtî’nin de tesiri belirgindir. Korikî mevlidnamesiyle de Melayê Bateyî takip etmiştir. Xakî musammat gazelinde Melayê Cizîrî’yi taklit etmiştir. Şeyh Seydayê Cizîrî için yazdığı bir muhammesinde üslûb yönünden Melayê Cizîrî’nin

* Hin beşên vê xebatê bi sernavê “‘Eqîdenameyê Menzûm: *Hazîhi Hedîyeytu’l-Îxwan fi Eqîdeti’l-Îman* a Şêx Qutbeddînê Korikî”, di sala 2019an de wek teza lîsansa bilind li Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Tirkiyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî hatiye pêşkeşkirin. Xebat bi piştî hin agahiyên nû û guherînan hatiye amadekirin.

* MA in Kurdish Language and Culture/Derçûyê Lîsansa Bilind, Email: abdexweda@gmail.com,
<https://orcid.org/0000-0002-8921-3939>

etkisi, diğer muhammesinde de Şeyh Ebdurehmanê Aqtepi'nin etkisi görülmektedir. Bu çalışma Şeyh Qutbeddîne Korikî'nin hayatı, eserleri ve edebî kişiliği üzerine yapılmıştır.

Anahtar Sözcükler: Klasik Kürt edebiyatı, Şêx Qutbeddîne Korikî, akidename, mevlid, şiir

Abstract

Sheikh Qutbeddîne Korikî (d.1979) is one of the classical poets who used the pseudonym "Xakî". Korikî was educated at Sheikh Seydayê Cizîrî's dergah affiliated to Basret, and received both his scholarship and caliphate approval from Sheikh Seyda. Although his family had a share in his personal education, Sheikh Seyda and his dergah had a strong influence in his scholarship, sufistic and literary development. Korikî is a person who has a work with a literary aspect as well as Korikî scholarship and sufi studies. According to the available data, Xakî wrote a verse akidename, an incomplete mawlid, a gazel and two muhammes with the Kurmanji dialect of Kurdish. Korikî became a follower of Ehmedê Xanî through his akidename. In his akidename, the influence of Melayê Bateyî and Mela Xelilê Sêrtî in turn of expression is also evident. Korikî also followed Melayê Bateyî with his Mevlid. Xakî imitated Melayê Cizîrî in the ghazal of musammat. In one muhammas written for Sheikh Seydayê Cizîrî, the influence of Melayê Cizîrî in turn of expression, and in the other muhammas, the influence of Sheikh Ebdurehmanê Aqtepi is appeared. This study is about the life, works and literary personality of Sheikh Qutbeddîne Korikî.

Keywords: Classical Kurdish literature, Sheikh Qutbeddîne Korikî, akidename, mawlid, poem

Destpêk

Danasîna kesayetên edebî, nixandina berhem û aliyên wan ê edebî ji bo edebiyat û seyra wê ya tarîxî bêguman xebat û merheleyeke jêneger û girîng e. Xebatên bi vî rengî tenê ne aliyê tarîxî yê kesayetî û berhemên edebî herwiha perspektîfên dînî, çandî, sîyasî, civakî, felsefî û hwd. jî derdixe holê û radixe ber çavan. Dîsa bi van lêkolînan dîroka metnên edebî, kesayet, qonax û ekolên edebî jî dikare bê diyarkirin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek kes û berhemên wan hene ku yan kêmtên nasîn an jî qet nayên zanîn. Ev kêmasî jî dike ku tarîxa edebiyata Kurdî nivco bimîne. Di tarîxa edebiyatê de geşedana kronolojiyê bi saya xebatên qadî, lêgerîna berhemên destxet û nixandina wan dikare bê temamkirin. Di vê lêgerînê em jî rastî kesayetê dînî-edebî û xwedî berhem hatin. Serpêhatiya vî xebatî berî sê salan bi dîtina fotoya destxetekî dest pê kir. Ev destxet a 'eqîdenameya Şêx Qutbeddîne Korikî bû. Korikî her çend ji malbeteke navdar be jî heta ku me destxeta wî nedîtibû em jî kesayeta wî ya edebî û berhemên wî ne haydar bûn. Piştî ku em ketin pey şopa wî me 'eqîdenameyê destxet, mewlûdeke destxet a nivco û sê helbestên wî yê Kurmancî bi dest xistin. Em jî hebûna mewlûda wî jî bi agahdariya kurê Korikî, Seyîd Ebdullah haydar bûn û di pirtûkxaneyê malbatê de me mewlûdê jî peyde kir. Mixabin em negihîştin destxetên resen ê helbestan lê me metnê îstînsaxkirî yê helbestan bi dest xistin.

Biqasî ku em dizanin ji xebata¹ Zeynelabidîn Zinar a ku li ser 'eqîdename û helbestên Korikî kirî û çend gotarên² ku behsa Korikî û berhemên wî dikin pê ve tu xebateke akademîk an jî lêkolîneke bihûrgilî li ser Korikî û berhemên wî nehatiye kirin. Di vê xebatê de Korikî û berhemên wî hatiye danasîn û berfirehî jî kesayeta wî ya edebî hatiye nixandin. Berhema sereke û birêkûpek a Korikî 'eqîdenameya wî ye. Korikî bi 'eqîdenameya xwe hewl daye ku

1Zeynelabidîn Zinar cara pêşî di sala 2011an de li Stockholmê li Weşanxaneyê Pencînarê bi navê "Dîwançeya Xakî, Haza Hediyet'ul Îxwan fî 'Eqîdet'il Îman" xebatekî çap kiriyê lê heta niha belav nekiriyê. Piştî re heman xebat bi navê "Hediyet'ul-Îxwan fî Eqîdet'il-Îman, Dîwançeya Xakî" di sala 2017an de Weşanên Nurefşanê de hatiye çapkirin.

2 Bnr. (Adak, 2012: 465-485); (Adak, 2017: 59-64); (Adak, 2019: 264); (Karaman, 2019: 38-40).

berevaniya dînê Îslamê bike; Ehmedê Xanî ji xwe re kiriye mînak û bûye şopînerê tradîsyona ‘eqîdenûsiyê. Çawa ku di sebebê te’lîfê de jî diyar kiriye wî jî wekî pêşengên xwe xwestiye ku gelê wî bi zimanê xwe ferî baweriya xwe bibe. Berhema xwe bi zimanekî zelal, sade û herikbar nivîsiye. Di mewlûdnameya xwe de jî daye pey şopa Melayê Bateyî lê neqedandiye. Di xezela ku nivîsiye de bandora Cizîrî xuya ye. Du medhiyeyên ku ji aliyê edebî ve astbilind jî ji bo şêxê xwe Şêx Seydayê Cizîrî nivîsiye. Em hêvî dikin ku Xakî bi berhemên li ber dest û yên ku dê bên bidestxistin di tarîxa edebiyata Kurdî de piştî vê xebatê û xebatên ku di dahatuyê de dê li ser bên kirin cihê xwe bigire û qedrê wî bê zanîn.

1. Jiyana Şêx Qutbeddînê Korikî

Şêx Qutbeddînê Korikî ji aliyê pêşiyên xwe ve seyîd e û malbata wî bi navê “Bûbê Kal” tê naskirin. Ev malbat di nav Kurdan de navdar, qedirbilind û bibandor e. Navê bavê Şêx Qutbeddîn, Mele Brahîm; navê diya wî Dirê (Durre) ye. Dirê Xanim jî neseben digihîje şêxên Geylanî yên Girêşîrî. Mele Brahîm her çend xelîfetiya Neqşebendîtiyê standibe jî zêdetir bi meletiyê tê naskirin. Lewra temenê xwe bi meletî û dersdariyê borandiye. Mele Brahîm xwediyê çar kur û du keçan e. Kurên wî Mele ‘Ebdulkerîm, Mele Mihemmed Emîn, Mele Bawedîn (Bahaeddîn) û kurê herî biçûk Şêx Qutbeddîn e. Şêx Qutbeddîn (Yıldız) di sala 1916an de li gundê Korikê ku vêga taxeke Batmanê ye çêbûye.

Şêx Qutbeddîn berî ku Elmedîna di bin avê de bimîne li dibistana fermî xwendiyê lê ne diyar e ku heta kîjan astê xwendiyê.³ Li bal bavê xwe dest bi xwendina medreseyê kiriye û heta ew birine leşkeriyê jî xwendina xwe li bal bavê xwe domandiye. Dema Şêx Qutbeddîn li leşkeriyê bûye, bavê wî Mele Brahîm wefat kiriye. Piştî vegeerê di şûna bavê xwe de meletiya Korikê kiriye û ji bo xwendina ‘Erebî çûye gundê Tilmercê (girêdayî navçeya Bişêriyê ye) bal kekê xwe Mele ‘Ebdulkerîm. Li gundê Tilmizê (girêdayî navçeya Bişêriyê ye) jî li bal Mele Hesênê Tilmizî⁴ xwendina xwe domandiye. Piştî wefata Mele Hesênê Tilmizî jî vê carê berê xwe daye gundê Basorkê û li bal Mele Fexredînê Batmanî⁵ xwendina medreseyê domandiye. Seyîd Qutbeddîn û Mele Fexredînê Batmanî berê xwe dane Cizîra Botan bi zor û zehmetî xwe gihandine Şêx Seydayê Cizîrî, pê bawer kirine, li dergahê wî mane. Hem Seyîd Qutbeddînê Korikî hem jî Mele Fexredînê Batmanî îcazeya şêxîtiyê ji Şêx Seyda wergirtine (Ünalın, 2009: 357). Bêguman Şêx Seydayê Cizîrî bandoreke mezin li jiyana Şêx Qutbeddîn kiriye û piştî ku bûye dildarekî dergahê Şêx Seyda heta ku îcazeya medreseyê standiyê întisabî wî kiriye. Destûrnameya medreseyê (Cezerî, 2015: 51) ya Şêx Qutbeddîn di sala hicrî ya 1375an (m.1955) de bi îmzeyê Şêx Seydayê Cizîrî û Seyîd ‘Eliyê Findikî hatiye amadekirin û pesendkirin. Korikî îcazeya terîqeta Neqşebendîtiyê (Cezerî, 2015: 222) jî dîsa ji Şêx Seyda di

3 Ev agahî ji aliyê kurê biçûk ê Şêx Qutbeddîn, Seyîd ‘Ebdullah hatiye dayin.

4 Mele Hesênê Tilmizî li derdora Batmanê kesayetekî ku di warê ilmê de xwedî otorîte bû. Li gundê Tilmizê meletî û muderisiyê kiriye.

5 Mele Fexreddînê (Yıldız) ‘Ernasî an Batmanî. Ji ber ku jiyana û xizmetên xwe li Batmanê domandiye bêtir bi nîsbeta “Batmanî” tê nasîn. Di çardeh saliya xwe de ji bo xwendinê hatiye bal Mele Hesênê Tilmizî û îcazeya xwe ya ilmî jê standiyê. Li mizgefta Ulu Camî ya Batmanê meletî-xetîbî kiriye. Ji Şêx Seydayê Cizîrî di sala 1955an de xelîfetî standiyê. Xebatên xwe yên îrsadê li mizgefta Hecî Şîrîn a li Batmanê domandiye. Di warê ziman û edebiyata ‘Erebî de gelek berhemên wî hene. Di sala 1972yan de li Batmanê wefat kiriye.

sala hicrî ya 1378an (m.1959) de, destûnameya *Delailu'l-Xeyratê*⁶ jî di sala 1383yan (m.1963) de wergirtiye.

Şêx Qutbeddîn mirovekî hişyar, xwedî berpirsiyarî û ji derdora xwe haydar bûye. ‘İlmê xwe di riya xizmeta gelê xwe de bi kar aniye û xwe jî gelê xwe dûr nekiriye. Korikî piştî wefata bavê xwe pêşî li gundê xwe pişt re jî li navenda Batmanê di Mizgefta Yıldızê -ya ku wî bixwe ava kiriye- de bi usûla medreseyê dersên xwe domandiye. Di serî de endamên malbatê, xizmên xwe û pişt re jî gelek feqî perwerde kirine û îcazeya ‘ilmî daye hin ji van kesan. Ji bilî feqiyên herêmê ji deverên din (Elezîz, Semsûr, Konya hwd.) jî bi mebesta xwendinê gelek kesan qesda Şêx Qutbeddîn kirine. Korikî jî bo îrşada dîn û terîqetê li herêmê geriyaye. Nemaze li bajarê Wanê navçeya Ozalpê û li gundên derdora navçeyê yên bi navê Mele Hesena Jorî, Mele Hesena Xwarî, Keşîşa Jêr û Keşîşa Jorî û hin gundên din îrşada terîqetê kiriye.

Korikî Kurdî, ‘Erebî, hinek Farisî û pir kêr jî Tirkî zaniye. Xutbeyên xwe jî ber ku Kurdî qedexa bû nikariye bixwîne lê belê tu carî bi Tirkî jî nexwendiyê. Zeynelabidîn Zinar di bîranîneke xwe de wiha behsa vê rewşê dike: “*Rojekê Şêx Qutbedîn gote min: Birazî va ye diyanetê emir kiriye ku xutbeya roja inê bi zimanê tirkî were xwendin, ez jî bi tirkî nizamim û zarûkên min jî li xwendinê ne. Tu rojên înan were li mizgeftê xutbe bixwîne, yên mayî ez dikarim bimeşînim. Piştî wê gotina Şêxê gorbihîşt, min demek dirêj di rojên înan de xutbe li mizgefta wî xwend heta kurê wî gorbihîşt Seyid ‘Umer xwendina xwe kuta kir û hat Êlihê*” (Korikî, 2017: 6). Korikî, wek mirovekî alim gelekî girîngiyê daye ilm û xwendinê. Nîşaneya vê ew e ku di mercên zehmet ên siyasî de dest ji dana dersê bernadeye, gelek feqî û mele perwerde kirine. A herî girîng jî ew e ku li kêleka perwerdeya medreseyê hemû zarokên xwe di xwendingehên fermî de jî daye xwendin. Korikî, digel aliyê xwe yê ilmî û tesewifî her weha kesayetekî xwedî berhem e jî. Korikî, her çend di demeke ku mercên wê jî aliyê siyasî ve rê li ber xebatên dînî û çandî girtibe jiya be jî, dîsa jî di nav tevgereke ilmî de bûye û bi berhemên ku bi zimanê gelê xwe nivîsiye hewl daye ku xizmeta civaka xwe bike. Di rewşeke wiha astengdar de hem xwendina xwe ya medreseyê domandiye heta ku qedandiye û destûnameya ilmî û terîqetê bi dest xistiye hem jî vegeriyaye welatê xwe heta ku çûye dilovaniya Xwedê li gund û bajaran xizmet û teblîxa gelê xwe kiriye.

Çar kur û du keçên Şêx Qutbeddîn Korikî hene. Navên kurên wî bi rêzê Fexredîn, ‘Umer, ‘Elî û ‘Ebdullah e. Navên keçên wî Marya û Cemîle ne. Korikî di sala 1979an û 63 saliya xwe de li Batmanê çûye ber dilovaniya Xwedê û li kêleka bavê xwe Mele Brahîm hatiye veşartin.

2. Berhemên Şêx Qutbeddînê Korikî⁷

Şêx Qutbeddînê Korikî li gorî lêkolîn û agahiyên ku li ber dest li pişt xwe bi Kurdî ‘eqîdenameyeke menzûm, sê helbest û mewlûdnameyeke neqediyayî; bi Erebbî jî hin qesîde û menqibeyeke (Cezerî, 2015: 100) der barê Şêx Seyda de hiştiye. Dîsa li gorî agahiyên li ber dest di pirtûkxaneya Korikî ya taybet de gelek pirtûkên destxet hebûne lê belê di dema

6 Mecmûaya selewatan a ku ji aliyê Şêx Muhammed b. Silêman el-Cezûlî (w.870/1465) ve hatiye berhevkirin. Bnr. (Uludağ, 1994: 113-114).

7 Ev beş digel agahiyên tezê bi hin agahiyên nû hatiye zêdekirin.

derbeya leşkerî de ji ber xetereya ku bên girtin ew pirtûk di bin axê de hatine veşartin û careke din nehatine dîtin.⁸ Di vê beşê tenê li ser berhemên Kurdî dê bê rawestan.

2.1. 'Eqîdename: Hazîhî Hediyetu'l-Îxwan fî 'Eqîdetî'l-Îman'⁹

Berhema bi navê *Hazîhî Hediyetu'l-Îxwan fî 'Eqîdetî'l-Îmana* Şêx Qutbeddînê Korikî mîna keke cureya 'eqîdenameyê ye. Berhem bi destxeta Mele Celaleddîn¹⁰ hatiye îstînsaxkirin û vêga di pirtûkxaneyê malbatê de ye. Bêguman berhema wî ya herî girîng 'eqîdenameya wî ye û hêjayî lêkolînê ye. Şêx Qutbeddînê Korikî, armanca nivîsîna 'eqîdenameya xwe di destpêka berhemê de diyar kiriye. Armanca wî ya sereke ew e ku gelê wî "riknên îman û Îslamê" bi awayekî baş bizanin û bi wan emel bikin. Vê mebesta xwe wiha diyar kiriye:

Muheqqeq bizan dîn û îmanê wan
Ku kamil dibîtin yeqîn bêguman

Yeqîn rukn û îman û Îslam(i) me
Li ser me temaman bizan lazim e (Korikî, 'Eqîdeya Îmanê, r. 7)

Armanca din jî ew e ku wekî 'eqîdenûsê edebiyata Kurdî yê yekem Ehmedê Xanî berhema xwe bi mebesta fêrîkirina dînê Îslamê bi Kurmancî ji bo zarokên gelê xwe nivîsiye. Ev armanc jî malikên jêrîn dikare bê fêmkirin:

Ku nezm kim ji bo van biçûkê 'ezîz
Rehet be li ser wan hîfîz kin temîz

Xwe hîn kin rewî kin bi emrê Xuda
Yeqîn wacib e her li ser bav û da

Li dû wan welîy yû weşî ey 'ezîz
Ku te'lîma zarwan bikin ew temîz (Korikî, 'Eqîdeya Îmanê, r. 7)

Her çiqas mebesta sereke, fêrîkirina zarokan be jî Korikî bala mezinan jî dikişîne ku sistî nekînin û bi van riknan emel bikin:

Eger çî me gotî ji bo zarûwan
Lê qeşda me 'am e heta kamilan

Çî mêr bin çî jin bin 'emel pê bikin
Ji vir pê de êdî ku sistî nekin (Korikî, 'Eqîdeya Îmanê, r. 7)

Her çiqas mijara sereke ya cureya 'eqîdenameyan "riknên îmanê" bin jî di hin berhemên de behsa şertên Îslamê û çendîn mijarên din jî tê kirin. Di menzûmeya Korikî de jî mijara sereke riknên îman û şertên Îslamê ne. Li kêleka van hin agahiyên din jî hene. Berhem ji beşa destpêkê, beşa sereke û encamê, bi beş û binbeşan tevahî ji pazdeh beşan pêk tê. Şêx

8 Ev agahî ji hêla kurê biçûk ê Şêx Qutbeddîn, Seyîd 'Ebdullah ve hatine dayîn.

9 Ji bo agahiyên berfireh ên di heqê vê berhemê de li xebata mastirê dikare bê nihêrtin: (Numan Yurt, "Eqîdenameyê Menzûm: *Hazîhî Hediyetu'l-Îxwan fî 'Eqîdetî'l-Îman* a Şêx Qutbeddînê Korikî", (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2019).

10 Celal Yıldız. Biraziyê Şêx Qutbeddînê Korikî û kurê Mele Bawedîn e.

Qutbeddînê Korikî jî bûye şopînerê Ehmedê Xanî û ‘eqîdenameya xwe bi teşeya mesnewiyê bi behra muteqarib a “Fe‘ûlun, fe‘ûlun, fe‘ûlun, fe‘ûl” nivîsiye. Korikî ‘erûzê bi awayekî serkeftî bi kar aniyê. Nimûneyek ji malikên ‘eqîdenameyê ji bo bikaranîna ‘erûzê:

Fe‘û lun fe‘û lun fe‘û lun fe‘ûl

Şukur bo / te ya Reb / Xudaê / Kerîm

Muşerref / te kir min / bi dînê / qewîm (Korikî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 1)

2.2. Mewlûdname

Korikî mewlûdnameyek bi destxeta xwe nivîsiye lê belê neqadandiye.¹¹ Mewlûd, peyveke ‘Erebî ye û di ferhengê de tê wateya “cih û dema jidayikbûnê.” Mewlûdname ew metnên dînî-edebî ne ku bi Cenabê Pêxember re têkildar in. Di huner û edebiyata Îslamî de ji merasimên ku ji bo salvegera jidayikbûna Cenabê Pêxember tên kirin re tê gotin û navê wan berhemên hevpar e ku bi mebesta li van merasiman bîn xwendin hatine nivîsîn (Özel, 2004).

Mewlûdnûsî di edebiyatên gelên Misilman de bûye kevneşopiyek. Di tarîxa edebiyata Kurdî de bi qasî tê zanîn cara yekem Mela Huseynê Bateyî di vî warî de berhemek nivîsiye. Melayê Bateyî bi vê berhema xwe di edebiyata Kurdî de bûye pêşengê cureya mewlûdnameyê. Nivîskarên ku ji Bateyî vir de mewlûdnameyan nivîsîne dane pey şopa wî. Ev berhem di medreseyên Kurdîstanê de jî hatine xwendin û niha jî di nav civaka Kurdan de girîngî û rêzeke mezin ji xwendina mewlûdê re heye. Mela Mehmûdê Bayezîdî jî di berhema xwe ya ku li ser rewresmên Kurdan nivîsiye de amaje bi vê adetê dike û dibêje: *Ew jî mewlûd didine xwendin* (Bayezîdî, 2010: 66).

Mewlûdnameya Korikî, ji 85 malikan pêk tê û bi teşeya mesnewiyê, bi qalibê ‘erûzê yê behra remel “Fa’îlatun Fa’îlatun Fa’îlun”ê hatiye honan. Malika destpêkê û ya dawî ya mewlûdê wiha ye:

Hemd û şukur hem şenaê bê ‘eded

Roj û şeva daîm j’bo Rebbê Şemed (Korikî, Mewlûd, r. 1)

Ref’et û ta’et hidayet bûn yeqîn

Hem se’adet hem şefa’et in çunîn (Korikî, Mewlûd, r. 11)

Heke di edebiyata Kurdî ya klasîk de wek pêşengê cureya mewlûdnameyê berhema Mele Huseynê Bateyî esas bê girtin û digel nivcomayîna mewlûda Korikî berawirdiyek bê kirin encamên wiha dertên holê:

Korikî jî wekî Bateyî mewlûdnameya xwe bi heman qalibê erûzê nivîsiye. Mewlûdnameya Bateyî ji nozdeh beşan pêk tê (Bateyî, 2012: 5). Korikî mewlûdnameya xwe dabeş nekiriye. Di şûna dabeşkirinê de mijar di nav malikan de honandine. Bateyî bi navê “*Hemdê Xwedê*” beşa destpêkê nivîsiye. Korikî di destpêkê de bê sernav di navbera malikên 1-14an de “Hemd û sena”yê ji Xwedê re kiriye. Bateyî bi navê “*Pesnê Pêxember*” beşek terxan kiriye. Korikî di navbera malikên 15-28an de “*Pesnê Resûlê Xwedê* (s.x.l.)” daye. Bateyî bi navê “*Xêra Xwendina Mewlûdê*” beşek nivîsiye. Korikî di navbera malikên 29-77an de behsa “*Xêra xwendin û dana mewlûdê*” kiriye. Bateyî bi navê “*Afîrandina Nûra*

11 Vê agahiyê kurê Şêx Qutbeddîn, Seyîd ‘Elî daye me.

Pêxember” beşek nivîsiye. Korikî jî bê sernav di navbera malikên 78-85an de dest bi mijara “Afirandina Cenabê Pêxember” kiriye û berhem li vir bi dawî bûye. Bateyî di malika dawî ya her beşê de malika jêrîn dubare kiriye:

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin: es-selat (Bateyî, Mewlûd, r. 40)

Korikî her çiqas berhema xwe dabeş nekiribe jî di dawiya her beşê de dubareya li jêrîn nivîsiye:

Ger dixwazin wan cennatê ‘aliyat
Pur bixunin ser Muḥemmed eş-şelat (Korikî, Mewlûd, r. 3)

2.3. Helbestên Wî

Wekî ku me berê jî behs kiribû di pirtûkxaneyê Şêx Qutbeddînê Korikî ya taybet de gelek pirtûkên destxet hebûne û em texmîn dikin ku di nav van de dê hin helbestên din ên Korikî hebin. Mixabin em gihîştin tenê sê helbestên Korikî yê Kurmancî. Em dixwazin li vir bi kurtî li ser şikl û cûreyên van helbestan rawestî û di vî warî de agahîyan bidin.

2.3.1. Şikl û Cûreyên Helbestan

Helbesta Yekem: Ev helbest bi terzê xezela musemmetê hatiye nivîsîn û ji 12 malikan pêk tê. “*Xezela musemmet cureyek ji xezelê ye û hemû taybetmendiyên xezelê di xwe de dehewîne. Lê di xezelên musemmet de beytên xezelê di nav xwe de jî bi serwa ne ku dema mirov wan serwayan li bin hev bîn rêz bike murebbayek derdikeve meydanê*” (Adak, 2014: 416). Wezna xezelê “Mustef ‘ilun Mustef ‘ilun Mustef ‘ilun Mustef ‘ilun” (recez) e. Malika yekem û ya dawî ya xezela Korikî:

Min dî bi xef weqta seher selwa şepal zêrînkemer
Meşya di burcê hate der ker kir dilim ev rengciger

Şehzadeya nazîkqeba hatî bi lez teşbîhi ba
Go: **Xakî**ym şed merheba qewlen feşîhen mu‘teber (Korikî, Mîn Kelamî’l, r. 1-4)

Helbesta Duyem û Sêyem: Her du helbestên din li ser pesnê Şêx Muḥemmed Se‘îdê Cizîrî ne û bi teşeya muxemmesa mutekerrîr hatine nivîsîn. Wateya eslî ya muxemmesê “tiştên ku pêncîne, pênc koşeyî” ye. Wek têgeheke edebiyatê, navê wê şiklê nezmê ye ku ji bendên pênc rist pêk tê. Ristên dawî yê bendan ku wekî hev bê dubarekirin ji vî cûreyê muxemmesan re “muxemmesa mutekerrîr”, neyê dubarekirin “muxemmesa muzdewîc” tê gotin (Saraç, 2015: 123). “*Di şeweya muxemmesa mutekerrîr de her pênc misrayên benda yekem hemserwa ne, yanî benda yekem muserre’ e. Di bendên dî de her çar misrayên pêşî bi awayên cuda hemserwa ne, misrayên dawî jî dubareya misraya dawî ya benda yekem e. Ev şewe dibe “muxemmesa mutekerrîra kit a asayî.”* (Adak, 2019: 412-413). Korikî her du helbestan jî bi qalibê ‘erûzê (behra remel) yê “Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilatun Fa‘ilun”ê honaye. Benda yekem û ya dawî ya muxemmesa ku ji heft bendan pêk tê:

‘Îd e û newroz mubarek bit li te Şahê Se‘îd
Şed tehiyyat û selamê Xaliqê ‘Erşê Mecîd

Mislê baranê bibarin kulle weqtin bi'ş-şedîd¹²
Da'efe'l-lahû muða'ef¹³ ew li ser Seyda Se'îd
Murşidê min rehberê min el-eman Şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 12)

Ateşê û şewq û muhebbet fi'q-çemîrî¹⁴ bûn herîn
Dağ û derdê dil gedar in jê dizên her ab û xwîn
Sail e her dem li dergah Qutbuddînê pir muhîn¹⁵
Mehderek bo wî bibexşe 'inde fexri'l-murselîn¹⁶
Seyyidê min rehberê min el eman Şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 15)

Benda yekem û ya dawî ya muxemmesa ku ji 11 bendan pêk tê:

Min heye şahek ji şeyxan pur wefadar û kemal
Aşifê textê zeman e ew ji bo ehlê dila
'Alimê memlû' ji 'ilmê axiz e j'nûra Celal
Menbe'a ava heyat e ew ji bona waşila
Înnehu durrun ferîdun amir e b'emrê Xuda¹⁷ (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 5)

Qutbê dehra me ye Şeyda ew 'ezîzê Mişr û Şam
Dîn û mecnûn mîn hewahû şahîbê haze's-suûr
Bigre ewwel tu ji ewwel summe's-şanî we's-selam
Edatu't-te'rîfî edxîl îsmê nazim bû zuhûr
Înnehu durrun ferîdun amir e b'emre Xuda (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 11)

3. Kesayetiya Wî ya Edebî¹⁸

3.1. Şexsên ku Bandor li Şêx Qutbeddînê Korikî Kirine

Piraniya helbestvanên klasîk çî ji aliyê edebî ve çî jî ji aliyê alema xwe ya derûnî ve be di nivîsîna berhemên xwe de hin kesayetiyên navdar ji xwe re kirine rêber û ew şopandine. Çawa ji aliyê şikl û naverokê ve berhem hatibin dubarekirin herwiha jî ji aliyê şewazê ve jî hatine teqlîdkirin. Dibe ku sedema vê bandorê tenê ne ji aliyê edebî ve, ji têkiliyên şexsî be jî. Di jîyan û berhemên Şêx Qutbeddînê Korikî de em rastî bandora hin kesayetiyên girîng ên dînî yan jî dînî-edebî hatin. Nemaze di berhemên Korikî de bandor û şopên gelek helbestvan û berhemên wan ên sereke tên dîtin. Ciyawaziyeke Xakî ew e ku ji helbestvanên cihê û berhemên cihê parçeyan wergirtiye û bi awayekî têkel di helbesta xwe de honaye. Di vê beşê de li gorî kronolojiya tarîxî behsa bandora hin kesayetên girîng û berhemên wan li ser kesayetî û berhemên Korikî hatiye kirin.

12 Wekî baranê bibare "her dem wiha bişid".

13 Xwedê zêde bike.

14 Di dilê min de.

15 Parsek e her dem li dergah Qutbeddînê pir "kêm, biçûk, qels."

16 Li cem fexrê pêxemberan wate, Resûlullah.

17 Ew durr e, yekî tenê ye, bi emrê Xweda emir dike.

18 Di vê beşê de hin agahiyên nû li agahiyên tezê hatine zêdekirin.

3.1.1. Mela Ehmedê Cizîrî

Edebiyata Kurdî ya klasîk di serdema mîrektiyan de di asta herî bilind de ye û gelekî berhemdar e. Melayê Cizîrî jî di vê atmosfera gunçaw de jiyaye, bûye mamoste û pêşengê edebiyata Kurdî ya klasîk. Cizîrî li gelek helbestvan an peyrewên xwe bandor kiriye. Korikî jî di bin bandora wî de maye û nezîreyeke ku ji aliyê teşe, kêş û şêwazê ve dişibihe xezela Melayê Cizîrî (Cizîrî, 2013: 292-294) nivîsiye. Malika yekem û ya dawî ya xezela Cizîrî:

Xelko li min kin şîretê ew dilbera zêrînkemer
Min dî di halê xefletê hate der ji bircê wek qemer

Zahir dibêjim pendîgir da dil nedî zulfa herîr
Şubhê Melê dimînî esîr guhderê qewlê mu'teber

Malika yekem û ya dawî ya xezela Korikî jî wiha dest pê dike:

Min dî bi xef weqta seher selwa şepal zêrînkemer
Meşya di burcê hate der ker kir dilim ev rengçiger

Şehzadeya nazîqçeba hatî bi lez teşbîhi ba

Go: Xakîyim şed merheba qewlen feşîhen mu'teber (Korikî, Mîn Kelamî, r. 1-4)

Korikî jî wekî Cizîrî xezela xwe bi qalibê 'erûzê yê behra recez bi "Mustef 'ilun Mustef 'ilun Mustef 'ilun Mustef 'ilun"ê honaye. Korikî dîsa xezela Melayê Cizîrî ya jêrîn ji xwe re mînak:

'Îd e û her kes ji dîdara te lê pîroz e 'îd
Ez tinê mehrûmê dîdar im bi sed menzil be'îd

Dergehê lutfâ te xanim ma li mehrûman vebî
Inne kelben basiten dehren zira'en bi'l-wesîd

Er bi kuştî wer bi hiştin emr û fermana te bit
Ahmed **'ebdun reqîqun waqifun beyne'l-'ebîd** (Cizîrî, Dîwan, r. 282-284)

Korikî di muxemmesa xwe ya jêrîn de hem hin komepeyv û ristan ji xezela Cizîrî wergirtiye û hem jî bi heman weznê wate, "Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun"ê nivîsiye:

'Îd e û her kes mufferreḥ ez tenê bê çare bûm
Karê 'alem 'îş û 'îşret karê min ḥuzn û humûm
Rûreşê şerma gunah im lew ji ḥedret dûr(i) bûm
Raciye lutfâ te şahim ez di zenban gerq(i) bûm
Seyyidê min rehberê min el eman Şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 12)

Ya Se'îden, Ya Se'îden Ya Se'îden Ya Se'îd
Înnî kelbun basiṭun dehren zira'ey bi'l-wesîd¹⁹
Ente qutbun ente ferdun ente şemsun ez 'ebîd²⁰
Înnenî **'ebdun zaifun waqifun beyne'l-'ebîd**²¹

19 Îqtîbas ji ayeta Kehf/18. Ez ew kûçik im ku piyê xwe li devê deriyê te dirêjkirî sekinî me.
20 Tu qutb î, yekî tenê yî, roj î; ez bendeyê te me.

Murşidê min rehberê min el eman Şahê Se îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 14)

Bi giştî ji van helbestên ku hatine dayîn û ji gelek parçeyên biçûk ên ji wergirtinên dîwana Cizîrî jî diyar e ku Nîşanî çiqas bandoreke bihêz li Xakî kiriye.

3.1.2. Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî di tarîxa edebiyata Kurdî de kesayetiyekî gelekî girîng e ku bandoreke xurt li peyrewên xwe kiriye. Tenê ne ji aliyê ramanên xwe ve her wiha ji aliyê taybetmendiyên berhemnûsiya xwe ve jî bûye pêşeng û mînak. Bi qasî ku tê zanîn destpêkerê ‘eqîdenûsiya Kurdî ye û yê din hemû li ser şopa wî ne. Dikare bê gotin ku ‘Eqîdeya Îmanê ya Xanî fihriste ye ji bo ‘eqîdenûsên peyrewên xwe. ‘Eqîdenameya Xanî bi sedsalan di medreseyan Kurdan de wek pirtûkeke dersê hatiye xwendin û jiberkirin (Çiçek, 2009: 47). ‘Eqîdenûsên li pey wî ji berê heta bi roja me hem ji aliyê naverokê ve hem jî ji aliyê ziman, teşe û şewazê ve Xanî şopandine. Şêx Qutbeddînê Korikî jî ji van şopîneran yek e. Di ‘eqîdenameya Korikî de hem ji aliyê honana mijar û şewazê ve hem jî ji aliyê teşeyê ve rêçên Xanî tên ditîn. Korikî wekî Xanî ‘eqîdenameya xwe bi heman teşe û qalibê ‘erûzê tefileyên “Fe‘ulun fe‘ulun fe‘ulun fe‘ulun”ê nivîsiye. Ji bo mînak Xanî wiha nivîsiye:

Li wî ra nebûrîne weqt û zeman

Ne sal û ne meh û ne hîn û ne an (Xanî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 70)

Korikî her du ristên li jêr jî bi şewaza Xanî honaye:

Di her sal û mah û we şehîr û we an

Di her hîn û lehze zeman û mekan (Korikî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 4)

Ehmedê Xanî di ‘Eqîdeya Îmanê de mijara sifetên subutî yê Xwedê wiha dide:

Sifatê di seb‘e ji bo Zu‘l-Celal

Bizan heft in ey ‘arifê purkemal

Xweşî, Şîn û Zanîn û Vîn û Kalam

Bihîstin digel Dîtinê bûn tamam (Xanî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 73)

Korikî di ‘eqîdenameyê de bi malika jêrîn dest bi sifetên Xwedê yê subutî dike. Bi şewaza Xanî bi termînolojiyê Kurdî van sifetan rêz dike:

Şifatê kemalî hene j’bo Xuda

Ji wan heft qedîm in jê nabin cuda (Korikî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 9)

Sifetên Xwedê yê subutî ku Xanî di ‘Eqîdeya Îmanê de bi termînolojiya Kurdî nivîsiye û ya Korikî ku di ‘eqîdenameya xwe de rêz kiriye bi vî şiklî ye:

Navlêkirina Xanî

1. Xweşî
2. Şîn
3. Zanîn
4. Vîn

Navlêkirina Korikî

- Saxî
- Quwwet
- Zanîn
- Vîn

- | | |
|-------------|----------|
| 5. Kelam | Xeberdan |
| 6. Bihîstin | Bihîstin |
| 7. Dîtin | Dîtin |

3.1.3. Mela Huseynê Bateyî

Kesayetiyekî din ê girîng ku bandor li peyrewên xwe kiriye Mela Huseynê Bateyî ye. Bateyî nûnerekî dînî-edebî yê edebiyata Kurdî ye û bi berhema xwe ya cureya mewlûdnameyê bûye mînak ji bo peyrewên xwe. Wekî gelek mewlûdnûsên Kurd, Şêx Qutbeddînê Korikî jî Bateyî ji xwe re kiriye mînak û hem di 'eqîdename û hem jî di mewlûda xwe de ji *Mewlûda* wî sûd wergirtiye. Ji bo nimûne Bateyî di *Mewlûda* xwe de di beşa Întiqala Nûra Pêxember de pêşiyên Muhemmed (s.x.l.) rêz dike:

Jêrê 'Ednan ta bi 'Ebdullah guhist
Bîst û yek bab in hemî rast û durist

Silsila wî ta bi Adem da û bab
Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab (Bateyî, *Mewlûd*, r. 30-32)

Korikî jî di 'eqîdenameyê de di binbeşa *Fî Mebhesî Neslihî We Be'dî Ewşafîhî* de wekî Bateyî pêşiyên Cenabê Pêxember (s.x.l.) rêz dike:

Ebî Me'dî 'Ednan tamam tu bizan
Biçin cennetê bê hîsab û mîzan

Evan bîst û yek bavê min gotine
Yeqîn ke muheqqeq xîlaf tê tune (Korikî, 'Eqîdeya Îmanê, r. 13)

Şêx Qutbeddînê Korikî di mewlûda xwe de jî Bateyî ji xwe re kiriye mînak. Ji bo nimûne Bateyî di beşa *Hemdê Xwedê* de wiha gotiye:

Ew Xwedayê bènazîr û Zu'l-celal
Bêmîsal û bêheval û bêzewal (Bateyî, *Mewlûd*, r. 10)

Korikî malika jêrîn bi şewaza Bateyî honaye:

Ew Xudaê bêzewal û bêwezîr
Bênezîr û bêmîsal û bê'eşîr (Korikî, *Mewlûd*, r. 1)

Bateyî di dawiya her beşê de malika jêrîn dubare kiriye:

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin: es-selat (Bateyî, *Mewlûd*, r. 11)

Malika dubareyê ya Korikî jî wiha ye:

Ger dixwazin wan cennatê 'aliyat
Pur bixwunin ser Muhemmed eş-şelat (Korikî, *Mewlûd*, r. 3)

Malikên her du berheman jî bi qalibê 'erûzê yê "Fa'ilatun Fa'ilatun Fa'ilun"ê hatine ristîn. Gelek mînakên din dikare bê dayîn lê belê tenê ji van taybetmendiyên hevpar jî diyar e ku Korikî daye pey şopa Bateyî.

3.1.4. Mela Xelîlê Sêrtî

Mela Xelîlê Sêrtî ku bi mexlesa “Şewqî” tê zanîn kesayatiyekî girîng û xwedî berhem ê edebiyata Kurdî ya klasîk e. Berhema wî ya bi navê *Nehcu’l-Enamê* ku li ser ‘eqaîd û exlaqê hatiye nivîsîn nimûneyeke edebiyata dînî ye û di medreseyên Kurdistan de ji bo perwerdehiya xwendekaran wek pirtûka dersê hatiye bikaranîn. Korîkî çawa ku ji Xanî sûd wergirtiye her wiha di ‘eqîdenameya wî de şopên Mela Xelîlê Sêrtî jî tên dîtin. Ji bo nimûne Mela Xelîlê Sêrtî di *Nehcu’l-Enamê*, *Behsa Rîsaletê* de wiha gotiye:

Ji nesla Qureyş e ji tuxmê ‘Ereb
Nubuwwet di sala çilî dayê Reb

Ji Mekkê ku balî Medîne ve çû
Li wê deh buwar in ji dinyayê çû (Sêrtî, *Nehcu’l-Enam*, r. 24-25)

Korîkî jî di beşa *Fî Mebhêşî Neslîhî We Be’dî Ewşafîhî* de wiha behsa wesfên Cenabê Pêxember (s.x.l.) kiriye:

Ji nesla Qureyş e we Haşim hebîb
Bi eşlen ‘Ereb tu bizan ey lebîb

Ji Mekkê bi balê Medîne ve çû
Li wê der wefat kir ji dunyayê çû (Korîkî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 10-11)

Mela Xelîlê Sêrtî di *Behsa Şemalê Muhemmed* de wiha gotiye:

Ne reş bû sipîsorekî esmerî
Mudewwer bû wech û rihên enwerî

Bi roj û bi şev hem li pêş û li pîş
Wekî yek didî haşa inkâr û haş (Sêrtî, *Nehcu’l-Enam*, r. 25)

Korîkî jî dîsa di beşa *Fî Mebhêşî Neslîhî We Be’dî Ewşafîhî* de wiha behsa şemalê Cenabê Pêxember (s.x.l.) kiriye:

Ne reşkî qemer bû Şehê Enwerî
Ne kej bû sipîşorekî esmerî (Korîkî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 11)

Ji pêş û ji paş ve muheqqeq yeqîn
Weke hev didî wî Resûlê Emîn

Bi roj û bi şev hem di tarî yû nûr
Wekî yek didî wî Nebiyyê şebûr (Korîkî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 10)

Digel minakên ku me bi berawirdî dan gelekên din nîşaneyê bandora Şewqî li ser Korîkî ye.

3.1.5. Şêx Ebdurehmanê Aqtepî

Piştî serdema mîrektiyan wek mekan Aqtep ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk bûye navend û nûnerên wî jî bûne danêrê ekoleke edebî. Bi giştî nûnerên ekola Aqtepîyan, nemaze jî Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ku bi mexlesa “Rûhî” tê nasîn bandoreke bihêz li peyrewên xwe û

edebiyata Kurdî ya klasîk kiriye. “*Di nav nûnerên ekola Aqtepiyan de nemaze Şêx Ebdurehmanê Aqtepî bi reseniya berhem û şêwazeya xwe ya edebî xwedî cihekî taybet e*” (Adak, 2015). Du berhemên girîng ên Rûhî ku bi kurmançî nivîsiye hene: Rewdu’n-Neîm û Dîwan. Rûhî bi van her du berhemên xwe “*wek helbestvanekî dahêner bandor li gelek helbestvanên pey xwe kiriye.*” (Adak, 2017). Aqtepî jî piştî jiholêrabûna mîrektiyên Kurdan ji gelek edîbên Kurd re bûye mînak. Şêx Qutbeddînê Korikî di bin bandora Aqtepiyan de jî maye û di destpêka ‘eqîdenameya xwe de yan beşa ku “sebebê telîfê” aniye zimên de di rîstekê de wiha dibêje:

Wekî Şeyxê Aqtep me go çend kelim

Teberruk bibin em bi wan wesselam (Korikî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 2)

Di ‘eqîdenameyê de ne diyar e ku Korikî ji nûnerên ekola Aqtepiyan behsa kîjanî dike. Adak ji bo bandora Şêx Ebdurehmanê Aqtepî li ser Korikî wiha dibêje: “*Şêx Qutbedîn ji aliyê edebî ve li pey şopa Şêx Ebdurehmanê Aqtepî çûye. Lewra di vê berhema wî de bi terzê “Wekî Şeyxê Aqtep me go çend kelim...” îfadeyên wî hene.*” (Adak, 2012: 447). Zinar ji bo bandora Aqtepî li ser Korikî dibêje ku: *Şêx Qutbedîn, Şêx Ebdurehmanê Aqtepî bo xwe kiriye mînak û weha domandiye: Wekî Şeyxê Aqtep me go çend kelim...* (Korikî, 2017: 3) Ji bilî ‘eqîdenameyê dema li helbestên Korikî jî bê nihêrtin bi hêsanî dikare bê gotin ku di helbestên xwe de carinan ji hevok û peyvên helbestên curbicur ên Aqtepî sûd wergirtiye carinan ji hêla şêweyê ve Rûhî teqlîd kiriye. Korikî carinan jî ji xalên cuda yên helbestên Rûhî sûd wergirtiye di helbestekê de civandiye. Heke rîsta yekem a muxemmesa Korikî ya ku li ser pesnê Şêx Seyda nivîsiye li ber çav bê girtin dikare bê gotin ku ev Aqtepî, Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye:

Yan bi xwe Keşşaf û Sawî yan **Rûhiyê Şemsuddîn**²²

Şibhetê Tebrîz û Se‘dî ku li meydan bim beda

Ne tenê ‘aciz deîf e ev esîrê dilbirîn

Bel hezar şubhê Ferezdeq ew li meydan bûn geda

Înnehû durrun ferîdun amir e b’emre Xuda (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 10)

Aqtepî wek alim û şêxekî Neqşebendî di helbestên xwe de bi pêsindarî behsa damezirînerê Neqşebendîtiyê, Şêx Bahaeddîn kiriye (Aslanoğlu, 2019). Ji bo nimûne di vê muxemmesa jêrîn de Aqtepî pesnê Şahê Neqşebend²³ daye û hawariya xwe gihandiyê:

Kelbê Şahê Neqşibend im; ta li dunya, zende me

Me‘dena cûd û sexa yî; ez, feqîr im, hewce me

Der-sulûkê rahê heq; ez, murxekî per-beste me

Bêhişê xemra gunah im, ‘asîyê şermende me

El-eman şahê mezin! Yexsîrê zencîra te me! (Aqtepî, Dîwan, r. 142)

Korikî jî bi heman şêweyê pesnê Şêx Seydayê Cizîrî daye. Muxemmesa Korikî ya ku bi rîsta “*Îde û newroz mubarek bit li te Şahê Se îd*” û muxemmesa din a ku bi rîsta “*Min heye şahek ji şeyxan pur wefadar û kemal*” dest pê dike ji aliyê mijar û şêweyê ve dişibihin

22 Nasnavê Şêx ‘Ebdurehmanê Aqtepî ye.

23 Hacı Muhemmed Bahauddîn el-Buxarî (j.718/1318- w.791/1389) Damezirînerê terîqeta Neqşebendîtiyê. Bnr. (Tanrikulu, 2016: 359)

muxemmesa Rûhî ya jorîn. Ji aliyê honana vegotinê ve jî bandora Rûhî li ser Korikî eşkere ye. Rûhî di helbestên xwe de girîngiyê mezîna daye aheng û melodyê. Wî di vê çarçoveyê de di gelek helbestan de neqerat bi kar anîne û cih daye hunera tekrîrê (Adak, 2017). Du nimûne ji berhemên Rûhî di heqê tekrîrê de:

Ya ‘Elîyya ya ‘Elîyya ya ‘Elîyya ya ‘Elî

Şod zî tîxî abîdared rûyê ‘alem muncelî (Axtepî, Dîwan, r. 48)

Huseyna Huseyna Huseyna Huseyn

Kuca Fatîme Murteza ‘eyne ‘eyn (Aqtepî, Rewdu’n-Ne‘îm, r. 283)

Korikî ji aliyê şeweyê jî di bin bandora Rûhî de maye. Bendek ji muxemmes û malîkek jî ji ‘eqîdenameya Korikî ku hunera tekrîrê bi şeweya Aqtepî bi kar aniye:

Ya Se‘îden, ya Se‘îden ya Se‘îden ya Se‘îd

Înnî kelbun basîţun dehren zira ‘ey bi’l-wesîd

Ente quţbun ente ferdun ente şemsun ez ‘ebîd

Înnenî ‘ebdun zaîfun waqîfun beyne’l-‘ebîd

Murşîdê min rehberê min el eman Şahê Se îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r.14)

Xudaya Xudaya Xudaya Xuda

Bi wî Ferdê Emced di weqtê me da (Korikî, ‘Eqîdeya Îmanê, r. 31)

Ji van mînanan jî diyar e ku Korikî, Rûhî teqlîd kiriye. Li gorî van agahiyan dikare bê gotin ku ev kes, Şêx Ebdurehmanê Aqtepî ye.

3.1.6. Şêx Muhammed Se‘îd Seyda Cizîrî

Şêx Muhammed Se‘îd Seyda yan Şêx Seyda ku bi leqeba “Emced” tê zanîn li devera Cizîrê kesayetiyeke girîng û xwedî dergah e. Dergahê Şêx Seyda ji aliyê silsileyê tesewîfî ve girêdayî dergahê Basretê ye û di sedsala XXan de li herêmê dergahekî zêde bibandor û berhemdar e. Dergahê Şêx Seyda li Cizîrê demeke dirêj bûye navendeke tesewîfî û li dora wî dergahî muhîteke edebî ava bûye. Di dergahê Şêx Seyda de li kêleka edebiyata tekyayê, lê ji wê zêdetir edebiyata dîwanê ya klasîk jî hebû. Li wir ew kesên ku ilmê medreseyê xwendibûn bi edebiyatê re meyildar bûn eleqeyê mezîna bi berhemên edebî nîşan didan (Adak, 2012: 465-485).

Şêx Seyda hem seydayê Korikî yê ilmî ye hem jî şêxê wî yê terîqetê ye û xelîfetî jî daye Şêx Qutbeddîn. Dergahê Şêx Seyda ji Şêx Qutbeddîn re bûye cihê cazîbeyê. Bandora Şêx Seyda li ser Korikî bi qenaeta me zêdetir ji aliyê me‘newî û ilmî ve ye. Korikî hem di çend cihên ‘eqîdenameyê de pesnê Şêx Seyda daye hem jî qesîdeyê bi ‘Erebî (Cezerî, 2015: 100) û du medhiyeyên ku tên zanîn li ser nivîsiye. Ji bilî helbestên Korikî nameyên ku Şêx Seyda ji Korikî re şandine (Cezerî, 2015: 191) jî tîkiliya Korikî û Şêx Seyda nîşan dide. Şêx Qutbeddîn ew ji xwe re wekî rêber, çavkaniya ilm û comerdîyê, xwedîyê halên pîr xerîb, ji dilê xwe re wekî tebîb, taca serê hemû alim, sofî û zahidan dibîne. Xuya ye ku Korikî hem ji aliyê alema xwe ya derûnî ve û hem jî ji aliyê atmosfera edebî ve zêde di bin bandora dergahê Şêx Seyda de maye. Der heqê bandora Şêx Seyda li ser Korikî de çend malîk ji ‘eqîdenameyê:

Xudaya Xudaya Xudaya Xuda
Bi wî ferdê **Emced**²⁴ di weqtê me da

Ewê tacê re'sê hemî 'aliman
Digel şeyx û sofî we hem zahidan (Korikî, 'Eqîdeya Îmanê, r. 31)

Di her du bendên muxemmesên jêrîn ên ku Korikî nivîsiye de jî bandora Şêx Seyda diyar e:

'Îde û newroz mubarek bit li te şahê Se'îd
Şed tehiyyat û selamê Xaliqê 'Erşê Mecîd
Mişlê baranê bibarin kulle weqtin bi'ş-şedîd
Da'efe'l-lahû muða'ef ew li ser **Seyda Se'îd**
Murşidê min rehberê min el eman şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r.12)

Ew şehê **Seydayê** enwer e me'dena şidq û şefa
Qaidê şer'a muçehher mañiyê zulm û cefa
Tu ji bo me afitab î ey munewwer ba wefa
Melhema derd û birînan mezherê ma qed xefa
Înehû durrun ferîdun amir e b'emre Xuda (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 6)

3.2. Mexlesên Wî

Mexles, bi kurtî navê edebî ye ku di edebiyata klasîk a Îslamî (edebiyatên 'Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî û yê dî) de ji aliyê helbestvan û naziman ve di helbest û menzûmeyan de hatiye bikaranîn (Adak, 2018). Mexles, ji bo naskirina kesayetiyên edîb gelek caran hin argumanan dide mirovî, bi piranî li gorî qarektera helbestvan tê bijartin û rê li ber tevliheviya helbestan digire (Pala, 2014: 294).

Şêx Qutbeddîn di berhemên xwe de nasnavên "Xakî", "Xakîyê Korikî", "Qutbuddîn" bi kar anîye. Carinan bi şiklê "Xakî", carinan jî wekî ravekekê "Xakîyê Korikî yan jî Xakîyê rûsiya" bi kar anîye. Xakî ji peyva "xak" û paşgira "î"yê pêk tê. Ji aliyê hevsengiya tef'îleya 'erûzê ve beramberî tef'îleya "fe'lun"ê tê. "Korikî" jî nîspeta cihê jidayikbûnê ye. Ev nîşaneyê peyrewiya kevnoşopiya helbesta klasîk e. Sê nimûne ji bo mexles û bikaranîna navê wî:

Digel cumleê mu'min û şaliq e
Ji bo **Xakîyê Korikî**'l-Fatihe (Korikî 'Eqîdeya Îmanê, r. 40)

Heşir ke evî **Qutbuddînê** heqîr
Di nav ehlê meşer meke wî esîr (Korikî 'Eqîdeya Îmanê, r. 35)

Şehzadeya nazikqeba hatî bi lez teşbîhi ba
Go: **Xakîyim** şed merheba qewlen feşîhen mu'teber (Korikî, Mîn Kelamî, r.4)

Şêx Qutbeddîn di benda dawî ya muxemmesa jêrîn de jî bi hunerê û awayekî veşarî navê xwe

24 Leqeba Şêx Seyda Muhammedê Cizîrî ye.

nivîsiye:²⁵

Qutbê dehra me ye Seyda ew ‘ezîzê Mişr û Şam
Dîn û mecnûn mîn hewahû şahîbê haze’s-sitûr
Bigre ewwel tu ji ewwel şumme’s-sanî we’s-selam
Edatu’t-te’rifê edxîl îsmê nazîm bû zuhûr
Înehû durrun ferîdun amir e b’emre Xuda (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 11)

Sedemê bikaranîna mexlesa “Xakî” çî ye em nizanin; lê belê dema li paşxaneyê jiyana Korikî bê nihêrtin, dikare li ser sedemên vê şîrove bîn kirin. Ji bilî wateyên sembol û mezmûnên ku di edebiyata klasîk de tîn bikaranîn ên ku tîn dîtin, wateyên wan ên dînî û tesewifî jî hene. Tevger û pêkhatiyên tesewifî, bûne xaleke ku bandor li wateya mezmûnên veşarî ku di helbesta klasîk de hatine bikaranîn, kirine (Levend, 2005). Hin sedemên der barê raveyên ku li ser wateya mexlesê, naveroka wê, bijartina wê, mebesta bikaranîna wê hwd. hatine kirin jî mesleka helbestvan bixwe...wesf û rewşên derûnî; çalakî û girêdanên dînî-tesewifî ne û pişt didin bûyereke sosret a girêdayî hal û rewşên hatine serê helbestvan (Tolasa, 2002: 234).

Şêx Qutbeddînê Korikî mirovekî hem ‘alim û muderis hem jî şêx û mutesewif bû. Ji ber vê, bandora çanda Îslamî û tesewifî li ser kesayetiyê wî ya edebî eşkere ye. Mexlesa Korikî li gorî nêrîna me mîzaca wî nîşan dide û Korikî bi bikaranîna mexlesa “Xakî” îşaretî esl/havênê mirovî dike, li xwe tîne ku ji axê hatiye afirandin û dîsa dê vegere bin axê. Çawa ku mirov dixwaze xeta û qisûrên xwe bitemere bin axê, xwe paqij bike; Korikî jî di gelek cihan de xwe gunehkar û bi qisûr dibîne, bi vê nîspetê gaziya xwe bal Xwedê ve dike:

Xudaya tu Xakî mu‘ezzeb nekî
Di tirbê bi min re bi rehîma xwe kî (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r. 34)

3.3. Zimanê Wî

Tesbîtkirina daneyên zimên û şeweya kesayeteke edebî bi awayekî birêkûpêk girêdayî qewareya berhem an koma berhemana e. Ev jî di edebiyata klasîk de bi nirxandina dîwanekê yan helbestên ku bi teşeyên curbicur hatibin nivîsîn pêkan e.

Şêx Qutbeddînê Korikî ne xwedî dîwan e. Ji bilî ‘eqîdenameyê mewlûdeke neqediyayî û tenê sê helbestên wî li ber dest hene. Ji bêr vê yekê nirxandina taybetmendiyên zimên û şewaza Korikî dikare bi berfirehî pêşî li gorî berhema wî ya ‘eqîdenameyê pişt re jî li gorî mewlûdname û her sê helbestan bê kirin. Berhema Korikî ya nimûneya cureya ‘eqîdenameyê ji aliyê qewareyê ve berfireh e. Lê ji ber ku di ‘eqîdenameyan de mebest zanist e ev cure berhem ji aliyê estetîzma edebî ve lawaz in û di rengvedana taybetmendiyên zimên de zêde ne libar in.

Korikî ji bilî xwendina xwe ya medrese û terbiyeya terîqetê piraniya temenê xwe li derdora Batmanê derbas kiriye. Batman ji ber ku cîwarekî nû ye û koçberên ji herêmên derdor li vir niştecîh bûne devokeke xwerû peyda nebûye. Her çiqas pêşiyên Şêx Qutbeddînê Korikî ji herêma Torê bin jî ji ber ku ji bav û kalan ve li derdora Batmanê niştecîh bûne devoka

25 Şêx Qutbeddîn di vir de bi peyva serê rista yekem û ya duyem îşaretî navê xwe kiriye. Dema bêjeyên “Qutbê” û “Dîn” ê li bin hev bîn rêzkirin navê “Qutbuddîn” dertê holê.

malbatê guheriye û şopa devoka Torê ji holê rabûye. Her çend di nav hînterlanda Batmanê de ergatîvî -ji bilî herêma Torê- tîk çûbe û Korikî li vir jiyabe jî dîsa jî di warê ergatîviyê de berhemên wî serkeftî ne. Korikî hevokên xwe li gorî rêzikên ergatîviyê bi kar anîne. Ji bo nimûne di malika jêrîn de forma “Te (ez) anîm” hatiye bikaranîn:

Şukur bo te ya Reb Xudayê Wedûd

Ji ewwel tune bûm **te anîm** wucûd (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r. 1)

Di malika jêrîn de ji ber ku hevok dema borî ye û lêker gerguhêz e, lêker li gor bireserê hatiye kişandin:

Me tewbe ji van zembê pîs ê muhîn

‘**Efîdî** bi newbet **nivîsî** yeqîn (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r.39)

Korikî di berhemên xwe de taybetmendiyên devokekê bi eşkereyî bi kar neaniye. Zimanê wî tîkel e. Di hin malikan de peyvên ku li derdora Batmanê û Xerzan tîk bikaranîn tîk dîtin. Ji bo mînak peyva “cih”ê bi şiklê “cî”yê, peyva “axaftin”ê bi şiklê “xeberdan”ê, peyva “sih”ê bi şiklê “sî”yê, peyva “din”ê bi şiklê “dî”yê bi kar aniye. Ji bo nimûne:

Munezzeh ji **cî** yû mekan û we mal

Li her **cî** bizan hêzî e Zû’l-celal (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r. 9)

Kelam e bi me‘na **Xeberdan** exî

Li ba te xelet tî nebe ey şefî (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r. 9)

Bandora devoka Cizîrê jî li ser zimanê Korikî çêbûye. Ji ber vê Korikî di berhemên xwe de ji devoka Botan û Behdînanê sîd wergirtiye:

Bi **ezmanê** Eşhed dibêjim we hem

Di qelb de muşeddiq we îqrar e hem (Korikî ‘Eqîdeya Îmanê, r. 8)

Serxweşê silka terîq im ez bi cama Eħmedî

Badeya aba heyatê ku bi kasa xalidî

Bi te şubbet fi’ d-dihanî hem bi destê Seyyidî

Dê tereb **bit** qelb û balim muncelî **bit** ebedî

Seyyidê min rehberê min el eman Şahê Se‘îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 14)

Korikî ‘eqîdename û mewlûda xwe bi zimanekî sade û herikbar nivîsiye. ‘Eqîdename ji ber ku fêrkirina biçûk û mezinan kiriye armanc û mewlûd jî kevneşopiyeye gelî ye asta zimanê van jî li gorî têgihîştina gelî ye. Di her du berheman de Kurdî û ‘Erebî serdest in. Li gorî her du zimanan kêmbê jî peyv an tîgehên Farisî jî tîk dîtin. Bi giştî dema li peyvên ku di her du berheman de hatine bikaranîn bê nihêrtin tîk dîtin ku rêjeya bikaranîna peyvên Kurdî ji sedî nêzî 55-60, yê ‘Erebî li derdora ji sedî 35-40; ji sedî 5-10 peyv jî Farisî ne.

Hin nimûne ji peyvên Kurdî yê resen ku Korikî di berhemên xwe de bi kar anîne: civîn, xeml, newroz, jar, hewar, xak, bîr, bêguman, guhdar, rûreş, dilbirîn, hûrehûr, xwestek, gêj, sistî, germî, kej, şepal, zarî, hevraz, neqencî, berjêr, piştxwar, jimar, mizgînî...

Di qadeke ilmî de çêkirina peyvên resen bi zimanê Kurdî ne hêsan e. Digel vê Korikî hewl daye ku sifetên subutî yê Xwedê bi termînolojiyeye Kurdî saz bike û digel ‘Erebî Kurdîya wan jî daye. Berawerdkirina sifetên subutî yê Xwedê di berhema Xanî û Korikî de:

Sifetên Xwedê bi Erebî

1. Heyat
2. Qudret
3. ‘Ilm
4. Îrade
5. Kelam
6. Sem‘
7. Besar

Navlêkirina Korikî

- Saxî
- Quwwet
- Zanîn
- Vîn
- Xeberdan
- Bihîstin
- Dîtin

Korikî di beşa xatîmeyê ya ‘eqîdenameya xwe de ji Hz. Muhemmed dest pê kiriye û heta Şêx Muhemmed Se‘îd Seyda Cizîrî sîlsileya şaxa Basretê ya Neqşî-Xalidî biriyê. Jêdera vê munacatê dîwana Mewlana Xalidê Şehrezorî ye û zimanê munacatê Farisî ye. Şehrezorî ji Cenabê Pêxember dest pê kiriye û heta Ebdullahê Dehlewî sîlsileya şêxên terîqeta Neqşebendîtiyê rêz kiriye. Hin kesayetên ku navên wan di vê sîlsileyê de derbas nabin lêbelê ji hela erbabên terîqetê ve rêz ji wan re tê girtin û girîngî bi wan tê dayîn (Bağdadî, 2013: 35) jî di munacatê de hene. Korikî tevî çend guherînan vê munacatê wergerandiye Kurdî. Wî ev sîlsile li gorî şeweya xwe di duaya xwe de bi cih kiriye.

3.3.1. Unsurên ‘Erebî, Farisî û Tirkî

Di edebiyata klasîk de ji bilî zimanê sereke ku berhem pê hatine nivîsîn ‘Erebî û Farisî serdest in û bandoreke mezin li zimanê helbestvanan kirine. Şêx Qutbeddînê Korikî jî di berhemên xwe de ji bilî Kurdî hakimê zimanê ‘Erebî ye. Hinek Farisî û di cihekî de jî peyveke bi Tirkî bi kar aniye.

Hin nimûne ji peyv û têgehên ‘Erebî ku Korikî di berhemên xwe de bi kar anîne: Îbtîda, Surûr, seqîm, ‘uqûd, ‘ewnet, xîtam, cînan, mewcûd, keîb, xebîs, zulmat, ‘ereq, cûd, mudewwen, telamîz, firaş, lacerem, rağimê enfê ‘enîd, hamilê wehyê, behra ‘emîm, yewmî’l-kemed, nez‘a helqûm, berqê xatîf, sifru’l-yed hwd. Korikî di hin helbestên xwe de ristan bi tevahî bi hevokên ‘Erebî honaye. Ji bo nimûne:

Ya Se‘îden, Ya Se‘îden Ya Se‘îden Ya Se‘îd

Înnî kelbun basişun dehren zira‘ey bi’l-wesîd²⁶

Ente qutbun ente ferdun ente şemsun ez ‘ebîd²⁷

Înnenî ‘ebdun zaîfun waqifun beyne’l-‘ebîd²⁸

Murşîdê min rehberê min el eman Şahê Se îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 14)

Korikî di berhemên xwe de kême be jî cih daye peyv û têgehên Farisî jî. Ji bo nimûne: afitab, geda, çunan, ba, çihar, rûsiya, şeh, şehzade, şahê merdan, mah, fîgan, pêşîwayê huda, gar, dergevan, şehînşeh, gunah, nazidar, birader, girdîgar, serdefter, padîşahê huda, rehber, atêş, taremûr, dêm, lêb, cerg, hwd. Nimûneyek ji malikeke xezela wî ji bo peyvên Farisî:

Hesîr kirim **şêrînlêbê** şuhtim bi şewqa **ğebğebê**

Tîr dane dil roj û **şebê** lew **pare pare** bû **ciger** (Korikî, Mîn Kelamî’l, r. 1)

Korikî bi Tirkî bi qasê ku me tesbît kiriye tenê peyv “kalın”ê ya Tirkî bi şiklê “qalind”ê ku di Kurdî de jî tê dîtin bi kar aniye:

26 Ez ew kûçik im ku piyê xwe li devê deriyê te dirêjkirî sekinî me.

27 Tu qutb î, yekî tenê yî, roj î; ez bendeyê te me.

28 Ez ‘ebdekî qels im li nav ‘ebdên din rawestiya yî.

Nebû Fexrê ‘Alem dirêj û zirav
Ne kin bû ne **qalind** bi kil bûn du çav

3.3.2. Hunerên Edebî

Ciwankarî di edebiyata klasîk de hêmanekî bingehîn e ku estetîzma berhemên edebî derdixe pêş. Mebesta berhemên Korikî yê menzûm -‘eqîdename û mewlûdname- ji ber ku ne huner e ji aliyê ciwankariyan ve qels in. Lê belê helbestên wî ji aliyê çêja edebî ve xurt in û bi hêman û mezmûnên edebiyata klasîk hatine ristîn. Korikî hem di xezela musemmet de hem jî di her du muxemmesên xwe de gelek ciwankarî bi kar anîne. Korikî di xezela xwe de mezmûnên sereke yê helbesta klasîk wekî çêşm, dêm, xal, burh, leb, xebxeb, gerden, şepal, şeml, bisk, zulf hwd. bi kar aniye. Ji bo nimûne:

Hat dilbera **burhên** hîlal **çêşmê** belek **gerdengezal**
Qeştin li **dêman** bûne hal **wechê** mudewwer wek qemer (Korikî, Mîn Kelamî’l, r. 1)

Korikî helbestên xwe hem baş honaye hem jî hunerên edebî bi awayekî serkeftî bi kar aniye. Mirov ji helbestên wî wek mînak dikare çend heb ciwankarî nîşan bide. Xakî di benda dawî ya muxemmesa jêrîn de hunerên mu’emna û tewşîhê (akrostîş)²⁹ bi awayekî serkeftî bi kar aniye:

Qutbê dehra me ye Seyda ew ‘ezîzê Mişr û Şam
Dîn û mecnûn mîn hewahû şahîbê haze’s-sitûr³⁰
Bigre ewwel tu ji ewwel şumme’s-sanî we’s-selam³¹
Edatu’t-te’rifê edxîl³² îsmê nazim bû zuhûr
Înehû durrun ferîdun amir e b’emre Xuda (Korikî, Hazî Ma Qale, r. 11)

Bikaranîna çendîn huneran bi hev re hunera îbda’ê pêk tîne. Xakî li benda jêrîn bi rêzê di rista yekem de hunera tekrîrê, di ya duyem de îqtîbas û ya sêyem de teşbîhê bi kar aniye:

Ya Se’îden, Ya Se’îden Ya Se’îden Ya Se’îd
Înnî kelbun basişun dehren zira’ey bi’l-wesîd³³
Ente qutbun ente ferdun ente şemsun ez ‘ebîd
Înnenî ‘ebdun zaîfun waqîfun beyne’l-‘ebîd
Murşîdê min rehberê min el eman Şahê Se’îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 14)

Korikî di benda jêrîn de bi riya tenasûbê di navbera peyvên ciger, sedr û hinav; mesrur, dilgeş û wîsal; lale, nesrîn û nergiz de tîkileyek daniye.

Ciger û **şedr** û **hinavim** pare pare bî’t-tehqîq
Tu bike **mesrûr** û **dilgeş** bi **wîşalê** ey şefîq
Nezer û feydê birêje carekî li qelbê herîq
Lale û **nesrîn** û **nergiz** fî *fuadî bin berîq*

29 Şêx Qutbeddîn ji bo navê helbestvan bê zanîn van huneran bi kar aniye û bi rista sêyem û çarem rê nîşanî xwendevanan kiriye. Her wiha bi peyvên serê rista yekem û duyem îşaretî navê xwe kiriye û dema ev her du bêje ji jor ber bi jêr ve bîn xwendin navê “Qutbeddîn” dertê holê û hunera akrostîşê pêk tê.

30 “Xwediyê van ristan ji kêfa” dîn û mecnûn e.

31 Ji malika yekem û ya duyem bigre.

32 Edata te’rifê jî bixe nav, hingê dê navê nazim eşkere bibe.

33 Îqtîbas ji ayeta Kehf/18. Ez ew kûçik im ku piyê xwe li devê deriyê te dirêj kirî sekinî me.

Murşidê min rehberê min el eman Şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 15)

Xwedê di ayeteke di Qur'ana Pîroz de behsa serboriyeke Mûsa (s.x.l.) dike. Li gorî vê bûyerê Mûsa (s.x.l.) li Çiyayê Tûrê agirekî dibîne û berê xwe dide wî agirê da ku xeberek an pêtek ji bo germkirina malbata xwe jê bîne (Qesas/29). Korikî di benda jêrîn de ji vê ayetê bi riya îqîbasê sûd wergirtiye û agirê li Çiyayê Tûrê wekî Şêx Seyda rênîşandêr dîtiye, ew şibandiye wê xetîreyê û wiha gotiye:

Hucceta 'îda xwe girtin ehlê fuqhê min bi dûr

Min esîrê ji hilalê ebrûwanê pir bi nûr

Ah û efganan dikêşim *kulle şubhîn we 'uşûr*

Da li min **meş'el xuya bit** ew ji cibhet **mişlê Tûr**

Murşidê min rehberê min el eman Şahê Se'îd (Korikî, Hazî Qesîdetu, r. 13)

Muxemmesa ku bi rista "*Min heye şahek ji şeyxan pur wefadar û kemal*" dest pê dike û pesnê Şêx Seydayê Cizîrî dide asoya Xakî ya fireh nîşan dide. Em ji vê medhiyeyê fêhm dikin ku Xakî çawa bi awayekî siruştî ji kesayetî û pirtûkên ilmî yên wekî Molla Camî³⁴, Haşîya 'Ussamî³⁵, Şerha Şemsî³⁶, Keşşaf³⁷, Sawî³⁸ haydar e herwiha ji kesayetiyên dîrokî wekî Yûsif³⁹, Asaf⁴⁰, Xusrew⁴¹ û ji kesayetiyên edebî yên wekî Rûhîyê Şemsuddîn⁴², Se'dî⁴³, Fîrdewsê Tûsî⁴⁴, Ferezdeq⁴⁵ jî haydar û van agahîyan ji bo zanîn û pesnê şêxê xwe di helbesta xwe de bi kar aniye.

Encam

Şêx Qutbeddînê Korikî mirovekî seyîd, alim, mutesewif û edîb ê sedsala XXem e ku li derdora Batmanê jiyaye. Çawa ku ji berhemên wî jî tê fêmkirin mexlesa wî Xakî, terîqeta wî ya tesewifî jî şaxa Basretê ya Neqşîya Xalidî ye. Korikî hezkiriyekî zanîn û perwerdehiyê bûye. Lewra wî gelekî girîngî daye ilmê û xwestiye ku endamên malbata wî li kêleka xwendina medreseyê bi zanistên pozîtîf re jî eleqedar bin. Xwendina zarokên wî nîşaneyê ve armanca wî ye. Li aliyekî din jî piraniya temenê xwe bi xwendin û bi perwerdekirina feqî û meleyan derbas kiriye. Seyda ji milê xwe yê ilmî û hîndariyê ve mirovekî çalak e. Korikî bi helbestvanîya xwe neyê naskirin jî li gorî berhemên wî yên li ber dest nûnerekî edebiyata klasîk e.

34 Ev pirtûkeke nehwe ye ku bi 'Erebiyeke xwerû hatiye nivîsîn. Herwiha şerha pirtûka "Kafiye"yê ye. Nivîskarê wê Mewlana Camî ye.

35 Mele 'Ussam, feqîyê Mewlana Camî bû. "Haşîye" pirtûka 'Ussam a ku li ser pirtûka Mewlana Camî ya bi nave "Camî" nivîsiye.

36 Pirtûka Se'dê Teftezanî ya ku naveroka wê mentiq e û xwerû bi zimanê 'Erebî ye.

37 Tefsîra Zemaxşerî ye.

38 Şerha tefsîra Celaleyn e.

39 Kurê Hz. Ye'qûb û pêxemberekî Benî Îsraîliyan ku bi bedewîtiya xwe navdar e.

40 Wezîrê navdar ê Silêman pexêmbere ku bi navê Asaf b. Berhiye tê zanîn. Di edebiyatên Rojhilatî de ev nav wek hemwateya "wezîr" tê bikaranîn.

41 Lehengê çiroka Ferhad û Şîrîn e. Navê wî Xusrewê Perwîz e û neviyê Nûşîrewan e.

42 Mexlesa Şêx 'Ebdurehmanê Aqtepi ye.

43 Yek ji helbestvanên herî mezin ê edebiyata Farisî.

44 Nivîskarê "Şehname"yê yê destana neteweyî ya Îranîyan.

45 Yek ji sê helbestvanên mezin ê daşorînê yê di serdema Emewîyan de ku şewaza kevin domandiye.

Bêguman di perwerdehiya wî de rola malbata wî heye lê belê di kemilîna ilmî û tesewifî de bandora Şêx Muhemmed Se'îd Seydayê Cizîrî û dergahê wî gelek zêde ye. Ji ber ku dergahê Şêx Seyda hem dibistaneke ilmî-tesewifî hem jî edebî bû, ev dergah ji bo kemilîna aliyê wî yê ilmî, tesewifî û edebî bûye navgîn. Korikî piştî ku îcazeyên xwe yên ilmî û tesewifî standiye bûye xelîfeyê Şêx Seyda û wekî gelek alimên Kurdistanê berê xwe daye welatê xwe, ji bo xizmeta gelê xwe dest bi îrşadê kiriye û berhemên ku dê ji geşedana edebiyata Kurdî re bibin gavek, nivîsine. Korikî di nav dem û mercên dijwar de ku hem oldarî hem jî Kurdayetî di wê heyamê de ji bo sîstema fermî du diyardeyên xeternak dihatin dîtin, hem perwerdehiya dînî domandiye hem jî berhemên bi zimanê gelê xwe nivîsiye. Ev bijartin û helwesta wî bi zanayî ye. Ji ber vê yekê xwedî cihekî taybet e. Korikî her çiqas bi aliyê xwe yê dînî-ilmî derketibe pêş jî divê aliyê wî yê edebî jî neyê jibîrkirin. Korikî bi qasî ku em dizanin wek berhemên menzûm bi Kurmancî 'eqîdenameyekê û mewlûdeke nivîsiye. Ji bilî van xezeleke muxemmes ku nezîreya xezela Mela Ehmedê Cizîrî ye û du medhiyeyan bi şiklê muxemmesê ji bo Şêx Muhemmed Se'îd Seydayê Cizîrî nivîsiye.

'Eqîdenameya Korikî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk wek mînakeke 'eqâidnameya menzûm, girîng e. Korikî 'eqîdenameya xwe li gorî pergala edebiyata klasîk nivîsiye û wekî 'eqîdenûsên din daye pey şopa Xanî. Bi vî şiklê kevneşopîya 'eqîdenûsiyê domandiye û di 'eqîdenameya xwe de ji aliyê şêwazê ve Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî û Mela Xelîlê Sêrtî teqlîd kiriye. Korikî di 'eqîdenameya xwe de sifetên Xwedê yên subûtî wekî ustadê xwe Xanî, bi termînolojiyê Kurdî nivîsiye. Di destpêka 'eqîdenameya xwe de wek sebebê te'lîfa berhemê destnîşan dike ku nûnerê herî girîng ê ekola Aqtepiyan Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî ji xwe re kiriye mînak. Her çend şêxên terîqetê, sîlsileyê terîqeta xwe bi piranî bi Erebi nivîsîbin jî Korikî di 'eqîdenameyê de nûnerên sîlsileyê şaxa Basretê ya Neqşî-Xalidî bi Kurdî rêz kiriye. Korikî di mewlûdnameya xwe de ji aliyê şêwe û rêzkirina beşan ve di bin bandora Bateyî de maye lê mixabin berhema xwe neqedandiye. Ji sê helbestên wî yên li ber dest helbesta wî ya ku bi rista "Min dî bi xef wexta seher selwa şepal zêrînkemer" dest pê dike bi çêja xwe xezeleke Melayê Cizîrî bi bîr dixê. Her du medhiyeyên ku li ser Şêx Seyda nivîsiye jî kûrahiya wî ya edebî nîşan didin. Şêx Qutbeddînê Korikî dildarekî Îslam û tesewifê ye. Her wiha ehlê hemiyetê û hezkiriyekî Kurdî ye.

Çavkanî

- Adak, Abdurrahman (2014). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, Abdurrahman (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*. Stenbol: Nûbihar.
- Adak, Abdurrahman (2012). "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebiyata Kurdî de". *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu* (Ed. M. Nesim Doru). 14-15 Nisan İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları. 465-485.
- Adak, Abdurrahman (2015). "Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdîtî-Elewîtî-Neqşebendîtîyê". *Nûbihar* 131: 10-15.

- Adak, Abdurrahman (2017). “Rûhî: Helbestvanekî Dahêner ê Serdama Piştî Mîrektiyan û Bandora Wî”. *Sûryanî, Arap ve Kürt Klasikleri, Uluslararası Klasikler Çalıştayı Bildirileri*. (Editörler: M. Nesim Doru-Ahmet Kırkan-Yakup Aykaç) 15-17 Gulan Mêrdîn: 491-509.
- Adak, Abdurrahman (2018). “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”. *Nûbihar Akademî* 10: 11-58.
- Aqtepe, ‘Ebdurrehman. (2016). *Rewdu’n-Ne’îm (Şerh: Zeynelabidîn Amedî)*. Diyarbekir: Seyda Yayınları.
- Aqtepe, Şêx ‘Ebdurrehmanê (2019). *Dîwan (Amadekar: Mehmed Emîn Hêvîdar)*. Stenbol: Weşanên Dara.
- Aslanoglu, Osman (2019). “Abdurrahman Aktepe’nin Divanında Geçen Şahsiyetler”. 4. *Uluslararası Bilimsel Araştırmalar Kongresi*. 14-17 Şubat Yalova: UBAK. 635-655.
- Axtepe, Şêx Evdîrehmanê (2013). *Dîwana Rûhî (Amadekar: Rênas Jîyan)*. Diyarbekir: Weşanên Belkî.
- Bağdâdî, Mevlânâ Halid-i (2013) *Divan (tercüme ve şerh: Abdulcebbar Kavak)*. İstanbul: Semerkand Yayınları.
- Bateyî, Melayê (2012). *Mewlûd. (amd. Huseyn Şemrexî)*. Stenbol: Nûbihar.
- Bayezîdî, Mela Mehmûdê (2010). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye (lêkolîn: Jan Dost)*. Stenbol: Nûbihar.
- Cezerî, Ş. M. S. (2015) *Mektûbat, el mecma’u’l-Munaddabu’l-Kamerî fî Tercemeti’ş-Şeyh Muhammed Said Seyda el-Cezerî. (çev. İbrahim Öztürk) İnegöl: Mega Basım Yayın.*
- Cizîrî, Melayê (2010). *Dîwan (wergêr: Osman Tunç)*. Stenbol: Nûbihar.
- Çiçek, Halil (2009). *Şark Medreselerinin Serencâmı*. İstanbul: Beyân Yayınları.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (2017). *Hediyet’ul-Îxwan fî ‘Eqîdet’il-Îman, Dîwançeya Xakî (wer. Zeynelabidîn Zinar)*. İstanbul: Nurefşan Yayınları.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (Destxet). *Hazî Hedyet’ul-Îxwan fî ‘Eqîdet’il-Îman*.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (Destxet). *Mewlûd*. Berhema Neçapkirirî.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (Destxet). *Mîn Kelamî’l Miskînî’l Mustekîn Şeyx Qutbuddîn*.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (Destxet). *Hazî Ma Qale eş-Şeyx Qutbuddînî’l-Korikî*.
- Korikî, Şêx Qutbeddînê (Destxet). *Hazî Qesîdetu Seyyîd Qutbuddîn fî Medhî Şeyx Seyda*.
- Levend, Agâh Sırrı (2018). *Dîvân Edebiyatı, Kelimeler ve Remizler Mazmunlar ve Mefhumlar*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Özel, Ahmet (2004). “Mevlid”. *TDVİA* (29): 475-479.
- Pala, İskender (2014). *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*. İstanbul: Kapı Yayınları.
- Sêrtî, M. X. (2012). *Nehcu’l-Enam (amd. Huseyn Şemrexî)*. Stenbol: Nûbihar.
- Tanrikulu, E. (2016). *Altın Silsile (Silsiletu’l-Zehab) ve Hak Tarikatlar*. Ankara: Semih Ofset Matbaacılık.
- Tolasa, H. (2002). *Sehî, Latîf ve Âşık Çelebi Tezkirelerine Göre 16. Yüzyılda Edebiyat Araştırma ve Eleştirisi*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Uludağ, Süleyman (1994). “Delâilü’l-Hayrât”. *TDVİA*. (9): 113-114.
- Ünalın, Abdülkerim (2008). “Molla Fahrettin Batmanî’nin İlmî, Tasavvufî ve Sosyal Faaliyetleri”, *I.Uluslararası Batman ve Çevresi Tarihi ve Kültürü Sempozyumu* (Ed. Salim Cöhce-Adnan Çevik). 15-17 Nisan İstanbul: Esen Ofset Matbaacılık. 355-374.

Xanî, Ehmedê (2012). *'Eqîdeya Îmanê (amd. Huseyn Şemrexî)*. Stenbol: Nûbihar.
Wergera Qur'ana Pîroz bi Zimanê Kurdî (2011). Stenbol: Nûbihar.

ZAZAKÎ DE RAWEYA FERMANÎ IMPERATIVE MODE IN ZAZAKI

Ahmet KIRKAN*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatîn: 22/11/2020
Accepted // Pejirandin: 23/11/2020
Published // Weşandin: 30.11.2020
Pages // Rûpel: 99-108

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atîf: Kirkan, Ahmet, Zazakî de Raweya Fermanî, *Kurdiname*, no. 3, p.99- 108.

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kilmnus

Na xebate de gramerê zazakî de mijaranê alozan ra yew, raweya fermanî ameya tedqîq kerdene. Derheqê raweya fermanî û antişê na rawe de cîya cîya şiroveyî ameyêkerdiş; nê mijarî ser o taye xebatî viraziyayê. Raweya fermanî seba şexsê diyine û hîrêyine esta û seba şexsê yewinî formê raweya fermanî çin ê. Raweya fermanî hem kerdişî hem zî nêkerdişî îfade kena ke na rawe erebki de sey emrî û nehyî di cure yê. Na xebate de mefhumê emrî yan fermanî ameyo îzahkerdiş, goreyê karan na rawe ameya antiş. Mîyanê raweyanê waştîşî de raweya fermanî zaf zêde yena şuxulnayene û na rawe goreyê mintiqayanê zazakî cîya şeklan de vejîyêna meydan. Amancê na xebate zazakî de raweya fermanî îzahkerdiş, mabênê na rawe û raweyanê bînan yê waştîşî de abirmayîş o. Na xebate de kitabane gramerî ra û berhemanê zazakî ra îstîfade bîyo. Na xebate de raweya fermanî hem goreyê şexsê diyin hem zî goreyê şexsê hîrêyînî do îzah bibo.

Kilîçekuyî: Emîr, Rawe, Zazakî, Ziwannasî, Şexs

Abstract

In this study, the imperative mode, one of the complex topics of zazaki grammar, is analyzed. Various comments have ben made about the imperative and its inflection; Various studies have been done on this mode. The imperative is conjugated for the second and third person, there is no imperative for the first person. imperative refers to doing or not doing a job. This mode has two types in Arabic expressing command and prohibition. In this study, the concept of order is explained, and the conjugation of verbs according to this mode is shown. In the willing modes, the imperative mood is widely used and this mode is expressed in different ways in Zaza-speaking regions. The aim of this study is to explain the imperative mode in Zaza and to distinguish it from other subjunctive modes. In this study, grammar books and works written in zaz were used. In this study, the imperative mode is drawn according to both second and third person.

Keywords: Imperative, Modal, Zazaki, Linguistics, Person

*Dr. Öğr. Üyesi, Unîversîteya Mardin Artuklu, Beşê Zivan û Edebîyatê Kurdî, ahmetkirkan@gmail.com,
Orcid: <http://orcid.org/0000-0003-3885-5218>.

1. Destpêk

Ziwan, seba cuya însanî sey neynîkêk o. Heme hetê cuya însanî sayeyê ziwani de yenê neqlkerdiş û ziwan her çî gêno xo mîyan. Mîyanê ziwani de zêdebîyayîşê çekuyan û formanê razber û şênberan reyde, ziwan sînoranê xo hîra keno. Eke nê formî û çekuyî ziwani de kêmi bibê, sînore ziwani teng beno. Vurîyayîşê sînore ziwani, dinyaya fikrî ya însanan ser o zî tesîrêk keno. Rewşa siruştî de ziwani bedilîyênê û ziwan teber ra mudaxele yî qebl nêkeno.

Dinya de zaf ziwani estê. Her ziwan goreyê xo wayîrê taybetmendîyan o. Nê taybetmendîyî mîyanê prosesê tarîxî de vurîyênê. Vurîyayîş xo ya pîya ziwani de pergalek awan keno (Bayraktar, 2014: 59). Ewro, zazakî îstîhsalkerdişê termanê ziwannasîye de, sentaks, semantîk, morfolojî ûsn binbeşanê ziwannasîye de pîrsgirêkê tesnîfkerdişî û tesbîtkerdişê terman esto. Nê pîrsgirêkî banderkerdişê zazakî de û xebatanê akademîkan de xo nîşan danê. Tesbîtkerdişê termanê ziwannasîye, îstîhsalkerdişê mijaranê ziwannasîye, goreyê krîteranê ziwannasîye îzahkerdişê babetan ûsn mijarî seba zazakî zaf muhîm ê. Na xebate zî mehsûlê nê fikran a.

Raweya fermanî mîyanê raweyanê waştîşî de ca gêna û ziwano rojane de zaf yena şuxulnayene. Taye ziwannasî, raweya fermanî û raweyanê waştîşî qasê raweyanê xeberî îzah nêkenê. Raweya fermanî zazakî de çend şeklan reyde yena viraştene. Nînan ra yewê ci bi vergirî *bi-* reyde virazîyêno û bîne ci tena kokê karî ya yeno meydan. Nê di şeklan ra ewilê ci sey formel û dîyinê ci zî sey înfornelî ya eşkeno name bibo. Çünke şeklê ewilî de, kokê karî tesbît beno û bi vergirî ya yeno şuxulnayene. Şeklê dîyinî de yew formêko standard çin o, her kar goreyê rewşa xo cîya şeklan de yeno antene. Seba şexsê ewilî yanî şexsê qalîkerdoxî ferman çin o. Goreyê taye ziwannasan seba şexsê ewilî zî raweya fermanî yena kar ardene. Yanî qalîkerdox eşkeno xo rê zî emir bikero. Erebkî de raweya fermanîya ke şexsanê dîyine reyde eleqedar a, sey *emrî hazir* yena name kerdene. Emrî hazir, seba muxataban (şexsê dîyinî) yeno dayene û formê na raweyî cîya yo. Erebkî de fermano ke seba şexsanê hîrêyanan yeno dayene sey *emrî xaîb* yeno name kerdene. Emrî xaîb, emrî hazirî ra cîya şeklan a yeno viraştene. Erebkî de zî seba şexsê yewinî raweya fermanî çin a.

Na xebate de zazakî de raweya fermanî amêya etud kerdene û goreyê şexsan na rawe îzah bîya. Seba na xebate hem kitabane gramerî yê zazakî hem zî ziwananê bînan ra îstîfade bîyo. Xususen berhe manê kurmanckî, fariskî û sorankî ra îstîfadekerdiş tercîh bîyo. Nê dîyalekt û ziwanan de raweya fermanî nêzdîya dîyalekta zazakî ya. Xêncê berhe manê gramerî, xebate de kitabane edebîyan ra zî îstîfade bîyo. Nê kitabane ra tayê nimûneyê raweya fermanî deyayê. Na xebate de karî, raweya fermanî de goreyê deman û şexsan bi tabloyan reyde ramojneyayê. Berhe manê gramerê zazakî de na mijar ameya îzah kerdene. Labelê na xebate de metodêko muqayeseyin do bêro taqîb kerdene. Raweya fermanî hem mîyanê mintiqayanê zazakî de hem zî ziwananê bînan reyde do bêra têvernayene. Xebate de raweya fermanî sey binbeşanê; raweya fermanî ya dîrekt û raweya fermanî ya îndîrekt ser ra bêro analiz kerdene.

2. Zazakî de Raweya Fermanî

Emir erebkî ra û *ferman* fariskî ra derbasê zazakî biyê. Nê çekuyî talîmatî, fermanî, emrkerdişî ûsn îfade kenê (Akalin, 2011: 794). Emrkerdiş, talîmatdayîş û fermankerdiş xo de taye taybetmendîyan hewêneno (Taş, 2013: 198). Raweya fermanî, qet nêbo mabênê di merdiman de cereyan kena. Nînan ra yew fermandayox, emrkerdox û o bîn zî fermangirewttox, emirbiyaye yo. Emirbiyaye zaf kesan ra eşkeno pê bêro. Eke merdimêko bîn çin bo, fermankerdox nêşkeno fermanan bido. Emirkerdiş û fermankerdiş zafane statuyê fermankerdoxî reyde eleqedar o. Eke fermankerdox hete statuyî ra fermanbiyayeyî ra berzêr nêbo, qalê ci sey fermanî ya nêyenê qebul kerdene. Heman şekil de raweya fermanî statuyê emirbiyayeyî rê zî îşaret kena. Mabênê nê her di statuyan de ganî ahengêk bibo. Fermankerdox û fermanbiyaye goreyê statuyê xo nê emrî rê rîayet bikero. Emir yan ferman seba fermanbiyayeyî mecburiyetî îfade keno. Ca nêardişî emrî mueyîdeyî îcab keno. Fermerkerdiş her tim têkilîyêka resmî îfade nêkeno. Ge-gane heskerdiş, rêzgirewtîş, cêr ra girewtîş ûsn hîsan zî îfade keno (Karademir, 2012: 2092-2093).

Raweya fermanî miyanê raweyanê waştîşî de ca gêna labelê waştîşî ra tengêr manayêke îfade kena. Têkilîyanê rojane de kes eşkeno vajo *Waştîşêkê min esto* labelê kes nêşkeno vajo *Emrêkê min esto*. Hetê mana ra mabênê cumleyanê *Mamosteyî wina waşt* û *Mamosteyî wina emir kerd* de zaf ferq esto. Însan, waştîşanê emirwarî ra zêdêr nazikeyan ra hes keno. Emrê ke bi şeklêko nazik ameyê îfadekerdiş zaf rey bêteredud yenê ca ardene. Raweya fermanî de elemanê asta suprasegmentalî eke bi şeklêko munasib îfade bibê, muxatab tewrê xo goreyê ney tayîn keno. Mîsale muxatabî ser o tesîrê cumleya *Taye şo o het* û tesîrê cumleya *Ti eşkenê tayê şorê o het* yewbînan ra cîya yê.

Seba raweya fermanî cîya pênasî ameyê dayene. Nînan ra taye pênaseyî; raweya fermanî caardişê karî rê îşaret keno (Dizdaroğlu, 1963: 18), raweya fermanî caardişê karî wazena û emir kena, raweya fermanî karî terzê waştîşî/emrî de xeber dana (Boz, 2012: 67), raweya fermanî karî şeklê emrî de îfade kena (Karaağaç, 2012: 370). Goreyê nê pênasayan raweya fermanî, bi şeklêko qetî û sertî ya fermanbiyayeyî ra waştîşê fermankerdoxî îfade keno. Raweya fermanî de rewşa xîtabî bi şeklêko tam yena meydan û seke ameyo îfadekerdiş ferman bi statuyê fermankerdoxî ya zî eleqedar o.

Zazakî de û ziwananê bînan de raweya fermanî zafane seba şexsanê diyine û hîrêyinî (yewhûmare û zafhûmare) yena şuxulnayene. Seba şexsê yewinî raweya fermanî esta yan çin a ney ser o munaqêşe esto. Goreyê Banguoğluyî însan seba xo zafane raweya hewcetîye kar ano (2011: 473). Însan xo bi xo rê nêşkeno emir bikero, o semed ra şexsê yewinî de (yewhûmare û zafhûmare) raweya fermanî nêyena kar ardene (Dizdaroğlu, 1963: 19). Çünke na rawe de seba şexsê yewinî peygirê karan çin ê. Goreyê taye ziwannasan raweya fermanî seba şexsê yewinî zî yena kar ardene. Seba şexsê yewinî raweya fermanî û raweya waştîşî sey yewbînî yê, o semed ra nameyê na rawe ganî sey fermanî/waştîşî ganî bêro îfadekerdene (Boz, 2012: 67). Raweya waştîşî ancax bi vurîyayîşê mana, eşkena manaya raweya fermanî îfade bikera (Karaağaç, 2012: 370). Seba zazakî zî heman çî kes eşkeno îfade bikero. Seba şexsê yewinî formê raweya fermanî çin ê.

Zazakî de raweya fermanî di beşan ra pê yena. Nê beşan ra ewilê ci raweya fermanî ya rasteraste (dîrekt), beşê diyini raweya fermanî ya nerasteraste (îndîrekt) a. Raweya fermanî ya

rasteraste, şexsê diyine reyde eleqedar a. Raweya fermanî ya nerasteraste (îndirect), bi şexsê hîrêyîni reyde eleqedar a.

Kurmanckî de karê ke vergiranê *ve, çê-, ra-, rû-, da-, hil-, wer-, der-* gênê gireyê raweya fermanî nêgênê. Mîsale; *veke (ake), rake (werze), derkeve, dakin, dadin* ûsn (Ocek, 2014: 232-233). Zazakî de zî taye karî estê ke xêncê vergirê *bi-* zî manaya raweya fermanî îfade kenê. Nê karan rê; *şîyayene-şo, akerdene-ake, wekerdene-weke, rakerdene-rake, devistene-devîne, dekerdene-deke, vatene-vaje, hewadayene-hewade, vazdayene-vazde, kaşkerdiş-kaşke, aşanayene-aşane, avistene-avîne, boykerdiş-boyke, piroyayene-pirode, piroyakerdene-piroke, weriştene-werze, ronîştene-ronîşe, ravistene-rafîne, ronayene-rone, rovitene-rovêje, weçînîtene-weçîne* ûsn eşkenê sey nimûne bideye (Grûba Xebate ya Vateyî, 2019; Arslan, 2019). Seke karanê corênan ra yeno fehmkerdiş, zazakî de karê ke vergiranê sey *we-, a-, ro-, piro-, hew-, de-, vaz-* ûsn gênê, seba îfadekerdişê manaya raweya fermanî êdî vergirê *bi-* yî nêgênê. Xêncê vergiran karê sey *şîyayene-şo, vatene-vaje, berdene-bere* ûsn de yew qaydeyêk nêameyo tesbît kerdene. Formê raweya fermanî ya nê karan de vergirêk çin o û nê karî vergirê raweya fermanî *bi-* zî nêgînê. Nê karê ke cor ra ameyê dayene seba formê erênîye na rewşe de yê. Gama ke nê karî formê neyênî de yenê îfadekerdiş, vergirê neyini *me- û nê-* vernîya nê karan de yeno.

Zazakî û kurmanckî de formê neyînî *me- û nê-/ne-* reyde yeno viraştene (Tan, 2011: 278-279; Malmîsanij, 2015: 242-244). Kurmanckî de formê *me-* yî kêmî bîyo. Qaso ke Yildiz îfade keno, kurmanckî de metnanê folklorîkan û metnanê klasîkan de seba formê neyînî ya raweya fermanî bi vergirê *me-* yî reyde yeno viraştene. Yildiz seba nê formî nê nimûneyan dano (Yildiz, 2018: 169):

“**Memir memir** Memo lo mammo
Memir memir Memo lo pismamo
Memir li beriya Nazê lo mammo
Rûnê li benda babê heyrano
Rûnê li benda babê pismamo” (Yildiz&Taşkin, 2018: 122).

“Ger te divêtin bibî mîr û ser û mu’teber
Kizb û xilafê **mebêj** ger te dikin ker bi ker” (Xanî, 1971: 22).

Seke nê nimûneyanê corênan ra fehm beno, seba formê neyînî vergirê *me-* yî zî yeno şuxulnayene. Labelê formê bînî zî estê û nê zî bi şeklêko aktif yenê kar ardene. Beyntarê nê forman de vergirê *me-* bi şeklêko qetî nêkerdişî îfade keno. Yanî gama ke *meke* vajîya, no *nêkerdişêko qetî* îfade keno. Seke Çem îfade keno, zafhûmariye de peynîya karî de *-ne* yeno, no peygir û kar nusîyênê (Çem, 2003: 204).

Fariskî de raweya fermanî, sereyê karî de bi îlawekerdişê vergirê **𐭪** reyde yeno viraştene. Sey kurdkî, fariskî de zî raweya fermanî kokê de demê nikayî ra yeno viraştene. Seba erênî vergirê **𐭪** yeno, seba neyînî zî vergirê **𐭪** vernîya karan de zêde beno (Aslanoglu, 2013: 189-194; Xanlerî, 1368: 31-32). Sorankî de zî raweya fermanî sey zazakî ya yeno meydan. Sorankî de seba raweya fermanî ya rasterastî **𐭪** yeno, seba neyînî zî vergirê **𐭪** vernîya karan de zêde beno (Xoşnaw, 2015: 65).

2.1. Raweya Fermanî ya Rasteraste

Raweya fermanî ya rasteraste, fermano ke terefê fermankerdoxî ra seba şexsê dîyinî (yewhûmare û zafhûmare) yeno dayene îfade kena. Raweya fermanî ya rasteraste de ferman seba kes yan kesê ke hember de yê yeno dayene. Yanî fermankerdox û fermanbîyaye hemberê pê de yê. Kurmanckî de û zazakî de raweya fermanî ya rasteraste de kokê demê nikayinî bi vergirê *bi-* reyde yena viraştene (Baran, 2012: 150). Na rawe de, seba şexsê dîyinî yê yewhûmarî girêk nêyeno, labelê seba şexsê dîyinî yê zafhûmarî peygirê *-în, -ê, -ên* yenê. Goreyê mintiqayan taye varyantê nê peygirî estê. Halî hazir de formê zafhûmarîye de peygirê *-ê* û *-î*, peygirî bînan ra zêdêr yenê şuxulnayene. Seke fehm beno mîyanê prosesî de no peygirî asîmîle bîyo û vengê /n/yî peynî ra kewto. Taye fekanê zazakî de peygirî vîndî benê (Malmîsanij, 2015: 236-237). Xususen fekê Çewlîgî de kes eşkeno nê kewtişan tesbît bikero. Cêr ra taybetmendiyê raweya fermanî ya rasteraste tablo de ameyê ramojnayene.

Tablo 1: Zazakî de Formê Raweya Fermanî ya Rasteraste

RAWEYA FERMANÎ YA RASTERASTE			
Şexsê Dîyinî yê Yewhûmare	Ti	ewnîyayene	biewnî
		kerdene	bike
		nuştene/nusnayene	binuse
		bîyene	bibi
		dayene	bidî
Şexsê Dîyinî yê Zafhûmare	Şima	wendene	şima biwanê
		xebitîyayene	şima bixebitîyê
		şimitene	şima bişimê
		beriqîyayene	şima biberiqîyê
		akerdene	şima biakê-akerê

Tabloyê corî de raweya fermanî ya rasteraste de formê erênî ameyo dayene. Na rawe de karî, kokê demê nikayinî de yenê antene û vernîya karan de *bi-* yeno zêde kerdene. peynîya karan de zî goreyê zafhûmarîye û yewhûmarîye peygirê şexsan zêde benê. Taye karan de formê *bi-* nêyeno.

Cêr ra kitabane zazakî ra seba formê erênî yê raweya fermanî ya rasteraste çend hebî nimûneyî deyayê:

“-Seba Heqî ina ra juye de mi **bizewecne!**” (Ballikaya, 2010: 87).

“-Top **bidê**, penaltî yo.” (Canşad, 2007: 43).

“Ti erkan û şertê nimajî **bizan**

We ferz o **bizanî** hemînî ‘eyan.” (Zîlan, 2017: 164).

“-Cîrê xiznaya altunan **bîyarê, rokerê.**” (Adabeyî, 2005: 59).

“Endi a derg **meke**, derd kenê zerrey insani. To birra x1 bîrnawa ke radê, **bigeyrê**. De **šo!**” (Saint-Exupéry, 2017: 36).

2.1.1. Raweya Fermanî ya Rasteraste de Neyînî

Raweya fermanî ya rasteraste de formê neyînî (negatîf) bi vergirê *me-* yan *ne-* reyde yeno viraştene. Seba formê neyînî vergirê raweya fermanî *bi-* serê karî ra yeno eştene. Zazakî de formê negatîfî *me-* û *nê-* yî reyde yeno viraştene. Labelê kurmanckî de tena vergirê *ne-* yî mendo. Formê neyînî de zî peygirê ke seba şexsê dîyinî yewhûmarî û zafhûmarî ameyê yenê seveknayene (Malmîsanij, 2015: 242-244). Cêr ra goreyê formê neyînî raweya fermanî ya rasterasteî deyayê.

Tablo 2: Zazakî de Formê Raweya Fermanî ya Rasteraste de Neyînî

RAWEYA FERMANÎ YA RASTERASTE			
Şexsê Dîyinî yê Yewhûmare	Ti	ewnîyayene	mewnî
		kerdene	meke
		nuştene/nusnayene	menuse
		bîyene	mebe
		dayene	mede
Şexsê Dîyinî yê Zafhûmare	Şima	wendene	şima mewanê
		xebitîyayene	şima mexebitîyê
		şimitene	şima meşimê
		beriqîyayene	şima meberiqîyê
		akerdene	şima meakê-meakerê

Tabloyê corî de raweya fermanî ya rasteraste de formê neyînî ameyo dayene. Na rawe de karî, kokê demê nikayînî de yenê antene û vernîya karan de *me-* yan *nê-* yeno zêde kerdene. Peynîya karan de zî goreyê zafhûmarîye û yewhûmarîye peygirê şexsan zêde benê. Cor ra îfade bîbî ke taye karan de vergirê *bi-* nêyeno labelê formê neyînî de vergirê negatîfîye her tim yenê.

Cêr ra kitabanê zazakî ra seba formê neyînî yê raweya fermanî ya rasteraste taye nimûneyî deyayê:

“Qîsurdê mî **mewni**, mî va qey tiye xorê wazenê.” (Berz, 2001: 178).

“De bê **memiri**, de bê **me teqi**.” (Ayyıldız, 2019: 113).

“Ti mi xwi vîr a bikse, Wiso

O hec tu qebul **nêbo**, Wiso” (Karasu, 2012: 64).

“Ez keynaya ayê Bexdadî nêgîna!” (Adabeyi, 2005: 122).

“Zîyade pers meke.” (Çem, 2007: 210).

2.2. Raweya Fermanî ya Nerasteraste

Raweya fermanî ya nerasteraste, fermano ke terefê fermankerdoxî ra seba şexsê hîrêyînî (yewhûmare û zafhûmare) yeno dayene îfade kena. Raweya fermanî ya nerasteraste de ferman seba kes yan kesê ke hember de nîyê yeno dayene. Yanî fermankerdox û fermanbîyaye hemberê pê de nîyê. Zazakî de raweya fermanî ya nerasteraste de kokê demê nikayînî bi gire û vergirê *wa bi-* reyde yena viraştene. Na rawe de, seba şexsê hîrêyînî yê yewhûmarî xêncê wa bi- girêk nêyeno labelê seba şexsê hîrêyînî yê zafhûmarî peygirê *wa bi-* rê dima *-în, -ê, -ên* yenê. Goreyê mintiqayan taye varyantê nê peygirî yanê meydan. Nika zafhûmare de peygirê *-ê* û *-î* peygirîyanê bînan ra zêdêr yenê şuxulnayene (Malmîsanij, 2015: 241-242). Seke fehme beno ke mîyanê prosesî de no peygirî asîmîle bîyo û vengê /n/yî peynî ra kewto. Cêr ra taybetmendîyê raweya fermanî ya nerasteraste tablo de ameyê ramojnayene.

Tablo 3: Zazakî de Formê Raweya Fermanî ya Nerasteraste

RAWEYA FERMANÎ YA NERASTERASTE			
Şexsê Hîrêyînî yê Yewhûmare	O, A	ewnîyayene	wa o biewnîyo
		kerdene	wa a bikero
		nuştene/nusnayene	wa o binuso
		bîyene	wa a bibo
		dayene	wa o bido
Şexsê Hîrêyînî yê Zafhûmare	Ê	wendene	wa ê biwanê
		xebitîyayene	wa ê bixebitîyê
		şimitene	wa ê bişimê
		beriqîyayene	wa ê biberiqîyê
		akerdene	wa ê akerê

Tabloyê corî de raweya fermanî ya nerasteraste de formê erênî ameyo dayene. Na rawe de karî, kokê demê nikayînî de yenê antene û vernîya karan de *wa+kerdox+bi-* yeno zêde kerdene. Peynîya karan de zî goreyê zafhûmarîye û yewhûmarîye peygirê şexsan zêde benê.

Cêr ra kitabên zazakî ra seba formê erênî yê raweya fermanî ya nerasteraste taye nimûneyî deyayê:

“Sîrrê nê torzîni zi, çend qalın dar beno, **wa bibo**, kes torzîni rê vazo, “nê dari bîbîrn, ew letanê cî zi 'hendê pê bîbîrn, no torzîni zey kesîya bîrreno.” (Hayig, 2007: 11).

“-Axwe ju çilke axwe raya Heq de bîresnê mi tek wa se beno **wa bibone**.” (Çiçek, 2012: 20).

“-Nê çinayê ma, dewî di kam feqîr o **wa bişuwo**.” (Seçilmek, 2019: 98).

2.2.2. Raweya Fermanî ya Nerasteraste de Neyînî

Raweya fermanî ya nerasteraste de formê neyînî (negatîf) bi vergirê *me-* yan *ne-* reyde yeno viraştene. Seba formê neyînî vergirê raweya fermanî *bi-* serê karî ra yeno eştene. Zazakî de formê negatîfî *me-* û *nê-* yî reyde yeno viraştene. Formê neyînî de zî peygirê ke seba şexsê dîyînî yewhûmarî û zafhûmarî ameyê yenê seveknayene (Malmîsanij, 2015: 242-244). Cêr ra goreyê formê neyînî raweya fermanî ya rasterastî deyayê

Tablo 4: Zazakî de Formê Raweya Fermanî ya Nerasteraste de Neyînî

RAWEYA FERMANÎ YA NERASTERASTE			
Şexsê Hîrêyî yê Yewhûmare	O, A	ewnîyayene	wa o nêewnîyo
		kerdene	wa a nêkero
		nuştene/nusnayene	wa o nêuso
		bîyene	wa a nêbo
		dayene	wa o nêdo
Şexsê Hîrêyî yê Zafhûmare	Ê	wendene	wa ê nêwanê
		xebitîyayene	wa ê nêxebitîyê
		şimitene	wa ê nêşimê
		beriqîyayene	wa ê nêberiqîyê
		akerdene	wa ê nêakerê

Tabloyê corî de raweya fermanî ya nerasteraste de formê neyînî ameyo dayene. Na rawe de karî, kokê demê nikayînî de yenê antene û vernîya karan de *wa+kerdox+nê-* yeno zêde kerdene. Peynîya karan de zî goreyê zafhûmarîye û yewhûmarîye peygirê şexsan zêde benê. Taye karan de vergirê *bi-* nêyeno labelê formê neyînî de vergirê negatîfîye her tim yenê.

Cêr ra seba nê formî taye cumleyî ameyê saz kerdene. Seba formê neyînî yê raweya fermanî ya nerasterasteî kitabî ra ma cumleyî peyda nêkerdî, o semed ra ma taye cumleyî nuştî:

“Yusufî rê vaje wa berî nêakero.”

“Eke sey verê ney hewteyî bo, aye rê vaje wa werd amade nêkero.”

“Wezîfeyê xo nêkero, wa êdî kar nêro.”

Encam

Na xebate de zazakî de raweya fermanî ameya analiz kerdene. Na rawe statuyêk îfade kena û tewr kêmi mabênê di kesan de cereyan kena. Nê kesan ra yew fermankerdox, o bîn fermanbîyaye yo. Fermankerdox, goreyê statuyê xo fermanbîyayeyî rê emir keno, kerdiş yan nêkerdişê karî wazeno. Yanî raweya fermanî hem kerdişî hem zî nêkerdişî xo de hewênena. Qaso ke kerdişê karî mîyanê sînoranê raweya fermanî der o, heman şekil de nêkerdişê karî zî mîyanê sînorê na rawe de ca gêno.

Raweya fermanî û tedeyîyê na rawe ser o munaqeseyî estê. Mîyanê xebate de nê munaqeseyî bi şeklêko xulasa ameyê îzah kerdene. Raweya fermanî seba şexsê dîyînî û hîrêyînî yena kar ardene. Labelê mîyanê ziwannasan de, seba şexsê ewilî zî raweya fermanî ameya şuxulnayene. No hîna zêde, xo bi xo rê emirkerdişî îfade keno. Ma gore seba şexsê ewilî raweya fermanî çin a. Kirarêko no tewir zafane waştîşî îfade keno.

Îfadekerdişê raweya fermanî û derbê fermankerdoxî, fermanbîyayeyî ser o tesîrêk virazeno. Mabênê nê her di kesan de statuyo sosyal yan resmî çiqas zêde bîbo, rengê rawe hende vurîyêno. Seke xebate de zî îfade bîyo, psîkolojîyê însanî emirgiretişî ra yan zî bi şeklêko sert a emirgirewtîşî ra hes nêkeno.

Zazakî de raweya fermanî di beşan ra pê yena. Raweya fermanî ya rasteraste, şexsê dîyînî ya eleqedar a. Raweya fermanî ya nerasteraste zî şexsê hîrêyînî reyde têkildar a. Na xebate îzahkerdişê formê erênî de vergirê bi- deyayo labelê zazakî de taye karî xêncê bigirewtîşî zî eşkenê manaya raweya fermanî îfade bikerê. Reya verên na xebate de vergirê ke karanê zazakî reyde yenê û raweya fermanî de hewceyê vergirê bi- yî nêkenê ameyê tesbît kerdene. Seba na xebate taye termê ziwannasîye sey pêşnîyar ameyê şuxulnayene. Termê ke na xebate de kar ameyê, seba xebatanê vernî, ma hêvî kenê ke sey bingeyêk wezîfe bivînê. Çunke zazakî de nê warî de xebatî newe newe yenê kerdene.

Çimeyî

Adabeyî, Feyza (2005). *Estanikanê Sêwregî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Akalın, Şükrü Halûk vd.(2011). *Türkçe Sözlük*. Ankara: Türk Dil Kurumu.

Arslan, İlyas (2019). *Zaza Dilinde Fiiller*, Ankara: Akademisyen Kitabevi.

Aslanoğlu, Osman (2013). *Kendi Kendine Kolay Farsça*. İstanbul: Nûbihar.

Ayyıldız, Zülfükar (2019). *Va. Şanlıurfa*: Elif Matbaası.

Ballıkaya, Huseyîn (2010). *Dêvo Kor Estanikanê Gimgimî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Banguoğlu Tahsin (2011). *Türkçenin Grameri*, Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

Baran, Bahoz (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Diyarbakır: Belkî.

Bayraktar, N. (2014). *Dilbilim*, Ankara: Nobel Yayın.

Berz, Koyo (2001). *Begê Dımılıyan*, İstanbul: Vejjiyaişê Tiji.

Boz, Erdoğan (2012). *Türkiye Türkçesi Biçimsel ve Anlamsal İşlevli Biçimbilgisi (Tasnif Denemesi)*, Ankara: Gazi Kitabevi.

Canşad, Murad (2007). *Xafilbela*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Çem, Munzur (2003). *Türkçe Açıklamalı Kırmancca (Zazaca) Gramer*, İstanbul: Deng.

Çem, Munzur (2007). *Gula Çemê Pêre*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Çiçek, Alî Aydın (2012). *Saye Marû Estanikanê Xinis û Tekmanî ra*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Dizdaroğlu, Hikmet (1963). *Türkçede Fiiller*, Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.

- Grûba Xebate ya Vateyî (2005). *Rastnuştîşê Kirmanckî (Kirmanckî)*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî (2019). *Ferhengê Kirmanckî (Kirmanckî)- Tirkî Kirmancca (Zazaca)-Türkçe Sözlük*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Hayig, Roşan (2007). *Mahmeşa Vizêr ra Ewro İstanikê Zazayan*, İstanbul: Vêjyayîşê Tiji.
- Hengirmen, Mehmet (2009). *Dilbilgisi ve Dilbilim Terimleri Sözlüğü*, Ankara: Engin Yayınevi.
- Karaağaç Günay (2012). *Türkçenin Dil Bilgisi*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- Karademir, Fevzi (2012). “Türkiye Türkçesinde Emir Kip(lik)i Üzerine” *Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume 7/4, Fall 2012, p. 2091-2138*.
- Karasu, Dogan (2012). *Dinya d' yo Darê Ma Rêncber Ezîz*, İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.
- Malmîsanij (2000). *Folklorê Ma ra Çend Nimûney*, İstanbul: Berdan Matbaacılık.
- Malmîsanij, Mehemed (2015). *Kurmancca İle Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi*, İstanbul: Vate.
- Ocek, Nezîr (2014). *Waneyên Rêzimana Kurmancî*. Van: Sîtav.
- Saint-Exupéry, Antione de (2017). *Şazadeo Qıckek*, Çarnayış: Mesut Asmên Keskin, İstanbul: Dersim Yayınları.
- Tan, Sami (2011). *Rêziman û Rastnivîsa Zaravayê Kurmancî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Taş, Çetin (2013). *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*. İstanbul: Dîwan.
- Xanlerî, Perwîz Natil (1368). *Desturê Zebanî Farisî*. Tehran: İntaşarati Tus.
- Xoşnaw, Nerîman Ebdulla (2015). *Rêzimanî Kurdî*. Hewlêr: Çapxaney Rojhelat.
- Yıldız Ayhan, Hanifi Taşkın (2018). *Şakiro Kewê Ribat*. İstanbul: Nûbihar.
- Yıldız, Ayhan (2018). “Referansên Gramera Kurdî di Edebîyata Devkî ya Gel da”, *Dil Bilimleri Klasik Sorunlar-Güncel Tartışmalar*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları
- Zilan, Bîlal (2017). *Di Kitabê Muhammedê Şêx Ensarî: Raro Raşt û Me'lûmatê Dînîye (Metn û Cigêrayîş)*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

رهنگی سوور له شیعرى کلاسیکی کوردیدا

اللون لاحمر في الشعر الكلاسيكي الكوردي

RENGÊ SOR DI HELBESTÊN KLASÎK ÊN KURDÎ DE RED COLOUR IN KURDISH CLASSICAL POETRY

Koser Omar AHMAD*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî

Received // Hatîn: 13/11/2020

Accepted // Pejirandin: 26/11/2020

Published // Weşandin: 30.11.2020

Pages // Rûpel: 109-126.

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).

<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Citation/Atif: Ahmad, Koser Omar, (2020). رهنگی سوور له شیعرى کلاسیکی کوردیدا. *Kurdiname*, no. 3, p. 109-126.

Plagiarism/Întihal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nîrxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Ev xebat li ser rengê sor di şî'ra klasîk a kurdî radiweste. Ango em di vê lêkolînê de ketine pey bersiva pirsên wek; di şî'ra klasîk a kurdî de rengê sor çî wateyên xwe hene, mebest ji bikaranîna vî rengî çî ye? Kompozîzyona reng û bandora wê ya psikolojîkî çî ye? Dîsa dema ku şairekî klasîk rengê sor di şî'ra xwe de bi kar tîne, li pey çî mebestan e? Herwiha ji ber ku xebatên bi vî rengî di kurdî de pir kêr in, bi hurgulî li ser rengan û bi taybet li ser rengê sor li helbestên kurdî de hatiye sekinin. Me ji bo lêkolîna xwe rêbaza wesfî û analîzkirinê bi kar anî. Lêkolîna me bi mînakên ji edebiyata klasîk a kurdî teşe girtîye. Bi vê xebatê em destnîşan dikin ku rengê sor çî tede dîke û çî bibîr dixê. Di encamê de daneyên ku bi dest ketine, bi hurgulî hatine nîrxandin û mebesta şairan a bikaranîna rengê sor hatiye destnîşankirin.

Peyvên Sereke: Reng, rengê sor, psîkolojiya rengan, reng di helbest û edebiyata kurdî ya klasîk da

Abstract

The title of this study is (The red color in Kurdish classic poems). This study shows the meanings associated to red color in Kurdish classic poems. The study resorts to both descriptive and explanatory methods. This study is an effort to serve the literature and the readers. Therefore, this study discusses colors, how they are made, psychology of colors and the use of colors by the poets. In addition, both colors and place of colors in Kurdish poetry are important. The study particularly puts a great emphasis on the use and meanings of red color in Kurdish poetry. Finally, the results of this work shown in points.

Key words: colors, meanings of colors, psychology of colors, colors in Kurdish poetry.

ملخص

هذا البحث تحت عنوان (اللون لاحمر في الشعر الكلاسيكي الكوردي) ، يظهر نللات اللون لاحمر في الشعر الكوردي الكلاسيكي، معتمدا على المنهج الوصفي الكلاسيكي ، ولان هذا الموضوع لم يدرس في الأدبالكوردية لا قليلا، يهدف هذا البحث الى تعريف دقيق للون خاصة اللون لأحمر كما يهدف الى ملء فراغ في هذا المجال و خدمة لادب والقاريء . لذلك في المحتوى يتكلم عن اللون و كيفية تكوينه و سايكولوجية اللون وكيفية استخدامه من قبل الشعراء عن طريق عرض النصوص الشعرية مع اهمية و وجود

*Kurdî MA in Kurdish Language and Literature, robinven98@gmail.com, Orcid: <http://orcid.org/0000-0001-5495-7623>

اللون في لادب الكوردي ، و بلاخص لاهتمام باللون لاحمر و لأهداف الاستفادة من اللون لاحمر، وفي الختام تم توضيح النتائج على شكل نقاط مع المصادر العلمية التي تم استخدامها .
كلمات مفتاحية: الوان ، نللات اللون لاحمر، سايكولوجية اللون ، اللون في الشعر ولادب.

پوخته

ئهم تووژینه وهیه؛ به ناویشانی: (رهنگی سوور له شیعی کلاسیکی کوردیدا).
تووژینه وهیه که؛ به نمونه وه دهلاله ته کانی رهنگی سوور دهخاته روو له شیعی کلاسیکی کوریدا، تووژینه وهیه که پشتی به ریبازی وهسفی شیکاریی به ستووه و له بهر ئه وه ئه م بابه ته له ئه دهبیاتی شیعیی کوردیدا، که متر به باس دهوله مند کراوه، بویه ئامانجی تووژینه وهیه؛ ناساندنی ورد و جوادییانهی رهنگ و به تاییهت (رهنگی سوور) بیخاته تیشکی تووژیه وه، زیده باری وی؛ تووژینه وهیه که: ههول و ئارمانجیکه که لینیک پربکاته وه و خزمهت به ئه دهب و خوینه ربکات. بویه له ناوه پوکدا باسی له رهنگ و سایکولوجی رهنگه کان و شیوازی به کارهینانیان کراوه لای شاعیران به خسته رووی دهقی شیعییه وه. له گه ل گرنگی و بوونی رهنگ له ئه دهبی شیعی کوردیی و وردتر گرنجیدا وه به مه به ست و دهلاله تی (رهنگی سوور) و ئه مه به سته خواستراوه جیاجیانهی که له ریگی رهنگی سووره وه خراونه ته روو. له کوتا پیشدا به خال ئه نجامه کان خراونه ته روو و له گه ل دانانی زانستیانهی سه رچاوه به کارهاتوه کان.

وشه کلییه کان: رهنگه کان، دهلاله کانی رهنگی سوور، سایکولوجی رهنگ، رهنگ له شیعی و ئه دهبا

پیشه کی

رهنگ، که شه پۆلیکی جولاو هیی رووناکییه و چاو ههستی پیده کات، هه ر چاوه جیاوازی رهنگه کان له ریگی تور؛ بر و سیفهت و رادهی تیژی رهنگه کان ههستی پیده کات، رهنگی به پنی ههستی پیکردنی چاو؛ هیمای جیاجیایان له سه ر دانراوه له رووی پیکهاتنییه وه، دواتر هه ریه که و به ناویکه وه ده ر ده بریت: ئه مه سووره، ئه وه سپیه و ئه وی دی سهوز و رهش... به له بهر چاوه گرتنی ناویشانی تووژینه وهیه که، کار له سه ر مه به ست و دهلاله ته کاتی رهنگ و رهنگی سوور دهکات له شیعی کلاسیکی کوریدا، له م ئه دهبیاته دا؛ چه ندین جار ئاماژه به رهنگه کان و به تاییهت رهنگی سوور کراوه، گه رچی خه لک سوور هه ر به رهنگی ئاسایی ده بینن، به لام شاعیرانی کلاسیک ئه م واتا بنچینه یه یان گوو یوه بۆ واتا و دهلاله تی نامۆ و (سوور) یان بۆ گه لیک مه به ست و خواستنی تری وهک (فرمیسک، خوین، شه ر، تور په یی، خو شه ویستی، جه نگ، خه نه، گو ل، لیو، گه رمی، شایی، چه خترکرنه وه...) به کارهینا وه، بویه له ناوه پوکدا، ئه م مه به سته جیایانه له گه ل نمونه ی شیعی کلاسیکی خراونه ته روو، ئه مانه و چه ند دهلاله تی رهنگی له چوار چیوه ی سایکولوجی تاک (شاعیر) دا خراونه ته روو له تووژینه وهیه که.

هوی هه لباردن و گرنگی تووژینه وهیه که

ئه ده بیاتی شیعی و وهسف و شیکردنه وه کانی شیعی کلاسیکی، زوریان له سه ر و تراوه، به لام باسکردنی رهنگه کان و به تاییه تی یه ک رهنگی وهک سوور، چه ندی له سه ر نوسرابی، ئه وه پیمانوایه که هه ر که م خراوه ته بهر باس، هه روها له بهر ئه وهی ئه و باسانه ییشی که کراون له سه ر رهنگ، به ساده یی به لای رهنگی سووردا روشتوون، یان به گشتی و له گه ل رهنگه کانی تر دا باسی لیوه کراوه، بویه ئامانجی تووژینه وهیه که ئه وهیه که به شیوه ی تاییهت و وردتر باس له دهلاله ته کانی رهنگی

سوور و خستنه پرووی ئەم ڕهنگه له شیعری کلاسیکییدا له گهڵ ئەو مەبەسته جیاجیا یانه بکات که له بری ڕهنگی سوور به کارهاتوون.

ئامانجی توێژینه وه که

توێژینه وه که ئامانجیه تی، که خواستی به کارهیتانی ڕهنگی سوور، ده لاله ت، مەبەست و واتاکانی ڕهنگی سوور له شیعری کلاسیکی کوردیدا بخاته ڕوو، به گشتی ئامانجیه تی؛ لایه نیکي نه بینراو، یان که مبینراوی توێژینه وه یی له سەر ڕهنگ و ڕهنگی سوور بخاته به رباس و ههول و خواستیکه که لینی ت که ئەده ب پربکاته وه.

که رهسته و سنور و میتۆدی توێژینه وه که

پیناسه و باسکردن له سەر ئەده ب و ئەده بی شیعری، فراوانه و زۆری له سەر نوسراوه، بۆیه کاتیک به شیکي ئەم ئەده به ده که ویت به تیشکی توێژینه وه، پتویسته سنوریک بۆ باسه که ی دابنریت، بۆیه له توێژینه وه که، له نیو ڕهنگه کاندایه نهها به وردی باس له ڕهنگی سوور و له نیو شیعری کوردی نهها نمونه کانی شیعری کلاسیکی کوردی وه رگیراون. که ئەمانه ییش له چوارچیه ی ڕیباژیکي وه سفی شیکاری خراونه ته به رباس و جگه له ڕهنگی سوور، شیعری شاعیرانی کلاسیکی، له (نالی) یه وه تا نیوه ی یه که می سه ده ی بیسته م، ده که شیعره کانیان کراون به که رهسته ی توێژینه وه که. که رچی له شیعری کوردی به کۆن و نوپوه، که لیک ده لاله تی جیا جیا هیه له باره ی ڕهنگه کانه وه، به لام له به ره وه ی ناوه رۆکه که زۆر فراوان نه بیت، توێژینه وه که نهها شیعری کۆن (کلاسیک) ی هه لباردوه و له نیوه نه ده یشتا، واته له نیو ده که کلاسیکیه کان، ده قی چه نه شاعیریکي وه رگرتوه، چونکه به گه ران و وردبونه وه ئەوه بۆ توێژینه وه که ده رکه وتوه که ئەو مەبەست و ده لاله تانه ی که له لای ئەم چه نه شاعیره هیه (که توێژینه وه که به کاریهیتان) به گشتی لای ئەوانی تریش هه ر به وشیه یه ن، بۆیه ڕیبه نه دی و سه رده م و خسته ی بۆیان دیاری نه کردوه، چونکه پتیش شیعره کلاسیکیه کان، ئامانجی توێژینه وه که ده رخستنی ده لاله ت و به های ڕهنگه له نیو ده که کاندایه وه که له ژماره ی شاعیران و شیعره کانیان.

پیکهاته ی توێژینه وه که

توێژینه وه که، که به ناو نیشانی (ڕهنگی سوور له شیعری کلاسیکی کوردیدا)، جگه له پتیشه کی باس، که وه که سه رتا و ده ستیکه بۆ توێژینه وه که، له ناوه رۆکدا؛ باس له چه مک و ده لاله ته کانی ڕهنگه کان و شیوازی دروستبوون و گرنگیان کراوه، له گه ل ئەوه شدا، تیشکی خستوه ته سه ر سایکۆلۆجی ڕهنگه کان له سه ر شاعیران و هه روه که باسی شیکي له گرنگی ڕهنگ کردوه له ئەده بیاتی شیعری کوریدا، به له به رچا و گرته ی ناو نیشانی توێژینه وه که، به وردی باسی له مەبەست و ده لاله ته کانی ڕهنگی سوور و به کارهیتانی ئەم ڕهنگه کردوه له شیعری کلاسیکی کوریدا، که چۆن ئەم ڕهنگه

هه‌رجاره و بۆ مه‌به‌ستیکی شیعریی جیا له واتای بنجی وشه‌که (سوور) خۆی به‌کارهاتوون له نیو ده‌قه کلاسیکیه‌کاندا.

مه‌به‌ست و ده‌لاله‌تی رهنگ، چه‌مگ و پیناسه

"رهنگ: که له تیشکی سپییه‌وه دروسته‌بیت؛ به‌چهند شه‌پۆلیکی درێژ و جیاواز ده‌رده‌که‌ون و درێژی شه‌پۆله جیاوازه‌کان وا له ئیمه‌ ده‌که‌ن که بتوانین رهنگ جیاواز ببینین" (سه‌هلا و منصور، 1392: 124)، رهنگ: له زمانی عه‌ره‌بیدا (اللون) و له زمانی ئیگیلیزیدا (color) ی پیده‌وتریت، وشه‌ی رهنگ له‌لایه‌ن سروشتناسانه‌وه به‌کارهاتووه، "رهنگ توخمیکی دیاری گه‌ردونیه‌ی و وه‌ک پیکهاته‌یه‌کی تایبه‌تی له جوانی له ژیا‌ماندا پۆلی دیار و به‌رچاوی هه‌یه به‌هۆی پرووناکییه‌وه له‌م دونیا‌یه‌دا دروست ده‌بیت" (اله‌الی، 2019: 1)، تا گه‌شتووه به‌هونه‌رمه‌ندا و بره‌ویان پیداووه، واتای ئه‌م چه‌مکه: شه‌پۆلیکی جولا‌وه‌یی پرووناکییه‌ و چاوه‌هه‌ستی پیده‌کات، هه‌ر چاوه‌جیاوازی رهنگه‌کان له رینگه‌ی تۆر؛ بر و سیفیه‌ت و راده‌ی تیزژی رهنگه‌کان هه‌ستپیده‌کات، رهنگیش به‌پیی هه‌ستپیکردنی چاوه‌هه‌میای جیا‌جیا‌یان له‌سه‌ر دانراوه له‌رووی پیکهاتنییه‌وه، دواتر هه‌ریه‌که و به‌ناویکه‌وه دهر ده‌بیت: ئه‌مه سووره، ئه‌وه سپییه و ئه‌وی دی سه‌وز و ره‌ش... بۆیه رهنگ: "به‌یه‌کی له‌بواره واتایه‌کانی زمان دانه‌نری، وه‌ک گروپیکی وشه، په‌یوه‌ندییه واتایه‌کانیان دهر ئه‌که‌ویت" (جه‌باری، 2016: 112) یان: "ژیان خۆی ده‌لاله‌ته بۆ رهنگ، له‌به‌ر ئه‌وه رهنگه‌کان ژیان وینا ده‌که‌ن، به‌ویناکردنیشیان ژیان نه‌خشین ده‌که‌ن" (عزیز و محمد، 2019: 113) یانیش: "رهنگ" یه‌که‌مین که‌ره‌سته‌یی زمانیه، که ئه‌وانه‌ی ده‌وره‌یانداوین، پیدیه‌دوین، ئه‌مه‌یش خۆی له‌وکارانه ده‌بینیتوه که پۆژانه پویستمانن" (ره‌ئووف، 2017: 457)، به‌م خویندنه‌وه‌ی ئه‌م پیناسانه‌ی سه‌ره‌وه، ده‌گه‌ین به‌وه‌ی، رهنگ: جگه له‌روانکه فیزیکیه‌که‌ی، راسته‌خۆ په‌یوه‌ندی به‌چاوی مرۆف و چلاکیه‌کانی ناخی مرۆف و کاردانه‌وه ژیا‌نییه‌کانیه‌وه هه‌یه، چۆن تیشه‌که‌کان له‌سپیتییه‌وه ده‌لاله‌ت له‌رهنگه‌کانی (سوور، سپی، ره‌ش، شین، سه‌وز...) ده‌که‌ن، ئه‌وا‌یش کاروکرده‌کانی مرۆف، له: (خۆشیی و ناخۆشی، خه‌م و ئازار، جوانی و ناشرینی، درووی و نزیک یاران، عه‌ شقی ئیلاهی... دروستکه‌ری رهنگه‌ی جودا و ده‌لاله‌ت و واتای جودان بۆ رهنگه‌کان.

رهنگه‌کان، له‌سروشتدا؛ له‌و کاته‌وه‌ی ته‌نها پرووناکیین و تا ده‌بنه‌ رهنگیکی ته‌واو، سیفیه‌ت و تیزژی و پله و راده‌بیان هه‌یه، له‌خواره‌وه به‌کورتیی له‌م بو‌عه‌ده‌وه تیشکیان ده‌خه‌ینه‌سه‌ر:

1- سیفیه‌تی رهنگه‌کان: ئه‌و تایبه‌تمه‌ندییه‌ی که هه‌ر رهنگ له‌یه‌کیتی تر جیا‌ده‌کاته‌وه و ناو و پۆله‌تی خۆی هه‌یه، که واده‌کات بلین ئه‌م رهنگه‌ له‌وی دی جیا‌وازه، وه‌ک: رهنگی سوور و پرته‌قالی و شین و ئه‌رخه‌وانی و... بۆ نمونه که رهنگی پرته‌قالی ده‌بینی، ئه‌وه دهرئه‌نجامی تیکه‌لکردنی ماتریالی سوور و زه‌رده، بۆیه رهنگه‌کان هاوچه‌شن خاوه‌ن سیفیه‌تی خۆیان و به‌سیفیه‌ته زه‌ردویی و سه‌وز هه‌لگه‌ران و سووربوونه‌وه‌یه‌وه ده‌ناسرینه‌وه.

2- **تیزی رهنه‌کان:** کاتیک ده‌لین ئەم رهنه‌گه کال یان تاریکه یان توخه، ئەمه راده‌ی رهنه‌گه‌که دهرده‌خات، واته چه‌نده له سپیتی و ره‌شیه‌وه نزیك و دووهره، ئەم ره‌ش بیین و سپیتییه، راده‌ی دووری و نزیکیمان له رهنه‌گه‌کانه‌وه دیاریده‌کات، هه‌تا دووربین رهنه‌گه‌کان مه‌یله‌و تاریکتر ده‌بینین و چاوی دیاریکردنی رهنه‌گه‌کان تیکه‌ل ده‌کات نزیکترین روونتر.


3- **پله‌ی رهنه‌گه:** ئەو تاییه‌تمه‌ندییه‌یه که راده‌ی چری و روونی رهنه‌گه و پاکی رهنه‌گه، دیاریده‌کات، رهنه‌گه‌کان هه‌ندیکیان پاک و روون و هه‌ندیکی تریان تاریک و تیکه‌ل، ئەم پله به‌ندییه، ئەنجامی لیدان و کاریگه‌ری رووناکییه له‌سه‌ر رهنه‌گه، که واده‌کات پله‌ی رهنه‌گه‌کان دهره‌که‌ون به کالی یان توخی بۆ هه‌ر رهنه‌گه‌ک.

هه‌موو ئەمانه دهرئه‌نجامی جوولانی راده‌ی رووناکیی سروشته و بۆیه "رهنه‌گه به هه‌موو جوور و سیماکانییه‌وه، که سه‌رچاوه‌که‌ی سروشت و سه‌رچاوه‌کانییه‌تی، هه‌میشه له دیده و بینینی مروّفا خوی ده‌نوینیت" (جه‌باری)، (2016: 114)، که دوا جار ده‌چیته سه‌ر کارو کرده و لیکه‌وته‌ی زمانی مروّف و له‌و رووه‌یشه‌وه رهنه‌گه ده‌بیته په‌یامیکی زمانی و واتایی و ده‌لاله‌تی جیا‌جیای واتایی ده‌دات، بۆیه گونجاوه بلێین: رهنه‌گه؛ په‌کیکه له هۆیه‌کانی گه‌یاندنی په‌یام له نیوان مروّقه‌کان، هه‌روه‌ها هۆیه‌که بۆ ئاشنابوون و نزیکبوونه‌وه‌ی تاکه‌کان په‌کتری و ده‌بیته مایه‌ی پیکه‌وه ژیان له‌گه‌ل په‌کتریدا" (عزیز و محمد، 2019: 116).

رهنه‌گه‌کان له سروشتدا، جگه له‌و شیوه‌یه‌ی که چاو دیاریده‌کات هه‌ریه‌که‌یان له ناخدا، له کۆمه‌لگه‌کاندا، هه‌لگری په‌یام و مه‌به‌ست واتایه‌کی جیاوازن، له رهنه‌گه‌کاندا، رهنه‌گه سه‌ره‌کییه‌کان که بریتین له (سه‌وز، سه‌وز، شین) جگه له‌وه‌ی هه‌ریه‌که‌یان به پێی بۆچوون لێروانیی کۆمه‌لگه‌کان، هه‌لگری واتا و په‌یامیکن، هه‌روه‌ها لیک نزیکبوون و پیکه‌بوونیان به‌یه‌کتری، رهنه‌گی نوێ دروست ده‌کهن، بۆنمونه:

- رهنه‌گی شین و سه‌وز: رهنه‌گی په‌مه‌یی لێ دروستده‌بیته.
- رهنه‌گی سه‌وز و سه‌وز: رهنه‌گی زه‌ردی لێ دروستده‌بیته.
- رهنه‌گی سه‌وز و شین: رهنه‌گی ئاسمانی لێ دروستده‌بیته.

هه‌روه‌ک له دوو وینه‌که‌ی خواره‌وه‌یشدا روونکراوه‌ته‌وه:




له نیو ئەم ڕەنگە دروستبووانەدا، زانایان دوو گروپ، یان دوو جۆری سارد و گەرمیی ڕەنگیان دیاریکردووە:

1- ڕەنگی گەرم: "هەستیکی گەرم دەبەخشن، بۆیە پێیان دەگوتریت ڕەنگی گەرم، ئەم ڕەنگە بە کۆمەڵەیهکی ڕەنگی دیارکراون، که کۆمەڵەیه ڕەنگی گەرمی: (زەرد- پرتەقالی- سوور) له خۆ دەگریت، ههروهها به کاریگه‌ریی دهرونیان کاردهکه‌نه‌سه‌ر یادگه‌ی مرۆف و یادى ڕەنگه‌کانى ئاگر و خۆر و خۆین سه‌رچاوه‌ی گه‌رمی دیننه به‌ر ئاوه‌ز" (ایمان، 2020: 77)، که ئەمانه ڕەنگی پایز و خۆرئاواو بوون و خۆرهلان و ئاگر و... به‌گشتی ئاماژه‌ن بۆ چلاکیی و هه‌ست و سۆز، که ڕەنگی سوور و زەرد، سه‌ره‌کیین و له ئەنجامی ماتریالی ئەم دووانه؛ ڕەنگی پرتەقالی دیتە بوون، که زیاتر وه‌رزی هاوین و کاته گه‌رمه‌کانی پۆژ به‌لای ئەم ڕەنگانه‌دا ده‌شکینه‌وه.

2- ڕەنگی سارد: هەستیکی قوڵی ساردیی دەبەخشنه به‌ر ئاوه‌زی مرۆف بۆیه به ڕەنگه سارده‌کان ناوزه‌دن "ڕەنگه سارده‌کانیش، کۆمه‌لیک ڕەنگی وه‌ک: (شین- سه‌وز - یان مه‌یله‌وشینی یان وه‌نه‌وشه‌یی و مه‌یله‌و وه‌نه‌وشه‌یی)، له خۆ ده‌گریت، ئەم ڕەنگانه له‌گه‌ل ڕەنگی ئاسمان و ئاودا ده‌گونجین و ساردیی دیننه به‌ر ئاوه و شعوری مرۆف" (ایمان، 2020: 77)

و ئەو ڕەنگانه‌ی له‌م گروپه‌وه نزیکن؛ شیوه‌ی سروشتی شاخ و گژوگیا و ئاسمانی شین... دهنوین، ئەم ڕەنگه له وه‌رزی به‌هاری و زستان و شه‌واندا زیاتر دهرده‌که‌وێت. له کاری وینه‌گرییدا ئەم ڕەنگانه ده‌بنه هاوسه‌نگی وینه‌یی (white balance)، که ڕەنگی زەرد و سوور و هاوشیوه‌کانیان، ده‌بنه ڕەنگی گەرم و ڕەنگی شین و سه‌وز و هاوشیوه‌کانی، دۆخ و ڕەنگی ساردی ناو وینه‌کانن. ڕوونکردنه‌وه‌ی زیاتر له وینه‌ی خواره‌وه‌یه:



واتای رهنگهکان

رهنگهکان، هەر یه‌که و به‌پێی لێ تیگه‌یشتن له زه‌ینی مرۆڤدا، هه‌لگری په‌یام و واتای تایبه‌تن، واتای جیاواز و هه‌ندیكجار هاومانان، كه‌ر یه‌کیان به‌شێوه‌یه‌ك هه‌ستی مرۆڤ ده‌روژێنن، هه‌ندیكجار رهنگی، له‌یه‌ك كاتدا واتای باش و خراپ، یان واتای گه‌شی و تو‌ره‌یی ده‌دات، وه‌ك رهنگی سوور، یان زه‌رد به‌ واتای نه‌خۆشی و هه‌م واتای پایزی جوان دیت... "رهنگ وه‌ك ژێده‌ریکی مه‌عریفی؛ له‌ سه‌رده‌می مۆدی‌رندا تیکه‌لبوونی شیعی‌ری له‌گه‌ڵ رهنگه‌کان، توخمیکی مه‌عریفی زیاده‌دوو كه‌ له‌ قوتابخانه‌ مۆرفۆلۆژییه‌کانی هاوچه‌رخ‌ی هونه‌ری وینه‌كێشاندا نوێنه‌رایه‌تی ده‌كریت، وه‌ك واقیع و نه‌ینی، زانستخوازان و قوتابخانه‌ ته‌كنیکیه‌کانی تر كه‌ بنه‌ما و چه‌مكه‌كان و مه‌نه‌ه‌جیه‌کانی خۆیان له‌م سه‌رده‌مه‌ دامه‌زراندوه و جێ بایه‌خبووه، له‌سه‌ر بنه‌مای فه‌لسه‌فه و ئەزموونه مه‌عریفیه‌ كه‌ له‌كه‌بووه‌كان، له‌ فه‌لسه‌فه‌ی كاره‌كانیاندا تیکه‌ل كراون" (محمد، 2006: 34). به‌رمه‌بنای ئەمه و له‌به‌ر ئەوه‌ی رهنگه‌کانی سروشت زۆرن، به‌لام له‌به‌ر ناو‌نیشان و سنوری باسه‌كه‌مان، له‌ نیو رهنگه‌ باوه‌كانی: (سه‌وز سوور، سپی، ره‌ش، پرته‌قالی، زه‌رد، شین)، ته‌نها رهنگی (سوور) ده‌خه‌ینه به‌رباس:

رهنگی سوور: سوور، زۆری له‌سه‌ر و تراوه، "له‌ نیو زۆربه‌ی میله‌تاندا به‌ واتای شو‌ر و به‌رخودان و شه‌هید بوون ئەناسریت" (جه‌باری، 2016: 116) رهنگی هیز و هه‌ست و سو‌زه، توانای سه‌ركرده‌یه‌تیکردنی هه‌یه و سه‌ر توپی رهنگه‌ گه‌رمه‌كانه و تواناو وزه‌ ده‌به‌خشیت، به‌ كالی، واتای وروژاندن و وزه‌ ده‌دات و كاتیک به‌ره‌و قاوایی بوون ده‌چیت هه‌ستیکی گه‌رمی به‌هیز ده‌به‌خشیت. له‌ كه‌ لتوری ولاتیکی وه‌ك (چین)دا، نیشانه‌ی شادییه و له‌ ئاهه‌نگه‌كاندا به‌كاردیت وه‌ك به‌لگه‌ی سه‌رکه‌وتن، به‌لام له‌ ئەفریقا یشانه‌ی مردنه، به‌لام له‌ ژاپۆن به‌ واتای تو‌ره‌یی و مه‌ترسی دیت، رهنگی سوور: رهنگی گه‌رمه، بۆیه رهنگیکی سه‌رنج‌راکێشه كه‌ تایبه‌تمه‌ندیی جنسی هه‌یه، "هه‌روه‌ها وه‌ك ده‌لاله‌ت به‌ستراوه‌ته‌وه به‌ توندوتیژی، رهنگیکه‌ گوزارشت له‌ ئاگر و خوین توندوتیژی ده‌كات" (امین، 2008: 614). کاریگه‌ری فیزیۆلۆژی هه‌یه له‌ زانستی پزیشکیدا ده‌بیته‌ هۆی هه‌ئاوسان(التهاب)، وه‌ یارمه‌تیده‌ر و نیشانه‌یه‌ بۆ تو‌ره‌بوون ته‌نانه‌ت له‌ دیمه‌نه‌ شانوویه‌کاندا؛ گوزارشت له‌ تو‌ره‌یی و رق و كوشتن ده‌كات" (جابر، الجزء (2): 611)، سوور: یه‌كه‌م رهنگه‌ كه‌ مرۆڤ له‌ سارشتدا ناسیویه‌تی، هه‌روه‌ها چه‌ند رهنگی تر له‌ سروشتدا، ده‌لاله‌ت له‌ رهنگی سوور ده‌كهن، وه‌ك: تیشك و دروشانه‌وه‌یی خۆر، تیشکی ئاگر، گه‌رمی.. ئەمانه‌ به‌ رووناکی و شه‌پۆلی گه‌رمی رهنگی سوور ده‌ناسرین..

رهنگه‌کان و کاریگه‌رییان له‌سه‌ر سایکۆلۆژی شاعیر

رهنگ وه‌ك کاریگه‌ریی كه‌ "به‌وزه‌یه‌کی سوک ناسراوه كه‌ ده‌چیته‌ ناو جه‌سته‌وه و خانه‌کانی میتشك ئاگادار ده‌كاتوه، ئەویش ده‌بیته‌ هۆی ده‌ردانی هه‌ندیک هۆرمۆن، كه‌ كۆمه‌لیك له‌ پرۆسه‌ فیزیۆلۆژییه‌کان به‌ره‌م ده‌هێنن و به‌م شێوه‌یه‌ راسته‌وخۆ كۆنترۆلی به‌سه‌ر بیرکردنه‌وه و میزاج و هه‌لسوکه‌وتماندا ده‌كهن" (ایمان، 2020: 73). ئەمه‌ ئەو کاریگه‌رییه‌ فیزیۆلۆجیانه‌یه‌ كه‌ به‌هۆی تو‌ری نه‌خۆشیی و خۆشییه‌وه‌ دروستده‌بیت، جا چ به‌هۆی رهنگی رهنگاوه‌ بیت یان تیشکی رووناکی رهنگاوه‌ رهنگ، بۆیه مرۆڤ، بی‌ویستی خۆی، بی‌ئوه‌ی دیاری‌کردبیت، رهنگه‌کان کاریگه‌رییان له‌سه‌ری ده‌بیت، ئەم رهنگانه‌و به‌تیا به‌تی تیژی رهنگی سوور؛ له‌گه‌ڵ ده‌رونییدا کارلیکه‌ه‌كهن، ریکه‌ه‌ه‌كون بۆ هه‌ندیکی دل‌کراوه‌ بیت و هه‌ندیکی تری داخراو،

هەر ئەمەیش وادەکان ڕەنگیک زاتر بیت بەسەر ڕەنگی تر لای مرۆف، ڕەنگەکان؛ لە زۆر کاتدا وەک چارەسەری دەروونی بەکار دێن، بۆ نمونە؛ "ڕەنگی ڕەش: ڕەنگی خەم و حوزن و ناوومیدییه، عەرەبەکان بە ڕەنگی ترس و ڕەش و ڕوتیان داناو، لای کوردیش هەروا، پێچەوانەی ڕەنگی سپی و بەهۆی لەدەستدانی ڕووناکی یا هەلمژینی ڕەنگی ترهوه دروسته‌بیت، لە زۆر بەی بۆچوون و حاله‌ته‌کاندا ئەم ڕەنگه بۆ خەم و ڕەشبینی وەرگیراوه هەروەک هێمایه بۆ تاوان و لەدەستچوون" (سلیمان، 2016: 170-171)، لە بیر و هزری شاعیرانیش هەر ئاماژەن بە خەم و خەفەت و هەروەک ڕەنگی زەردیش بۆ گرژی و سپی بۆ ئارامی و ئاشتی دەروونی، ئەمانە و ڕەنگەکانی تر هەر یەکە و دەلاله‌تیکی بۆ تیروانین هەیه و ئەم هەسته ڕەنگییه بۆ چارەسەر له وینە‌کیشان و ڕەنگکردندا وینا دەکریت.

زۆرجار ئەم کاریگەرییه (ڕەنگی سوور)، لە کۆمه‌لگه‌دا و لای تاکه‌کانی، زروف و بارودۆخی: سیاسی، کۆمه‌لایه‌تی، هونەری... دەیه‌نینته بوون، لای نه‌توه و تاکی کورد، له‌بەر ئەوهی به‌دریژی میژوو، له ژیر سته‌م و غەدری دوژمنان بووه، بۆیه ڕەنگی سوور زاله و جگه له واتا بنچیه‌یه‌که‌ی، به واتای: جەنگ، شو‌رش، به‌خودان، شه‌هیدی، خونچه و گول وەک نیشانه‌ی پشکوتن، شای و شهرم... هاتوه، ئەکریت ئەم کاریگەرییه به پنی ته‌مه‌نیش بگۆردیت، واته ماوه‌ی ته‌مه‌نی گەنجی و شادی، زیاتر ڕەنگه گەرمه‌کانی وەک (سوور و زەرد) زیاتر به‌کار دیت لای تاک و ته‌مه‌نی گەوره و بوون و به‌ره‌و پیری، ڕەنگه سارده‌کانی وەک (سه‌وز و شین) زیاتر جی بایه‌خن، که دواجار بابه‌خدا نه‌کەیش وەک کاریگەری له‌سەر دەروونی تاکه دیته بوون و ڕەنگاله‌یه‌ک به‌ژیانی که‌سه‌ده‌دات، که واده‌کات "به‌کاره‌یانی هەر ڕەنگیک لای هەر تاکیک باری دەروونییه‌که‌ی و ئەو ژینگه‌یه‌ی تیدا ده‌ژیت، دەری بخت.

بۆیه ده‌کریت ڕەنگی سووریش په‌یوه‌ندییه‌کی پته‌وی به‌باری دەروونی شاعیرانه‌وه هه‌بیت و دۆخی هەر تاکیک له باره جیا‌جیاکان ڕوون ده‌کاته‌وه" (عزیز و محمد، 2019: 117)، له ناو کۆمه‌لگه‌یشدا، ئەدیبان و شاعیران هەن، ئەمانیش راسته‌وخۆ ده‌که‌ونه به‌ر کاریگەری باری دەروونی ڕەنگه‌کان، ڕوانینی شاعیران بۆ ژیان، جودا تره له هەر تاکیکی تری نیو کۆمه‌لگه، ئەمان مرۆف گه‌لیکی به‌هه‌ست و دلناسکی وشەن و هه‌موو دیمه‌نیک به‌تیکه‌لی ده‌ربیری خه‌یالیکی ده‌بینن و کاروچلاکی و کرده‌کانی ژیان زووتر کارییان تیده‌کات، ئەم چلاکیه، به‌ریگه‌ی می‌شکه‌وه ده‌کات ناخ و له‌ریگه‌ی په‌نجه‌وه به‌وینە‌ی شیعری ده‌رژیته‌سه‌ر کاغه‌ز.

بۆیه ده‌کریت له‌نیو ڕەنگه‌کان و کاریگەرییان، ڕەنگی سووریش، بابه‌ت گه‌لیک له‌شیوه‌ی وینە، لای شاعیرانی کورد به‌تایبه‌تی کلاسیکی، بوروژین، ئەم ڕەنگه‌یش چه‌ندین بابه‌ت و ده‌لاله‌تی جیا‌جیا له‌نیو ده‌قه‌کان ببه‌خشیت. چونکه، ڕەنگی سوور، چۆن کاروکرده‌کان و ژینگه‌ی شاعیر(له‌شیعردا)، له‌ریگه‌ی وشه‌کانه‌وه شتی باو و ئاسایی ده‌گۆریت بۆ شتی ناباو و نا‌ناسیی له‌ریگه‌ی وشه‌وه، ده‌لاله‌ته‌کانی ڕەنگی سووریش، هه‌مان کار له‌وینە‌ی شیعری شاعیراندا ده‌که‌ن.

ڕەنگ له‌ئەدەبی شیعرییدا

"ڕەنگ هه‌یشه توخمیکی زیندووی چیرۆکی شیعره‌که‌یه، له‌بەر ئەوه‌ی ڕه‌گه‌زیکي دیاری پیکهاتنی دیمه‌نی شیعریه به‌بوونیکی فیزیکیه‌وه وینە ڕۆحیه‌که به‌رجه‌سته ده‌کات و زمانی نوسینه‌که‌یش ده‌کات به‌ئلایه‌ک بۆسه‌رکه‌وتن" (محمد، 2006: 33) به‌م شیوه‌یه ڕەنگ نیشانه‌ی هه‌لگری تاییه‌ته‌ندیی ئەو وینە‌یه بوونیه‌یه که به‌شیوه‌یه‌کی مانادار له‌پیکهاته‌ی دال و مه‌لولدا پیوه‌ی لکیندراوه، که دواجار ده‌مانگه‌یه‌نیت به‌وه‌ی که ڕەنگ:

به دهنگ و جولە بەشداری دهکات له تیکه لکردنی دیمه‌نی شیعریدا، بۆیه "وینه و وینه‌کیشان و به‌کارهینانی دهنگ لای شاعیرانی کورد، به‌تایبه‌تی له‌سه‌رده‌ی نۆزده‌یه‌م و پینشتیشدا هونه‌ریکی باو و نه‌ناسراو بووه، ئەو‌کاته‌یش ئە‌گه‌ر هه‌ندیک زانیای له‌و باره‌یه‌وه هه‌بوو، ئە‌وا به‌ شیعر نوسیویانه" (عمر کاکێ، 2018: 25)، چونکه هه‌ر هینده ئاو‌ه‌زیان بۆی هه‌بووه گه‌رچی که‌میش نییه ئە‌و درک پیکردن و به‌کارهینانه.

دهنگ؛ وهک ئایکۆن و هیمایه‌کی ئە‌ده‌بییه، شاعیران؛ له‌ زۆریک له‌ ده‌قه ده‌شیعرییه‌کانیان، ده‌نگیان وهک ده‌م‌ز به‌کارهیناوه، هه‌ندیک جار راسته‌وخۆ و هه‌ندیک‌جاری تر نا راسته‌وخۆ به‌کارهیناوه، بۆ نمونه؛ (خه‌نه‌)یان وهک ده‌م‌زیک به‌ واتای ده‌نگی سوور به‌کارهیناوه، هه‌ندیک‌جاری تر؛ سووربوونه‌وه‌ییان وهک ده‌م‌زیک تهوره‌یی به‌کارهیناوه، یاخود ده‌ش وهک ده‌م‌زیک بۆ پرچی یار و سپی وهک پیربوون... ده‌نگ و هیمایه‌ ئایکۆنیکی ئە‌ده‌بییه، سیمایه‌کی دیاری هیمایی و ناروونی و نه‌بوونی روونی و راسته‌وخۆییه، واته له‌ زمانی ده‌م‌زی و مانا و مه‌به‌ست و رواله‌ت و رووی وشه‌دا نییه، به‌لکو چه‌م‌کیکه له‌ ده‌روه‌ی رواله‌ته.

هیمایه و کۆد له‌ ئە‌ده‌دا؛ "یه‌کیک له‌ سیمایه‌کانی شاعیرانی نوێ که له‌ شیعری کۆن جیای ده‌کاته‌وه، به‌کارهینانی خه‌یال و ئە‌فسانه‌یه، له‌ شیعری شاعیرانی هاوچه‌رخدا، بۆیه شاعیران له‌ لایه‌ک ئاماده‌بوونی کارا و کاریگه‌ری ده‌نگه‌کان وهک ده‌م‌ز و کۆد ده‌بینین و له‌ لایه‌که‌ی دیکه‌ش فره‌جۆری له‌ دایکبوونیان و فراوانبوونی وینه و هونه‌ره" (سیاوشی و چینگه‌ر، شماره‌ (37) به‌هار 1395: 82)، که‌ وا ده‌کات له‌ شاعیر بیری به‌هێز بکات و وینه‌ی ده‌نگه‌یه‌ی خه‌یالی ناوازه به‌ره‌مه‌به‌یتیت. هه‌روه‌ها ده‌نگ له‌ ئە‌ده‌دا، یه‌کیکه له‌ فاکتوره‌کانی گواسته‌وه‌ی بیری شاعیر بۆسه‌ر کاغه‌ز، که‌ ئە‌م ده‌ربرینه، له‌ گه‌ل ده‌ قی کۆن (کلاسیکی)یش یه‌کده‌گرته‌وه، چونکه ده‌لاله‌ته‌کانی ده‌نگ له‌ کۆن و نویدا، گۆرانگاری و اتاییان به‌ سه‌ردا نه‌هاتوه، بۆ نمونه؛ له‌ کۆن و نویدا، ده‌نگی سوور، هه‌ر به‌ واتای هیزو و خۆشه‌ویستی و ده‌نگی خۆین و هه‌ستی و روژاندن و... هاتوه، ئە‌م مامه‌له‌کردنه، په‌یوه‌سته‌ کاردانه‌وه‌ی لایه‌نی سایکۆلۆجی شاعیر، وهک له‌وه‌ی له‌ چوارچۆیه‌ی فۆرم و ناوه‌پۆکا په‌یوه‌ندی به‌ سه‌رده‌می کۆن و نوێ هه‌بیت. لێره‌یشدا شیعر: "وهک جوانیه‌ک؛ خۆی له‌ خۆیدا وینه وهک وه‌سپه‌یه‌ک بۆ په‌یوه‌ندیکردن به‌ چلاکی و داهینانه‌کانی ده‌ورو، ئە‌م وینه‌یه‌ش به‌نده به‌ ده‌نگ و هیلکی گه‌یه‌نه‌ره بۆ ده‌ربرینی خۆشه‌ویستی، رق، خه‌م، شادی، سه‌رما، گرژی، بیده‌نگی و... (اله‌لالی، 2019: 2)" بۆیه ده‌نگه‌کان کاریگه‌ری گه‌وره‌یان هه‌یه له‌سه‌ر پۆحه‌کان، ئە‌م کارکردنه سه‌ره له‌ که‌سه‌یکه‌وه بۆ که‌سه‌یکی تر بر و راده‌ی به‌کارهینانی جیاوازه و به‌هه‌مان لای تاک و هه‌ر تاکه و کاریگه‌ری له‌سه‌ر ده‌نگه‌کانی تاییه‌ت به‌ خۆی هه‌یه، به‌پیتی خواست یان سۆزی خۆی یان به‌رامبه‌ر ده‌نگ و کاریگه‌رییه ده‌روونییه‌کانی کار له‌ کاروکرده‌کانی ژیا‌نیشی ده‌کات.

ده‌نگ به‌هه‌تیکه‌ی دیرینی له‌ گه‌ل ئە‌ده‌دا هه‌یه، له‌ ئە‌ده‌بی زاره‌کی و نوسراویشدا؛ به‌هه‌تیکه‌یان به‌ ده‌نگ پوونکراوه‌ته‌وه، بۆ نمونه، مروف گه‌لی کۆن، ئە‌گه‌ر شتیکیان بوسته‌ییه، سه‌ره‌تا وینایان ده‌کرد و ده‌نگیان به‌کارده‌هینا بۆ ئە‌و ویناکردنه، که‌ وهک سه‌ره‌تایه‌ک بۆ ده‌ربرینی ده‌نگه‌کان له‌و‌کاته‌دا پێی خۆش‌حالبوون.

له‌به‌ر ئە‌وه‌ی ده‌نگه‌کان به‌ درێژایی میژوو مانای جیاوازیان هه‌یه بۆ که‌سانی جیاوازیان (شاعیرانی جیاوازیان)، بۆیه ده‌کریت ببه‌ یه‌کیک له‌ گرنگترین لایه‌نه‌کانی روژاندنی ده‌رونی شاعیر و گرنگترین ده‌نگه‌زێشبه‌ن بۆ هیمای مروف، چونکه ده‌نگ و هیمایه، وهک ئە‌وه‌ی هاتوه‌ته‌واوه‌ری ئە‌زمونه‌ مروفیه‌کان و دووباره‌ کردنه‌وه‌ی بێرکردنه‌وه‌ی خه‌لکه، بۆیه به‌کارهینانی ده‌نگه‌کان به‌ مانا ده‌م‌زی و ده‌م‌زییه‌کانی تاییه‌تمه‌ندی شیعری سه‌رده‌م

و کۆن و به کارهیتانی هێما و کۆدهکان، یه کێکه له سیما دیارهکانی شیعری کۆن و هاوچهرخى ئێرانى و عه ره بى و کوردیش، هه ر بۆیه شاعیران؛ له رینگای هێما و کۆدهوه بارودۆخى خه لکى چه وساو ه وینا ده که ن و له چوار شێوه یه کى (سیاسى و کۆمه لایه تى و هونه رى) به ر ه ن گ بیره کانیان ده که به وشه و وینه ی شیعری پى ده کیشن. "ره ن گ له کاره کاندای پۆلینى جیاوازی هه یه، شاعیره کان هه ندیک جار روو له وینه و نوینگه رى ده که ن و هه ندیک جاریش ئه نجامى به رجه سته بوونى مه جازى ره ن گ ده رده بړن، ره ن گ گرنگترین توخمى قوتابخانه ی ئه ده بى وینه یه، شاعیرانى ئه و قوتابخانه یه، له جیاتى ئه وه ی راسته وخۆ گوزارشت له چه مکه کانی وینه و خه یال بکه ن، دین و ره ن گه کان ده که ن ره مزیکى ئه ده بى و وینه خواستراوه که ی به رجه سته ده کات" (سهیلا و منصور، 1392: 125) شاعیره کان؛ ره ن گ به کاردینن بۆ دروستکردنى وشه و دواتر له وینه ی شیعری و گوزارشتکردن له چه مکه روون و جوانه کان، ئه و وینه یه که شاعیران له جیهانى ده وروبه ریان پیشکه شى ده که ن، وه سفى وه رزه کانی سال و دیمه نه ره ن گاله یه جیاوازه کانی سروشت، خه یال و بینینان ئاشکرا ده کات. پیشکه شکردنى وینه ی نوپى شه و و رۆژ، وه سفى وه رزه کانی سال به ره ن گى وه رزه کان، جوانیه که تابه ت و خه یلاوى به ئه ده بیاتى شیعیر ده به خشیته.

له ئه ده بى شیعری کوردیدا، شاعیران ره ن گ به شێوه ی به هیز و هه میش شێوه ی لاواز به کاردینن، ره ن گه به هیزه کان ئه و ره ن گانه ن که به شێوه ی چر و زیاتر کاریه گه رى له سه ر ده رونیان هه یه و ئه م کاریه گه ریه به شیعیر ده په رپه ته وه سه ر کاغه ن، لاوه کیه کانی بى توانا و لاوازن به پى پى پى پى دین و زۆرجار بۆ پرکردنه وه ی مه به ستى شیعیرن و واتا و مه به ستى روون و به هیزیان یه له شیعیردا.

له ئه ده بدا "ره ن گه کان، ژینگه ی زیندوویمان ده گۆرن به هارمۆنى یان دژبه یه کى خۆیان، ئه م هارمۆنى یا کونتراسته ی ره ن گه کان له ئه ده بى کارپیکراوى کۆن و نویدا زۆر فراوانه، چونکه ئه ده ب ئاوی ته وایى پوانینى هه موو کومه لگایه ک و بیرکردنه وه ی به رجه سته ده کات" (فاتحى و قهرمانى، 1396: 145)، وه ک چۆن ره ن گه کان له کۆمه لگادا هه ن و به شێوه یه کى ره مزى وینه یان له ئه ده بدا ده رده که ویت، هه ره که چۆن ره ن گى ره ش مانای بیهیوایى و تاریکی هه یه، سه وز؛ پیرۆز و ژیانپه ره رانه یه، سوور و زه رده و ئه وانى تریش هه مان ده لاله تن له ئه ده بدا و بۆ واتای خۆیان به کار هاتوون، نابیت ئه وه ش له یاد بکریته که ئیمتیازاتى گه وه رى ره ن گه کان تام و چیژ و به رژه وه ندی مرۆقه له هه لبژاردنى دا و هه موو که سیک به پى پى پى و باوه ر و ته نانه ت ئه زموونى شه خسى خۆى، ره ن گى خۆش ده ویت، شاعیران له ئه ده بدا هه روان، ئه م خۆشه وىستیه یه وای نیشانداده ت که ره ش له کاره کانییدا به به رزترین ده رکه و تنه وه خاوه نى به رزترین به کارهیتانه له رووى چه مکه وه، لای شاعیریکى تر، به هۆى مه ست بوونى به عه شق و جه نگی و به ر دوام رشتنى ئه شکی سوورى چاوه، ئه شى ره ن گى سوور بکه ویت به رزترین ئاستى ئه ده بییه وه.

بۆیه "هه ر کاریکى ئه ده بى نوینه رایه تى شێوازی بیرکردنه وه و دنیا بینى نوسه ر(شاعیر) ده کات، چونکه کارى ئه ده بى له سه ر قوولایى هه ست و سۆزى شاعیر دامه زراوه" (نیکوبخت و قاسم زاده، 1387: 207)، هه ره ها ره ن گانه وه ی که سایه تى و رۆحى ده روونى ئه و ده بیته، له گه ل ئه م چه مکه دا، ده گه یه ئه وه ی ره ن گ ده توانیت باشتترین ئامرازیت بۆ ناسینه وه ی هه ست و سۆز و رۆح و بیرکردنه وه و پرۆفیشنالیه تى(ئاست به رزى) شاعیر و دیاریکردنى دنیاى بینى خۆى له رپى به کارهیتانى ره ن گه کان له شیعیره کانییدا. هه ره ها "له ده قى شیعیرى و له ئه ده بدا، ره ن گه کان؛ ره ن گانه وه یه کى به هیزیان له سه ر زیندووویه تى و نه مری ده قى شیعیرى و لایه نى ئیستاتیکیه تى شیعیرى هه یه، ئه مه ش هۆکاریکه بۆ کردنه وه ی ئاسۆیه کى نوئى له به رده م واتای ده ق و دا هیتان

و جوانکاری دهق" که درهفت دهرهخسینیت هتا له ئەدەبدا و لەرێگە دەقی شیعرییەوه، ئەو ڕەنگدانەوه دەرونییە بێبیریت که له وێنه ڕەنگراوهکەى شاعیراندا هەیه.

دەلالەتەکانی ڕەنگی سوور لە شیعری کلاسیکی کوردیدا

"سوور له ڕووی دەروونی و میژوووییەوه به وشەى "ژیان و خوین" دەناسریت، که به (Ruh-Ira) له زمانى سانسکریتی و به لاتینی: (Rot) هاتوو و له هەردوو زماندا؛ به مانای (خوین و ژیان) ناو دەبرین، ئەم ڕەنگە(ڕەنگی سوور) زیندوو و له هەمان کاتدا به تهواوی له چوارچۆیەى؛ ڕەنگی گەرم و وزەبەخش دیاریدەکریت، هەروەها نزیکه له هەموو ماناکانى: دەسلات و خوین، هیمای ژیان، ڕەنگی بنچینهی... ئەم ڕەنگە؛ ھۆکاری هەستان و سەرکەوتنه، له وێنه هیماییهکاندا ڕەنگی سوور: (هیمای ئاگر و شەهوەت و شەر و خۆشه‌ویستی)بوو" (سهیلا و منصور، 1392: 133).

لای شاعیرانی کوردیش ڕەنگەکان و دەلالەتەکانیان، هەریه‌که و بۆ واتا و مەبەستیک دەستیشانکراوه، بەلام له ڕووی سایکۆلۆجییەوه، (ڕەنگی سوور) وەک ڕەنگیکی گەرم؛ که بەهێزترین ڕەنگی وروژاندن و ڕەنگی هەست و سۆزه، ئەم ڕەنگە جیاوازی تایبەتمەندی خۆی هەیه و جیاوازه له ڕەنگەکانی تر...، چونکه سوور؛ له هەموو ڕەنگەکانی تر زیاتر پەيوه‌ستیی به لایەنى سۆزدارییەوه لای شاعیرانی کورد، جگه له‌م کارییەى هەروەها سوور "له ڕووی زاستییەوه خانه هەسته‌وه‌رییەکانی ئاوه‌زی جەسته زیاد دەکات و ھۆکاره بۆ بەرزکردنەوه‌ی پەستانی خوین، ڕوومەت وەک فۆرمیکی تۆرەیی پیشانده‌دات، بۆیه سوور له‌م کرداردا وەک ئاماژەى هیز و توورەبوو و سەرچاوه ئاگرینەکان دادەنرین، به پشت بەستن بەمه، زانایان ڕەنگی سوور: بۆ وروژاندنی جەسته و میشک و بۆ زیادکردنی سووری خوین بەکاردینن. ڕەنگی سوور: "ڕەنگی هیزه و فرمانکردنه، هەر له‌بەر ئەمه‌یه که کاتیک ده‌گه‌یه ترافیک لاییت، ڕەنگی سوور دەمانوه‌ستینیت، ئەم ڕەنگه وەک ڕەنگی هیمایه‌ک بۆ هیزی پیاوان هەژماردەکریت که کاریگه‌رییەکی زۆری له‌سەریان هەیه" (میرعلی، 1397: 16)، بۆیه له‌گەل دەربرینەکانی شاعیرانی کورد، که پەيوه‌سته به ئاوه‌زی بیر و دەرونیان، وەگ پەرچه‌کرداریکن له‌کاتی خۆشی و ناخۆشییەکانی ژیانان، که سوور بووه‌ته ده‌لاقه و دەرچه‌یه‌ک که به مەبەست و دەلالەتی جوداوه وێنه شیعرییەکانیان بگه‌یه‌نن.

له‌لایه‌کی دیکه‌وه بۆ ڕوونکردنەوه‌ی زیاتر دەرکریت ئەمه‌یش بخه‌ینه ڕوو: "ئەم ڕەنگه که له‌گەل بونیاتی له‌ش و لایەنى بایۆلۆجی شاعیره‌(مرۆف)، که ده‌بیته تایبەتمەندی بۆ پەرچه‌کردار، له‌لایه‌ک بۆ ون بوونی ئەو بایۆلۆجییەى شاعیر، له‌لایه‌کی تریشه‌وه؛ شیوه پەشیمانیه‌ک له‌ کردارەکانی شاعیر نیشاندەدات" (کاوس و مصطفی، 1382: 96).

به سەرنجدان به‌و نمونه شیعرییانه‌ی خواره‌وه، به ڕووی به‌وه ده‌گه‌ین، که ڕەنگی سوور، له هەندى باری دەرونییدا، هیزی ژیانه، له‌بەر ئەمه و اتای خۆشه‌ویستی و هەر شتیکی تر ده‌خوازیت که خۆشه‌ویستی تێداییت، یان" به واتای ئاره‌زوییەکی به‌هیز دیت به‌رانبەر به شته خواستراوه‌کانی دەرۆبه‌رمان، "سوور؛ واته جوله، ئیراده له‌به‌رانبەر پیرۆزییەکان و هەموو شته‌ خاوه شوره‌ت و قەدرەکان" (سیاوشی و چیتگر، 1395: 88). ئەم ڕەنگه لای شاعیران، وەک مەبەست بۆ جوان دەربرین و دروستکردنی وێنه‌ی جوانی شیعری به‌کارهاتوو، هەروەها شاعیرانی کلاسیکی کوردیش، وەک هەر تاکیک به‌شیکى به ھۆی سایکۆلۆجی و کاردانەوه‌ی ڕەنگی سوور له‌سەر دەرونیان، پانتاییه‌کی گەوه‌ره‌ی له شیعەرەکانیان داگیرکردوو، ئەم ڕەنگه له سروشتی ژیانی شاعیراندا؛ هیزیکی گرنه‌گه، له‌بەر ئەوه مانای ئاره‌زوو و هەموو شیوه‌کانی ئاره‌زووی هەیه و"ڕەنگی

پهسه‌نايه‌تی و هيمای شادی و به‌رخودانی و جوانییه" (امینی لاری و خیراندیش، 1392: 15)، "لای عه‌ره‌به جاهلییه‌کانیش، ئەم رهنگه، نیشانه‌ی مهرگ و کوشتن بووه، هه‌روه‌ها ئەگه‌ر باس و خواستی کۆن و سه‌رده‌می پیشو و باوباپیرانی خۆیان بکردایه، ده‌یانوت: (سالی سوور)، هه‌روه‌ها بۆنی سوور، خوشترین جۆری بۆنیان بووه" (پیرانی شال و ناعمی و هاشمی، 1392: 38). لای شاعیرانی کورد: به هۆی کاریگه‌ریی ئەده‌بیاتی فارس و تورک و عه‌ره‌ب، ئەم رهنگه هه‌لگری هه‌مان چه‌مک و واتای ئەو نه‌ته‌وانه‌یه.

له ئەده‌بی کلاسیکی کوردیدا، رهنگ وهک یه‌کیک له هه‌ره توخمه نه‌زه‌ریه‌کان به‌رچاوه، ئەوه‌یه که له دروستبوونی مانا و دروستبوونی شیوه خه‌یالییه‌کان و له‌ده‌رب‌پینی رپوایه‌ته خه‌یالیه‌کاندا رۆلی دیاری هه‌یه. له‌به‌ر ئەوه‌ی سنوری لیکۆلینه‌وه‌که‌مان دیاریکراوه به ده‌لاله‌ته‌کانی رهنگی سوور، بۆیه له خواره‌وه چه‌ند نمونه له واتا و مه‌به‌ستی بنچیه‌یی و خواستراوی رهنگی سوور و به‌کاره‌ینانی ئەم رهنگه جگه له واتای بنچیه‌یی و بۆ چه‌ند مه‌به‌ست و خواستیکی تر، له شیعری کلاسیکی کوردیدا ده‌خه‌ینه روو:

- به‌کاره‌ینانی سوور، له‌بری (جنیو و توورپه‌یی داخ رشتن)، له‌م شیعری (عه‌ونی)یدا، که بۆ کۆچی دوایی (ئیدریس بارزانی)وتوو، رهنگی سووری بۆ واتا و مه‌به‌ستیکی تر و دوور له مه‌به‌ستی بنجی به‌کاره‌یناوه، که گله‌یی له رۆژگار ده‌کات و به‌هۆی بیستی هه‌والی مردنی (ئیدریس بارزانی)هوه، تانه له رۆژگاره‌ده‌دات که رۆژیک نییه ئەو هه‌والیکی خوش، ئاوازیکی خوش بیته به‌رگویی:

"رۆژگار پووت سوور نه‌بێ، هه‌روا به‌شت بێ پوویی پەش

پوو پەش و دلگیر و په‌ست بی، هه‌ر به‌ ئازار و نه‌خۆش" (شاره‌زا، 1997: 119)

- به‌کاره‌ینانی رهنگی سوور؛ وهک سووربوون و پیداکه‌ریکردن له‌سه‌ر خواست و داوا، وهک له‌م شیعری (صابری) له پاتکردنه‌وه‌ی (سوور)دا، سکلا له یاری ده‌کات و به شیعری ئەوه ده‌لێت: یاری دلی ئەوینی زامدارکردوو و له‌گه‌ل ئەوه‌یشدا یاری پیداکه‌ری ده‌کات و حاشای لێده‌کات:

"قه‌سدی خوینی بێ گوناها‌ن بۆچ ده‌کا رۆژی هه‌زار

ده‌ست و خه‌نجه‌ر غه‌رقی خوینه و سوور به سوور حاشا ده‌کا" (صابری، 1969: 43)

یان (هیمن) له شیعری (رقی پیرۆز)دا (سوور) وهک جه‌ختکردنه‌وه و دلنیا‌بوون و وازنه‌هێنان به‌کاره‌ینیت:

"ده‌مگرێ، ئەمما له‌گرتوو‌خانه‌ی رقی ئەستور ترم

لیم ده‌دا، ئەمما له‌سه‌ر داوا ره‌واکه‌م سوور ترم" (ئه‌حمه‌د و ده‌شتی، 2003: 187)

- به‌کاره‌ینانی رهنگی سوور؛ وهک پیناسه‌یه‌ک بۆ رهنگاله‌یی دنیا، وهک ئەم شیعری (ئه‌حمه‌دی ئەحمه‌دی کۆر):

"نه‌قشی دنیا تو ده‌بینی، که‌سک و سوور و زه‌رد و شینی

هه‌یج نییه حق الیقینی، خانه‌خشتی سوور نه‌بێ" (داشبه‌ندی، 1378: 276)

ئەم پیناسه‌ سروشتیه‌ی، لای زۆریک له شاعیرانی تر کراوه، (بێخود) له وه‌سفی سروشت که دیته‌ گۆ: ئەبێ کێ بیت مانی (په‌یامبه‌ری وینه‌کیش)ئاسایی، ئەو سه‌حرا و شاخ دۆلانه‌ی رهنگا و رهنگ و سوور و زه‌رد شین و کردوه:

" ئاخۆ چ مانیتیکه که سهحرا و شاخ و داخ

ژهنکار و زهره و سوور و سپی و سهوز و شین ئەکا " (مه‌لا که‌ریم، 1391: 22)

- به‌کارهیتانی په‌نگی سوور؛ وه‌ک گه‌رم-گه‌رمکردن-گه‌رمی، (سالم) که میوانی مه‌لیک ده‌بیت له شاری (حله) دوا‌ی گازه‌ندی له میوان دۆستی! داواده‌کات شیشیکی سوور بینن بۆ‌ی گیانی کۆلنجی کردووه، تا به‌و شیشه‌گه‌ری دابیت و ئازاری کۆلنجی نه‌میتیت:

"شیشی سوور بینن وهرن خالیگه‌مان داخ که‌ن به‌ جووت

چوونکه ژانمانه‌ من و ئەسپم له‌به‌ر سه‌ردیی هه‌وا" (موده‌ریس و فاتیح و مه‌لا که‌ریم، 2015: 46)

- به‌کارهیتانی په‌نگی سوور؛ وه‌ک واتای شایی و خوشی: لای(سالم)، له‌ بۆ پینچ و ده‌وورانی دنیا، باسی ئەوه ده‌کات که خودا؛ دنیای سه‌رتاخوار به‌ نزم و بیتار دروستکرد، دیویکی خوشی و شایی و دیویکی شین و ماتهم، که تیدا په‌نگی سوور، وه‌ک واتای شایی به‌کاردینی که ده‌لیت:

"خوداوه‌ند چادری دونیای به‌ دوونییه‌ت سه‌راپا کرد

بروون سوو سوور و ئایینه، ده‌روون په‌نگی عه‌زا په‌یدا" (موده‌ریس و فاتیح و مه‌لا که‌ریم، 2015: 64)

یان (سه‌ید تاهیر هاشمی)، به‌ هه‌مانشیوه‌ی (سالم)، په‌نگی سووری وه‌ک ده‌لاله‌تیک بۆ شایی و خوشی به‌کارهیتاوه:

"په‌نجی دنیا و پراحتی هه‌ر شهبی گه‌نج و مارییه

شادی و غه‌م، سوور و ماتهم وه‌ک گۆل و وه‌ک خارییه" (هاشمی، 2019)

شادی و غه‌م، سوور و ماتهم، هه‌ردوو یه‌ک واتا دینه‌وه، به‌شیوه‌یه‌ک: (شادی، سوور) به‌ واتای خوشی و شادی و (غه‌م، ماتهم)یش هه‌ر به‌واتای بنچیه‌یی خۆیان.

- به‌کارهیتانی په‌نگی سوور؛ وه‌ک په‌نگی خوین، که له‌م به‌یته‌ی خواره‌وه‌ی (مسته‌فا شه‌وقی)یدا، به‌ ناوی (له‌ بۆ کوردان)ی نوسیوه؛ ئاماژه به‌ کانیه‌ کی کیوی (قولقولاغی)ده‌کات له‌ رۆژه‌ لاتى سالاخ که له‌بری ئاو خوینی لیده‌چۆریت:

"ته‌ماشاکه که‌کانی قولقولاغی سوور و سووراوه

ئه‌وه گه‌رمه‌برینی کاکته چون لێره کوژرابوو" (شه‌ریفی، 1384: 32)

به‌کارهیتانی په‌نگی سوور، له‌بری خوین، پانتاییه‌کی زۆری له‌ شیعری کلاسیکی کوردییدا، گرتووه‌ته‌وه، (ئه‌حمده‌ موختار جاف)یش، له‌ به‌یته‌ شیعریکیدا، دوا‌ی گازه‌نده‌ کردن له‌ یاره‌که‌ی گرفتاریی به‌ عه‌شقی ئه‌و، دواتر به‌ غه‌ددار و خوین ریژی عاشقان وه‌سف ده‌کات:

"گرفتارم به‌ ده‌ردی عیشقی دلدارئ که‌ واه، ئەمه‌رۆ

به‌ خوینی عاشقان دایم به‌ری پئی سوور و په‌نگینه" (ره‌سول، 2016: 148)

ئه‌م چوانده‌ واتاییه‌ لای (عه‌ونی)یش، په‌نگی داوه‌ته‌وه و له‌م به‌یته‌دا (سووری)ی به‌ واتای (خوین) هیتاوه‌ته‌وه:

"ئه‌سپی خۆی با تاو بدات و بیته‌ مه‌یدانی به‌زین!

تا به‌ خوینی زامه‌وه به‌رگی سپی خۆی سوور نه‌کا" (شاره‌زا، 1997: 227)

- به کارهیتانی رهنگی سوور؛ وهک سیفەت بۆ فرمیسکی چاو، (کوردی) له م دهقهیدا، له بری ئه وهی بلیت خوین له چاوانم دهچۆریت، (سرشکی سوور)ی به کارهیتاوه:

"گه واهی لافی عیشقی تویه قوربان

سرشکی سوور و رهنگی زهردم ئه مپۆ" (موکریانی، 1387: 32)

(حهمدی)یش، له بهیتیکدا، له بری فرمیسکی چاو (ئەشکی سوور) به کاردینن و چاوی یار و کاتی گریه و زاییه کهی، به دهرایای سوور دهچوینن و فرمیسکه کهیشی وهک خوین لیهاتوویی:

"دهم به دەم بۆ حالی عالەم دیتە جۆش و گریه وه

ئەشکی سوور و سویری به حری ئەحمەر و عوممانه ئه رز" (مهولود، 2013: 32)

(دیلان)یش ئەم سرشکهی له خویدا چواندوووه و کاتیک زامزه دهیه، ئه وه فرمیسکی چاوی، که چواندووویه تی به (ئەشکی سوور) دەست و چاوی دهشوا:

"زامداره بولبول و له دهوری گول ئەکا رهقس و سهما

به کهیلی ئەشکی سوور و ئەسهف دەست و چاو ئەشۆم" (ئاگرین، 2013: 59)

- به کارهیتانی رهنگی سوور؛ به مانای بنچینهیی خوئی: وهک له م بهیتهی (ئەخۆل) دا هاتوووه:

"به هارم هاتوه یاران عهجهب شیرین به هاریکه

به خونچه سوور بووه سهحرا به گول سیمین عوزاریکه" (عزیز، گهردی، 1383: 70)

خونچهی سوور، مه بهستی له خونچهی گولاله سوریه، که هه م به خونچهیی و هه میش به گولی، رهنگی سووره و به تایبەت به هاران دەست و دەر، که شاعیر لیره به (سهحرا) ناوی بردوووه، رهنگ سووری دهکات.

یا هه مان (حهمدی) خه مان مه بهستی رهنگی ده نوینیت بۆ سوور:

"سهحرا هه موو سهوز و سووره، چه شمه مه نابیی نووره

گل وهک کلی کئوی تووره، نه غمه ی نه سیمی سه متووره" (مهولود، 2013: 58)

یان له شیوهی وهسفی گونای یار و گه شارهیی و سوور و په مایی و گه شی کولمی یار، (مینه جاف) رهنگی سووری به شیوهی رهنگی بنچیهیی به کارهیتاوه، که ئیزی:

"مه دحی ئەگریجە ی په شیو و چاوی مهست و پڕ خومار

کولمی سوور و خالی شین و له علی لیوی ئاودار" (نه ریمان، 1990: 60)

- به کارهیتانی (خه نه = حنا) له بری رهنگی سوور، به شیک له شاعیران، خه نهی دهستی یاریان به خوینی

دل و فرمیسکی چاوی خوین چواندوووه، که به هوی بی دهر بهستی و خه می یاریانه وه تووشی

هاتوون، ئه وه تا کاتیک (حه بیبه) دهست و په نجهی به خه نه سوور دهکات، (نالی) پیمان دهلیت، که

دهست و په نجهی به خوینی دلی ئه و سوور کردوووه، نهک خه نهیی بیت، ئه و دهست سوور کردنه ییشی

شاهندیبه من (نالی) کوشته ی دهستی ئه و (حه بیبه) م:

"خه نایی کردوووه په نجهی به خویناوی دلی زارم

ئه مه رهنکه شه هادهت بی که کوشته ی دهستی دلدارم" (مورده ریس و فاتح، 1976: 271)

یان لەم بەیتەى خوارەودەدا، ئەو خەنەیهى که یارەکهى، دەست و سەرى پى ڕەنگ کردوو، پى وایه که ئەوه خەنە نییه، بەلکو ڕەنگى سوورى خوینى جەستەى خۆتە و داوتە بەسەرتا و لە خەمى ڕازى داستانه دلدارییەکانته و شین ڕۆڤۆتە که ڕازت لە گەلیان هەبووه:

"خوینى سیرفە پى سەر و دەستت حەنایى کردوو"

ڕەنگى دەست و سەر نییه، ڕەنگى سەرى دەستانیه" (موردهریس و فاتح، 1976: 591)

یان (سالم) کاتیک لە سروشت و دلێ خۆى دەکهوێتە موناچاتیکی عاشقانه، لەگەڵ بەره بەیاندا دەبیته شەر داوادهکات ژوانى عەشقی لى تیک نهدات و گەریش دیت لى گەری! لەبرى ئەوه سمى ئەسپهکهى به فرمیسی چاوى(سالم) ڕەنگ سوور دەکات:

"سەحەر گەر بۆ شکارم دێیه سەحرا با مورەخخەس یم"

حەنایى کهم به ئەشکی دیدە سمى مەرکەبت ئەمشوو" (موردهریس و فاتح، 2015: 687)

شیعری کلاسیکی کوردی، فۆرمیکی مولەممەعی هەبوو، وهک یاسا و هەمیش وهک نیشانهى ژیری و دەسترویشتووی شاعیر بوو، که بتوانیت به زمانیکی تیکه‌ل له (کوردی و فارسی و عەرەبى) شاعر بنوسیت، بۆیه له چەندین ده قى شیعری کلاسیکی کوردییدا، لەبرى وشەى (سوور)، بەلکو وشەى (قرمزى) فارسی بەکارهاتوو، که به هەمانشیوه کوردییهکه بوو له مانا خواستراوهکه، واته هەر بۆ واتای: فرمیسی چاو، خوینى دل، لیوى سوور... بەکار هاتوو، بۆ نمونه (نارى)، (قرمزى) به واتای پەنجەى سوورى خویناوى بەکارهیناوه:

"پیشەى جەرگی لەبن هینام به قولابى موژەى"

بۆ دەکا حاشا به پەنجەى قرمز و خوینینهوه" (فه لاج، 1383: 114)

یان لەم دوو بەیتەى خوارەودەدا، هەر یهک له (شیخ ڕەزای تالەبانى) و (عەونى)، وشەى (قرمز)یان به واتای ڕەنگى سوورى لىو بەکارهیناوه:

"شیرین وهکوو خوسرهو پسهرى هورمزه جافه"

چاو مامزه، لیو قرمزه، ئیمانسه، جافه" (پهسوول، 2009: 58)

"یارى من سەرو قەدە، ڤووى گولە، لیو قرمزییه"

چاوى باز، لەنجە کهوه، ڤهوت و ڤهوى مامزییه" (شارهزا، 1997: 48)

ئەنجام

1- ڕەنگ، ڕۆلى یه لاکهروهیى له هەلوێستی چهکهکان و ماناکان گێراوه، ڕەنگەکان بەهایهکی هونەرییان داوه به شاعر، شاعیر له ناو دهقهکانیان، بههۆى بەکارهینانى واتای دوومه ڕەنگەکان، که توێژینهوهکه زیاتر ڤوچوووه بۆ ڕەنگى سوور، نهینى و تیرامانى فکرى خۆیان بهرجهستهکردوو.

2- بەکارهینانى ڕەنگەکان، وهک هیمایهک بۆ بەردهوامى خستنه‌ڤووى وینه شیعرییهکان، دەردهکهوێت هەر شاعیرهو هیمما و چهمكى هاوبهش و تايهتیی خۆى ههیه بۆ ڕەنگەکان، بۆنمونه لای بهشیکیان؛ رهش:

بهواتای خەم و حوزن و لای هەندیکی تر سیمبولیکە بۆ نارهزایی، ڕهنگی زەرد، بۆ نهخۆشی و لای هەندیکی تر هیمایشه بۆ دابەران و ئامانجه بهدینههاتووهدکان، سهوزیش ههروهک رهمزیکى پیرۆز و دینییه و هیمایشه بۆ سهقامگیری و سووریش، له دهقی شاعیران به چهندین واتای جودا له گشت ڕهنگهکانی تر زیاتر دهردهکهوئیت و ههرجاره و بهواتایهکی دوور له واتا بنجییهکهی خۆی بهکارهاتوو، ڕهنگی سوور له شیعری کلاسیکی کوردییدا، به واتای: شای و شین، خوین، تورهی، لئوی یار، نیشانهی ئاگاداربوون و خهتەری، فرمیسکی چاو، شهرم و پیدایگیری و... هاتوو، ئەم واتایانه نوینهرایهتی سایکۆلۆجی و ژیان و چلاکییه جۆراوجۆرهکانی هزری شاعیرانی کورد دهکات.

3- سروشتی ڕهنگاوڕهنگینی کوردستان، دهشتی سهوز و ئاسمانی شین و گولالهسووره و زهردهپهپی دهمی خۆرئاوایبوون، بوون به ماتریال و ڕهنگ له شیعری کوردی، شاعیران له م ڕووهوه تابلۆیهکی ڕهنگاوڕهنگی خهیالی دهرهوشاوهدی ڕۆحییان له سروشتهوه نهخشاندوو به وشه.

4- چه مکه جیاوازهکانی ڕهنگ و مانای ڕهنگ له دهقه ئهدهبییهکان، ئاماژهی دنیا بینی و ڕوانینی جوداخوارییهی شاعیره بۆ ڕهنگ، و ههروهها توانای شاعیره له بهکارهینانی ئەم فۆرمه زمانیییه بۆ مهبهستی خۆی.

5- له شیعره کلاسیکییهکان و ئەو نمونانهی بهکارهاتوون، هیچ کات ڕهنگ به نهزانی و لهخۆوه بهکارنههاتوو، وشه (سوور)؛ هاوشان لهگهڵ وشهکانی تر، مانا و پیکهاتهی شیعریین و نوینهرایهتی ئەو دهقه کلاسیکییه دهکەن، که بهخۆی و واتا خوازهیییهکهیهوه بوون به سهراچاوهی وینهی شاعیران، که شاعیران زۆر به وردی و مهبهستهوه، له بهری ڕهنگی سوور (ئەشکی چاو) له بهری ناوهینانی راستهوخۆی ڕهنگی سوور، (خهنه) ڕهنگ سووریان بهکارهیناوه، له بهری ڕهنگی سوور، شهرم و تورهی و... بهکارهیناوه، که دواچار بۆ دروستکردنی ئەو وینهیه هونهرییهیان بووه، که مهبهستیان بووه.

6- له سایکۆلۆجی تاک و کۆمه لگهیشدا، ڕهنگهکان لیکهوتەهێ ژیانی شاعیران، ئەو بارودۆخهی ژیانی شاعیرانی پیدا تپهر دهبیته، وهکچۆن له ناوهڕۆکی شیعرهکانیدا ڕهنگ دهواتهوه، هاوکات به هۆی لایهنی دهروونی شاعیرهوه، له یهکیکهوه بۆ یهکیکی تر، رادهو مامه لهکردن به ڕهنگهوه دهگۆریت، بۆنمونه، ڕهنگاوڕهنگ بینینی دنیا، لای (مینه جاف) زیاتر له پیشاندانی سهوز و سوور و شینی دهشت و دهردایه، وهک له (سالم) که بۆ گهلیک مهبهستی تری وهک (سرشکی چاو، خوین، شای...)، چونکه مینه جاف، له ژیانیکی میری و خۆشخوانییدا بووه وهک له سالم که دهورانی زهمان گهلیک شوین گۆرکی و خهمی پیدوا.

7- ڕهنگهکان ڕۆلی گرنگ له ویناکردن و گه یاندنی چه مکهکان له ئەدهبی شیعرییدا دهگێرن، شاعیران له ڕیگهی بهکارهینانی ڕهنگهکانهوه، ڕیگهیان بۆ خۆیان خوشکرد، ههتا دهلالهتی جیاواز و مهبهستی خهیالی و وینهی ڕهنگاوڕهنگ بهرجهسته بکەن له دهقه شیعرییهکانیاندا.

سهراچاوهکان

قورئانی پیرۆز

کوردی

1. ئەحمەدی شەریفی. (1384). بەشیک لە بەرھەمەکانی دوکتور مستەفا شەوقی قازی زادە. مەھاباد: چاپخانەی لەیزێر مەھاباد (چاپی یەکەم).
2. بەدران ، ئەحمەد؛ عوسمان، دەشتی؛. (2003). *بارگەیی یاران-سەرچەمی شیعری ھێمن*. ھەولێر: چاپخانەی وەزارەتی پەرۆردە (چاپی یەکەم).
3. ژوان ، عبدالسلام عزیز، یوسف، علی محمد؛. (2019). دەلالەتەکانی رەنگ لە دەقە شیعرییەکانی (مستەفا بەگی کوردی)دا. *گۆڤاری زانستە مەرفایەتیەکانی زانکۆی گەرمیان*، 114-132.
4. شیخ عبدالرحمن شیخ نجم الدین (صابری). (1969). *دیوانی صابری*. کەرکوک: چاپخانەی شارەوای کەرکوک (چاپی یەکەم).
5. عزیز ، گەردی؛. (1383). *رەبەری کیشی شیعری کلاسیکی کوردی*. پیرانشەر: انتشارات سامرند.
6. عەبدوللا خدر مەولود. (2013). *دیوانی حەمدی*. ھەولێر: چاپخانەی رۆژھەلاتی ھەولێر (چاپی پینجەم).
7. عەبدوللا ئاگرین. (2013). *دیوانی شیعری محەمەد سالیح دایان*. ھەولێر: چاپخانەی چوارچرا (چاپی دووھ)
8. عەزیز محەمەدپور (دەشەندی). (1378). *دیوان و شەرحی حالی شیخ ئەحمەدی کۆری موکریانی*. تاران: چاپخانەی پەیام (چاپی یەکەم).
9. عەزەدین مستەفا رەسول. (2016). *دیوانی ئەحمەد موختار جاف*. تاران: چاپخانەی تاران-پەنجەرە.
10. کاکەیی فەلاح. (1383). *دیوانی ناری*. سنەدج: انتشارات کردستان (چاپی یەکەم).
11. کەریم شارەزا. (1997). *دیوانی عەونی*. ھەولێر: چاپخانەی پەرۆردە (چاپی یەکەم).
12. گیوی موکریانی. (1387). *دیوانی کوردی (مستەفا بەگی ساحتیقیران)*. چاپی یەکەم.
13. لوقمان رەئووف. (2017). *سیمۆلۆژیای رەنگ لە شیعری شێرکۆ بیکەسدا: دیوانی رەنگدان بە نمونە*. *مجلة جامعة التنمية البشرية*، 453-482.
14. محەمەد ئەحمەد سەعید (کەساس جەباری). (2016). *شیکاری دەق*. چاپخانەی (تەژنە).
15. محەمەدی مەلا کەریم. (1391). *دیوانی بیخورد*. سنە: انتشارات کردستان (چاپی دووھم).
16. محەمەد تەقی ھاشمی. (31 7, 2019). *سەید محەمەد تاهیری ھاشمی (1914-1991)*. تم لاسترداد من کوردستانی نوێ: <https://knwe.org/?p=46573>
17. مدرس مەلا عبدالکریم، و عبدالکریم فاتح. (1976). *دیوانی نالی*. بەغداد.
18. مصطفی نەریمان. (1990). *دیوانی مینە جاف*. بەغداد: مطبعة الجاحظ.
19. 38- *حەمە، نوری عمر کاکێ*؛. (ژمارە (54) نیسانی 2018). بەرگ و رەنگ لە شیعری مەحویدا.
20. 20. مدرس مەلا عبدالکریم، و عبدالکریم فاتح. (2015). *دیوانی سالم، عەبدوررحمان بەگی ساحتیقیران*. سلیمانی: بەکی ژین (بەرگی یەکەم).

عەرەبی

1. طالب غالب لاسدي محمد. (العدد(4) لسنة2006). العلامة اللونية دراسة في توظيف اللون و اللالته في تشكيل المشهد الشعري في شعر مظفر الواب. مجلة اداب البصرة، 32-66.
2. عبدالستار عطا الله ايمان. (العدد (95) لسنة2020). سيمياء اللون في العروض الفنتازيية لمسرح للطفل. مجلة لأكاديمي، 71-86.
3. على، پيرانى شال؛ زهرة، ناعمى؛ خديجة هاشمى؛. (العدد(12) شتاء 2013/1392). نقد اللون لاحمر و لآخضر و دراستها في اشعار ازك الطلائكة. اضاءات نقدية(فصيلة محكمة)، 33-52.
4. كاظم محمد الطائي جابر. (العدد(50) الجزء(2)). نللات اللون في رياض لآطفال. مجلة الكلية لاسلامية الجامعة، 601-617.
5. لؤي، نجم جرجيس امين؛. (العدد الخامس والسبعون 2008). نللات اللون في المنجزات الخطية والزخرفية. مجلة ديالى، 608-634.
6. محمد عبدالسيد سليمان. (العدد الخامس والعشرون 2016). لالة اللون فس نهج البلاغة_اللون لابيض ولأسود أنموذجا. مجلة كلية تربية، 159-192.
7. وسام، محمد منشد الهلالي؛. (المجلد الثاني عشر: العدد، 2019). اللون و نللاته قي مجموعة(عبرالحائط في المرأة)لحسب الشيخ جعفر. مجلة القادسيهه للعلوم لانسانية، 1-12.

فارسي

1. حسن لى كاوس، و صديقي مصطفى. (شماره(13) بهار 1382). تحليل رنگ در سروده هاى سهراب سپهرى(علمى-پژوهشى). نشریه دانشكده ادبيات و علوم انسانی، 96.
2. سهیلا، حسینی؛ احمد، منصور رضی؛. (شماره (74) بهار1392). نقد زیبایی شناختی رنگ در شعر فرزانه خجندی شاعر رنگ. فصلنامه زبان و ادبیات فارسی، 120-143.
3. شبنم، فاتحی؛ علی، قهرمانی؛. (شماره(35) بهار 1396). کارکرد عنصر رنگ در مثنوی مولوی. فصلنامه بهارستان، 141-166.
4. صابره، سیاوشی؛ محمد، خسروی چیتگر؛. (شماره(37) بهار 1395). جایگاه نمادین رنگ در ادبیات پایداری در اشعار قیصر امین پور و محمود درویش. مطالعات ادبیات تطبیقی، 88.
5. عبدالله حسن زاده میرعلی. (شماره (5)، تابستان 1397). نقد روانکاوانه عنصر رنگ در اشعار فریدون مشیری. رخسار زبان، 16.
6. ناصر، نیکوبخت؛ سید علی، قاسم زاده؛. (شماره (8) پاییز و زمستان 1387). سمبولیسم نور و رنگ در عرفان- اسلامی. مطالعات عرفانی، 185-215.
7. الای، امینی لاری؛ سید، مهدی خیراندیش؛. (شماره (9) پاییز و زمستان 1392). جلوه های نمادین رنگ در ادب عرفانی. دوفصلنامه علمی-پژوهشی ادبیات عرفانی دانشگاه الزهرا، 7-42.

BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN

LİRİKAY ŞAİRÊ GEWREYÊ KURD MEWLEWÎ (1806-1882)

Enwer Qadir Mihemed, 2007, Silêmanî, Weşana Serdem, Çapa sêyem, 285 rûpel.

Hemin Omar AHMAD*

Article Type: Book Review // Nirxandina Pirtûkan**Received** // Hatî: 10/11/2020**Accepted** // Pejirandin: 15/11/2020**Published** // Weşandin: 30.11.2020**Pages** // Rûpel: 127-132This work is licensed under the Creative Commons
Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>**Citation/Atîf:** Ahmad, Hemin Omar, (2020). "Enwer Qadir Mihemed, Lîrikay Şaîrî Gewrey Kurd Mewlewî (1806-1882)", *Kurdiname*, no. 3, p. 127-132.

Ev berhem di eslê xwe de têza doktorayê ye, bi zimanê Rûsî ji layê Enwer Qadir Mihemed ve li zanîngeha Rojhelatnasî ya Lenîngrad hatiye amadekirin. Şêwirmendiya vê berhemê zana û rojhelatnasa berniyas a Sovyetê, Nikolayevna Verejekina kiriye. Wek tez ev xebat di salên heştê de hatiye gengeşekirin û pişt re weke pirtûk bi Kurdiya Soranî di sala 1990an li Swêd û di sala 2007an de li Silêmaniyê hatiye çapkirin.

Mela 'Ebdurehîmê Mewlewî (1806-1882) yek ji helbestvanên herî berniyas, pîrberhemê edebiyata Goran e. Ew wek Seyîd 'Ebdurrehîmê Tawgozî hatiye nasîn û di nav xelkê de jî "Mewlewî" bûye. Wî bi xwe mexlase "Me'dûm" bi kar anîye. Her wekî aşkera ye ku zimanê Mewlewî bi xwe Soranî bûye, lê wî helbestên xwe bi Goranî û Hewramî nivîsandine. Diyalekta Goranî jî ji sedsala çardehan ta sedsala nozdehan zimanê resmî yê mîrekiya Erdelan bûye û li hinek navçeyên Kurdistana Jêrîn jî wek zimanê edebiyatê belav bûye. Mixabin berawird bi lehçeyên din ên kurdî, hêj bi başî dîroka edebiyata Goran nehatiye nivîsandin, hemû destxet û metnên wan nehatine lêkolîn û çapkirin.

Di warê helbest, 'eqîde û zanistên olî de gelek berhemên Mewlewî hene. Ji bo yekem car helbestvan Keyfî; bêyî ku navê Mewlewî bîne, di rojnameya "Tercumana Heqîqet" de helbestekî Mewlewî diweşîne û ji bo zimanê Tirkî jî werdigerîne. Pişt re di sala 1920ê de mîladî, Emîn Feyzî Beg di pirtûka xwe ya bi navê "Encumenî Edîbanî Kurd" de bal dikêşîne ser Mewlewî, hinek helbestên wî diweşîne û behsa teknîka serwaya helbestên wî dike û weke diyarîdeka hunerî ya helbesta Ewropayî behs dike ku haya Mewlewî jê nebûye û ew qafiyê bi kar anîye.

* Mamoste li zankoya Soran-Hewlêr û mamosteyê mêvan li zankoya Çewlikê Beşa ziman û wêjeya kurdî. hemin.ahmad@soran.edu.iq, <http://orcid.org/0000-0003-1985-9512>

Nivîser di destpêka têza xwe de dibêje: “Ji bo vê xebatê hewl hatiye dayîn ku tenê bi çavekî temaşa berhemê Mewlewî neyête kirin û Mewlewî ji rewşa civakî û kultûrî ya serdemê xwe neyête cudakirin. Çunke; Eger em serdem û qonaxê wê çaxê fêm nekin û bi giştî li kultûra wê mêze nekin, em nikarin hîç berhemekê bi şikleke babetî û objektîf binirxînin.”

Derbarê jêder û çavkaniyên tîzê de jî, xencî çapên cûr bi cûr ên Dîwana Mewlewî, nivîser îşaret bi wê daye ku gelek jêderên bi mifayên kurdî, gelek çavkaniyên teoriya edebê û êstetîk û çewaniya mîtodê lêkolînê bi zimanê rûsî hatine bi kar anîn û mifa jê sitandiye.

Ev xebat ji çar beşan pêk tê; di beşa yekem de, di bin sernavê “**Goran, Ziman û Edebiyata Wan**” de behsa dîroka nivîsîna bi lehceya Goran dike û amaje bi wê çendê dide, ku yekem jêderê dîrokî ku navê Goran anîbe “**Şerefnameya Şerefxanê Bitlîsî**” (1543-1603) ye ku dibêje: Kurd bi diyalekt, adab, nerît û exlaq dibin çar beş. Ew jî: Kurmancî, Lorî, Kelhûr û Goran in. Herwiha behsa nêrînên rojhelatnasên mîna Minorsky jî dike ku di gotarên xwe de bi navê Goran û F.Miller û D. Morgan jî ji aliyê zimannasî ve lêkolîn derbarê lehceya Goran de kirine. Herwiha Jeneral Rosoy konsolosa Firensayê di sala 1807an de geştekek bi Kurdistanê de dike û di xafîratê xwe de behsa Hewramîyan wek 'eşîreke kurdan dike. Digel wê jî E. B. Soane gotarek bi navê “Entologiyayeke Kurd” ya helbestên Goran weşandiye.

Nivîser di destpêka vê beşê de behsa nêrînên gelek rojhelatnas û nivîserên biyanî û nivîserên kurd derbarê ziman û cîh û cografyaya Goran de dike û pişt re nêrînên wan dinirxîne. Her wiha behsa nêrînên wan rojhelatnas û lêkolîneran jî dike ku Goran û Zaza ji zimanê kurdî vediqetînin û bi zimanê Îranî dihesibînin, ew jî; **D. N. Mackenzie û Oscar Mann in**. Li gel wê çendê jî ew nêrînên **Meckenzie** ji aliyê lêkolînerên kurdên Sovyetê mîna “**Kurdoyev, A. i. Smirnova, M.Xemo û Zerê Osp**” û zanayên kurd ên mîna “**Tofîq Wehbî, Cemal Nebez, Mihemed Emîn Hewramanî û Kerîmî Eyyûbî** ve hatine redkirin. Nivîser bi awayekî zanistî di çend rûpelan de nêrîna Soane lêkolîn dike û rexne li wê digire ku Soane di pirtûka Rêzimana Kurdî de Zaza bi Kurd dihesibîne û di gotarê de jî nêrîneke dijberî wê dinivîse. Ew di encamê de gihiştîye wê nêrînê ku teoriya veqetandîna Goran û Zaza ji zimanê Kurdî bo destpêka sedsala bîstana vedigerîne ku armanca desthilata siyasî ya dewletên mezin ên rojavayê bûye, bi taybetî jî kesekê wekî Soane di destpêkê de bi nihênî hatiye nav kurdan û pişt re bûye karbidestekê mezin a îngilîzan li Kurdistana Başûr.

Goran di demeke zû de bûye cihê girîngîdanê ji aliyê rojhelatnasan ve, bo nimûne: **V. Jukovsikî** ku lêkolînerê di warê zimanên îranî de bûye, di salên heştê yê sedsala borî de gotiye: Kurdên Goran ji ber du tiştan hêjayî behskirinê ne. Yekem; ji ber ku bi wê lehceyê gelek destxet û berhemên edebî li muzeya Îngiltereyê hatine parastin, hêja ye ku behsa wan bê kirin. Ya duwem ew e ku; gelek ji Goranan girêdayî olekê ne, ku jê re dibêjin: “**Ehlê Heq.**”

Pişt re behsa nêrînên Peter Lerch, E.B. Chirikov, Xurşîd Efendî yên di derheqê Goranan dike û amaje bi wê çendê dide, ku şa'îrekî wekî Se'diyê Şîrazî di bedayî'ê xwe de niv malik bi Goranî nivîsandiye.

Nivîser behsa sebebê ze'îfbûna edebiyata Goran dike di destpêka sedsala nozdehan de. Piştî ku di mîrektîya Baban de edebiyata Soran geş bû, edebiyata Goran jî bi vê sebebê li hember edebiyata Baban lawaz bû.

Her di dawîya vê beşê de, behsa du berhemên din ên Goran hatiye kirin. Ew jî; pirtûka Marîfet û Pîr Şalyarê Zerdeştî ne ku goya Pîr Şalyar yek ji Muxên Zerdeştî ye. Herwisa pirtûka Serencam ku pirtûka dînî ya Ehlê Heq e û di Kurdistana Îran de zêdetir bi sirûdên dînî yên yarsanan meşhûr e. Nivîserê vê pirtûkê bi navê Sultan Şhak tê hesabandin. Pişt re behsa nakokîya di navbera her du terîqetên dînî yên serdest li Kurdistanê ku terîqeta Qadirî û Neqîşbendî ne hatine kirin. Her di dawîya vê beşê de behsa helbesta Goran û hinek helbestvanên wan hatine kirin. Di cûreyên helbestan de bi hurgulî behsa çîrokên şîrên evîndarî yên wekî Baram û Gulendam, Leyla û Mecnûn yên Mela Weledxan, Şîrîn û Xusrew ya Xanayê Qubadî, çîroke şîrê qehremanî yên wek Heft Xwanî Rostem, Rostem û Zorab û du çîrokên Mîrza Şefîî Camerêzî (Ew çîrok; Cîhangîr û Rostem, Nadîr û Topal in) hatiye kirin. Di vê xebatê de behsa helbesta lîrîk jî bi nimûneya Bêsarî, Seyidê Hewramî, Ehmed Begê Komasi (1793-1876) û Xanayê Qubadî (1700-1759) û Mîrza Şefîî Camerêzî (1785-1835) û gelekî din jî helbestvanê Goran hatiye kirin. Dîsa di vê tîzê de helbestên dînî yên wekî Perîşannameya Mela Perîşan û Selawatnameya Xanayê Qubadî hatine gengeşe kirin.

Beşa duyem a pirtûkê jî di bin sernavê “**Jiyan û Berhema Edebî û Zanistî Ya Mewlewî**” de ye. Di vê beşê de bi hurgulî behsa xwendin û jiyana wî, behsa peywendiyên wî bi şêxên Neqîşbendî ve hatiye kirin ku di dîwana wî de 18 helbest tenê ji bo şêxan hatine nivîsandin. Herwiha peywendiya Mewlewî bi şêxên rêbaza Qadirî ve jî hebûye ku helbesteke wî ji bo Şêx 'Ebdurehmanê Xalisê Talebanî heye. Di gel wê çendê jî dostaniya helbestvanî bi padişahên Caf, 'eşîretên din û kesayetên kurd re hebûye. Piştî jiyana wî, nivîserê tê ser berhemên wî û bi vê şiklî pênc berhemên wî tesbît dike, ew jî ev in:

1-Elfezîle: Ev pirtûk bi zimanê 'Erebî û bi nezim hatiye nivîsandin û ji 2031 beytan pêk tê. Mewlewî ev pirtûk di 1868ê miladî de temam kiriye. Ev pirtûka Mewlewî di warê usulê dînî de ye û ji teref Mela 'Ebdulkerîmê Muderîs ve digel şîroveya wê hatiye çapkirin.

2-'Eqîdey Merzîye: Ev pirtûk wek helbest bi zimanê Kurdî ye, ji 2452 beytan pêk hatiye û di derbarê 'Eqîdeya Eş'erîyan de ye.

3-Elfewah: Ev pirtûk wek helbest bi zimanê Farisî ye û zêdetir ji hezar beytî ye û di derbarê sîfatên Xwuda de hatiye nivîsandin. Di sala 1932 yê miladî de bi 'Eqîdey Merzîye ra li Qahîreyê hatiye çapkirin.

4-'Eqîdeya Mewlewî: Ev pirtûk ji 110 beytan pêk tê, zêdetir ji bo xwendevanên nû hatiye nivîsandin û sala di 1977 de hatiye çapkirin.

5-Nameyên Mewlewî: Ta niha 38 nameyên Mewlewî peyda bûne, pîranî Mela 'Ebdulkerîmê Muderîs di pirtûka Yadî Merdan de çap kirine.

Beşa sêyem a pirtûkê bi sernavê “**Dîwana Mewlewî, Janira, Mijara Lîrîkî û Aliyên Hunerî û Êstefîkyên Wî**” ye. Di vê beşê de nivîser behsa cûreyên helbestên Mewlewî dike mîna helbestên ferd/ tak beyt. Li gorî tesbîta nivîsêr di Dîwana Mewlewî da 31 ferd hene, 18 ji wan ferdan di mijara felsefe û jiyane de ne, 10 heb di mijara evîne de 3 heb jî di mijara resimkişandina sirûştê de ne.

Janira ew dubeyte ku; çarîneke naveroka wê lîrîk, evîn, felsefe û dîn di xwe da bihewîne, ev jî di helbestên kurdî de ne gelek in. Di çarînen Baba Tahîr û Melayê Cizîrî de 'eynî mijar tê dîtin. Wezna dubeytiyên Mewlewî 10 kîteyî ye û serwayên wan jî **aaba** û **abab** ne, bi piranî jî **aabb** ne.

Mijareke din di nav helbestên lîrîkiyê Mewlewî de heye, ew jî xezel e. Xezel di helbesta kurdî de mîna xezel û qesîdeyê farsî ne û bi wezn, qafiye, redîf, texellus, tercî-i bend, terkîb-i bend û mustezad hatiye nav edebiyata Kurdî. Lê ev xezela edebiyata Goran ji Farisî nehatiye wergirtin, belkî jêdera wê folklorî Kurdî ye. Ji bilî 'erûz bi kêşa xwemalî ango 10 kîteyî û bi qafiya mesnewî jî hatine nivîsandin. Di dîwana Mewlewî de 213 xezel hene, ev xezel piranî ji 5 ta 11 beytan pêk tên û herwiha xezelên 3 beytî û 30 beytî jî hene. Piranî nameyên bi helbest in, mijarên wan ev in:

1-Wesfa lîrîk: 24 xezel

2-Mersîye: 28 xezel

3-Lîrîkay kesî : 36 xezel

4-Helbesta munasebat: 31 xezel

5-Helbestên dînî: 5 xezel

6-Behsa mey: 1 xezel

Mijara wesfa xwezayî û dîmenên sirûştî nêzik ji %88 ê helbestên Mewlewî di xwe de dihewîne. Nivîser yek bi yek behsa wan 6 cureyên helbestên lîrîk bi mînakan dike.

Di dawîya vê beşê de nivîsêr behsa hinek taybetiyên teknîkî yên helbestên lîrîk a Mewlewî dike, mîna teknîkên kêş/ wezn, serwa û teknîkên cûr bi cûr .

Beşa çarem di bin sernavê “**Çavkaniyên Helbesta Mewlewî û Kartêkirina Lîrîkaya Wî Di Helbesta Kurdî Da**” ye. Nivîser di vê beşê de hewl daye ku nîşan bide bê ka Mewlewî ketiye bin tesîra kîjan helbestvanê Goran. Li gorî tesbîta nivîsêr Mewlewî bêtir ketiye bin tesîra şa'îrên wek Bêsarani, Ehmed Begê Komasi û Xanay Qubadi ne ku navê hinek ji wan jî di helbestên xwe da aniye. Lê nivîsêr tesbît dike ku Mewlewî zêdetir ji helbestên Bêsarani hez kiriye. Ev jî bi motîf û îmaj û teknîka herdû şa'îran nîşan dide.

Herwiha nivîser her di vê beşê de di bin sernavê “**Mewlewî û Helbesta Klasîka Farisî**” de hewl daye tesîra helbestvanên Faris li ser Mewlewî nîşan bide, ew jî li gor motîf û teknîk û naveroka helbestan, bi taybet tesîra Hafizê Şîrazî bi mînaka helbestan tesbît dike li ser Mewlewî.

Her di vê beşê de di bin sernavê “Mewlewî û Sofizim” de nivîser hewl daye ku bi nêrîneke tesewufî helbestên Mewlewî şirove bike, xêncî behskirina binemayên tesewufê li ba Mewlewî, bi pratîkî têgehên tesewufê di Dîwana Mewlewî de destnîşan dike. Herwiha mesela evîna Xweda, pêxember û murşîd gengeşe dike. Digel wê jî mesela yekîtiya hebûn/ Wehdet ul-Wucudê li ba Mewlewî şirove dike.

Her di vê beşê de; di bin sernavê “Mewlewî û Helbestvanên Lehceya Kurmanciya Jêrî” de behsa tesîra Mewlewî li ser Pîremêrd û Goran dike û berawirda şewaz û motîvên wan dike. Heta Mewlewî tesîr li helbestvanên nû yên Soranî salên heftî yên sedsala borî jî kiriye û di nav helbestên wan de Mewlewî û 'Enber Xatûna xanima wî bûne du sembolên mezin bo edebiyata Kurdî. Ev du kes bûne sembol bo edebiyateke mezin a nîştmanî, azadî û xweşikiyê.

Nivîser di dawiyê de li çend rûpelan encama tezê nivîsandiye û pişt re listeya çavkaniyan amade kiriye. Di nav 186 çavkaniyan de zêdetir ji 50 çavkanî bi zimanê Rûsî û yên din jî bi zimanên Îngilîsî, Farsî, 'Erebî û kurdî hene.



BOOK REVIEW / NIRXANDINA PIRTÛKAN

RÊBERA RASTNÎVÎSÎNÊ KOMXEBATA KURMANCÎYÊ

Bahîz Omer Ehmed, Bahoz Baran, Behrûz Şucaî, Deham Evdîlfehah, Dilawer Zeraq, Dilbirîn Evdîla, Evdîlwehab Xalid Mûsa, M. Malmîsanîj, Mahmûd Lewendî, Mehdi Caferzade, Mihemed Teqewî, Mistefa Aydogan, Mîkaîl Bilbil, Newzad Hiroîrî, Samî Tan, Şoreşvan Adil, Zana Farqînî û Zulkuf Ergun, 2019, Stenbol: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê, Çapa duyem, 229 rûpel, Isbn: 9786058097506

Tahirhan AYDIN*

Article Type: Book Review // Nirxandina Pirtûkan

Received // Hatîn: 29/11/2020

Accepted // Pejirandin: 30/11/2020

Published // Weşandin: 30.11.2020

Pages // Rûpel: 138-142

Citation/Atif: Aydın, Tahirhan, (2020). Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê, *Kurdiname*, no. 3, p. 138-142.

This work is licensed under the Creative Commons Attribution International License (CC BY 4.0).
<http://creativecommons.org/licenses/by/4.0/>



Nivîs, bi alîkarîya hin herf, teşe û şeklan, di çarçoveya hin rêzikên dîyarkirî da, bilêvkirin û qeydkirina fikir, raman, gotin û peyvan e. Nivîs, yek ji rêyên herî giring e ji bo parastina forma zimanî. Bi giştî ji bo rê û rêbaz, rêzik û qayîdeyên ku ji bo nivîsînê hatine dîyarkirin ra “rêzikên nivîsînê” tê gotin. Ji bo berhemên ku hem rêzikên nivîsînê û hem jî yên rastnivîsînê dihewîne ra jî îfadeya “rêbera rastnivîsînê” hatiye emilandin. Ev rêber, ji bo yekitî û standardkirina zimanî navgîna herî bihêz e. Ji ber ehemîyeta vê mijarê, li gelek dewletan, ev kar ji aliyê dezgehên fermî ve tên kirin û ji bo van karan, ji zimannas, wêjenas û perwerdekarên gelek pispor, mîtexesis û rewşenbîr tên tayînkirin. Sazîyên fermî, vî zimanî bi kar tînin. Zanyar û rewşenbîr, bi vî zimanî dinivîsin, perwerde bi vî zimanî tê kirin.

Ji bo zimanan, devokên curbicur hene. Armanca rêberên rastnivîsînê ew e ku konsensuseka yekser di navbera van axaftinan da bi cih bike. Li vir du ziman derdikevin holê. Yek zimanê axaftinê (ku ne yekpare ye) û ya din jî zimanê nivîsînê. Zimanê nivîsînê dixwaze ku têgihîştîneka hevpar di nav varyantên axaftinê da pêk bîne. Ji bo vê armancê berhemeka giring ya bi navê “*Rêbera Rastnivîsînê*” bi destê “*Komxebata Kurmancîyê*” hatiye amadekirin ku ev kom bi înisîyatîfa Weqfa Mezopotamyayê hatiye avakirin.

Rêbera Rastnivîsînê, ji 229 rûpelan pêk tê. Navê wê li ser bergê “*Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê*” hatiye nivîsîn. Çapa yekem, Kanûna Paşîn ya sala 2019an li Stenbolê û çapa duyem jî dîsa li Stenbolê Gulana heman salê pêk hatiye. Berhem, ji aliyê Bahoz Baran, Mîkaîl Bilbil û Mistefa Aydoganî ve hatiye redaktekirin. Piştî rûpelên jenerîkê pirtûk bi rêzê van sernavan dihewîne: “Naverok”, “*Komxebata Kurmancîyê*”, “Ji bo rastnivîsîneka standart”.

Di bin serenava “*Komxebata Kurmancîyê*” da hatiye gotin ku ev grup bi înisîyatîfa Weqfa Mezopotamyayê ava bûye. Kom ji her çar parçeyên axa kurdan ji hin zimannas û

* Prof. Dr., Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî, e-mail: tahirhan@hotmail.com; Orcid: 0000-0002-2586-2956

lêkolîneran pêk tê. Di listeya lijneyê da ev her çar parçe bi “Başûr, Bakur, Rojhilat û Rojava”yê hatine binavkirin. Endamên lijneyê ev in: Bahîz Omer Ehmed (Başûr) Bahoz Baran (Bakur), Behrûz Şucaî (Rojhilat), Deham Evdîlfehah (Rojava), Dilawer Zeraq (Bakur), Dilbirîn Evdîla (Başûr) Evdîlwehab Xalid Mûsa (Başûr), M. Malmisanij (Bakur), Mahmûd Lewendî (Bakur), Mehdî Caferzade (Rojhilat), Mihemed Teqewî (Rojhilat), Mistefa Aydogan (Bakur), Mîkaîl Bilbil (Bakur), Newzad Hîrorî (Başûr), Samî Tan (Bakur), Şoreşvan Adil (Başûr), Zana Farqînî (Bakur), Zulkuf Ergun (Bakur). Wekî tê dîtin hejmara endamên nûneran ne wek hev in. Ji Bakur 9, ji Başûr 5, ji Rojhilat 3 û ji Rojava 1 kes. Navên beşdarên komxebatê li gel pisporî, herêm û hejmara wan ya beşdarîya civînan hatine dayîn. Em hêvî dikin ku ev xebatên bi vî rengî, ji aliyê temsîliyetê ve hinek xurttir bibin. Lê mirov dikare bibêje ne mimkun e ku xebatên weha, ji aliyê kesekî bîn çêkirin û dîsa ne mimkun e ku fikr û nêrînên kesekî bi temamî bîn qebûlkin.

Ev berhem, encama heft civînan ku di 14.03.2015an da dest pê kiriye û di 12.07.2017an da jî qedîyaye, derketîye holê. Em dibînin ku Komxebata Kurmancîyê berhema endamê komê, Mistefa Aydogan, ji bo xwe wekî bingeh qebûl kiriye: “*Bingehê minaqeşeyên her heft civînan kitêba Mistefa Aydoganî (Rêbera rastnivîsînê) bû. Loma rojeva her heft civînan jî bi awayekî giştî xwe spartîye xalên naveroka vê kitêba navbirî.*”

Rêbera Rastnivîsînê ji 31 sernivîsên sereke pêk tê. Sernivîsên sereke ev in: 1. *Alfabe*, 2. *Alfabeya tîpgotinê*, 3. *Kîtekirin*, 4. *Navên bajarû bajarokên Kurdistanê*, 5. *Navên welat, paytext û yekeyên pereyan*, 6. *Navên gel/netewe û zimanan*, 7. *Navên hêlan*, 8. *Navên rojan*, 9. *Navên demsalan*, 10. *Navên mehan*, 11. *Tîpa ducare û awarte*, 12. *Nivîsîna bêjeyên ku bi “-stan”ê dihên çêkirin*, 13. *Pirsa bêjeyên ku bi [i]yê dest pê dikin û bi [i]yê diqedin*, 14. *Nivîsîna hin bêjeyên bîyanî yên yekkîteyî ku di kurmancîyê da dibin dukîteyî*, 15. *Nivîsîna [î]ya berî [y]yê*, 16. *Nivîsîna [ê]ya berî [y]yê*, 17. *Peyvên dunavdêrî*, 18. *Nivîsîna navdêrên taybetî yên bîyanî yên kes, bajar û deveran*, 19. *Nivîsîna hin bêjeyên bîyanî û îranî*, 20. *Girdek û hûrdek*, 21. *Kurtkirin*, 22. *Tewang*, 23. *Îzafê*, 24. *Parastina awayê leksemî di navdêran da*, 25. *Nivîsîna cihnavan*, 26. *Nivîsîna rengdêran*, 27. *Nivîsîna lêkeran*, 28. *Nivîsîna daçekan*, 29. *Nivîsîna hejmarnavan*, 30. *Nivîsîna tarîxê*, 31. *Xal bendî*. Di dawîya *Rêberê* da “*Ferhengok*”ek heye û tê da têgehên rêzimanê bi kurmancî, îngilîzî, tirkî, farisî û erebî hatine pêşkêşkirin.

Amadekarên *Rêberê* di destpêkê da li ser “*lihevkin*”ê disekinin û weha dibêjin: “*Ji bo nivîsîneka baş, birêkûpêk, fêambar û herweha ji bo berlêgirtina tevlihevî û sergêjîyan qayîdeyên zelal -çî yên ku xwe bispêrin rêzimanê, çî jî yên ku xwe bispêrin hevîkîrî û lihevkinê- şert in. Lewra gava ku qayîdeyên rastnivîsînê yên li ser bingehên navbirî hebin, xwendin hêsantir û zelaltir dibe. Rê li ber têgihîştinên şaş venabe. Her weha naveroka zimanê nivîskî jî bi mebesta xwe ra guncayî dihê ragihandin.*” Di vê çarçoveyê da Weqfa Mezopotamyayê berî ku berhemê çap bike halê dawî ji gelek dezgehên eleqedar û kesayetên pispor ra dişîne û ji wan nirxandin û rexneyan dixwaze. Gelek ji wan bersiv didin û rexne, nirxandin û pêşniyazên xwe dişînin. Endamên lijneya Komxebata Kurmancîyê dicivin û hin biryarên xwe li gorî van nêrînan diguherînin. Lêbelê dîsa jî piştî çapkirina pirtûkê, ji aliyê gelek kesan ve nivîsên rexneyî hatine amadekirin.

Bêguman ji bo xebatên ziman xala dawî tune ye. Lewra ziman bixwe diyardeyeka zindî ye. Divê mirov van rexneyan di vê çarçoveyê da binirxîne. Hin nirxandin û rexneyên derbarê Rêbera Rastnivîsînê da ev in:

- Nevzat Emînoğlu, “Xebateke Girîng û Dîrokî: Rêbera Rastnivîsînê”, Nûbihar, 147, Bihar 2019, rr. 40-43.
- Amed Tîgrîs, “Çend başî û şaşiyên Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmancîyê”, <http://www.rojnameyakurdistan.com>, (02.04.2019)
- Deham Ebdulfettah, “Daxuyaniyek Di Derbarê Rêbera Rastnivîsîne Da”, <http://portal.netewe.com/daxuyaniyek-di-derbare-rebera-rastnivisine-da/>, (30 Temmuz 2019)
- Maruf Yılmaz, “Hizrek li ser pirtûka "Rêbera Rastnivîsînê" ya "Komxebata "Kurmancîyê", <http://www.rupelanu.com/hizrek-li-ser-pirtuka-rebera-rastnivisine-ya-komxebata-kurmanciye-4974h.htm> (16 Gulan 2019)
- Qasim Xelîl, “6 rexne li “Rêbera Rastnivîsînê”, <https://www.bernamegeh.org/2020/02/12/6-rexne-li-rebera-rastnivisine/>
- Husein Muhammed “Rêbera Rastnivîsînê” ya WM û derdê giran yê hîperkorektîyê û xweferzkirinê (1)”, (Jan. 29, 2020)
- Remzî Kerîm, “Rêbera Rastnivîsînê: munaqêşe yan pêşbirke?”, https://remzikerim.wordpress.com/2020/02/16/___trashed/ (Feb. 16. 2020)
- Sazîya Zimanê Kurdî, “Ji bo Weqfa Mezopotamyayê\Komxebata Kurmancîyê: Encamnameya nîqaşên li ser Rêbera Rastnivîsînê” (22.12.2019)
- Halil Aktuğ, Gotara Rastnivîsa Kurdî (Kurmancî).
- Yaşar Eroğlu, “Rêbera Rastnivîsînê çi rast nivîsiye?”, Nûbihar, 149, Payîz 2019, rr. 42-49.

Teqez ji bilî van rexne, nirxandin û nûçeyan gelek nivîsên din jî hene. Endamekî komxebatê Bahoz Baran, li se van, bersiveka giştî nivîsî (bnr. Bahoz Baran, “Weqfa Mezopotamyayê, Xebatên Zimanî û Komxebata Kurmancîyê”, <https://bahozbaran.wordpress.com/2020/02/13/weqfa-mezopotamyaye-xebaten-zimani-u-komxebata-kurmanciye/>).

Bêguman berhemeka kamil tune. Her berhem heq dike ku bê famkirin, nirxandin û rexnekirin. Berhem bi vî rengî dikemilin. Yekem car e ku berhemeka bi vî rengî ji alîyê komeka berfireh ve tê amadekirin. Ev kom hem ji alîyê pisporî û hejmarê ve û hem jî ji alîyê temsîliyeta kurdan ve heta astekê serkeftî ye. Ji bo zimanekî ku nêzî 50 milyon însanan temsîl dike xebatên bi vî rengî pir kêr in. Hema bêje tune ne. Em dibînin ku Başûr ev çendî sal in xwedî pergaleka taybet e û xwedîyê gelek sazgeh û derfetan e û li ber destê me xebateka wan a bi vî rengî tune ye. Gava ku em li Başûr, Rojava, Rojhilat û sazîyên li dîyasporayê û yên li Bakur dinêrin em dibînin ku ev *Rêbera Rastnivîsînê* pir dereng maye. Ji ber vê yekê jî ev *Rêber* ji îro pê ve dê bibe mîhwer û navenda nîqaş û pêşveçûnan.

Teqez rast e ku vî komê midaxeleyî hin ezberan kiriye û gelek tiştan jî pesend kirîye. Xwezaya ziman, guherandin û midaxeleyên berfireh qebûl nake. Normal e ku li ser xebatên ziman her gav nirxandin û rexneyên hûr û kûr bên kirin. Dema ku zimanê rexneyê zimanekî

akademîk be ev rexne çêker e bikêrhatî ye. Lê mixabin hin rexne ji çarçoveya rexneya akademîk derketine û gihîştine asta heqaretê. Bêguman ev bêsiûdîyek e ji bo vê kedê.

Em qala zimanekî ku bi sedsalan e neketîye ser kaxezî û pergale dikan. Di vê sedsalê da, ne mimkun e ku mirov di warê zimanî da belawela be, belkî ev karê sed sal berê bû. Lê îro derkete holê. Mirov dikare vê xebatê wekî avahîyekê bifikire. Lê dikî û paşê wextê bi kar tîni, hinek tiştan diguherîni. Derdixî, lê zêde dikî. Hebûna rêberekê, muhîm e. Ji ber vê ev gav gaveka giring û heyatî ye. Ji bo tekamulê diviyabû li ber destê xwîner û nivîskarên kurdî mîna keka şênber hebûya û ev berhem ji bo vê guzergêh û pêvajoyê destpêkek e.

Rêbera Rastnivîsînê

Komxebata Kurmancîyê

Bahîz Omer Ehmed, Bahoz Baran, Behrûz Şucaî,
Deham Evdîlfeţah, Dilawer Zeraq, Dilbirîn Evdîla, Evdîlwehab Xalid Mûsa, Malmîsanîj,
Mahmûd Lewendî, Mehdî Caferzade, Mihemed Teqewî, Mistefa Aydogan, Mikail Bilbil,
Newzad Hirorî, Samî Tan, Şoresvan Adil, Zana Farqînî, Zulkuf Ergun



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ